

NÛDEM

№ 26 1998

Kovara Huneri, Edebi o Çanli

NÛDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî



Xwedî û berpirsiyarê giştî

Chief Editor

Firat Cewerî



Hejmar 26, sal 7

Havîn: 1998



Şerdên abonetiye (salek)

Swêd: 240 Sek

Skandinaviya: 280 Sek

Ewrûpa: 80 DM

Amerîka, Austaralia,

Kanada: 50 \$

Institution: 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964



Wêneya bergê: Rehîmo

Çapa bergê:

Jakobsbergs Tryckeri



Pergala bergê û rûpelan:

Nûdem



Adres: NÛDEM

Box: 177

177 23 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-580 131 62

NAVEROK

- 4 Aboriya NÛDEMê ◆ **FIRAT CEWERÎ**
- 6 Riya Teze ◆ **WEZÎRÊ EŞO**
- 15 Ew ê min winda bikin ◆ **ZEYNEL ABIDÎN**
- 16 Û çavên te ◆ **ÎBRAHÎM SEYDO AYDOGAN**
- 17 Hevpeyvîn bi Ahmet Altan re ◆ **NAÎLE ARAS**
- 23 Civaka IT û pirsra kurdî ◆ **MÛRAD CIWAN**
- 38 Pênc şîir ji ◆ **SABAH KARA**
- 40 Seyra Gulîsor ◆ **ŞEREFXAN CIZÎRÎ**
- 54 Here dera dilê te te dibiyê ◆ **SUSANNA TAMARO**
Werger: **ZINARÊ XAMO**
- 61 Wekheviya jin û mêran ◆ **ŞAHÎNÊ BEKÎRÊ SOREKLÎ**
- 66 Êş ◆ **RÊNAS JIYAN**
- 67 Çik wilo ◆ **KAWA NEMIR**
- 68 Rehîmo ◆ **RINDÊ ÇAÇAN**
- 71 Olof Palme ◆ **MIHEMED DEHSIWAR**
- 83 Salên Şerif Paşa yê dawîn ◆ **ROHAT ALAKOM**
- 87 HAWAR hat hawara me ◆ **F. CEWERÎ**
- 91 Elyêzêrê kurd ◆ **MUSTAFA AYDOGAN**
- 93 Li ser Hawarê ◆
DERWÊŞ M. FERHO
SEBRÎ BOTANÎ
PERVÎN CEMÎL
HESENÊ METÊ
ROJEN BARNAS
MEHMED UZUN
- 105 Agahdariyek ji bo aboneyên NÛDEMê
- 106 Romana tarîti û ronahiyê ◆ **LOKMAN POLAT**
- 114 "Kultur û Raman" ◆ **N. ZAXURANÎ**
- 119 Li ser Şerefname û çapa wê ya nû ◆ **ZIYA AVCI**
- 124 Weşanên nû bi kurtî
- 134 Titanic ◆ **SULEYMAN DEMÎR**

NÛDEM Û ABORIYA WÊ



FIRAT CEWERÎ

Kurdino, makxerabino, an mebêjin em kurd in an jî bi kurdî bixwînin.

Celadet Ali Bedir-Xan

Bêguman aborî bingehê jiyane ye. Aborî bingehê azadî û serbixwebûnê ye jî. Ev dikare azadî û serbixwebûna ferdî, organîzasyonî, an jî dewletî be. Lê gava ferd, organîzasyon an jî dewlet di warê aborî de serbixwe bin, ew dikarin di warê civakî û fikrî de jî serbixwebûna xwe biparêzin. Serbixwebûna aborî carinan di-

kare bibe bingehê serbixwebûna fikrî jî. Fikrên serbixwe objektîv dibin, objektîvbûna fikran dikare civatê bi awayekî bi sûhet bi pêş de bibe. Herçiqas welatê kurdan di warê aborî de dewlemend be jî, kurd bi xwe jî vê dewlemendiyê bêpar in. Loma jî ew hewcedar in. Xwendeyên kurdan, dezgehên kurdan, partî û rêkxistinên kurdan ku xwestine rewşa kurdan ya civakî, siyasî û aborî biguherin, bi xwe jî feqîr û belengaz bûne, bi xwe jî hewcedar bûne û îro jî hin îstisna ne tê de, dîsan rewş weha ye. Loma jî tiştên ku ew dixwazin nikarin bibin serî; kelemên siyasî demekevin pêşberî wan jî kelemên aborî derdikevin. Ger rewşa dezgehên kurdan ya aborî baş bûya û ger wan bixwestina wan ê bikarîbûna, qet nebe, di warê kulturî û edebî de gelek tiştan bikin. Nebûna pir kanalên radyo û televîzyonan, nebûna rojnameyên kurdî yê rojane û nebûna di her şaxî de kovarên kurdî ji ber nebûna îmkane aborî ye. Di vir de fikir û têgihîştin jî pêwîst e. Yê hinan jî ev îmkane hene lê nêzikî vî karî nabin. Ji ber ku di rewşa kurdan ya îroyîn de ev kar serêşyan bi xwe re tîne.

Fikra derxistina kovara NÛDEMÊ hê di nava salên 1980ê de di serê min de çêbûbû, lê problema mezin problema aborî bû. Me bi keda xwe ya şexsî ya deh-donzdeh salan bingehe aborî danî. Ev bingeh bi hesab bû û wê vî hesabî têra jiyandina NÛDEMÊ ya pênc salan bikira. Loma me pênc sal dabûn ber xwe û me pênc salên xwe bi serbilindî qedandin. Di vê pêvajoya pêncsalane de bi sedan abone û tîyaqiyên Nûdemê çêbûn. Abonetiya van aboneyan, ji bo berdewamkirina pênc salên din ji ji me re hem bû moral, hem jî bû piştgiyeye aborî. Herçî astengiyên siyasî yên ku li welêt derdikevin pêşberî çapemeniya kurdî, li Swêdê demeketine pêşberî me û wê dermekevin jî. Dibe ku hin kes bi vê demokrasiya Swêdê bawer dikin ku Swêd jî bo kovarên kurdî peran dirjîne. Tiştêkî welê tune. Mîna gelek welatên dinyayê, wezaretê çandî ya Swêdê jî bi cidiyeta weşanê ve girêdayî alîkariyeye aborî dide, lê divê weşan bi xwe xwe finanse bikin. Ji 26 hejmarên Nûdemê, me jî heqê 5 hejmaran alîkarî ji konseya çandî girtîye. Lê mîna gelek kovar û rojnameyan em îro jî wê alîkariyê jî bêpar in. Wezaretê çandî ew alîkarî jî daye rawestandin û divê kovarên kurdî bi her awayî xwe bi xwe finanse bikin. Ji bo finanskirina kovareke mîna Nûdemê 800 abone an jî 1000 abone têr dike. 1000 abone hem wê kovarê finanse bike, hem jî wê kovar 1000 xwendevanên kurd perwerde bike ku ev 1000 xwendevan di pêşerojê de bibin 1000 mamoste û 1000 mamoste bibin 1000 mûm û ronahiyê bidin civaka me ya tarî. Di nava kovarên edebî de, ji aliyê aboneyan ve dibe ku rewşa Nûdemê ya herî baş be, lê gava mirov rewşa kurdan tîne ber çavan, şer û pevçûna wan tîne ber çavan, daxwaza wan ya azadî û serbestiyê bi bîr tîne, hebûna çandsed aboneyekî pir kêr e. An kurd hîn nebûne ku li hêjayiyên xwe xwedî derkevin, an jî baweriya wan ya bi azadiya wan sist e. An na ji bo bidesixistina kovar û rojnameyeye kurdî diviyabû wan li sînoran bixistana, diviyabû wan tehlûkeyên mezin bidana ber çavan û xwe bigihandina weşanên bi kurdî. Lê mixabin îro ne wisa ye. Do û pêr ji ne wisa bû. Yanî berî bi sêsed salî di dema Ehmedê Xanî de jî bazara kurdî "kesad" bû û berî bi şêst salî di dema Celadet Bedir-Xan de jî kesî pênc pere di kurdî nedida. Loma Celadet bang dikir, digot: "Kurdino, mabxerabino, an mebêjin em kurd in, an jî bi kurdî bixwînin."

Digel hemû neyîniyan rewşa îro jî ya do û pêr çêtir e. Wê çêtir jî bibe. Carinan hin xwendevanên me di nameyên xwe de dibêjin: "Eman, ji bo Xwedê, weşana Nûdemê medin rawestandin." Û di vê weşana heft salane de wê rojê ji Norvecê, ji aboneyekî me î bi navê Walîd Seîd heqê abonetiya 1998an 1000 Kronên Norvecî hat. Yanî vî camêrî 700 Kron alîkarî ji Nûdemê re şandiye. Em çî bibêjin, ew destê xwe biavêje axê, ax di destê wî de bibe zêr. Gava hejmara camêrên mîna Walîd Seîd pir bibin, ne Nûdemek, wê kurd bikaribin bi dehan Nûdeman derxînin.

Bi hêviya ku wê partî û rêxistinên kurdan, welathez û dewlemendên kurdan hinekî din jî guh bidin ziman û edebiyata kurdî, ez silavên xwe yên ji dil jî piştgir û dibxwazên ziman û edebiyata kurdî re pêşkêş dikim... 🙏

"RIYA TEZE" DI NAV DÎROKA ROJNAME-GERIYA KURDÎ DE RÛPELEKÎ GEŞ E



WEZÎRÊ EŞO

Îsal sedsaliya rojnamegeriya kurdî ye. Pîrozkirina Îsedsaliya rojnamegeriya kurdî rûmeta berpîrsiyarê rojnamê Mîqdad Mîdhed Bedir-Xan û rojnama wî bilindtir dike. Ez jî bi vê gotara xwe beşdarî vê cejna çanda gelê me ya bi nav û nîşan dibim.

Di çarçova vê cejnê da ez dixwezim qala tişteki wisa bikim, ku haya kurd û Kurdistanê kêm jê heye. Gotina min derheqa rojnama kurdên Sovyetistana berê - "Riya Teze" de ye.

Gava sala 1930î bi zimanê kurdî û bi tîpên latîni dest bi weşandina wê rojnamê bû, êdî "perdeke hesinî" di navbera kurdên Sovyetistana berê û kurdên Kurdistanê de hatibû danîn. Weşandina wê hetanî sala 1937an dom kir. Ji wê salê hetanî sala 1955an rêjîma Stalîn ew da qedexekirin. Lê piştî mirina "bavê milera" wê carek din dest bi weşanê kir, lê vê careê êdî bi tîpên kirîlî û hetanî îro jî ronahî dibîne. Lê gerekê bê gotinê, ku ew "sûra hesinî" wek berê ma, hela hîn mehkemtir bû.

Gava em îro 100-saliya rojnamegeriya kurdî didine kîvşê, em rojnama kurdên Sovyetistana berê jî bi şabûn bir tînin, ji ber ku dîroka "Riya Teze" jî beşekî dîroka rojnamegeriya kurdî ye. Ez îro bi serbilindî derheqa rojnama me ya delal de dinivîsim, ji ber ku rola wê nava pêşketina edebiyat û çanda kurdî li hemû cîhanê pir e û



РІА ТӘЗӘ

ОРГАНА КОММУНИСТИКА ДИК. СОВЕТА ТӘҖРӘВӘНД У СОВЕТА МИНИСТРЕД РСС ӘРМӘНИСТАНЕ
 -ՌԻԱ ԹԵԶԵ՝ ՕՐԻՆԿԱԿ ԵՄ ՄԵԼՆԻՍԻՄ, ՀԱՅՈՒՄԻՆԻՄ ԱՄԷ ՊԵՇԻՅԱՆԻՄ ԿՈՄՄՈՆԻՍՏԻԿԵՐԻ ՊԱՐԼԱՄԵՆՏԻՄ
 «РИА ТАЗА» ОРГАН ЦК КПА, ВЕРХОВНОГО СОВЕТА И СОВЕТА МИНИСТРОВ АРМ. ССР

№ 103 (4257)
 ЧАРШӘМ
 27-е
 ДЕКАБРЕ
 (К'АНУНА
 ПЕШЬН)
 САЛА 1989

Қиғәт 2 кәкәк

Ж Ъ САЛА 1930—Н НӘШЬР ДЬБӘ ● Б'ӘВТЕ ДО ЦАРА ДӨРТЕ

ez xwe bextiyar dibînim, ku ez van 40 salên dawî bi wê va girêdayî bûm, ew wek av û hewa jiyan dida min û her kurdekî roşinbîr. Û tişteki hewaskar û balkêş e, ku em dikarin rojnama kurda ya pêşin-”Kurdistan”-ê û rojnama kurdî ya here jiyandirêj-”Riya Teze” wek hevalcêwî bihesibînin, ji ber ku herdu jî li dervayî welêt derketine, herdu jî xwerû kurdî bûne, herdu jî bi fikrên cuda yên pêşin in, qedera gelê Kurdistanê û kurdên Sovyetistanê jî yeke, ji ber ku me herduyan jî di hêla hişyarkirina gelê kurd de karekî mezin kiriye.

Tişteki gelekî hewaskar e, ku îsal sersalîke ”Riya Teze” jî tamam dibe. Ew rast 50 sala derketiye. 7 sal bi latînî û 43 sal jî bi kîrîlî (wek me got, ji sala 1937an hetanî sala 1955an çap ne bûye).

Belê, em bêî şikberî dikarin vê rojnamê bihesibînin salnivîsara dîroka kurdên Sovyetistana berê, xwesma dîroka edebiyat û çanda me.

Nivîsara vê gotara derheqa ”Riya Teze” de, weke dibêjin, deynê ser stuyê min e -wek roşinbîreki kurd, rojnamevan û nivîskar. Lê ez dixwezim vê sersaliyê bikim bahane, wek firsetekê bi kar bînim, ku herwaha ser pirsgirêkên çanda me, xwesma rojnamegeriya kurdî bisekinim. Ji ber ku kivişkirina sersaliyê tenê ”lêxistina def û zurnê nîne”. Giringe îro em kêmasî û şaşiyên xwe jî bînine meydanê, ku em bikaribin pêşerojê de wana hilînin, ji ber ku em gelek şûnda mane û dem li benda me nasekine. Divê em li demên buhurî jî mêze bikin, ku bikaribin pêşiya xwe rind bibînin. Eger em hildine ser hesêb, ku dewleta me tune, wî çaxî rola rojname, kovar, pirtûk, radyo û televizyonê hîn zelal têne ber çavan. Ew gerekê karekî wisa bikin, ku êdî dijmin nikaribe gelê me bixalîfîne, bixapîne.

Haya min rind ji ”Riya Teze” ya salên 30î jî heye, ji ber ku min ne tenê hejmarên wê xwendine, lê herwaha hemû berpirsyarên wê dîtine. Herdu berpirsyarên pêşin Hraçya Koçar û Harûtyûn Mikrtçyan jî ermenî bûne. Herduyan jî kurdî xweş zanibûn, ji ber ku yek ji Eleşgîrê bû, yê dinê jî ji Wanê. Dû ra jî Cerdoyê Gêncoyê kurd bûye berpirsyar. Ez bi wan re zemanekî dirêj peyivîme, bîtanînen wan wek ronaya çavan xwedî dikim. Ez pir gotina ji wan roşinbîrên kurd jî pê hesyam, ku

wan sala bi nivîsarên xwe beşdarî weşandina wê bûne: Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Ahmedê Mirazî, Casimê Celîl, Qaçaxê Mirad, Wezîrê Nadîrî, Qanatê Kurdo, Çerkez Bakayêv, Aramê Çaçan, Etarê Şero û gelekên mayîn.

Û xût "Riya Teze" bû bingeh, ku salên 30î ronakbîriya me saz bû, şax veda û ew dewran bû dewrana çanda kurdî ya zêrîn. Ji ber ku wan sala hemû dergên xêrê li ber me vebûbûn. Wî alîda wan ermeniya, ku em bi hev re ji qira sala 1915an ya tirkî xilas bûbûn û derbazî Ermanîstana îroyîn bûbûn, û baş kurmancî zanibûn, gelekî alîkariya "Riya Teze" û bi tevayî me kirin di hêla sazkirina bingeha mehkem bona pêşketina me. Ji wana hêjayî bîranîne ne: Avêtîk Îsahakyan, Hovsêp Orbêlî, Hakob Xazaryan (Lazo), Sarmên, Sîras, Vardan Pêtoyan, Rûbên Drampyan, Hamo Bêknazaryan, Solak Nikoxosyan û yê mayîn. Sed mixabin, ku van salên dawî di nav ermeniya de xêrnexwaz û dijminên wek Garnîk Asatryan û Yêxya Naçaryan peyda bûn, yê ku niha di nav ermeniya de naskirî ne.

Ev rojname me ne tenê bi ziman, lê bi naveroka xwe jî kurdî û kurdewarî bû. Gelek bîranînen qenc, welatparêzî bi wê re girêdayî ne. Em yek ji wan raberî we bikin: Em ji hejmara 8an ya kovara Hawarê (sala 1932an) pê dihesin, ku çend hejmarên "Riya Teze" û çend pirtûkên kurdî, yê ku li Yêrêvanê hatibûne çapkirinê, gihîştine ber destê ronakbîrê kurda yê bi nav û deng Celadet Bedir-Xan. Awa wê hejmarê de çî tê gotinê: "Rojnameke kurmancî, bi herfên nû, bi kurdmanciyêke xwe-rû, li Rewanê di şikleki spehî û çeleng de derdikeve.

Vê paşiyê çend hejmarên wê gehîştine destê me. Çavên me pê biruhn bûn, dilê me şa û geş bû.

Kurdmancên Rewanê ji rojnamê pêve çend kitêb jî derxistine. Me sê çar rûj mijûlahiya xwe bi wan kirin.

Ji nav rûpelên wan ên taze û ter bîhna kulîlkên çiyayê Elegazê, bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav resmên wan de şal û şapikê kurdmancî, xencer û piştence-rên kal û kalikên me dihatin dîtin.

Rêya Taze wek navê xwe taze ye, nû ye, nûbare. Lê ji Hawarê kevintir, bi emir jê mezintir. Hejmara wê a paşin, ko gehîştîye destê me a pêncî û nehan e. Li gora ko Rêya Teze rojnameke dehrûjki ye, berî salkê û hin dest bi derketinê kiriye".

Wê şûnda Herekol Azîzan (Celadet Bedir-Xan navê xwe wa bin nûçeyêda nivîsiye) weke nimûne ji kirêbeke kurdmancî, ku bi "Riya Teze" re gihîştîye ber destê wî, du helbestên şayîrên kurdên Ermenîstanê di Hawarê de weşandine. Pişt re Celadet Bedir-Xan dawîya nûça xwe de wa dinivîse:

"Ji bona îro me hevqas got, pêşdetir em ê dîsan ji Rêya Taze behs bikin.

Em ji hevalê xwe re rêkeke xweş û dawîyêke geş hêvî dikin. Divêt ko her gav me

hay ji hev hebit û gerek e ko em hevdu ser xebata hev serwest bikin”.

Haqas. Gorina ronakbîr û welatparêzê me yê mezin ne pir dirêj e, lê çiqas fikir û mitala dil û hişê mêriv de disêwirîne. Wan çend xetan dixûnî û dibêjî qey te pirtûkeke tam xwendiyê. Her car, gava ez vê gotarê dixûnim, kela girî dide qirka min. Û zanin ji bo çi? Boy qedera ronakbîrê me û gelê me. Em bi milyona kurd ketûne çî rewşeke giran, ku sermiyanê rojnamegeriya gelê me - Celadet Bedir-Xan bona sitendina rojnamek û çend pirtûkên kurdî çavronayê dide xwe û hogira. A ev e welatparêziya rast, mezinaya ronakbîr. Em hela hê çîqa tişt gotî ji wî ronakbîrê xwe fêr bin. Û gelo ev yek her kes dikare fêr bibe? Heyf, ku na! Ev yek ji nijad, ji xûna merivê xas û paqij tê û loma jî her kes nikare bibe Celadet Bedir-Xan. Lê tiştê baş û şabûnê ew e, ku gelê me yê weke wî dane, wê dîsa bide.

Kê mîrov zane, ku bona şandina hejmarên rojnama "Riya Teze" û çend pirtûkên kurdî ji bo redaksiyona Hawarê, çend ronakbîrên me girtin, kirine hebsê.

Naveroka "Riya Teze" ya salên 30î pîranî pesindariya siyaseta Partiya Komûnîstiyê û dewleta Sovyetê bû, pesindariya keda helal û dijderketina hindava olperestiyê, axa, bega, şêxa û kevneperesta. Û îzna hîç kesî tunebû, ku ji govêka siyaseta Sovyetê û Partiya Komûnîstiyê pesnê tiştêkî dinê bidin. Û gava tevî gelek rojnamên welêt "Riya Teze" jî sala 1937an hate qedexekirinê, derbeke xedar û giran gihîşte edebiyat û çanda kurdî. Bilî vê, ronakbîrên kurd Heciyê Cindî, Cerdoyê Genco û Ahmedê Mîrazî li Yêrêvanê girtin, lê Erebê Şemo li Peterbûrgê. Hersêkê pêşin piştî salekê derketin, lê bingevanê romana kurdî heta mirina Stalîn jî (sala 1953an) di heb-sê de ma.

Berî mirina Stalîn biryar hatibû qebûlkirinê, ku herfên elfebayên hemû mileta ji tîpên erebî û latînî bikin kîrîlik. Sebeb jî ew bû, ku Xwedêgiravî çanda wan gela nêzikî ya rûsî bikin. Lê bi rastî eva destpêka helandina gelan bû, alîkî va firsendek bû, ku miletên kêmjimar ji koka wan biqetînin. Ji ber wê jî bi serokatiya Heciyê Cindî, herfên kurdî yê nuh-yên kîrîlik hatine çêkirinê û ew hetanî niha jî li Sovyetistana berê bi kar tînin.

Sala 1955an "Riya Teze" dîsa hate weşandinê. Vê carê ew êdî organa Komîtêya Navbendî ya Partiya Komûnîstiyê ya Ermenîstanê, hukumer û parlamentoya wê bû. Mîroyê Esed bû berpirsyarê wê hetanî sala 1989an. Û ji ber ku hemû xebatkârên rojnamê di hêla nivîsara kurdî de xam û "xişm" bûn, zaneyên kurd Heciyê Cindî û Emînê Evdal şandin redaksiyona rojnamê û ew du salan li wir xebitîn û karekî mezin dane pêşketina rojnamê.

Rojname vê carê êdî heftê du caran derdiket. Salên pêşin tîraja wê 3 hezar bû, paşê jîmara xwendevana gihîşte hetanî 5 hezaran. Hema bêje ew dikete her maleke

kurdên Ermenîstanê. Heta bi mecbûrî xelq dikirine abone. Ev yek dibû bingeş, ku hemû kurd hînî xwendina kurdî bibin. Ew herwaha çend komarên Sovyetistana berê û hinek welatên mayîn jî belav dibû. Ji ber wê jî di nava xwendevana de nûçe-gîhan peyda dibûn.

Wek min got, rojnama me ya resmî bû. Eva yeka bona me - kurda serbilindî bû, ji ber ku rojnama me jî beramberî rojnameyên Sovyetistanê yê navdar xwediyê rûmeteke hêja bû. Lê ji alîkî dinê va jî, wê resmîtiyê malik li me xirab kiribû. Bi wê resmîtiyê rojname gotî ji çarçova qanûnên partiyê derneketa û anegorî dilê wê bi-meşiya.

Belê, Stalîn zû de miribû jî, lê destûra "Riya Teze" tunebû rûpelên xwe da bini-vîse, ku sala 1937an ew û zimanê kurdî yê lîteratûrî hatibû qedexekirinê. Lê ya here xirab û ziyandar ew tirs û xof bû, ku ji dewrana Stalîn dilê meriva de mabû. Rûyê wêda, meriv heta niha jî wek dibêjin, ji siya xwe ditirsin. Xwesma berpirsyarên rojnamê nava wê tirs û xofê de bûn, ji ber ku rûyê şaşîke siyasî de ew dikaribû biçûya ber mehkemê, an jî bihata girtinê. Bi texmîna wan, eger navê kurd û Kurdistanê nava rûpelên rojnamê de pir bihata nivîsarê, ew dikaribû wek miletçî, nijadperest bihara sûcdarkirinê.

Belê, sed mixabin, ku rojnama "Riya Teze" ya ji salên 50î heta salên 80yî rûyê berpirsyarê wê de, wek lazim bû xizmetî gel ne kir. Eger tirsî berpirsyarên rojnamên ermenî, rûsî û yê mayîn dihate afûkirinê, ji ber ku rojnamên wan bi temamî siyasî bûn û rojnamên wan yê lîteratûrî, çande, dîrokê jî hebûn, lê ya kurda - na! Ji ber ku ew ya bi zimanê kurdî ya tek-tenê bû. Ango, gerekê bilî siyasî zêde guh bida ser çand û lîteratûra kurdî, pirsên zimanzanî û dîroka me. Û ewqas siyasî hebû, ku ji bo kurdeyatîyê çî ne dima. Eger em kurt bêjin, qedexa berpirsyar ji ya dewletê zêdetir bû.

Eger berhemeke şayr an jî nivîskarekî ne gorî siyaseta partiyê bûya, ew ne dihat weşandinê. Lê eger bi awakî çap dibû jî, bi xurtî dihate rexnekirinê û xwedî dihatê sûckirinê. Lê eger berhemeke sist pesnê partiyê û hukumetê bida, ew çap dikirin. Sebebê nivîsara berhemên wî awahî ew bû, ku me hetanî van dawiya jî korekor baweriya xwe bi bîr-baweriyên komûnîstiyê, siyaseta hukumeta Sovyetê dianîn, me digot qey kurdên Kevnesovyetê yê here bextewar in. Haya geleka jê tunebû, ku hukumeta Sovyetê jî bi siyaseta xwe gelek cara rê li ber çêbûna dewleta Kurdistanê girtiye. Dîroka me - kurdên Sovyetistana berê gelek cara rûpelên rojnamê de hatiye feşkirinê: bi zanîn û nezani, bi dilxwezî û mecbûrî.

Lê bilî van kêmasiya û şaşiya rojnama "Riya Teze" roleke giring list di helkirina zimanê kurdî yê lîteratûrî, amadekirina kadroyên kurd yê rojnamevan û nivîskar

da. Ser rûpelên wê gelek zane, şayîr, rojnamevan û nivîskar gihîştin. Yek ji wana jî ez im û bi wê xwe bextiyar dibînim.

Tê bîra min, sala weşandina rojnama me ya pêşin bû. Ez wê hingê xwendikarê Unîversîteya Yêrêvanê bûm. Min biryar kir, ku ez jî nûçeyekê rojnamê re binivîsim û bibim rojnamevan, bême naskirinê. Ez rûniştim û min destbi nivîsarê kir. Û min teze texmîn kir, ku nivîsara bi kurdî ne gelekî hêsa ye. Belê, ez li gundê kurda de mezin bûbûm û min zimanê zikmakî yê axaftinê rind zanibû, lê jiyana xwe de hê bi kurdî hevokê jî ne nivîsî bû. Hêna fêrbûna min de, dibistana me de dersên ziman û edebiyata kurdî derbaz ne dibûn. Eger min ew nûçe bi ermenî binivîsiya, çiqas jî zehmet bûya, minê nava çend seheta de xilas bikira. Lê gava min kurdî nivîsî û bi xwe xwend, ew qet bi min xweş ne hat, ku ma li xelqê xweş bê. Min nivîsara pêşin qelaşt û ji nuh va destpê kir. Çi serê we biêşînim, nivîsara nûçeke bi çend hevoka çend roj kişand. Min nivîsara dawiyê hinek begem kir û bir siparte redaksiyonê. Bê sebir benda weşandina nûça xwe sekinîm. Piştî çend rojan nûça min bi navê min di rojnamê de ronahî dît. Wek dibêjin, per-baskên min tunebûn ez bifiriya. Ez xwe bi xwe difikirîm, ku niha ew nûça min gundiyan di rojnamê da xwendine û ji hev re wa dibêjin: "Hela bala xwe bidinê, kurê Eşoyê Hûtî begê çiqasî pêş va çûye, ku rojnamê de nûçeya wî hatiye weşandinê".

Piştî sê salan, sala 1958an çîrokeke min di rojnamê de çap bû û ji wê şûnda xên ji rojnamevaniyê, min xwe li nivîskariyê jî girt, pirtûkên xwe yê serpêhatî û kurteromana weşandin.

Min ji bo çi di derheqa vê yekê de hinekî dûr û dirêj nivîsî? Sebebê herî mezin ew e, ku ez ji hogirên xwe yê rojnamevan û nivîskar re bêjim, yê ku bi tirkî an jî bi zimanekî dinê dinivîsin, lê naxwazin fêrî kurdî û nivîsara kurdî bibin, ku ew jî dest bi nivîsara bi kurdî bikin. Ez bawer im, ku hinek ji wan bi kurdî zanin, lê ji ber ku xwendina wana bi tirkî ye, nivîsandina bi tirkî jî ji wan re hêsatir e. Lê ev rê ne riya ronakbîrên kurd e. Em bi zimanên xerîba nikarin bigihîjine pêşketina rojnamegeriya kurdî. Eger ne bi kurdî be, êdî çi rojnamegeriya kurdî?

Xwendevanên hêja, em dîsa vegerine ser rojnama me ya ezîz - "Riya Teze". Me hinek kêmasiyên wê kivş kirin, lê bona heqiyê, rastiyê lazim e bêjin, ku sebebên wan kêmasiyan ne tenê berpirsyar û hinek xebatkarên wê bûn. Lê alîkî va jî em nikarin keda wan karkerên redaksiyonê ji bîra bikin, yê ku nava şertên dijwar da, ji gel û welatê xwe qetiyayî, ji rojnamegeriya kurdî qutkirî, gihîştine wê derecê, ku zimanekî kurdî yê siyasî çê kirin û keda xwe kirine nava helkirina zimanê edebiyatê.

Salên dirêj di rojnamê de bilî kesên ku me navên wan dan, herwaha ev kes jî xebitîne: Şekroyê Mihoyî, Qaçaxê Mirad, Emerîkê Serdar (wek çîgirên betpirsyar),

Eliyê Evdilrehman, Karlênê Çaçanî, Şerefê Eşir, Babayê Keleş, Tîtal Mûradov, Egîrê Xudo, Hesenê Qeşeng, Têmûrê Xelîl, Girişayê Memê, Pirîskê Mihoyî, Yûrayê Şawo, Vanîkê Elîxan, Rizganê Cango, Hesenê Ūso û yê n mayîn. Serok û berpirs-yarê radyoya kurdî Xelîlê Çaçan (Mûradov) jî demeke kurt li vir xebitî. Salên pêşin Mîkayêlê Reşîd jî wek wergêr li vir kar kir. Heq e, ku em keda herfrêzkir û herfrastkirên xwe jî bîr bînin: Egîtê Abasî, Letîfê Emer, Paşayê Erfût, Porsora Sebrî.

Bilî navên jorgotî, bi nivîsar, gotar û berhemên xwe yê n mayîn va rûpelên rojname xemilandine: Nadoyê Xudo, Xelîlê Çaçan, Ūsivê Beko, Baxçoyê Îsko, Şikoyê Hesen, Sehîdê Îbo, Xalit Çetoyêv, Celîlê Celîl, Meksîmê Xemo, Kinyazê Îbrahîm, Çerkezê Reş, Memoyê Xalit, Simoyê Şemo, Ezîzê Îsko, Cerdoyê Esed, Semend Siyabendov, Şemsî, Eskerê Boyîk, Ordîxanê Celîl, Rizaliyê Reşîd, Sîma Semend, Nûra Cewarî, Tosinê Reşîd, Ezîzê Cewo, Ehmedê Hepo, Elîxanê Memê, Ezîzê Gerdenzerî, Egîtê Sinco û yê n mayîn.

Bi serî rojname "Riya Teze" rojnamevanên kurd pêşda hatin û pêşda çûn, yê n profesyonel jî nav de. Lê ya here giring û qenc ew bû, ku ronakbîrên kurd bi giştî, yê n ku xwendina wan bi rûsî an jî ermenî bû, bi saya rojname me ya delal afirandin û xwendina bi zimanê kurdî kirine edet. Aboneyên wê jî kurdiya xwe xurttir kirin. Ez vê yekê dihesibînim destanîna me - kurdên Ermenîstanê ya here mezin û giranbuha. Ne tenê xwendin û nivîsara bi kurdî, lê fikrandina bi kurdî bû edet, kurda li her ciya, malê, li ser kar, der va, li redaksyona rojnamê û beşê peyvandina bi zimanê kurdî ya radyo ya Ermenîstanê, para kurdzaniyê ya Akadêmiya Ermenîstanê, sêksyona nivîskarên kurda û ciyên mayîn de bi kurdî dipeyivîn. Ev weke şorişekê bû. Ango, ronakbîrên me bûn ronakbîrên esîl kurd, kurdî û kurdewarî.

Me civîn, şev û cejnên xwe tenê bi kurdî dikirin. Me li kolana û baxça da jî kurdî diaxivî. Gava gundiye n kurd dihatin bajêr, ev yek didîtin, pir şa û serbilind dibûn û bi me zarokên xwe yê n li gundên ermeniyan terbet dikirin.

Lê çi mixabin, ku van dawiya gotina "kurd" li Ermenîstanê êdî bi gelek xweş ne dihat, him hinek ermeniya, him jî hinek êzîdiyên xwefiroş, yê n ku bi destê nijadperestên ermenî li kurdîtiya xwe xwedî derneketin, hela serda jî xwe wek "miletê êzîdî" dibînin. Ū wan êzîdiya dest pê kirin êrîş anîne ser kurdên welatparêz. Piranî êrîşên wan li ser redaksyona "Riya Teze" bû. Gelek kurdên dilsoz û welatparêz bi destê wan xayîna hatine kutanê, zêrandinê. Me navê wan daniye "êzîdiyên nuh". Ū ermeniyan ji bo wan rojname derxistin û radyo vekirin. Lê hiç tişteki wan jî bi êzîdiyê va tune, ji ber ku rojname wan bi ermenî ye, radyoya wan jî bi kurdî ye. Ew jî hindava xwe de: di rûpelên rojnamoka xwe de berî dewleta Tirkiyê kurda nas kirin wek qirkirê gelê ermeniya. Ev jî ne bes bû, anîn li ser rûpelên "Dengê êzîdi-

yan” resmekî wa çê kirin: tabût li ser milê çend mêra ne û mirî jî berbi goristan dibin, ku binax bikin. Mirî kî ye? Ew jî rojnama ”Riya Teze” ye. Belê, ”êzîdiyên nuh” rojnama bi zimanê kurdî binax dikirin, lê ya bi zimanê ermenî radikirin jor.

Lê me - ronakbîran têkoşîna xwe pêşda bir. Me bona parastina yekîtiya gel û navê kurdîtiyê rêxistina xwe - Şêwra rewşenbîrên kurd yê Ermenîstanê damezirand. Şekroyê Mihoyî bû serokê me. Çerkezê Reş û Şerefê Eşîr bûn cîgir, Têmûrê Xelîl sêkrêtar. Ez, Tosînê Reşîd, Eskerê Boyîk, Emerîkê Serdar bûne endam. Me xaniyê redaksiyona ”Riya Teze” jî kire cî-warê çêkirina civînên xwe, weke barêgeha xwe. Lê piştî rabûna rêjîma komûnîstiyê, ”Riya Teze” bû rojnama eynî miletiyê bi naveroka xwe. Gava dewletê alîkariya xwe ji ser rojnamê birî, me destpê kir ew bi alîkariya kurdên welatparêz weşand. Lê peydakirina aboneyan piştî wan teqereqan, ji nava kurdên êzîdî haqasî jî hêsa nîbû. Me, wek dibêjin, roj û şevên xwe kirin yek û ketine gundên kurdan. Rojokê ez û Têmûrê Xelîl ketine gundekî kurda, mal bi mal geryan, hetanî şev dereng û me 50 mal kirine abone. Belê, em geryan, tarîstanê da ser kevir-kuçîka lukumîn, hetanî lingê me ji me re ”axivîn” û gotin: ”Heyran, em zêryan, êdî nikarin bimeşin”:

Belê, rojnama me êdî bû ya ne resmî. Sovyet, komûnîstî çûn, hukumeta Ermenîstanê ya nuh jî nema alîkariya wê kir. Ji ber wê jî ser rûpelên wê îdî nûçeyên ser bûyerên Kurdistanê dihatin weşandin. Piştî Mîroyê Esed ku 34 salan serokatiya rojnamê kir, bi zemanekî kurt Tîtalê Efo bû berpirsyar. Û hêna wîda warguhêzî kete nava rûpelên rojnamê. Lê ji destpêka salên 90-î Emerîkê Serdar bû serok û hetanî niha jî ew e. Li vira heq e em fêriziya wî û karkerên rojnamê bidin kîvê. Eger em dirêj nekin, ku Emerîk wan demên giran de ne bûya berpirsyar, berdewamiya weşandina wê dibe bikete bin tehlûkê. Ji ber ku di vê rewşa giran de rojnama me berbîna kurdan e. Ew nîşana heyetiya me ye, heyetiya rojnamegeriya me ye.

Îro pîraniya rojname û kovarên me bi tirkî û zimanên mayîn yên biyanî, an jî nîvenîv kurdî derdikevin. Sebebên wê yekê ez zanim, lê nikarim tam efû bikim. Nimûna kurdên Sovyeta berê ji bo we gerekê bibe ders. Bi jimara xwe bi sedan cara nji kurdên Kurdistanê kêmtirin jî, lê di dereca karê kurdeyatiyê de pêşdatir in. Min ji bo wê jî nimûna destpêkirina karê xwe yê rojnamegeriyê ji we re got. Ez nimûneke mayîn jî bînim: Mîkayêlê Reşîd hema bêje kurdî hîç nizanibû. Nava demeke kurt de fêr bû û gihîşte wê derecê, ku bû wergervanê radyoya kurdî, pirtûkên xwe bi kurdî nivîsî û weşand.

Li cîhanê qanûneke weha heye: nivîskar bi çî zimanî diafirîne, ew nivîskarê wî gelî ye. Ev tiştêkî rast e. Ji ber ku ziman berhema mejû û fikrandina miletiyê ye. Eger tu dixwezî kêrî gelê xwe bêyî û navê nivîskar û rojnamevanê kurd bê ser te, tu

gotî bi kurdî bifikirî û bîafirînî. Wî çaxî gel wê zûtir û tam ji te fam bike û pey te bê. Min dixwest, ku rojnamevanên me ji yên kurdên Ermenîstanê fêr bûna. Gava pêşiyên me ji welatê kal û bava koç kirin û destpêka vê sedsalê de hatin Ermenîstanê, di tûrê wan de ne rojname, ne kovar, ne jî pirtûkên kurdî hebûn. Lê lawên wan bînga edebiyat û çanda kurdî li wî welatî danîn, ji ber ku di destpêkê de xwe li riya dijwar, lê rast girtin û fam kirin, ku tenê bi zimanê dê edebiyat û çanda kurdî çê dibin û pê re jî rojnamegeriya kurdî.

Xûşk û birayên me sebakê wêşandina rojname, kovar û pirtûka bi zimanê tirkî wê yekê dihesibînin, ku îro xwendevanên wan yên kurdî pir kêr in. Ev jî rastîk e, lê ew yek qet jî nayê wê manê, ku em gerekê destên xwe tewarkin û vî halê giran qebûl bikin. Eger em wisa bifikirin û wisa bikin, em gerekê asîmîlebûna bi milyona gelê xwe di hindava zimên de jî qebûl bikin. Lê êdî çi welatparêzî, em êdî bo çi vê rêkoşîna giran dikin. Gava ziman nemîne, êdî bîr û bawerî bi tenê çi dikarin bikin? Dijmin jî ji xwe dixweze bi destî dibistanên xwe me ji rûbarê dinyayê biqelîne. Bona pêşîgirtina van yeka rola rojname û kovarên kurdî pir û pir e. Ew gerek bibine wek dibistanên kurdî.

Li cihanê de tu tişt bi hêsanî nayê destanînê. Hetanî nan jî rind necûyî, naçe xwarê. Salên 20î helbestvanê rûsa yê mezin Vladîmîr Mayakovskî gazinê xwe dikir, ku xwendevanên rûs kêr in. Lê îro? Îro li Rûsiyayê gişk û li her derê dixûnin. Hilbet, qewlên me û rûsa ne wekehev in, lê ez bawer im, ku em hemû kovar û rojname mên xwe hêdî-hêdî bikine yên kurdî, jîmara xwendevanên me jî wê roj bi roj zêde bibin. Demekê xwendevanên me - kurdên Sovyetistana berê jî tunebûn, lê çê bûn. Lazim e em gotina pêşîkî xwe, weke dibêjin, bikine guhar têkine guhên xwe, vê gotina Celadet Bedir-Xanê nemir: "Hawara me berî her tiştî, heyîna zimanê me dê bide naskirin. Lewma ko ziman şerta heyîne a pêşîn e".

Bi raya min, bikaranîna bi sê elfaba zimanê me zûtir nikare pêşya here. Elfaba, ku dikare aliyê zimên de hemû kurda nêzîkî hev bike, ya latînî ye. Min bi xwe jî 40 sala bi kîrîlî nivîsiye, lê niha - li Awropayê ez fêrî tîpên latînî bûm û ji ber wê şabûna lingê min erd nagire. Lema jî ez bangî hemû kurdan dikim sala 100-saliya rojnamegeriya kurdî bikin sala fêrbûna kurdiya bi tîpên latînî.

Dawiyê bi hêviya hindava hîlanîna van kêmasî û şaşîtiyan, serketina gelê kurd, pêşketin û gulvedana edebiyat û çanda kurdî, vê sersala mezin va girêdayî, ez cejna hemû heval-hogirên xwe yên pênûsê bimbarek û pîroz dikim û ji wan re serketinê dixwezim. □

Ew ê min winda bikin

ZEYNEL ABIDÎN

Demekê şûnda li siya min keve,
Rêçên piyên sinsî yên wehşetê
Û dê çênebe,
Bawer bikin
Tewrê bi tirs
Ya tunebûna li ruhê min...

Ew ê min winda bikin!

Hûn ê nikaribin hîn bin
Ku sibe
Û şefeq çawa reşayî dîke
Û tu car hûn ê pê nehesyabin
Bagerê ku mirov dipelîtîne
Ya xîşbûna ber bi meçhûlê,
Li bedena min a cesûr û xemgîn...

Ew ê min winda bikin!

Ew ê hinek şûnda xwîn bikin,
Xwîna stran û evîne.
Hêsirên çavên şevê
Û tenêtiya min dê bikeve,
Li ser laşê min ê bêxwedî
Û ez miriyek bim jî,
Bêdengiya we dê canê min biêşîne...

Ew ê min winda bikin!

Lê laş nayên windakirin
Timî nêzîk in ew,
Li dareke şikiyayî
Li peleke weşiyayî
Û li ber çemekî
Bes li benda dora xwe nebin
Hinek jî şerm bikin ewên mayî...

Ew ê min winda bikin!

Çavên min girêdayî
Li kêleka riyekê
Yek jî du gulle li pişt serê min
Û bedena min perçe perçe
Hûn ê min bibînin
Û min,
Gelekî ecêb e;
Ji saeta min
An jî, ji pêlasê min nas bikin hûn ê...

Ew ê min winda bikin!

"Mirov gurê mirov e"
Hûn ê bêjin
Û wan bidin ber qehrê
Ku ew celadê min ên
Dev bi zuxav û mêjîrziyayî.

Na na, hevalno,
Di hesim ji beriya bêhna dawî,
Ji ber tirsê, lê ez ne,
Celadên min winda dikin pêşhatiyê
Û bes ji ber vê yekê,

Ew ê min winda bikin!

Li wan bigerin
Û bi tevlên efendiyên bi şiklê mirov
Yên xwediyê sîstema bi xwîn
Yanî yên dagirkerî,
Nekevin qalibekî
Nejîn jiyanekê
Li ser vê sîstema hov
Kevir li ser kevir nehêlin
Û ez dizanim ku
Ew ê min winda bikin,
Lê hûn, min windabûyî qebûl nekin...

Berlîn, 1996

Û çavên te

divê mirov xaniyan ava bike ji xwe re
gundan bajaran welatan
ji xwe re jîneke nû û evînan

divê ji dîroka xwekustinan bikişîne
ji okyanûsan û çolên bêdawî
hemû tenêtiyan

êvar e
divê mirov vî bajarî biterikîne...

min peyv ji bîr dikirin
gava çavên te diçûnsîn di êvarên weha de
peyv dibûn biyanî û nenas
li vî aliyê avê
min tîr di sînga xwe de radikirin

li vî aliyê avê

ez

û tu

û evîna me ya efsanewî

û heta tu bibêjî bes

tenêti...

û li vî bajarî dibûn du bask çavên te
bi wan re min xwe li ezmanên xeyalan
dixistin...

divê mirov vî bajarî bihêle û here
divê mirov vî bajarî biterikîne...

bila hebe evîn

her

û her...

İBRAHİM SEYDO AYDOĞAN

AHMET ALTAN: "DI EDEBIYATÊ DE ZIMAN BINGEH E"

HEVPEYVÎN: NAÎLE ARAS

Ahmet Altan di sala 1950î de hatiye dinyayê. Fakulteya îktisadê ya Stenbolê xelas kiriye. Di bîst û çar saliya xwe de dest bi rojnamevaniyê kiriye. Wî hemû şaxên rojnamevaniyê ceribandine. Di sala 1987an de dest bi nivîskariya quncikan kir. Herweha Ahmet Altan di televizyonan de jî gelek program çêkirine. Ahmet Altanê ku gelek caran ji ber nivîsên xwe hatiye mehkemekirin, îro yek ji romannivîsên Tirkiyeyê yê herî baş tê hesabandin. Her romaneke wî mîna bombeyekê li Tirkiyeyê diteqe. Ew par bi romana xwe "Tehlikeli Masallar" û îsal jî bi "Kılıç Yarısı Gibi" aktuel e. Hevala me Naîle Aras ji bo xwendevanên Nûdemê Ahmet Altan li Stenbolê dît û kurtsohbetek pê re kir. Bi hêviya ku wê bi dilê we be, em vê sohbetê li jêr diweşînin

NAÎLE ARAS: *Ez dixwazim em ji kurdbûyîn û ne kurdbûyîna te dest bi sohbetê bikin. Dibêjin ku diya te kurd e. Çi para rastiyê di vê de heya?*

AHMET ALTAN: Heta çilsaliya xwe jî min ji malbata xwe tişteki weha nebihîstibû. Demekê Yaşar Kaya nivîsandibû, gotibû ku eslê diya min kurd e. Dibe ku para rastiyê di vê de hebe. Ji ber ku diya min bi eslê xwe ji Başûr e.

– *Baş e, te bi xwe qet pêwîstiya lêkolîna vê yekê nedît?*

– Ji bo min bi rastî jî qîmeta nijad tuneye. Yanî ne ji bo ku ez kurd im ez dilşa di-

bim, ne jî ji bo ku ez tirk im ez dilşa dibim: herweha ne ji bo ku ez ne tirk im ez xemgîn dibim, an jî ne ji bo ku ez ne kurd im ez gemgîn dibim. Tu carî nehatiye bîra min ku ez lê bikolim ka gelo koka min ji ku tê, ez kî me, eslê min çi ye. Ez ne li mirovên din bi vî çavî dinerim û ne jî li xwe. Heta ez li dij im ku mirov bi vî awayî li însanan binihêre. Ma ji bo çi serê min dikeve belayê? Ji ber ku ez dibêjim li kurdan mexin, wan azad bihêlin. Ger kurdan tade li tirkan bikirana, kurdan tirk bikuştana, min ê ji wan re jî bigota, li tirkan mexin. Ez pir li dij im ku yek ji bo nijad û koka yekî din lê dixê, tade û neheqiyê digihîniyê.

– *Gelo ma tu dizanî bê diya te kengî û ji bo çi hatiye Tirkiyeyê?*

– Ez bawer dikim ew berî şerê cîhanê yê yekemîn hatiye Tirkiyeyê. Gava ew hatiye ew hê yeksalî an jî dusalî bûye.

– *Ew bi malbata xwe re hatiye, ne wilo?*

– Ew bi diya xwe û bi du xuşkên xwe re hatiye Tirkiyeyê. Xuşka wê ya mezin wê çaxê sêzdehsalî bûye. Ew bi eskerekî ku ji vir diçe şer re dizewice û diya min jî tîne ba xwe. Mêrik, an jî zavayê me, vedigere û diya min jî bi xwe re tîne. Wek min got, hîç behsa kurdan nedihat kirin, an jî ferqek weha tunebû. Ev tişt niha derketiye holê. Esil min dixwest ku kokeke min î weha hebûya. Wê çaxê bi qasî ku ez diçim ser tirkan ez ê ewqasî biçûma ser kurdan jî. Min ê ji wan re re jî bigota, weha bikin, an weha mekin. Min ê hertişt ji wan re jî bigota.

– *Yaşar Kaya çawan ev yeka ha derxistiye ortê? Ew ji ku pê dizane ku diya te ji Başûrê Kurdistanê hatiye?*

– Gava ew çûye Başûr ew pêrgî merivên min hatine, wî li wir merivên min dîtine. Wî endamên eşîra diya min dîtine, wan jê re gotine. Wî ji min re navê eşîra diya min jî gotibû, lê min zêde guh nedabûyê, loma a niha di bîra min de nemaye.

– *Ger bi rastî weha be, diviyabû ew bi we re têketina têkiliyê.*

– Merivên diya min hatin vir. Lê nehat bîra kesî ku ji wan bipirsin bê ew kî ne, ji çi eslî ne.

– *Ew li wir li kîjan bajarî dimînin?*

– Ez bawer dikim ew an li Mûslê an jî li Kerkûkê diman. Ger ew kurd bin jî ne tiştekî ezcêb e.

– *Erê, muheqeq kurdî-tiyek heye.*

– Rast e, wê hebe. Ji xwe birûyên wisa qalind zû bi zû ji nijadên din dernakevin.

– *Gelo haya te ji edebiyata kurdî, ji berhemên kurdan yên edebî heye? An jî tu di vê derheqê de bi tiştekî dizanî?*

– Ez bi tenê Mehmed Uzun nas dikim. Wekî din jî haya min zêde ji edebiyat û edebi-

yarvanên kurdan nîne. Lê ez nizanim gelo berhemên kurdî ku werdigerin zimanên dinyayê an jî wergeriyane tirkî hene an na, haya min zêde jê nîne. Mîna her kesî ez jî Mem û Zînê nas dikim. Ji bilî wê zanebûne min a zêde di derheqê edebiyata kurdî de tune. Ez dizanin ku nivîskarên esilkurd hene, lê perçeyek ji edebiyata zimanên din in. Bo nimûne li Tirkîyê nivîskarên ku bi tirkî dinivîsîn hene, nivîskarên ku eslên wan kurd in û bi zimanê erebî û farisî dinivîsîn hene, lê ew perçeyên ji edebiyata wan zimanan in. Ez bi xwe hê nizanim ku edebiyateke kurdî ya



Ahmet Altan (Foto: Naîle Aras)

bi zimanê kurdî tê nivîsandin heye an na. Ev an ji cehaletî û nezaniya min tê, an jî kurdan bi xwe, xwe di vî warî de nedane nîşandan û nedane qebûlîkirin. Ez Mehmed Uzun nas dikim ku bi kurdî dinivîsîne û mîna perçeyek ji edebiyata kurdî derketiye holê.

– *Ji bilî Mehmed Uzun jî gelek nivîskarên kurd hene. Bo nimûne berpirsiyarê me Firat Cewerî heye, Rohat Alakom heye, bi dehan nivîskarên kurd hene...*

– Ji sedî sed wê hebin, lê ji ber ku min berhemên wan nexwendine ez zêde di derheqa nivîskariya kurdî de tiştêkî nizanîm.

– *Li Tirkîyê Yaşar Kemal heye, kurd e, lê ji ber ku bi tirkî dinivîsîne mirov nikare wî wek nivîskarekî zimanê kurdî an jî wek nivîskarekî kurd bihesibîne.*

– Rast e, ji ber ku edebiyat bi zimên ava dibe û tu di edebiyatê de kîjan zimanî bi kar bînî tu dibî perçeyek ji edebiyata wî zimanî. Ger ez niha li Îngiltereyê bûma û min bi zimanê îngilîzî binivîsanda tu bêjî nebêjî ez ê bibûma perçeyek ji edebiyata îngilîzî, ez nedibûm nivîskarekî zimanê tirkî. Mesele Salman Ruştî ji ber ku bi zimanê îngilîzî dinivîsîne ew perçeyek ji edebiyata îngilîzan tê hesabkirin. Di edebiyatê de ziman bingeh e, ziman rola esasî dileyize.

– *Di eslê xwe de gelek berhemên bi kurdî hene. Lê ji ber ku qedexeyê, ji ber ku ev kar hertim bi dizî hatiye kirin, ji mirov weye ku bi zimanê kurdî tiştêk nehatiye nivîsandin.*

– Ji ber ku zimanê kurdî di bin zilmê de ye û hertim di bin nîrê zordestiyê de hatiye hiştin, teng maye, nebûye zimanê edebiyatê. Ne ku ez vê yekê pir bi zanebûn dibêjim, ev tenê tiştê ku min ji hevalên kurd bihîstine. Ez bawer dikim ger zimanê kurdî firsenda azdiyê bidîta wê îro bi vî zimanî gelek tiştên bedew bihatna nivîsandin. Ji aliyê din ve ez dizanîm ku edebiyata kurdî ya devkî dewlemend e, lê herçî edebiyata kurdî ya nivîskî û modern e, zêde haya min jê tuneye.

– *Dibe ku haya te jê tunebe, lê çî di salên sîhî de û bi derketina kovara HAWARê û çî jî niha li Swêdê gelek mînakên edebiyata modern têne pêşkêşkirin.*

– Belkî jî ji ber ku ew nagihêjin me, an jî ew wernagerin tirkî em jê bêhay dimînin.

– *Ez niha jî dixwazim em hebeke vegeirin ser nivîskariya te. Di nivîsên te de tişteke bala min dikişîne, bi taybetî jî di esyên te de. Tu hertim nêzikî mijara jin û evîne dibî. Lê tu bi perspektîva mêreke nêzikî jinê dibî. Hinek nivîskarên mêr hene gava ew li ser mijara jinê radiwestin ne ji jinekê bêtir be jî, bi kêmanî bi qasî jinekê dikare êş û ezîyata jinê bi xwendevanên xwe bidin hîskirin. Gelo li ba te jî tişteke weha heye? Tu dikarî bi çavê jinê behsa jinê bikî?*

– Belê, min di hin gotarên xwe de ew ceribandîye. Tişteke xweş e gava mirov xwe dixê şûna cinsê hember û ji dil li ser problemên wî cinsî dinivîsîne.

– *Gelo te çawa nivîsand? Tu ji tecrubeyên xwe yê şexsî bi rê ketî?*

– Hem tecrubeyên min yê şexsî, hem jî tiştên ku min xwendine û li ser lêkolîn kirine, tiştên ku min ji jinên li der û dora xwe bihîstine, tiştên ku min di zaroktiya xwe de dîtine, tiştên ku ez hertim dibînim, tiştên ku ez pê dizanim û nizanîm... Tabî ne ku ez zêde jinan nas dikim, lê xuyaye ez hinekî wan nas dikim.

– *Tişteke wilo jî heye, gava mirov nivîsên te dixwîne, hertişt pir xwezayî ye, "Ax, ev jin min dikişin" tu dibêji. Lê gelo gava nivîskareke jin bibêje "Ax, ev mêr min dikişin" wê xwendevan çawan lê binihêrin?*

– Civatê rolên cihê dane jin û mêran. Ev rol hatine qebûl kirin. Gava mêrek tiştê wilo bibêje xwezayî tê dîtîn, lê ger jinek bibêje, ew jin dikeve kategoriya "sivikan" an jî a "tolan". Ji ber ku em tavilê jinan dixin kategoriyên cihê. Ji ber ku jin, cih û dera ku exlaq û namûs lê dicive ye, yanî ew wek hêlîna namûs exlaq tê dîtîn. Yek ji van sebebên berbiçav ew e ku paşdemayîna civatê ye. Di civatên weha de qabiliyera mêran tune ye ku ew bi xwe namûs, şexsiyet û şerefa xwe bi dest bixin. Ji ber ku exlaq, namûs û rûmeta mirovan bi karê mirovan derdikeve holê. Yanî yek bi namûs e, an bênamûs e, bi şeref e, an bêşeref e, bi şexsiyet e, an bêşexsiyet e; ev hemû bi karê yekî ve girêdayî ye û bi karê yekî ve derdikeve holê. Lê ger karekî mêr tunebe, tişteke xwe pê bide îspat kirin tunebe, wê çaxê ew ê bi riya namûs û şerefê xwe bispêre jinê û xwe bi wê yekê bide îspat kirin. Yanî ger jina yekî, ji wî pê ve bi kesekî din re ranezê, lê ew bi xwe her roj derewan bike, xelkê bixapîne, gelac be, mêrkuj

be, celad be, dîsan jî ew mîna mêrekî bi namûs û bi exlaq tê qebûlkin. Lê ji aliyê din ve, mêrekî bi exlaq, di halê xwe de, ne î derewîn, ne î mêrkuj, ger jina wî xera-biyekê bike, ew mêrik wê tavilê mîna bênamûs û bêexlaq were dîtin. Ji bo ku newekheviyeke wilo ji civatê rabe, bi tenê niyeta baş têr nake. Divê civat were guher-tin, divê mirovên civatê bêtir bi ber bibin, ber bidin, yanî bixebitin. Te divê ev xe-bata ha ya madî be an jî ya entelektuelî be... Ger berhemên me tunebin, wê çaxê wê qîmeta ku namûsa me, şexsiyeta me û exlaqê me bipêve û tarîf bike tunebe. Lê ji aliyê din ve jî em dibînin ku jinîti li welatê me û li gelek welatên dinayayê jî mî-na senetekî, mîna karekî tê qebûlkin. Jin bi xwe jî hevkarê sîstema mêrîtiyê ye, ew bi xwe jî dixwaze ev sîstem li ser lingan bimîne. Ger ne weha bûya, nivê civatê jin in û wê jinê bixwesta ku civatê biguhere. Heta carinan ew ji mêran bêtir li sîstemê xwedî derdikevin, an na ne mimkun bû ku vê sîstemê wilo dom bikira. Yê min sempatiya min zêde ji mazlûman re tune ye. Ger li navê zilmek hebe, ew bi qasî zilmdaran mazlûman jî kirêt dike. Ew kirêtiya ku di sîstema zilmdariyê de heye hemû endamên civatê para xwe jê digire, li hemû endamên civatê digere. Ger xweste-keke veşartî ya mazlûman tunebe, zilmdar nikarin sîstema xwe li ser lingan bihêlin. Bala xwe bide Îranê. Îran yek ji welatên ku herî pir jinê vedişêre, lê herî pir li Îranê jin piştgiriya sîstemê dikin. Ev çawan dibe? Ez bawer dikim di civateke weha de, ji bo ku mêrê wê li dû jinin din neçe, ew bi xwe dikare dev ji jiyana xwe berde.

– *Ez bawer nakim ku jin dixwaze her tim weha veşartî bin û di siya mêran de bijîn. Li gorî şertên welatan têne guhertin.*

– Divê em vê bizanibin, sîstemek bi zalim û mazlûman ve li ser lingan e. Ew bi za-lim û mazlûman ve heye. Baş e çima mazlûm li hemberî zaliman serî hîlnadin? Çi-ma ew xwe azad nakin?

– *Bi hêviya serîhildan û azadiya mazlûman, ez ji bo vê hevpeyvînê spas dikim.*

– Ez jî pir spas dikim...

CIVAKA IT Û PIRSA KURDÎ (2)



MÛRAD CIWAN

Pêwendî û rûdanên nuh. Ev dinya ku îro ava bûye tiştin bi xwe re anîne. Tê gotin "madem dinya wiha ber bi otomatîzebûyin û globalîzebûyinê ve diçe, gelo dinya dê ber bi ku de biçê?" Ev yek herî berbiçav xwe di jiyana aborî de û diyartirîn jî di pirs-

sên kar û bêkariyê de derdixin meydanê.

Em dizanin ku pirsê herî mezin li Awrûpayê îro pirsê bêkariyê ye. Pîranî tê gotin ku sebebê bêkariyê siyaseta hukûmetan an krîzên mûeçqet ên konjokturel in. Tedbîrên ekonomîkî yê bi îradeya siyasî dikarin bêkariyê jî holê rakin. Hin bîrbir jî îro dibêjin ku helbet para buxranên konjokturel û siyasî aborî yê welatan di bilindbûn û nizmbûna bêkariyê de heye. Lê ev, nayê wê maneyê ku bi tedbîrên siyasî yê heta îro heyî, dikare rê li ber bêkariyê bê girtin. Otomatîzebûyina jiyana aborî û civakî welê lê kiriye ku wekî meriv bi kevçiyên berhev ke lê bi heskê belav ke; jî aliyekî de meriv jî vir û wir de tedbîran werdigre û însanan îstîxdam dike, jî aliyê din jî otomatîzebûyîn, robotên kar û xizmetan, komputer dikevin şûna bi hezaran an milyonan karkiran, berhemên destlênedayî hê erzantir û hê zûtir dertên.

Ev, encameke welê bi xwe re tîne ku ya her ku biçê wê bêkarî pirtir be, yan jî di-

vê em konseptâ kar û bêkariyê biguherin û li gora wê konseptê guhertinên civakî bikin. Dinya dê were qonaxeke wilo ku tenê di warê ilm û keşfan de, di warê xizmetên giştî û koordînasyona karûbaran de însan ê di prosesa kar de bimînin, wekî din dê hemû karên din otomatîze bibin. Robot û komputer wê ji dêlva însanan karan bikin. Bi vî awayî li gora konseptâ îro wê beşeka herî mezin a civakê bêkar bimîne û beşeka gellek piçûk ji însanan kar bikin.

Nexwe berî her tiştî divê em tarîf û konseptâ xwe ya li ser kar biguherin. Divê kar ne tenê ew be ku meriv biçe bi meaş di fabrîke, daîre an warekî din de bizava berhemhênanê bike. Her mijûliyên ku insan jê hez dikin û pê dibilin divê ji kar bèn hesabkirin. Her wekî; mijûliya yekî ya resimkêşiyê, şairiyê, sporê, biliyana bi edebiyatê, kolleksiyonî, biliyana bi muzîkê û karûbar û mijûliyên din jî ku niha wekî hobî tèn qebûlîkirin divê têkevin nava tarîfa kar.

Mesela wergirtina meaş jî, di civakê de, divê were rewşeka wilo ku bibe mafê hemwelatîtiyê. Çawa îro gava meriv hemwelatîyê welatekî tê ser ruyê erdê, hin mafên hemwelatîtiyê; wekî mafê dengdan û hilibijartinê çawa ji bo meriv bê qeyd û şert tê dayîn, mafê meaş wergirtinê jî ji bo her hemwelatîyekî bibe mafê hemwelatîtiyê yê bê qeyd û şert. Ji vê re dikare bê gotin meaşê hemwelatîtiyê. Lê ew kesên ku ji bilî vî meaşî, diçin karekî bi pera jî dikin divê ew destmiz di ser vî meaşê hemwelatîtiyê re ji bo wan bê dayin û hwd.

Axir min nevê ez di van pirsîyan de dûr û dirêj biçim. Tenê dixwazim destnîşan bikim ku pirs û mînaqêşe hatiye heta vê derecê.

Demokrasiya vîrtuel

Diyardeyeka din jî rû daye ku hin pirsên din jî dide mînaqêşekirin. Gelo jiyana siyasî, rewşa demokrasiyê û pîrsa îrada civakê û hemwelatîyan wê bi çi awayî bê guherîn.

Em îro, di wan welatan de ku demokrasî li wan heye, di nava şertên demokrasiya temsîlî de dijîn. Yanî ji bo ku em hemwelatî nikarin bi derbekê de li ser pîrsekê biryarê bidin, em berê temsîlcîyên xwe hildibijêrin, ew diçin di parlamentoyan de li ser navên me bîyaran didin, qanûnan derdixin hukumetan datînin û hildiweşînin.

Lê em dizanin ku di tarîxa destpêkê ya demokrasiyê de demokrasî wiha nedibizivî. Mesela di dema Yunana Antîk de demokrasiya rasterast (demokrasiya dîrekt) a bajarî hebû. Hemû hemşehriyên wî bajarî ku wê çaxê jî wan re hemwelatî dihat gotin, diçûn li meydanekê dicivîyan, pîrsên xwe mînaqêşe dikirin û bi dengdana

rasterast biryar werdigirtin. Lê piştî ku nifûsa însanan zêde bû, ew li ser ruyê erdê, li gellek bajar, welat û qitayan belav bûn îdî îmkana civiyana li meydanekê û dengdana rasterast nema, ji dêlva wê ve hemwelatîyan li ser navê xwe hin însan hilbijartin, ew çûn li derekê civiyan, ji dêlva hilbijêrên xwe ve dengê xwe dan û biryar wergirtin. Bi vî awayî demokrasiya temsîlî derket û heta roja me ya îro bi rengarengiya xwe geş bû û pêş de çû.

Lê îro ji nuh ve, bi saya jiyana komputerîzebûyî ya ku jê re tê gotin civaka agahdariyê ku ferqa mesafa navbera zeman û mekanan nemaye û teknîk welê pêşde çûye ku îmkane dide ku her hemwelatîyek di pirsên curbucur ên welêt de bibe xwedan deng û biryar, her hemwelatî dikare bi xwe dengê xwe bide, îdî jê re ne lazim e ku yekî bişîne parlamentoyê ku ew ji dêlva wî ve deng bide. Em dizanin ku bi alîkariya şopa pêçikan an avabûna çavî her kes dikare şexsiyên xwe binasîne û bi saya komputerê ji mala xwe dengê xwe bide.

Em bêjin ku hukumeta Swêdê budçeya Swêdê a 1998ê amade kiriye û dixwaze ew bê tesdîqkirin. Îro rewşa teknîkî hatiye merheleyeka welê ku her hemwelatîyê swêdî dikare bi xwe dengê xwe li ser budçeyê bide; bê ka bê qebûlkin an na. Nexwe şert û mercên demokrasiya rasterast bi awayekî nîpînuhtir peyda bûne.

Heta em bêjin ku di rewşa îro de heke hemû pirsên civaka seranserê welêt nebin jî hin pirsên wan, an pirsgirêk û hilbijartinên belediyan, yên partiyên siyasî, sendîke û komeleyan dikarin bi vî awayî bi riya dengdanên rasterast bên çareserkirin û biryardan. Hemwelatî, hemşehrî an endam ne mecbûr in îdî hinan li ser navên xwe hilbijêrin ku ew biçin di parlamentoyan de, di meclîsên belediyan de an di kongreyên partî, rêxistin û sendîkayan de temsîla wan bikin. Qada hemû welêt, ya tevayîya bajarekî an berfirehiya her partî û rêxistinekê ji bo kesên endam û beşdarên wan bûye platformeka rasterast a sohbet, agahdarî, minaqeşe û biryar wergirtinê.

Helbet ev pirsêka pîralî ye ku hin encamên din jî bi xwe re tîne; wekî di rojên pêş de gelo wê rola siyasiyan, ya partî û meclisan, ya rêxistinan ber bi ku de biguhere. Lê em nakevin van minaqeşan, tenê balê dikêşnin ser û derbas dibin.

Mesela demokrasiyê jî her wiha ye. Gelo wê demokrasiyeka rasterast pêk bê an na, yan wê tiştekî di navbera demokrasiya rasterast û ya temsîlî de derkeve, ku jê re "demokrasiya vîrtuel" an "demokrasiya dijîtal" tê gotin, em nakevin kûrayîya van pirsan jî.

Çend pirsînî din jî hene ku divê ew jî li vê derê bi xetên qalind bên destnîşankirin. Yek jê ew e ku madem em dibêjin ev sîstema han sîstemeka wiha ye ku wê li

nik ferd û grûbên piçûk jî belav bibe, nexwe ev îmkân dikeve destê kes û grûbên zirarder jî. Bazirganên seks û pornografîyê, pedofîl, hêzên nîjadperest, terorîst û krîmînel, diz û mafia û yên wekî van jî wê vê torr û sîstemê ji bo armancên xwe yên kirêt bi kar bînin. Ji niha ve dest bi van karan bûye, lê têkoşîna li hemberê van jî ji bal civak û dezgeyên civakê yên meşrû ve dest pê kiriye. Divê em ji bîr nekin ku ev kes û hêzên xerab û zirarder, di civaka maddî bi xwe de jî hene, serêşandinên mezin ji bo civakan peyda kirine. Lê civak li hemberî van bi qanûnan wasite û dezgehên rêlibergir ên aborî, hîndekarî û huqûqî û yên cezadariyê têkoşînê dide.

Pirseka din jî ew e ku ev teknîk û sîstema ku îro pêş de dikeve, li wan welatên pêşkeftî di destê herkesî de nîne, hin beşên civakê ji vê yekê bêpar in. Welatên paşdemayî jî têra xwe ne xwedanê wê îmkânê ne ku karibin bingehe teknîkî û zanyarî yê vê torrê li welatê xwe raxin.

Pişt re, ev teknîka pêşkeftî, kare têkeve bin monopola wan şîrket û hêzên ku wê derînin, pêş de dixin û dixin piyasê. Gava welê be, alim, kaşif û teknîker jî wê têkevin bin emrên wan. Nexwe zanyarî dikeve bin monopla hin grûbên piçûk ên elît û tevayîya civaka ser ruyê erdê, mecbûr dibe li destê wan binêre, ew ji zanyarî û agahdariya di destê xwe de çi berdîn, heta ku derê berdîn û bi çi awayî berdîn civak wê mecbûr bibin ku ew qas werbigirin. Geva welê be, dê îmkana îdarekirina civakên dinyayê têkeve bin destên grûbên elît ên piçûk. Helbet ev pirsêka gellek ciddî ye. Pirsê wêkhevî û newekhevîyê, ya heq, huqûq û edaletê ye.

Lê ji bo ku pirsêka wiha heye em nikarin bêjin ku divê em dev ji pêkanî û pêşdexisitna vê sîstema nuh berdîn. Em bixwazin jî em nikarin rê li ber vê pêşveçûnê bigrin. Ev pêşveçûn divê her hebe û wê her hebe jî. Divê rojekê zûtir em vê rastiye bibînin û berê têkoşîna xwe bidin wê yekê ku ev bêdaletî û xetera nuh a ser ruyê erdê çawa dikare kêmbibe, heke îmkân heye ji holê rabe.

Carekê ev sîstem sîstemeka welê ye ku yên wê derdixînin nikarin di nava destê xwe de bihêlin, divê bi berfirehî li nava civakê belav bikin. Qezenca şîrketan di belavbûna vê sîstemê de ye ku li her welatî, herkes bibe xwedanê wê û zanibe wê bi kar bîne. Pişt re di vê dinya globalîzebûyî de ew nikarin tenê bi civakên pêşkeftî bimînin, lazim e ew muhaweke bikin ku li nava welatên paşdemayî jî teknîk û zanîna bikaranîna wê belav bibe. Berjewendiyên berpirsiyar, desthilatdar û xwedanê hêzên welatên paşdemayî jî di wê de ye ku ev torr belav bibe.

Lê helbet ew belaş vê torrê li ser ruyê erdê belav nakin. Meriv dibîne ku heta ji destên wan tê dixwazin malîyeta wê ji bo kes û hemwelatîyan erzan be, heta li gellek ciyan dewlet xwe dixê bin avakirina înfrastruktura wê. Nexwe wekî bacder, bi-

karhêner û dengderan divê hemwelatî warên têkoşînên bi wî awayî peyda bikin û bi daxwazî bi wî awayî rabin ku zanyarî jî di destên hinan de nebe monopol û ew bêdaletiya ku heye heta îmkân tê de heye ji holê rabe.

Ji xwe têkoşîna heq, huqûq edalet û wekhevîyê; ya îmkana pêşkeftin û geşbûnê ji bo herkesî, ne tişteki nuh e, li ser ruyê erdê, ji destpêka dîroka însaniyetê her hebûye û wê hebe jî. Li vir, ya esas ew e ku ev têkoşîn hay ji vê rewşa îro hebe û xwe bi daxwaz û pêdiviyên vê dewrê bixemilîne.

Di vê beşê de girêdayî bi vê meselê aliyekî din jî heye ku ew jî pirsêka girîng e divê ew jî bê destnîşankirin. Di beşên derbasbûyî de me got ku îro îmkân vebûye ku hemwelatî îdî rasterast biryaran li ser pirsên civakî ên derûdora xwe, ên bajar û welatên xwe bidin. Lê pêwendiyên heyî rê li ber vê yekê digrin. Ev, wekî wê meselê ye ku demekê ji ber rewşa aborî ya jinan û ya bêmilkiyetan, ji ber rewşa dewlemendî û serdestiya beşek ji mêran, jinan û mêrên bêmilk nikarîbûn di hîlbijartinan de dengê xwe bidin. Têkoşîneka mezin ji bo vê hat dayin da bêyî ferqa dewlemendî û feqîriyê, bêyî ferqa jin û mêran, mafê her hemwelatîyekî xwedanruşt û dengekî hîlbijartinê bê qebûlkirin û îro ew hatiye qebûlkirin. Îro jî di vê civaka ragihandinê de îmkana her hemwelatîyek û dengekî rasterast peyda bûye. Yên ku rê li ber vê yekê digrin yek jê ew e wekî me li jorê bahs kir ku herkes hê nebûye xwediyê îmkana bikaranîna vê sîstema nuh. Ya din jî, ji bo wan hemwelatîyên ku rojê heşt saeran, hetta deh, duwanzde saetan kar dikin îmkân tune ye ku ew karibin di gellek meselan de xwe tê bigihînin, wan fam bikin, sewiya zanîn û kultura xwe bigihînin wê derecê ku karibin di biryaran de tercîhên xwe li ser esasên zanîna bidin. Ji bo vê yekê jî lazim e ku ew di bîst û çar saetan de hindiktir kar bikin û wextê xwe pirtir bidin zanîn û agahdariyê.

Nexwe mesela kurtkirina wextê kar, bes ne ji bo wê yekê ye ku wê bibe çareserîya heta dereceyekê ya békariya ku îro buye pîrsa yekê di civakên pêşkeftî de, ew her wiha bûye daxwaz û talebeka hemwelatîyê ya demokrasiya nuh.

Heta niha îmkana wê yekê tune bû ku her hemwelatî li ser pirsên herêmî, giştî û navnetewî dengên xwe rasterast bidin, loma jî demokrasiya temsîlî pêk hatibû. Hinan ji dêlva hemwelatîyan biryar didan, hemwelatîyan tenê ji çend salan carekê ew hildibijartin û li mala xwe bi karê xwe mijûl dibûn. Lê îro, gava îmkana her hemwelatîyekî derketiye ku ew bi xwe di van meselan de dengê xwe bide, kes nikare bêje ku na heqê wî tune ye ku ew deng bide. Îddîayeka wiha, yanî meriv tabe bêje ku ew hemwelatîyê normal e, ne lazim e rasterast deng bide, qasî îdîaya ku digot ew jin e ne lazim e deng bide ji ciddiyetê dûr e.

Nexwe, riyek dimîne: divê qanûn bên guhertin ku hemwelatî pirtir û pirtir di meseleyan de xwedan biryar û dengdan bin. Û divê têkoşîn bê dayin ku dema kar-kirinê bibe şex û pişt re jî çar saet ku însan karibin pirtir wextê bibînin, bi meselên xwe yê civakî û hemwelatî bibilin, kultur û zanîna xwe bînin wê sewiyê ku ew jî bi zanîn tercîhên xwe bikin. Biserketina têkoşîneka wiha wê bêkariyê jî kêmbike û wê hem kvalîta berhemhênanê hem jî ya tevayîya civakê bilindtir bike.

Divê em mejî û perspektîfên xwe biguherin

Ji vir pê ve me divê em werin ser pirsê kurdî. Ev rûdan û guhertinên ku li ser ruyê erdê çêdibin çi tesîrê li pirsê kurdî dikin? Bi qenaeta min tevî ku ev guhertin pêk hatine jî, em hemî kurd gava li ser rewş û pirsên xwe radiwestin, mejiyê me, fikra me, perspektîf û pêşniyariyên me li gor wê yekê ne wekî ev guhertin bi ser ruyê erdê de nehatibin û wê neyên. Em hê di hema hema hemî pirs û pirsgerêkên xwe de, çareseriyên klasîk ên dewra beriya van guhertinan difikirin. Mesela eger behsa yekîtiya zimanê kurdî bê kirin, pîr rahet em dikarin rabin bêjin "baba eger heta her çar perçeyên Kurdistanê rizgar nebin, heta hemû perçe nebin yek û yekîtiyeka siyasî ava nebe, yekbûna zimanê kurdî pêk nayê." Hê jî em di wê fikrê de ne ku em ê bi têkoşîna riyên klasîk yeko yeko perçeyan rizgar bikin, wan bikin yek û li ser hemûyan dewlêreka yekbûyî ya kurd ava bikin, pişt re wê prosesa yekbûna zimanê kurdî dest pê bike.

Yan jî herî siviktir; em dibêjin ku "em kurd li Awrûpayê di nava welatan de belav bûne, komeleyeka me li vî welatî ye, yek li filan welatî ye, enstîtuya me li welatê din e. Em kurd bêimkan in, em neşên biçin, hevdu bibînin, civînan pêk bînin, pirs û pirsgerêkên xwe mînaqêşe bikin û karûbarên mişterek bimeşînin. Loma jî hin pirsên kurdan hel nabin."

Lê ev civaka agahdarî û ragihandinê ya ku hê di destpêka jiyana xwe de ye, nîşanê me dide ku divê îdî em dev ji fikirandina bi vî awayî berdin. Bêyî ku Kurdistan di jiyana fîzîkî de bi hemû perçeyên xwe rizgar bibe, bibe yek û dewlêreka yekbûyî ya Kurdistanê ava bibe, prosesa yekbûna zimanê kurdî dikare destpê bike. Ev proses jî wê xwedan taybetiyên dema nuh be, ne wekî yê wan riyên yekbûna zimanê mîletên din.

Bêyî ku kurdên Awrûpayê hinde mesrefên rê û cih û waran bikin bi saya torra ragihandinê ya elektronîkî, bi sîstema înternet û înteranetê dikarin pêwendiyên xurt bi hev re deynin, bidin û bistînin, mînaqêşe bikin, biryaran bidin, plan û projeyên mişterek pêk bînin û bimeşînin. Hemû kurdên Awrûpayê li gel kurdên Kurdistanê û yê warên din ên xwedan îmkaniyetên vî torra elektronîk, dikarin qadên

muşterek ên jiyana siyasî, kulturî û hin tiştên din pêk bînin. Hema em mîsalekê ji ber çavê xwe bidin. Hê berî avakirin û bikaranîna vê îmkaniyeta torta agahdarî û ragihandinê ya vîrtuel jî, tenê bi riya MED TV û hin radyoyên xwedan weşana navnetewî, em dikarin buyer, rûdan û nûçeyên çar aliyê Kurdistanê bibihîzin û temaşê bikin. Bi saya vê televîzyonê îdî soranî ji bo yekî diyarberkirî ne xerîb e, dimilî ji bo yekî mehabadî an silêmaniyeyî ne xerîb e. Bifikirin ku ev hê destpêk e. Dersên kurdî tên dayin, behsa jiyana Diyarberkirê, Mehabadê, Silêmaniyê, Afrînê, Behdînan an bajar û herêmeke din a Kurdistanê tê kirin, ji hemû perçeyên Kurdistanê em helê hevdu dibihîzin, lê temaşê dikin. Yanî perçebûna Kurdistanê, hebûna dewletên dijmin, hudûd, gumruk û sansura wan, ordiyên wan ên li ser hudûdên destkird, qanûn û dadgehên wan nikarin rê li ber wê weşana televîzyonê bigirin ku di riya satelîtê re diçe, li Diyarekirê dikeve mala yekî kurd, li Mehabadê yan li serê çiyayê Kurdistanê, di şikeftê de dere dikeve ber çavê yekî kurd.

Ji vê jî wêdetir, îro îmkan heye ku em li Awrûpayê navendek vîrtuel a dijîtal ava bikin ku li ser kurdan û bi zimanê kurdî program û materyalên hîndekariyê ji dibistana destpêkî heta zanîngeha bilind bê danîn ku ji Kurdistanê û ji çar aliyên cîhanê kurd, pêwendîyan pê re deynin, dersên wê li gora sal û sewiyên xwe taqîb bikin, heta li ciyên ku ew lê dijîn di serokatiya mamosteyan an rêberan de grûb an sînifan ava bikin, aktîv dersan bibînin. Ev navenda vîrtuel dikare îmtîhanan ji bo wan pêk bîne, yên ku ji van kursan bi serfirazî derbas bûn dîplomeyan werbigirin.

Ez li vir dixwazim numûneyan li ser halê herî xerab bidim. Em dizanin ku îro dewleta tirk mafê kurdan ên kulturî nas nake û heta demeka dûr û dirêj jî wekî dewlet wê îmkanan peyda neke ku dibistanên kurdî vebin û kurd bi finanskirina dewletê, bi hatina baca ji hemwelatîyan, bi zimanê xwe bixwînin. Gava wiha be, îmkan gellek dijwar dibin ku însan bi zimanê xwe di prosesa hîndekariyê re derbas bikin.

Lê em dizanin ku ji aliyê din li Tirkiyê jî hêdî hêdî tevgereka berfireh çêdibe ku dixwaze dewletê piçûk bike, li ser aboriya bazara vekirî û milkiyatiya şexsî reforman bike. Heta van karan destpê kirine jî. Ev dide xwiyakirin ku her çendî dewlet ne nêzîkî vekirina medreseyên kurdî û dezgehên ragihandinê yên kurdî be jî, sermiyanê şexsî dikare dest bi van karan bike, an ko hin medrese, dersxane û merkezên ragihandinê yên kurdî peyda bibin. Em bêjin ku niha li Diyarberkirê bi alîkariya du sê mamosteyan dersxaneyeka taybetî vebe û ew xwe bi torra ragihandina vîrtuel girêbidin, ew dikarin hemû wan program, zanyarî û materyalên ku di navenda vîrtuel a kurdî de hene ji bo xwe werbigirin û hînî şagirtên xwe bidin. Bi vî awayî tenê

dersxaneyeka bi du sê mamosteyan dikare salê bi sed dusedan şagirt ji kursên xwe derbas bike û wan hînî xwendin, nivîsandin, dîrok û edebiyata kurdî bike.

Li Kurdistana Iraqê, Unîversîteya Selaheddînê an ya Silêmaniyê, tenê bi alîkariya komputerê, modemekê û xeteka telefonê dikarin pêwendiyên bi vê merkeza vîrtuel a kurdî re deynin, hemû ew zanyariyên ku li Awrûpayê di bin destên me de hene, dikarin têkevin bin destên wan jî ku ew li şagirtên xwe belav bikin. Ew dikarin lêkolîn û zanyariyên xwe verêkin vê navendê, ew di wir de biçîh bibin da em hemû xwendevanên kurd ên li derveyî welêt wan zanyariyan bi dest xînin. Heke ev herdu unîversîte bi torra elektronîk a înternetê ve bînin girêdan ew dikarin têkilî bi hemû wan unîversîteyên pêşkeftî û grîng ên ser ruyê erdê re deynin û wan zanyariyên herî nuh û pêşkeftî werbigirin bidin şagirtên xwe, yanî ji mehrûmîyet û bêîmkaniyera xwegihandina zanyariyê xelas bin, çî zanyariyên modern li unîversîtên pêşkeftî tînin xwendin li van unîversîtên kurdan jî bînin xwendin.

Îro li tevayîya welatên rojava, ji dibistanên destpêkê bigire heta unîversîte û zanîngehên bilind hemuyan program û kursên xwe xistine navendên vîrtuel, dewletan ji bo malbat û piçûkên karmendên sefaretxaneyên xwe yê li derveyî welatên xwe ji bo wan hemwelatîyên ku tevî malbatên xwe demên dirêj li derveyî welêt dimînin dibistanên wiha vîrtuel çêkirine û piçûkên wan ên ku li derveyî welêt in jî ders û mektebên xwe raqîb dikin.

Ji vê jî pêştir divê em bibînin ku dinya bi vê yekê jî namîna û pêşdetir diçe. Hê îro hatiye rojevê ku di çend salên pêşiya me de destpê bibe, telefon, komputer û televîzyon bibe her yek aletek û bi vî awayî têkeve nava malan. Maneya vê yekê ew e ku îdî tekst deng û wênerewanên piçûk ên mehdûtkirî namînin. Îdî ew prosesa sîstema ku deng, dîtî û lîva 3 bejneberî (dîmensiyonêlî) ya misêwayî û herlidar ava dibe, di wê sîstemê de meriv îdî ne temaşevan an guhdarekî pasîf e ku hema bes wergirê agahdariyan e. Îdî sîstemeka seranser a înteraktîv destpêkiriye ku meriv têde ye. Meriv di wir re hem di rîya fonksiyonên telefonê re (ku îdî meriv bi kê re bixavê wî dibîne jî) bi însanan re pêwendiyên deyne, bi programên televîzyonê re têkilîyan deyne, kengî bixwaze wan programên bi dilê xwe, di demeka jî bo xwe lêhatî de temaşê bike, bi saya fonksiyonên wê yê komputerî jî wan hemû kar û barên li banî jimartî pêk bîne.

Yênî heke em bi hişyariyê hayjêheyîyê van pêşveçûnên îroyîn û dûrbînîyeka bînerê pêşeroja dûr û nêzîk û xweamadekirê li gora wê bibizivin em dikarin navendeka kurdî ya vîrtuel a welê ava bikin ku navenda hukümeteka kurdistanî tê de be ku endamên wê bîyî ku fîzîkî werin ba hev pêwendiyên bi hev re deynin û birya-

ran di heqê Kurdistanê de werbigirin, em dikarin navendeka kongreyeka millî ava bikin ku hemî siyasiyên kurd çî li hundur û çî li derveyî welêt li gel hev pêwendiyên deynin, guftûgoyan bikin, biryaran bidin da nebêjin me hay ji hev du nebû, te wiha kir û yê din filan kir, yan ev perçe yê min e û yê din ê te ye. Hemî jiyana me ya kulturî têkeve vê sistema dijîtal çî ji hundur û çî ji derveyî welêt em bi saya wê xwe bigihînin. Her partî û rêxistineka kurdî bi vî awayî dikare pêwendiyên rojane bi endamên xwe yên hemû welatan û derve û hundur re ava bike, hemû dezgeh, rêxistin, enstîtu, weqf û komeleyeên kurdan dikarin bi vî awayî bihev bîrê girêdan, platformên muşterek ên rojane avabikin.

Min nevê ez dirêj bikim: Qesda min ew e ku îro pêşveçûna jiyana civakî ketiye merheleyeka welê, ew îmkanên ku peyda bûne ji alî me kurdan bi xwe jî ku em milletekî bindest in li gor milletên din yê herî bêxwedî, bêdost, bêîmkan û bêtaqet in bi vê bêîmkanî û bêtaqetiya xwe jî em dikarin xwe têxin nava vê berhema civaka agahdarî û ragihandinê, xwe bi rê xî, bikin xwedan muessese, ku milletê me jî ava bibe, li setanserê Kurdistanê di nava kurdan de şûûreka millî ya muşterek çê bibe û geş bibe, ku hemî karibin bi hisên hev bihesin, ji ber hev şad an xemgîn bibin, dilê wan bi hev biêşe, an kêfxweş bibe. Îro me hay ji hevdu nîne, em neşên bi ser hev de biçin û bîrê û hevdu bibînin an bibihîzin, loma jî em hevdu nanasin, derd, êş û bexteweriyên hevdu nabînin. Yekî diyarbekirî hay ji yê mehabadî, yê mehabadî hay ji yê Qamişloyî nîne. Lê wekî ku bi Med TV destpêkiriye, weşanên bi vî awayî yên ragihandinê pirtir ava bibin, em xwe têxin wê jiyana virtuel, ew ordî, hudûd û zordariyên dewletên dijmin wê qasî îro nikaribin me ji hevdu perçe werçe bikin, dûr bixin. Na, me yê hay ji hev du çêbibe û wê şûûra muşterek, me bi gellek awayan bigihîne hev, em ê ber bi milletbûneke modern de gavan bavêjin.

Tevî gellek dijwariyan, gellek bend û astengan îro îmkan heye ku nêzîkbûna lehceyên kurdî ber bi hev ve biçê, ev, bere bere rê li ber zimanekî yekbûyî yê standard veke. Em bala xwe bidinê ku Med TV nimûneyeka tenê ye û hîn bi vê sistema virtuel a înteraktîv ne xemilandî ye. Tenê yekalî ye, ew weşanê dike em jî dibihên û dibînin. Lê heke em bifikirin ku naveroka programên wê bê dagirtin, bi hişyariya hayjêhebûna ji vê rewşa nuh, bi sistema virtuel a înteraktîv bê xemilandin, hem bide û hem bistîne û bibe weka unîversîteyekê... Çawa ku îro li Awrûpayê jî meriv dikare li Stockholmê bijî û li Unîversîteya Oxfordê bixwîne. Dersên ku li unîversîteyê tên dayin dikare bi sistema înternetê û bi ya vîdyoya înteraktîv bixwîne. Dokûment, kitêb û materyalên dersê çî bi riya postê û çî jî bi riya xeta elektronîk bi awayekî dijîtal ji wê derê jê re tên, ew dikare dersan taqîb bike, pirs ji mamosteyê

wî ji wir jê re werin û ew jî bersîv û xebatên xwe yên din di riya xeta elektronîk de ji mamostê xwe re verê dike. Ew bi vî awayî bêyî ku biçe Oxfordê ji unîversîteya wir mezûn dibe. Her bi vî awayî bêyî ku yek ji Kurdistanê derkeve dikare di zanîngeha kurdî ya vîrtuel de bixwîne û bibe xwedanê zanîn û meslagakê. De îja em bifikirin ku navendên wiha tenê bi Med TV nemînin û çend navendên kurdî yên din jî bi vê teknîk û sîstemê xemilandî bîn avakirin. Divê kurd dest bi vê bikin.

Berpirsiyariya millî

Divê li vir em destnîşan bikin ku li gora rewşa kurdan ji bo pêşveçûna têkoşinê, hişyariya millî û avabûna rayeka giştî ya kurdistanî di mesela bikaranîna wasite û teknîka hemdem a pêşkerî de yên herî pêş ew kes in ku xwe dane ber danîn û meşandina Med TVyê, hêz û der û dorên Kurdistanî yên din erê hinan ji wan dest avêtine îmkânên înternetê jî, hê di dereceyeka berbiçav de bi diviyahî û berpirsiyariyên xwe ve ranabin. Lê berpirsiyarên Med TV bi xwe jî, li gora qenaeta min, bi wê hayjêhebûna wê prosesa ku me bahs kir, dest neavêtine meselê. Ev pirs divê li cem wan bi kûr û dûrî bê jenandin û encameke li gor pêdiviyên dem û dewranê jê bê derxistin.

Divê kurdên din jî bi van berpirsiyariyan rabin. Em mîsalekê bînin; heke kurdek derdikeve serê çiya, şer dike, dikuje û tê kuştin, ji bo çi? Ma ne ji bo rizgarbûna milletê kurd e, ne ew e ku kurd li ser axa xwe serbest, azad û di nava şadî û bexteweriyê de bijî, bi zimanê xwe biaxive, bixwîne û binivîse, bi zimanê xwe dinyayê nas bike, xwe îfade bike? Baş e ew hêzên ku bi vî awayî pêşmergeyan derdixin serê çiyân û kuştina bi deh hezaran ji wan didin ber çavên xwe, ew qas tedeyî, zilm, zor û qedîamên li ser millet tehemmul dikin, îro îmkânêk peyda bûye ku ew karibin kanaleka televîzyonê, yeka din û yeka din jî bi wan wasite û sîsteman techîzkirî di riya avabûn, yekbûn, serbestbûn û pêşveçûna milletê kurd de li dar xî, çima nakin? Ma ne wazîfeyeka millî ye ku ew vê yekê bikin. Heke ew vê yekê nakin mane-ya wê ew e ku ew berpirsiyariyên xwe yên millî bicîh naynin.

Ji ber çi? Ev îmkân û sîstemên ku em bahs dikin, berî deh panzde salan nebûn, heke wan bivîya jî wan nedikarî ev ava bikirana. Her wekî mîsala Med TVyê. Heke di van salên dawiyê de wê sîstema bazara serbest, piçûkbûna milkiyeta dewletî û berfirehbûna warê milkiyeta şexsî nebûna ew ava nedibû. Berî niha bi çend salan, qanûnan rê nedida ku şexs bibûna xwedan kanalên televîzyonan, radyo û televîzyonan tenê dewletan dikarî daniyana. Heke îro jî ev sîstema dewletî li Awrûpayê li

dar bûya, avakerên Med TVyê çend bi cehd û muhaweले dibûn bila bibûna, çend dewlemend dibûn bila bibûna ji bo ku ne dewlet bûn nedîşyan bibin xwedanê kanaleka televîzyonê. Lê îro sîstema Awrûpayê ya li ser teşebbusiya şexsî ev rê vekiriyê ku şexs rabin şîrketekê deynin û Med TVyê ava bikin. Madem rewşa cîhanê ya globalîzebûyî ya nîzama nuh ku xwe li ser milkiyet û teşebbusa şexsî, reqabet û bazara serbest ava dike, rê dide ku navendên ragihandin û zanyariyê yên wiha bên danîn wazîfe ye li ser hemû hêzên kurdan ku çî televîzyon be, çî jî navend û sîstemên vîrtuel bin deynin. Îdî mesela millî ne tenê ew e ku ew pêşmergeyên xwe derxin serê çiyar û bêjin em ji bo serbestiya Kurdistanê şer dikin, mesela millî her wiha ew e ku ew wasite û sîstemên wiha jî derxin meydanê ku bi saya wan, têkoşîna hebûn, avabûn, û pêşketina milletê kurd pêk bê.

Li Awrûpayê bizaveka nuh

Berpirsiyarî ne tenê li ser hêzên siyasî yên kurdan e. Em her kurdên normal, ronakbîr û pisporên ji meslegên cuda jî di bin berpirsiyariya vê rewşa nuh de ne. Divê em jî mejiyê xwe biguherin û bi berpirsiyariya ferdê milletekî hişyar şêla xwe diyar bikin. Bi taybetî îro berpirsiyarîyek derketiye hemberî me kurdên ku li welatên Awrûpayê dijîn. Di vê rewşa civata globalîzebûyî ya dinyaya piçûk de, di vê civaka ragihandinê de, em ji niv milyonî zêdetir kurd di nava hudûdên Yekîtiya Awrûpayê de dijîn. Em bûne hemwelatîyên endamên vê yekîtiyê, an me musaeda rûniştinê û kar li van welatan girtiye; em bacê didin, karan dikin, eskeriyê dikin û di hîlbijartinan de dengên xwe didin, hildibijêr in û tèn hîlbijartin. Îdî êskere ye ku em ne mêvanên muweqet in, em ê her û her li van welatan bimînin. Heke em tek tek li van welatan grûbên piçûk bin jî di tevayiya Yekîtiya Awrûpayê de em grûbeka etnîkî ya girîng in ku em ji mafê xwendina bi zimanê xwe, mafê radyo û televîzyonan a bi zimanê xwe bêpar in. Heke li welatê me yê eslî, li Kurdistanê ev maf ji miletê me hatiye stendin em vê yekê bi barbarîya berpirsiyarên welatê dagîrker girê didin. Baş e ji bo çî Yekîtiya Awrûpayê van mafan nade me?

Ez difikirim û pêşniyar dikim ku em kurd bi awayekî mînaqêşe û lêkolînan bikin, ku gelo em nikarin mafê redyo, televîzyon û zanîngehên kurdî ji Yekîtiya Awrûpayê bixwazin ku weşanê li seranserî Awrûpayê û heta li ser Kurdistanê bikin. Ev dezgeh, bi sîstema înteraktîv a vîrtuel bên xemilandin ku em hemû kurdên Awrûpayê jê îstîfade bikin. Gelo rewşa huqûqî, siyasî û peymanên heyî yên Yekîtiya Awrûpayê di van waran de çî mafan didin me? Em bacê didin. Em hem di hîlbijarti-

nên herêmî û yên welatan de û him jî di yên parlamentoya Awrûpayê de hilbijêr in. Gelo em nikarin vê hêza xwe ji bo van daxwazan bikar bînin? Wan îmkanên ku civaka ragihandinê dide me gelo em nikarin bi saya wan platformekê li seranserê Awrûpayê tenê ji bo van daxwazan ava bikin û wê bikin bizaveka aktif ku ji hemû kurdan pêk bê? Gelo em nikarin çend civînan ji bo vê meselê amade bikin û bi guftûgoyan vê pirsê hîn zelaltir bikin? Ez bi xwe di wê qenaetê de me ku em van hemûyan jî dikarin bikin. Her tişt heye, bes me viyan jî hebe wê ev kar dest pê bin.

Perspektîfên dûr û dirêj

Ez werim ser perspektîfên dûr û dirêj ên stratejîk ên tevgera kurdan. Ev sîstema dinyayê ya ku îro peyda bûye ji bo me asoyekî welê aniye ku bêyî ku em daxwaza serbixweyîya her perçeyekî Kurdistanê bikin, bêyî ku em li ser van perçeyan bi awayê klasîk dewletên serbixwe dabimezrînin, van perçeyan bigihînin hev û dewleteka millî ya kurdî deynin, civaka kurd dikare li her perçeyê xelas bibe û hetta ji hemû perçeyan yekîtiya milletê kurd pêk bê.

Ev bi çi awayî dikare pêk bê? Helbet ez kûr û dûr bi vê meselê de naçim, li vê derê tenê rûdanê destnîşan dikim. Me got sîstema nû ya cîhanî ya globalîzebûyî pêk hatiye, prosesa piçûkbûna dewletan destpêkiriye, milkiyet û teşebusa şexsî di warê jiyana aborî de serdestiya xwe bi dest dixe, dewlet her ku diçe ji aboriyê vedikişe û teşebussên civakên sîvîl berbipêş ve diçin, bazara serbest çêdibe, desentralîzasyon dikeve herêman, mekanîzma navendî ya burokratîk diherife û herêm û periferî, grûbên etnîkî û yên din zêdetir dibin xwedan maf û berpirsiyarî. Di dem û dewrana neka wiha de ku fikr û bizavên bi vî awayî li hin wan welatên ku kurd bindest kirine jî peyda bûne, ger kurd jî wekî siyaseteke millî, wekî perspektîfên serbestiya millî li Tîrkiye, Îran, Iraq û Sûriyê dev ji daxwaza serxwebûnê berdin, hebûna xwe ya di nava van her çar welatan de bikin program ji xwe re (ku bi pirranî îro welê ye) û ya esasî, xwedî li wan programan derkevin da ev welat reforman di xwe de çêkin, dewlet û civakên xwe ber bi wan perspektîfên jorîn biguherin; avayiya dewletê ya unîter rabe, milkiyet û teşebbusa dewletê rabe, ya şexsî bê, desentralîzasyon û ew hemû tiştên jimartî pêk bînin û di vê çerçevê de mafên millî ên siyasî û demokratîk ên kurdan bê dayin wê asoyekî realist li ber kurdan vebe.

Mafên millî yên kurdan bi çi awayî bê dayin; federasyon an otonomî; helbet li vê derê nabe ku meriv têkeve wê bahsê. Lê wekî sîstem, kurd bibin beşdarên mafên

millî, însanî ên demokratîk û hemwelatîfî. Nabe ku em ji bîr bikin 'ku jiyana civakî ne statîk e, hemû caran diguhere û pêş ve diçe. Gava kurd di çarçewa van dewletan de dawa maf û statuyekê dikin divê ji bîr nekin ku ew statu, ne statuyeka statîk lê yeka dînamîk be, piştî bîst salan, gava guhertin di dînyayê de di van welatan de çêbû, ew welê di cihê xwe de nemîne, statuya wê jî karibe geş bibe, xwe nuh bike. Nebe wekî makîneyeka kevnare ya ku kar nake. Divê em dawa statuyeka welê bikin ku dînamîzm, jiyana û liv tê de hebe.

Nuxta duduyan; cardin wekî siyaseta millî ya kurdî divê em doza wê yekê bikin ku gumruk, qeyd û bend ji nava hudûdên van herçar dewletan û bi wan re dewletên din ên Rojhilata Navîn rabe; mal, semiyana, ked û kar, kîrîn û frotin û gerr û kultur di navbera van welatan de serbest bibin. Peyman û pêwendiyên bi vî awayî di nava van welatan de bîst hûnandin ku di warê aborî, siyasî, kulturî, hîndekarî û gellek warên din de platformên mişterek bîst avakirin, dût û dirêj perspektîfê wekî ya yekîtiya Awrûpayê di nava van welatan de bê danîn. Îro çawa wan panzde dewletên Awrûpayê bi navê Yekîtiya Awrûpayê sistemek welê ava kirine ku hema hema ber bi dewletbûnekê ve diçin. Heke ev perspektîfên me, di Rojhilata Navîn de bîst bisexistin, maneya wê ew e ku bi yekîtiya van welatan re yekîtiya kurdan jî pêk tê. Di sistemeka wiha de, wê zêde qîmeta wê yekê nemîne ku resmî her perçeyekî Kurdistanê bi ser welatekî din ve ye, di rastiya jiyandê de wê kurd karibin di nava her çar perçeyan de biçin û bîst, bazareka wan a mişterek ava bibe, bixwazin li kîjan perçeyî rûnên an karibin ji wan re serbest be, bidin bîstînin, ticaretê bikin, bibin şînk û merivên hev. Zehmetiya wan qasî wê yekê be wekî ku ji bajarekî biçin bajarekî tir.

Hilkirina daxwazên wiha wekî perspektîfên millî yê kurdan, ez dibêjim ku realîst e lê ne di demeka kurt de dikare pêk bê, ne jî wiha hêsan e. Helbet gellek têkilhev û bi fetlok e, asteng û bend li pêşiyê ne û demeka dût û dirêj jê re lazim e. Gava ez behsa van perspektîfên dût û dirêj dikim ez tevayiya seranseriya sedsala bîst û yekê li ber çavan digirim. Gava ji bo xelasî û serbestiya xwe em kurd behsa muddetê sedsalekê bikin ne ew qas ecêb e û ne demeka wiha pirr dirêj e. Em bînin bîra xwe Alman li ser ruyê erdê dewleteka ew qas pêşketî û xurt bûn, mîratxurê împaratoriyekê bûn jî ji bo ku karibin yekîtiya xwe pêk bînin teqîben nîv qirnek li ber xwe dan, sebir kirin. Heke nîv qirn ji bo Almanan ne pirr be sedsalek jî ji bo me kurdan ne pirr e.

Axir, qenaeteka welê li ser min peyda bûye ku divê em îro îdî mejiyê xwe, fikr, perspektîf û pêşniyariyên xwe biguherin, bi mejî û çavêkî nuh bi hişyarî û bîreka

nuh li pirs û pirsgirêkên xwe binêrin. Divê hem perspektîfên me yê taktîkî hem jî yê stratejîkî bîn guhurîn. Divê edî em li civaka kurd û tevgera kurdan a rizgariyê bi wî çavî nenêrin û wê di wan metodên klasîk de hebis nekin ku bibe tevgera herî dawîn a milletên rizgarbûyî yê dema civaka îndustrîyel, lê em têkoşîna gelê kurd bi wasite, metod û perspektîfên civaka agahdarî û ragihandinê bixemillînin ku ew bibe tevgera herî pêşîn a civak, millet û grûbên millî û etnîkî yê din ku îro bi saya hatina vê qonaxa nuh, rê li ber wan vedibe, ew jî firsend û îmkana xwerizgarkirinê bidest dixin. Divê em dev ji wan metod û perspektîfên klasîk ên ku heta niha me li milletên berî xwe nihêrtin û ji bo xwe anîn berdin. Rehmeta ku di wan dewr û deman de bariya tu caran li rezê me nekir, tevî ku me jî qasî milletên din ked û xwîna xwe rijand, me tu berek ji wî rezî nexwar. Ew baran çû, şûna wê va ye hişk dibe û diterike jî. Ka em berê xwe bidin vî aliyê didin, bibînin ku wa ye baraneka taze ya gurr û geştir û têravtir tê ku diyar e wekî hemî jar û bêîmkanan wê li baxê me jî xe. Îhtîmal e ku em yê pêşîn bin ku ji berhemên vê baranê bixwin û yê din jî li me binêrin, em, rêberî û nimûnetiyê ji wan ra bikin.

Piştî vê tesbîtê, bi îzna we ez dixwazim dawî li axaftina xwe bînim. Her wekî min di destpêkê de got; ev axaftin tenê bi wê amancê hatiye kirin ku bi hin xetên qalind bal bê kişandin ser hin pirsan û belkî riyek li ber minaqeşê bê vekirin, da ev pirs pirtir bîn minaqeşe û lêkolîn belkî hê berfirehtir û zelaltir bibin.

(1) Li gorî Marksî, esas ev her du diyarde hemî caran bi hev ve girêdayî ne û du alî tesîrê li hev dikin. Gava awayê pêwendiyên berhemhênanê bi sewiya hêzên berhemhênanê re lihevhatî be, ew pêwendî rê li ber pêşveçûna hêzên berhemhênanê vedikin, teqlê li wan didin ku ew nuhtir û mukemeltir bibin. Wê gavê hêzên berhemhênanê jî dikevin bin pêwendiyên berhemhênanê û wan nuhtir, gurr û geştir dikin. Ev dînamîzm e ku civakan ber bi pêşkeftinê de diguhêre. Gavê di navbera van her du diyardeyan de nelihevîyek peyda bibe ew dikevin hemberî hev û rê li ber teqla pêşveçûna hevdu digrin. Bêîstîqrarî dikeve civakê, pêşveçûn û nuhbûna civakê radiweste, texrîb dibe, heta hin caran dikare paş de jî here.

Lê bi giştî, di van têkiliyên dualî de bingeh û qedertayîner, hêzên berhemhênanê ne. Di hemberî û nelihevkrina navbera van her du diyardeyan de, piştî demekê pêwendiyên heyî yê bi hêzan re nelihev, perçe perçe dibin û pêwendî nûh ên berhemhênanê peyda dibin ku li gora bejna hêzên berhemhênanê ne û ew careka din li hev dikin, hev du pêş ve dibin. Civak di warên din de jî destpê dibe geş dibe û gul vedide. Li gorî Marksî, ev, qanûna pêşveçûna civakan a dînamîzma materyalîzma dîroki ye. Civak li ser vî esasî guherînan xwe yê ewlasyonî û şoreşgerî dijîn. Ew, dîroka guherîna ci-

vakî ya ji komunala îptîdaî ber bi ya koledariyê, ji wir ber bi feodaliyê û ji wir jî ber bi sermiyandariyê de bi vê qanûnê tehlîl dîke.

Mesela; di civaka feodal de, hêzên berhemhênanê ji wan aler û wasitan pêk dihat ku bi hêza destan dihatin bikaranîn. Zanebûn û bikêrhatina însanan li gora bikaranîna van aletan bû. Li gora vê, sistemeka aborî ya girtî hebû, xwedîtiya milkiyeta ax û erdê û karkirina li ser esasê serfî û reeyatî ya li ser van erdan ew pêwendiyên berhemhênanê bûn. Jiyanê civakê despot a patriyarkal û dewletên biçûk ên derebegayetî an ku mîrî hebûn. Milliyetek ji gellek dewletên piçûk pêk dihat ku bi hudûdan ji hev cudakirî bûn. Ev, civakê derebegayetî yan jî ya çandiniyê bû.

Lê ku makinên buxarê keşif bûn, aletên bi qeweta buxarê, pişt re motor, elektrik û sanayiya mekanîzabûyî peyde bû, fabrîke hatin danîn ku di berhemhênanê de ji dêlva qeweta destan an a heywanan, a motoran bikar dianîn, civaka îndustrî serî rakir, ew pêwendiyên feodaliyê yê axatî û reayatî, ekonomiya girtî, avayiya ji dewletên piçûk ên feodal, bi wan hêzên berhemhênanê yê nuh re li hev nekirin, rê li ber wan girtin. Vê carê têkiliyên berhemhênanê yê li ser kedfiroşiya serbest, jiyanê bajarvanî, bazara li ser esasê peran çêbû. Dewletên feodal perçe bûn, ji dêlva wan, dewletên berfirehtir ên li ser esasê millî ava bûn, mefhûma milletbûnê ser ruyê erdê girt, hemwelatîtiya azad, bû bingehê pêwendiyên navbera dewletê û însanan û yê navbera însanan bi xwe. Jiyanê nuh a civakê îndustrî- el destpêkir ku ev wekî civakê sermiyandarî jî tê binavkirin.

Ji tehlîl û tesbîtên bi vî awayî, Marks gîhaşt wê baweriyê ku li gora vê qanûnê bivê nevé wê civakê sosyalîst û komunist piştî civakê sermiyandarî were. Di destpêka sedsala me de, gava şerê cîhanê yê yekê derket û buxranê navnetewî ya giran peyde bû, hin welat yekcar serûbin bûn, qismek ji peyrewên Marksî gotin ku ev tesbîta Marks di derbasbûna ji sermiyandariyê ber bi sosyalîzmê de wê ne ji sedî sed wiha be. Berê wê şoreşa sosyalîst pêk bê, di bin hegemoniya dewleta sosyalîst de wê berê peywendiyên berhemhênanê yê civeka nuştêrek bê serdestxistin û wê ev bi xwe re hêzên berhemhênanê yê bilindir bînin.

Di destpêk û pişt re di nivê vê sedsala me de, gava şoreşên sosyalîst bi ser ketin û heta vê dema me ya dawîn jiyan, rêberên van şoreş û civakan bi guhertin û lêzêdekirinên bi vî awayî xwe li vê teoriya Marksî girtin. Lê sosyalîzm bi ser neket. Demekê mûeqqet li ser hukum ma, bi awayekî ji ya hatina xwe zûtir, bi hezîmet û bi bêberîyeke mezin hilweşiya.

Erê piştî sermiyandariyê bivê nevé sosyalîzm nehat, lê bi qeneeta min ev hin rastiyan wê qanûna ku Marksî bahs kiriye nade alî. Rastî di vê tesbîtê de hene ku hêzên berhemhênanê û pêwendiyên berhemhênanê bi hev re ne, dualî tesirê li pêşveçûn û hêdîketina hevdu dikin û di neticê de hêzên berhemhênanê esasî ne, divê pêwendiyên berhemhênanê xwe li gora van hêzan biguherin, nuh bikin û bînin awa û derencekê wisa ku bi wan re lihevhatî bin.

Pênc şîir ji SABAH KARA

Derî

Tu umrekî li derîkî geriyayî
Mîna wê çîroka Kafkayî
Ez ew derî bûm
Te nizanî

Îdî qediya
Te salan li dûv xwe hiştin
Derî hate girtin
Tu li ber derî mayî
18.6.1997, Essen

Anqa

Tu li diyarê çîrokan dijî
Bi qîza kibrîtfiroş re ku
Bi dilê te germ dike
Destê xwe yên cemidî

Bi teyrên Furûxî re
Ku li ser tiliyê te yên bi hibr
Hêk dikin û anqa
Li ser tiliyên te
Hêkê xwe diqelêşin
Li vî diyarê çîrokî

Û erê zehf baş e ku tu
Li diyarê çîrokan dijî
2.7.1997, Essen

Êşa hebûnê

Êşa hebûnê ye
Êşa min
Êşa hebûnê

Dilo lorî lorî
Lorî dilo
Lorî

Mêjî j' hebûnê têşe
Dil ji hebûnê
His ji hebûnê

Dilo lorî lorî
Lorî dilo
Lorî

Çav ji dîtîne têşe
Guh ji bihîstinê
Bêvil ji bêhnê

Dilo lorî lorî
Lorî dilo
Lorî

Êş ji hebûnê têşe
Derd ji hebûnê
Xem ji hebûnê

Dilo lorî lorî
Lorî dilo
Lorî

7.8.1997, Essen

Bêxwedî

Mala min li serê çiyayekî ye
Ez ji çiyê re distirê
Li diyarekî windayî
Diyarekî xalî
Û bêxwedî

Dunya bêxweda be
Evqas bêxwedî
Ma wê hê çawa
Ji vê xerabtî
Mîna çiravekê
Çiravek genî
Ji bakurê dunyê
Heta bi başûr
Bi hêz biherikê
Evqas malmîrat
Û bêxwedî

Ez ji çiyê re distirê
Dengê min li min dizîvire
Çiya kerr
Newal lal
Azman bêbinî
Bayekî Van Goghî
Li dora min digere
Zer û bêxwedî

1.8.1997, Essen

Dîroka girînê

Ha serzemîn
Ha serê serxweşekî

Mîna tu dîtî
Ev çav
Dê çawa bibin ax
Dê biçê ku
Ev dîtina spehî

Tu ê dîroka girînê
Çawa binivîstî
Tu ê çawa
Mîna Beethovenê kerr
Li ber qedere
Serî daneynî
Û tu ê çawa
Mîna wî
Têlên qedere
Di binê tiliyên xwe de
Bilerizînî

Ax çiqas bêkes in
Tiştê hûr
Û çiqas sêwî

5. 7. 1997, Essen

SABAH KARA

SEYRA GULİSOR



ŞEREFXAN CİZİRÎ

Evîn û evîndarî, dermanê hemû kulan e. Mirov dikare wilo bêje û derbas bibe. Lê belê evîn ne tenê evîn e, evîn û pir tiştên din dikare bi hev re bin. Evîn ji hemû aliyan de dîrokî ye, kûranî ye, mirovî ye, psîkolojîkî ye û civatî ye. Evîn dikare teorîk be, pratîk be, trajedîk be, komîk be, eşkere be, bi dizîbe û dikare gelek kategoriyên din be jî. Lê evîn weke çalakîyeke mirovî, tu caran tenê ne weke xwe ye. Evîn dikare carna kitêbî û teorî be û tenê di vir de bi mîne. Lê belê evîna bêyî çalakî, gelo ji çi re ye? Evîn di rastiya xwe de hergav divê ji xwe mezin-tir be, ji xwe zêdetir be û ji xwe jî nav û dengê xwe hîna bedewtir be. Evîn ne tenê evîna seksî ye. Babetên evînê pir in. Di navbera jin û mêran de, di navbera xwişk û biran de, di navbera dayik û zarokan de, di navbera mirovan û welatan de evîn dikare hergav pêk were. Di avaniya danûstandinên evînî de, gelek çalakîyên mirovî xwe derdixînin ser rûwê erdê. Tiştên girikî, ji pir aliyan de zelal dibin. Ev çalakîyên mirovî çiqasî harmonîk bin, evîn jî bi xwe ewqas kûr e, ewqas xurt e û ewqas tekûz e...

Ez dikarim wilo bibêjim; Evîn, heger ku ne mirovî be nikare bibe evîn. Ma dar û kevir evîndarê hevdû dibin? Ma gelo evîndariya agir û avê çêdibe? Ma berf û roj di-

karin danûstandineke evînî ava bikin? Mirov dikare hejmara pirsan zêde bike, lê hewce nîne. Bûyer li vir hatiye fahmkirin. Di heyvanê evînê de mirovatî bi xwe heye.

Psîkologê mezin Erich Fromm dibêje ku, hemû teoriyên evînê, divê bi teoriya li ser mirovan û bi hebûna li ser mirovan ve were destpêkirin. Weke ku xuya dike, di evînê de mirov, destpêkên bûyerên evînî ne. Mirov evîndarê mirovan dibe, mirov evîndarê teba û xwezayê jî dibe. Mirov evîndarê welat dibin. Heta mirov dikare bibêje ku di bingehê evîndariya du kesan de, evîna ku mirov herdem daxwaz dikin, evîna ku ew bi warê xwe re, bibin yek heye. Evîna welat û war, di rastiya xwe de divê evîna welat û warê hinek mirovan be. Mirov dixwazin bi welat û warekî re bibin yek, ev yekbûn raste rast daxwaziya yekbûna mirovan e. Heger em bi kurtî bêjin; welat û war evîndarê mirovan na bin, lê belê mirov evîndarê wan dibin. Bergîl evîndarê mirovan nabin, lê gelek mirovên ku evîndarê bergîlan dibin hene. Li şûna hespên kihêl kesên ku dibin evîndarê bergîlan jî, hilbet bi serê xwe bûyereke psîkolojîk e.

Girêdayî dîtînen li ser mirovan, Marks jî hinek ramanên hêja derdixîne pêş. Ew wilo dibêje; mirovan wekî mirovan biramînin, danûstandinên mirovan bi gerdûnê re divê mirovî bin, we çaxê hûnê li miqabilî evînê evînê, li miqabilî bahweriyê bahweriyê bibînin. Di felsefa Marks de, mirov her gav di navenda bûyetan de ne. Evîn jî, ji bona Marks bûyereki navendî û mirovî bû. Bi kurtî mirov dikare bibêje; heger mirov çi biçîne, ewê mirov wî jî hêlîne. Hemû tişt li miqabilî hevdû bi pêş de diçin. Mirov li hevdû temaşê dikin û dimeşin. Ji bona ku ew danûstandina bi berhem be jî, ji mirovan re pêdaketin, berpirsiyarî, hurmet û zanebûn pewîste. Van dîtînen xwe psîkolog Erich Fromm di pirtûka xwe ya ku li ser "Hûnera Evînê" hatiye nivîsandin de, sistematîze dike. Evîn di rastiya xwe de weke pêvajoya çandiniyê ye, mirov çikas nêzikayî nişan bide û zana be, li miqabil vê yekê berhem jî ewqas mezin dibin. Di realîta civatê de evîn û zanebûn destbirakê hevdû ne. Erich Fromm wilo dibêje; Ji bo ku mirov karibin hurmetê nişanî mirovan bidin, divê ew mirov hevdû pêşî nasbikin. Beyî hevdû naskirinê ne evîn, ne ji hurmet, ne ji ewlekarî, ne bahwerî û ne jî hevkarî dikare baş pêş ve biçin. Di avanî û bingeha evînê de, ji hemû aliyên de zaniyariyêke sosyolojîk heye ku mirovan herdem bi hemû haweyî ronî dike. Di hemû danûstandinên sosyolojîk de, li civatê, divê pêşengiya zanebûnê û naskirina bûyeran, rolên xwe yê bingehîn bileyizin. Beyî vê pêşengiya zanabûnê û mirovan naskirinê, evîn, hurmet û berpirsiyarî dibe weke babeteke korîtiye. Bi kurtasî mirov dikare bêje ku, di evîna mirovan de avaniya civata berbiçav, beş bi beş derdi-

keve miqabilî çawên mirovan. Evîn xwe di civatê de nas dike û civat jî xwe di evînê de. Li ber şewqa mirêka sosyal, civat, xwe li ber fesala evînê dixemilîne. Xwe nas dike, mekrohî û bedewbûna xwe carake din di ber çavan re derbas dike. Civat dibêje; wey gidiyano ma ez çilo bûm? Bi kurtasî civat û evîn, ji pir aliyan de dişîbin hevdu. Hemû pirsgirêkên civatê xwe di evîna mirovan de radixin ber çavan ...

Di mijara evînê de tişteki pir balkêş heye; armanca evînê şahî û serfirazî ye, lê belê evîna biserketî zêde li ser ne hatiye gotin û nivîsandin. Mirovan bêtirîn caran di edebiyat, huner û serpêhatiyên sosyal de, behsa evîna ne biserketî kirine. Di mijara evînê de hergav trajedî derdikeve pêşiya mirovan. Ev yeka hanê him li cîhanê him ji li welatê me wilo ye.

Ma eposa kurdan ya helî navdar Mem û Zîn ne trajedî ye? Ma Xecê û Siyabend, Ferhad û Şêrîn ne trajîk in? Mirov dikare bi sedan stran, leylan, dûrik û lawcan li ser evîna trajîk bihejmêre. Bêyî mubalexe mirov dikare bibêje; li Kurdistanê evîn gelek caran trajîk bûye! Trajedî di pir waran de bûye malê dîroka Kurdistanê. Di bûyerên trajîk de gelek sêncên civatî hene ku dibin encamê ne biserketina evînê. Danûstandinên çîneyetî, malbatî, dînî, mezhebî, tixûbên eşîrî, etnîk û netewî hergav dikarin bibin dîwarek û têkevin pêşiya evînê. Sêncên ku li Kurdistanê li himber evînê hene, herdem civatî bûne. Di tevgirêdana evînê de, rola kesên û evîndaran hergav biçûk maye. Sêncên civatî li himber evînê çikase mezin bin, nakokiyên malbatî û etnîk çikase xurt bin, ferqa çîneyetî çikase kûr be, li miqabilî vê yekê jî tehlûke heye ku evîn bibe trajedîk. Di navbêna sêncên civatî li himber evînê û evîna trajîk de, raseriyêk îdeolojîk heye ku li gora civatan û demên dîrokî, dikare were gûhertin. Evîna trajîk bi giştî di civateke trajîk de, şax û ber dide...

Epopa Seyra Gulîsor, di edebiyata gelê kurd ya devkî de, xwediyê cîhekî mezin e. Ne tenê li ba hûnermendan, lê belê li ba gelê kurd jî, Seyra Gulîsor cîhekî bi taybetî digre. Di dema civata eşîrî de, hemû kategoriyên eşîra serpêhatiya Seyra Gulîsor zanîbûn. Kalan jî, pîran jî, xortan jî, evîndaran jî, naşiyan jî, eşîrên cur be cur jî, dînan jî, bîaqilan jî, erê, hemû kesên bi Seyra Gulîsor re digotin û dibilandin;

”Li min Seyrê li min nemayê,
li min deste li ber rûwayê,
li min şermekara welatê Hesanan û Heyderayê,
li min rûreşa we hersê birayê,
li min qîjaka serê darayê,
li min totaka li serê çiyayê,

Min bi guran re zûryayê,
Bi koviye li serê çiya re geryayê,
Piştî mirina Eliyê Mamed pismamê mi rebenê,
Ezê nemînim li rûwê vê dinyayê”.

Seyra Gulîsor di dema xwe de, bibû weke nasnamayeke jî bo gelek kategorî û kesên civata kurdan. Di epopa Seyra Gulîsor de, hemû bedewbûn û mekrohî, qencî û xerabî, şeref û bêşerefî, bahwerî û xaîntiya ku di civata eşîrî de hebû derdikete ser rûwê erdê. Ewrên reş ku li ser civata eşîrî hebûn di vê epopê de, belawela dibûn. Epopa Seyra Gulîsor, di civata eşîrî de bûbû wek mirêka evîna trajedî li welatê kurdan. Li ber vê mirêka biriqandî ya evîne, gelek evîndarên kurdan di wextê xwe de, porê xwe şeh kirine û xwe nas kirine!

Seyra Gulîsor li welatê me bi gelek versiyonan tê gotin. Ez bi xwe du versiyonên Seyra Gulîsor baş nas dikim. Yek ji van versiyonan, versiyona Mihemed Eliyê Kercosî ye. Ya din jî ya Miradê Kinê ye. Mihemed Elî û Miradê Kinê herdu jî, du dengbêjen herêma Mêrdînê ne. Herdu jî li binya xetê û ji derveyî herêma Mêrdînê jî, baş tene nas kirin. Weke ku ji navê wî jî baş tê xuya kirin, Mihemed Elî Kercosî ye. Jî bilî epopa Seyrê, Mihemed Elî xwediye reperetuareke dewlemend û heja ye. Ew stranên dilan û govendê jî dibêje, lê belê di rastiya hunermendiya Mihemed Elî de, bûyerên şer û lawcên merxasiye ji, cihekî bi taybetî digirin. Ji bona mînak ez dikarim çend epopên şer yên ku Mihemed Eliyê Kercosî bi nav û deng kirine, li vir bihejmêrim; "Kero û Kulik", "Çeleng Evdal", "Koçero", "Mûso", "Evdilrehmanê Zorbaşî", "Şerê Tînatê", "Şerê Mala Eliyê Unis" û gelekî din.

Di navbena versiyona Mihemed Elî û versiyona Miradê Kinê de, hinek ferq û informasyonên cihê cihê hene. Miradê Kinê, Epopa Seyrê di hinek aliyên de navçeyî dîke. Navên hinek war û kesên beşdar diguherîne. Miradê Kinê hinek tiştên dema xwe li orjînalê epopê zêde dîke. Lê belê ji aliyê awaz de, tu hunermend nikarin weke Miradê Kinê, Seyra Gulîsor ji kezaba dilê xwe bibêjin. Deng li Kurdistanê weke dengê Miradê Kinê hîna jî peyde nebûye. Ew dengê zîz û zelal, bilind weke Çiyayê Zagrosê û xurt weke naqosa Dêrên Fileha, bûye normekî dengbêjiya Kurdistanê û li hemû deverê welatê belav bûye. Miradê Kinê bi dengê xwe yî berz û zelal, nexweşan ji nava livînan radike ser piyan...

Mihemed Elî di versiyona xwe de, bêtirîna girêdayî versiyona orjînal dimîne. Hilbet ew dîtina min e. Di gotina epopa Seyrê de, stîla Mihemed Elî nerme û ji pir aliyên de biserketiye û bi herk e. Li ba Mihemed Elî stîl û deng bi hemû haweyî

hevdû timam dikin. Carna Mihemed Elî perçên şanogeriye jî dixê nava epopê. Di versiyona Mihemed Elî de him drama û him jî qomedî heye. Ji bona vê nivîsê ezê versiyona Mihemed Elî bikim ya bingehin û paşê jî ezê herdu versiyonan bi hevdu re hinekî muqayese bikim. Ezê niha dest bikim û versiyona Mihemed Elî ji nû ve bixwazim ava bikim;

...Qor Mistefa, Qor Qasim û Qor Silêman hersî birayên hevdû bûn. Ew hewsê bira Axayên welatê Hesanan û Heyderan bûn. Mirovan mal û milkê vana bavêtina nav avên çeman, ewê çem biçikiyana. Ciwamêran ewqas dewlemend bûn. Xuhek wana hebû jê re digotin Seyra Gulîsor. Seyrê bi bedewbûna xwe, li welat û li cîhanê deng dabû. Hîna jî di mala bavê xwe de bû. Gelek caran begên Farqînê xeber şandibûn ku ewê bêne serdana wan. Piştî çend caran ricakirinê, incex dûra karibûn îcazê bidine wana ku ew werin mala wan. Roja ku hatin serdanê, destê Seyrê ji kar û barê malê vala nebibû. Geh xwarin, geh vewxarin, geh çay, geh qahwe, geh fêkî ûhw. Heta ku destê Seyrê ji kar û barê malê betal bû, êvar tibabekî derbas bûbû. Seyrê çû li ber pencerê rûnişt û xwest ku ew mêvanên pêşkeş ku hatinê cem bîrayên wê, nas bike. Seyrê li pişt pencerê li sohbeta civatê guhdarî dikir. Gotin hatin û zivîrin... Mêvanan dest pêkirin behsa Seyrê kirin. Deng hate Seyrê û wê jî îca meqseda mêvanên birayên xwe fahm kiribû. Rê li Seyrê hêdî hêdî teng dibû. Berê jî Seyrê dilê xwe bijandibû pismamê xwe Eliyê Mamed. Wê biryara xwe ji zû da; ji bedêla begên Farqînê, Seyrê rabû xeber ji pismamê xwe re şand. Seyrê ji xwe bi xwe re gor; ma min heta niha xwe himandiye ji bona begên Ferqînê? Eliyê Mamed çawa be jî pismamê min e. Di roj û qewamên giran de, ewê hergav weke stûneke hesinî be û li pişt birayên min be. Hema Eliyê Mamed çilo be jî, ji begên Ferqînê peşkêştir û ferztir e. Seyrê wilo difikirî, lê belê hayê Eliyê Mamed ji vê yekê qet tune bû.

Eliyê Mamed her çikas pismamê Seyrê bû jî, wî nikaribû ji feqîriya xwe qelenê Seyra Gulîsor peyda bikira. Ew û pîra diya xwe bi tenê bûn. Eliyê Mamed kesekî xort û xêşim bû û hîna nû xeta simbêlan rast kiribû. Feqîr û perîşan bû. Ma ne bav û kalê me jî, ji berê de gotinê ku "feqîrî zingara mêra ye?" Xwedê barê feqîriye bi ser serê tu lawên bavan de daneweşîne. Li gora ku tê gotin; bizineke Eliyê Mamed hebû, ew bi qiloçekî bû, bi çawekî bû û pişt wê jî weke dasekê bû. Eliyê Mamed ku ji malbata axayên welatê Hesanan û Heyderan bû, kesekî ewqas maldar bû!!!

Seyrê hema wê gavê ji pîrekê nav malê re got; ma pîrê tu dikare qasidiyekê ji min re bikî? Pîrê jî hema bi carakê re li Seyrê gotin vegerand; ma lawo cîhê ku ez lêbim, ka heqê kê ye ku ew qasidiyekê li vir bike? Seyrê bi kurtî derdê xwe ji pîrê re got û

gotê li baş guhdarî bike: Tu niha rabî biçî mala Eliyê Mamed. Jê re bibêje Seyrê gotiye ku ji niha û du saetê din, heger ku aliyek rûwê te qusandî û yê din jî nequ-sandî be, divê tu zû were civanê min, yan na ezê jî destên te herim. Dibêjin bereke-ta Xwedê li pîrê be; bi loqa guran û bibazdana keran xwe gîhand mala Eliyê Ma-med. Qasidiya ku ew pê hatibû bi cih anî û vegeziya. Eliyê Mamed şaş bû, lê xwe zû komî ser hevdu kir û bi cihê civanê ku Seyrê jê re gotibû, hêdî hêdî meşiya. Sey-rê berî wî hatibû civanê xwe. Ma ne ji beriya zemanan de bav û kalan gotiye; "şe-wata pîrekan jî a zilaman bêtir e." Herdûyan jî ji hevdû şerm dikirin, lê belê Seyrê bêdengiya xwe zû şikenand. Bûyer bi kurtî ji pismamê xwe re got. Eliyê Mamed feqîrî û xizaniya xwe derxiste pêşiya vê yekê. Lê Seyrê bi vê yekê qanî nebû û ji pis-mamê xwe re got: Seyra dotmam qîma xwe bi te tîne, lê belê tu qîma xwe bi Seyra dormam nayînî. Gotin çû û hat. Wana li ber hevdû dan. Di taliyê de mesela revan-dinê derkete pêşiya wana. Hema Eliyê Mamed wê gavê, xatir ji pîra diya xwe xwest, berê xwe da ber tewla hespa û hespek ji tewlê derxist. Hespa xwe zû ediland, Eliyê Mamed Seyra Gulîsor li pişt xwe kir û herdûyan berê xwe dane ser riya oxirê. Seyrê û Eliyê Mamed bi wî hawayî bûn xwîniyên welatê Hesenan û Heyderan...

Seyrê ji Eliyê Mamed re got; min bibe nava welatê Hemikan û Dasikan. Hemû kesên xwînî dirin cem wan. Hemikî û Dasikî xwîniyan çawa be jî diparêzin. Lê Eliyê Mamed dixwest ku ji serî de, hakimê rewşa xwe be. Damara wî ya zilamtiye bi carake re pêgirt û ji Seyrê re got; madem ez zilam im û tu jî pîrek î û tu bi dûv min de tê, wê çaxê elaqê te ji vê yekê tune. Niha buhar e û wexta razana serê xa-niyan e, wexta hejmartina stêrkên li ezmana ne. Emê niha rabin herin quntara Çi-yayê Evdilezîzê cem kirîvê me yê xwînê Hiseynê Dobelên. Ciwamêro mezinêkî Yezîdiyan e, ew ji bav û kalan de kirîvên me yên xwînê ne. Di şeva tarî de lîngên xwe li hespê xistin û meşiyên...

Seyrê û Eliyê Mamed ketin nav avingan, leylanan û çolberiyên. Wan bi lez û bi bez xwe berdane derdora Golên Geniyan, dîsa bi lêz û bêz di Xanê Dimdim û Xir-bê Xezalan re xwe diqevizînin û di ser serê Şûva Reşan re bi giranî xwe diqulipînin. Di ser serê Bîra Gûrgûrî re derbas dibin, li ser serê Bîra Şerefdînê zerikek av vedix-win. Nêzikî Çiyayên Spî dibin. Di Şingalê re, di nava bajarê Yezîdiyan re, di sika-kên nivên bajêr bi xwe de dimeşin. Piştî tibabekî ew îca hêdî hêdî nêzikî nava Çi-yayên Reş, Çiyayên Yezîdiyan dibin. Di Geliyê Dûdê, Geliyê Simoqê û Geliyê Kersê, di neqeba van her se geliyan re derbas dibin. Di biniya avingan û çolberiyên re dimeşin û îca hêdî hêdî dikevin quntara Çiyayê Evdilezîzê. Ji bedêla ku ew herin mala kirîvê xwe Hiseynê Dobelên, ew bi şaşî dikevin binê konê Îskanê Gulîxanê yê

malik şewitî. Li şûna kirivê wan î xwînê Hiseynê Dobelên, îca Îskanê Gulîxanê bû-
ye mezinê eşîrê.

Ew çî dem bû û çî dewran bû?

Eliyê Mamed Seyrê dişîne aliye malê. Ew bi xwe derbasî oda Îskanê Gulîxan di-
be. Ode weke hergav ji mêvanan tije ye. Eliyê Mamed silavê dike û derbasî nava
mêvanan dibê. Îskanê Gulîxanê bi xêrhatina mêvan dike û jê re wilo dibêje; xortê
Hiseynî tu bixêr hatî nava me, min ji zû de bêriya we Hiseyniyan kiribû, ma te xêr
e? Eliyê Mamed bi kurtî çîroka xwe ji civatê re dibêje û xwe davêje bextê wana.
Wexta ku Îskanê Gulîxanê navê Seyrê dibihîze, kul û kederê wî şiyar dibin. Îskanê
Gulîxanê berê nav û dengê Seyrê bihîstibû. Hema wê gavê bi carakê re şeytanî ha-
tin bira wî. Ji xwe re got; ez li ezmanê heftan li Seyra Gulîsor digeriyam, li erda
muqaddes va ye ew hazir û nazir kete nav lepên min. "Bi Melekî Tawis kim, ezê
Eliyê Mamed bikujim û Seyrê li canê xwe mehr bikim." Îskanê Gulîxanê li ser fen
û fûtan û vê şeyraniya hanê difikirî...

Ji bere de gotine; ku kurmê darê ne ji darê be, dar hişk nabe. Îskanê Gulîxanê ra-
dibe bangî melayekî musulman dike. Xortên Yezîdî melê li biniya avingan û leyla-
nan dibînin. Îskanê Gulîxanê armanca xwe ji-melê re dibêje û melê tembîh dike:
Di dema ku tu mehrê bibirî, bi destê Eliyê Mamed yê rastê bigire. Ezê sê xortên
Yezîdiyan bi çek û etfî bi te re bişînim aliye malê. Wexta ku te bi destê wî yê rastê
girt, wê çaxê çav bike xortên Yezîdiyan, ew jî bera bav û kalê xwe di bira xwe de bî-
nin û Eliyê Mamed bi qeptên xenceran bikujin. Na heger tu wilo nekî ezê serê te
jêkim. Melê musulman mecbûr dimîne. Melê Qurana xwe xist bin çengê xwe û bi
sê xortên Yezîdiyan re derbasî aliye malê bûn. Mele, Eliyê Mamed û Seyra Gulîsor
tîne cem hevdu û destpêdike ji wan re wesfê dîne musulmantiyê dide. Her se xor-
tên Yezîdiyan jî li devê derî sekinî ne û li wan temaşe dikin. Wexta ku Eliyê Ma-
med û Seyrê hersê xortan dibînin, şik dikeve dilê wan. Melê musulman gotinên
li ser dîn û şerîetê pir dirêj dike û destê xwe davêje destê rastê yê Eliyê Mamed. Di
vê gavê de Seyrê niqûrçkekê ji Eliyê Mamed dide û anîşka xwe li anîşka wî dixîne.
Eliyê Mamed meselê fahm dike û destê xwe yê çepê dixê destê melê. Li gora dîne
musulmantiyê destê çepê nabe. Mele dibêje; heger ku ferman jî rabe, dîsa di dîne
me bi destê çepê tu cara mehr nayêne çekirin. Mele dîsa dest pêdike şîretan li wan
dike. Wê gavê Eliyê Mamed ji melê re dibêje; Elhamdullillah em dizanin ku dîne
heq dîne me ye. Li vê dinyayê û li wê dinyayê jî, ez hêviya xwe ji Xwedê dikim ku
îşev di dîne me de, destê çepê qebûl bibe. Melê Eliyê Mamed baş fahm nedikir. Lê
vêca tu rê jî, ji wî re nemabûn. Melê îca bê çare dimîne û radije destê Eliyê Mamed

yê çepê. Çavan li xortên Yezîdîyan dike, lê belê kes ji wan jî bav û kalên xwe di bîra xwe de qet nayînin. Mele mehra Eliyê Mamed û Seyra Gulîsor, li bin konê Îskanê Gulîxanê dibire.

Mele bi xortan re vedigere cem Iskanê Gulîxanê. Jê re meselê dibejê. Îskanê Gulîxanê tiredîn dibe û radihêje şûre xwe ku serê melê jêbike. Hûn mele bi rastî hergav xaîn in dibêje. Mele xwe ji vê yekê begûneh dike û sûc davêje ser xortên Yezîdîyan. Dibêje ku min destê wiyê çepê girtibû, lê belê xortên Yezîdîyan bav û kalên xwe di bîra xwe de neanîn. Ji bedêla ku tu min bikujî, ezê şîretê baş li te bikim. Binêre û li min guhdarî bike; ew her du xort hîna nûh jî welatê Hesenan û Heyderan hatinê vê derê. Wana herduyan bêriya hevdu kirinê û westiyane. Niha wê ew di ber hevdû kevin û milên xwe yên spî weke berfa Serhadan, di bin serê hevdu re derbas bikin. Wexta ku ew raketin, tu jî here Eliyê Mamed di xewê de bikuje. Etfiya xwe ya Soranî li ser kerkerka dilê wî xîne. Seyrê wê gavê çilo be jî, ewê bi te tenê bimîne. Ma ew nikarê ji erda muqaddes winda bibe, yan jî ji vir bifire. Heta ku ez jî Seyra Gulîsor li te mehr nekim, ez ji van deran xwe nalivinim.

Îskanê Gulîxanê bi vê şîretê şaş dimîne. Dibêje; Ya Allah û îman Allah, kesî nika-rîbû vê şîreta wilo li min bike û ji bona vê yekê jî melê efû dike. Îskanê îca nema kare di cîhê xwe bisekine. Weke mirîşka ku hêk pêre be, ew nema kare li cîhekî rûnê. Serîkî tê vî alî û serîkî jî dirê wî alî. Dire û tê. Hizûr pêre nemaye. Piştî tibabekî Îskanê Gulîxanê çû aliye malê, bi dizîka li bin çîta Seyrê û Eliyê Mamed nerî. Bi rastî jî herduyan destên xwe di bin serê hevdu re derbas kiribûn û ketibûn xewa şêrîn. Di reşaya odê de Seyra Gulîsor weke heyveke ku li çardehan bû dibiriqand...

Wexta ku îskanê çav li Seyrê kir, aqilê wî çû û çavê wî beloq bûn. Li ber hizn û cemala Seyrê, Iskanê Gulîxanê bi sûr ketibû û diricifî. Iskanê malik şewîtî, xwediyê etfiyek Soranî bû. Etfiya wî tûj weke şûjin û derzî bû. Ew bidîzîka nêzîkî Seyrê û Eliyê Mamed bû. Xwe diqelizand. Bi carakê re xwe biser nêçîra xwe de daqûl kir û heta ku qewet tê de hebû, ji nişkeke ve etfiya Soranî li ser kerkerka dilê Eliyê Mamed xist. Etfiyê doşek jî qul kir û bi qasî du tiliyan jî bi erdê de çû. Xwîna Eliyê Mamed herîkî ser Kulavê Xorasanî. Eliyê Mamed ji ber bîrîna xwe him him dikir. Bi him hima Eliyê Mamed re Seyrê şiyar bû, wê destê xwe peland û her çar tiliyên Seyrê, bi careke re ketin hindurê birîna etfiya Soranî. Wê gavê qêrîn bi Seyrê ket û dengê wê çû nava erş û ezmana. Seyrê rabû ser xwe û li xwe xist. Li derdora xwe nerî. Çavên xwe firkandin û xwe bi ser gewdê pismamê xwe de daqûl kir û got;

”Li min Seyrê li min nemayê,
 li min destî li ber rûwayê,
 li min rûreşa we her se birayê,
 li min şermîkara welatê Hesenan û Heyderayê,
 piştî Eliyê Mamed pismamê min rebenê,
 ez nemînim li vê dinyayê”.

Lê belê Eliyê Mamed hîna jî sax bû. Li ser doşeka xwe keft û left dikir. Dixwast ku hinek gotinan ji dotmama xwe re bibêje. Eliyê Mamed di wî halê xwe de bangî Seyrê dikir;

– Seyrê dotmamê rabe hêdî hêdî bimeşe û bilezîne. Ji bona Xwedê bese van hêstiran bibarîne li ser taqiyên xwe yên binefş. Gava ku ez herim, bera serê te û her se bîrayê te li dinyaya gewrik, li şuna min xweş be.

Seyrê li Eliyê Mamed vedigerîne;

– Pismamo ez bi te re, ez hey bi te re. Min digot qey; ez zêrekî hilandî me ji canê te re. Wey pismamo ez nemînim piştî te re.

– Seyrê dotmamê wilo ye. Binêre li bejna te weke minarê ye, tayekî rihanê li nav bexçe ye, ji vir û pê de dinya gewrik ji min û te re be feyde ye.

– Seyrê dibêje; min digot qey ez xortek pak im, ez tu qanûna qebûl nakim! Piştî Eliyê Mamed pismamê min rebenê, ezê zewaca dinyaya gewrik li xwe heram kim.

– Eliyê Mamed dibêje; Seyrê dotmamê dilê min terkinî. Dinya bûye behra bêbinî. Nava min evdalê Xwedê bûye wekî sêleke sorî hesinî, pêtiyekî li ser û yek jî li binî. Agir bi mala bavê te neketê, ma tu çawa li pêşberî çavê min disekinî? Seyrê dotmamê li min û li van xafeta, berfê girtibu welatê Serheda. Tu dizane ku dawa xîret û namûsê gelek zor û zehmet e. Tu tucara meke ku ew gawir li miqabilî min, destê xwe bike stûyê te de. Seyrê rabe lezekê li xwe xe û bilezîne, daw û delingan biçikîne, xwe zû bi kirîvê me Hiseynê Dobelên bigihîne. Lê lê dotmamê nûha va ye bihar e, şalûl û bilbil dixwînin li bin zinar e. Belkî hêviya min ji Xwedê, ew ji me re bibe sitar e. Va dotmamê dilê min xemgîn e, belkî îşşelleh ew destê te û biçûkê bira Qor Silêman bi hevdu bigihînin e. Ez hêviya xwe jî ji Xwedê dikim ku heyfa min jî li erdê nemîn e.

Seyrê dibêje; pismamo wilo ye bi min wilo ye, lê gotin û galgal bê feyde ye, bejna min zirav e weke minarê ye, tayeke rihan e li nava bexçe ye. Xwedayê mezin li ser kursiya xwe, raserî min û te ye. Ji vir û pêda ez çiqasî bêjim, ji min û te re bê feyde ye. Seyrê bi dilekî şewitî dîsa li xwe xist û ji xwe re got;

”Li min Seyrê li min nemayê
 Li min destî li ber rûwayê
 Li min şermikara welatê Hesenan û Heyderayê
 Li min rû reşa we her sê birayê
 Li min qijaka li serê darayê
 min totaka li serê çiyayê,
 Piştî Eliye Mamed, pismamê min rabenê
 Ez e xwe bikim qirdik û rahbika li ber Dêrayê.”...

Seyrê bi çavên serê xwe dibîne ku pismamê wê, deqîqe bi deqîqe melûl û zelûl di-
 be. Hêdî hêdî zenga mirinê davêje ber diranê wî. Heta bezê bi ber çavê wî zer dibe.
 Di dawî de Eliyê Mamed weke ku mirov pif bike çirayeke, emir dide hazira û ti-
 mam dibe. Seyrê radibê berê wî li qubletê di edilînê, daw û delingên xwe diçikîne
 û ji çîta xwe baz dide...

Kûçikên gundiyan bi dûv Seyrê dikevin, lê belê ew xwe zû digihîne binê konê ki-
 rîvê xwe Hiseynê Dobelên. Di taliya kon re diçe û li nava kufletê wî rûdine. Hisey-
 nê Dobelên bi ewt ewta kûçikan, bi nale nale û bi hime himê şiyar dibe. Radibe ser
 xwe, heger mûmê heger fenerê pêdixîne, li dora xwe dinêre û dibîne ku li nava kuf-
 letê wî tişteki reş xwe dilebitîne û rûniştiye. Hiseynê Dobelên bang dike û dibêje;
 ma ew çi gotin e, ma ev çi xeber e? Heger tu însî an jî cinsî were ji taliya kon were
 dere. Heger tirsî te hebe, bextê min û yê bavê min jî, ji te re.

Wexta ku Hiseynê Dobelên wilo dibêje, Seyrê wê gavê ji qama xwe de radibe ser
 piyan. Xurmîn dikeve tok û beniyên, tê li cem Hiseynê Dobelên rudine û sisê an jî
 çar girêkan li hûçikê wî dixîne. Dibêje; kirîvo her hêya, ez ketim bextê kirîvê xwe
 mêr î çê ye. Hiseynê Dobelên wê gavê şaş dimîne. Dibêje; li wê ecebê kuro, ev kirî-
 va me Seyrê ye! Agir bi mala bavê te neketê, ma tu bi agirê eşqê firîya, kirîvê bêje;
 ma xwîne te revandiye, ya na ma gelo tu li ser baskê teyra hatiye... Seyrê çîroka xwe
 ji serî heta binî ji Hiseynê Dobelên re dibêje.

Hiseynê Dobelên jî bi derd û bi kul e. Di nava eşîrê de zora wî çûye. Îskanê Gu-
 lîxanê axatiya eşîrê ji destê Hiseynê Dobelên girtiye. Dibêjin piraniye zora mêrani-
 ye biriye. Hiseynê Dobelên ji gelek aliya de qels ketiye, lê belê ew dîsa weke mêrê
 çê ji Seyrê re dibêje; waye sê law û du qîzên min hene, ezê hemûyan ji te re bikim
 qurban.

Di wê navê û di wê bêhnîkê de, dengê Îskanê Gulîxanê ji derve tê. Di destê wî

de şûrekî Kildanî heye. Helk helk pêketî ye, çavê wî sor bûne, ew bûne weke agirê pizotan. Weke nêçîrvanekî ku nêçîra xwe ji dest xwe birevînê, îskan çav beloqî bûye û hizûra wî reviyaye. Dibeje; heyhat, ez Îskanê Gulîxanê me. Min Eliyê Mamed di ber sênga Seyra Gulîsor de kuştiye, ez li ezmanê hefta li Seyra Gulîsor digeriya, helal û hazir li erda muqades ket bin destên min, ewê ku Seyrê li mala wî derkeve, xweziya min ne bi dilê wî ye!

Xelk hêdî hêdî ji malê xwe derdikevin. Di wê navbênê de Hiseynê Dobelên derdikeve pêş û ji Iskan re dibêje ku Seyrê li mala wî ye. Ew di halekî perîşan de ye. Heger ku ez niha wê teslîmî te bikim, ew dikare bi kela xwe ya germ kêrekê an jî qelemtraşekê li ser canê xwe de û xwe bikuje. Wê çaxê ew nabe qismetê tu kesan. Binêre wa ye du seet ji sibehê re mane. Ezê wêna sibehê teslîmî te dikim. Xelkê jî piştgiirtiya Hiseynê Dobelên kirin û dûra ji belav bûn.

Hema bi carakê re Hiseynê Dobelên hate binê konê xwe. Hersê lawên xwe ji xewê şiyar kirin. Ji wan re got; Ji roja ku hûn sê salî bûn û heta ku hûn gîhane wexta zewacê, min hûn bi dûvên beranan, goştê berxan û bi gepên birincê xwedî kirine. Ji bona rojê ku serê we di ber xîret û namûsê de biçê. De rabin Seyra Gulîsor weke xuh û bira li pişt xwe biedilînin, wêna li ba Geliyê Kersê, Geliyê Dûdê û Geliyê Simoqê, di navbêna hersê geliyan de deynin û zû jî paş ve vegerin. Xortan weke ku bavê wan ji wan re gotibû kirin. Hatin Seyrê li navbêna hersê geliyan danîn û gotin; kirîva Seyrê, ji vir û pêde tixûbê me û dijmîn û Erebiştan e. Heger tu li avingê û mesîrê vegeftî te bibîne ku derdora sedûpêncî konî vegirtî ne. Heger tu li eslê van bipirsî, ew konên Sînoqê Şemerî ne.

Wana Seyrê li wir danin û vegeeriyên. Seyrê hinekî meşîya, li avingê û mesîrê vegeerîya, û bi rastî dît ku derdora sedûpêncî konî waye vegirtîye. Dîsa li dora xwe nerî û dît ku şikeftê raserî hersê geliyan e, hema vê gavê çû hindurê sikeftê û li halê xwe got; li min Seyrê li min nemaye...

Roj tibabekî hilatibû. Seyrê xwe berda nava konan. Dît ku konekî ji konê din hinekî cihê ye. Telîsek li ser sê an jî çar darika ye. Seyrê nêzîkî kon bû. Di bin kon de pîrê razayî bû. Ser û binê xwe li hevdu gerandibû. Hayê wê ji ba yê felekê qet tunebû. Seyrê lingên xwe hêdîka li wê xistin û ew ji xewê şiyar kir. Pîrê rabû xwe veparimand, çavê xwe firmand û wexta ku çav li Seyrê ket ew matmayî bû. Hema bi carekê re daxwaziya xwe anî ziman: Xwezî ku ez niha xortekî çarde salî ba ma, minê nihaka tu li xwe mehr kiriba. Hey sed maşelleh ji şewqa te re qîza min. Seyrê ji pîrê re dibêje ku tu dayîka min be, ji min re baştir e. Pîrê dûra jî Seyrê re dibe sitar. Seyrê û pîrê dura li hevdu dibanin...

Pîrê dûra radibe melayekî peyde dike. Seyrê dixwaze ku nameyekê ji birayên xwe re bişîne. Lê belê ew mele, melayekî wilo ye ku ew pir ji hevdu de ketiye. Rîha melê digihe çogên wî, heyvanê ronahiyê di çavê melê de nemaye, destê wî nema karin qelemê bigirin. Mele naxwaze ku ew were binê konê pîrê. Pîrê jî ji mela re dibêje; seyda bi Xwedê mêvana min qîzîk e, zêrek e Mehmûdî bi niçîk e. Tiştên ku hatiye serê wê xezalê, tu caran nehatiye serê Herdem Gozelê, Xan Dûndîrê, Şebabên Xortan û Eyûbê Kurma xwarî li darê vê dinyayê. Wextê ku melê dibihîzê ku mêvana pîrê qîzîk e, hema wê gavê ew ji dahma xwe de radibe, tizbiyeke nîv weqî di stûyê wî de ye, wê diqetîne û davêje, şehê xwe ji bêrîka xwe derdixîne û destpêdike rîha xwe şeh dike, zimanê xwe bi dora devê xwe dixîne, Qurana xwe li bin çengên xwe datîne û li pêşiya pîrê, qevzê melê dibin weke qevzên pezkoviyân!

Mele li bin kone pîrê bazaran bi Seyrê re dike. Bêyî ramûsan, ez tu nameyan jî te re nanivîsînim dibêje. Seyrê jî dibêje; esas îca fermana min e, lê belê ew mecbûr jî dimîne û daxwaziyên mele qebûl dike. Piştî nivîsandina namê, ewê mele ramûsaneke bi dilê xwe ji Seyrê bisitîne. Qewlê wan wilo ye. Fehmê melê hergav li ser bejn û bala Seyrê ye. Wexta ku ew namê dinivîsîne jî, destê wî tê wî alî û dire wî alî. Diçe û te! Ji çardeh xetan, ew yekê tenê di namê de rast nanivîsîne! Seyrê dibêje; ew namê ji destê min û ji destê bîraye minî biçûk, ji destê Qor Silêman e. Namê reş dikin, mohr dikin û Seyrê pişt rê jî sê zêran dixê destê xulamekî û wî dişîne nava welatê Hesenan û Heyderan...

Wexta ku xulam bi ser rêya xwe de diçe, mele îca li bin kone pîrê dawa ramûsan li Seyrê dike. Seyrê di ber re haziriya xwe dike. Kevirekî tûj û mezin dixê bin çoga xwe. Ji melê re dibêje; de were kerem ke ka ramûsana xwe bistîne. Mele tê li ba Seyrê xwe direj dike, weke roviyan li ber destê Seyrê xwe xiloxavî dike û li bendî ramûsana xwe disekine. Seyrê hema wê gava kevirê xwe ji bin çoga xwe derdixîne û jî nişkeke ve kevir li nava çavê melê dixîne. Çavekî melê derdixîne û yek jî sax dimîne. Seyrê bangî hirç û kûçîkên koniyân dike, û ew jî laşê melê dikin weke termên kera û çêlekan...

Xulam xwe digihîne welatê Hesenan û Heyderan. Nameya Seyrê dide birayê biçûk Qor Silêman. Ew jî namê dixwîne û roj bi roj zelûl û melûl dibe. Birayên wî yên mezin Qor Mistefa û Qor Qasim dibêjin; qey birayê me evîndar bûye. Qerfên xwe pê dikin. Keko jê re dibêjin; tu destê xwe bi destê qîza kîjan eşrafî û xanedanî vekî, emê wê ji te re bînin vê derê. Qor Silêman bi kul û derd serpêhatiya Seyrê û nama wê, ji birayên xwe re dibêje. Qor Silêman bi hêrs û bi birîn e. Ji birayên xwe re dibêje; hûn herdu zewicî û nazirî ser zarokên xwe ne, ez dixwazim tenê herim

heyfa pismamê xwe. Birayê mezin Qor Mistefa bi vê yekê razî nabe, dibêje daweta bi hev re xweş e, tu hîna jî xeşim î, te serê xeta simbêla niha rast kiriye, em ê bi hev re herin û kodika vala li a tije xînin, ya em ê bidin yan jî bistînin. Hersê bira hazirîya xwe dikin, bi hespên xwe re dibin cot. Yek jî wan şêr e, yek Ezraîl e û yek jî dibe birakê Melkemot. Dimeşin. Ew têne derdora Golên Geniyan, di Şingalê di nava bajêr re bixwe derbas dibin. Di Xirbê Xezala, Xanê Dimdim û Şûva Reşan re xwe diqevêzin. Li ser Bîra Şerefdinê zerikek av vedixwin, hêdî hêdî dikevin nava Çiyayên Reş, Çiyayên Yezîdîyan. Ew gavekê ji nasekinin heta ku gîhan bin konê kirîvê xwe Hiseynê Dobelên. Hiseynê Dobelên xwarina wana li qorziya kon li ber wan danî, boqê simbelên wî li defa sênga wî diketin, yek bi yek dîrok û çîroka Seyrê ji wan re got. Konê Îskanê Gulîxanê raserî konê Hiseynê Dobelên bû. Hersê bira piştî xwarinê bi hev re derdikevin nava konan. Qor Silêman dikeve pêşîya herdu bîrayên xwe. Nahêle ku ew ji cihê xwe bilebitin. Ji wan re dibêje ku kuştina Îskanê Gulîxan bi deste min e. Ew dûra wekî mêvanekî bi zilaman re diçe oda Îskanê Gulîxan, li nava şekalan di bin reşayiyê de rûdine. Li odê nêzika sedûpencî zilamî kom bûne. Li nivê odê yekî wekî qedenakî Rusan li ser doşekê rûniştiye. Ji wî û pêde di nava sedûpencî zilamî de, kes ne diaxivî. Tibabeke wext derbas bû. Xortek ji civatê ji Îskanê Gulîxanê re pîrsa kuştina Eliyê Mamed û Seyrê dike. Ma ka çi bi Seyrê hat dibêje? Îskan ji nişkekî ve radibe ser xwe û helk helk pêdikeve. Çixarekê pêdixê û dire seriyê vî alî û wî alî odê, dibêje min bîzorê ew jibîra kiribû, te dîsa kire kul û keser û ew xiste ser dilê min. Qor Silêman îca îskan nas dike. Piştî tibabekî, îca hêdî hêdî odê yeko yeko, dido dido, sisê sisê, çaro çaro belav dibe. Iskan û sê çar xulam tenê dimînin. Xulamek diçe aliyê malê, beniyekî ji van hejîrên Çiyayên Şingalê, hejîrên spî ku weke qama zilamekî ne, tîne odê. Ew fêkiye xwe dixwin. Dûra xulamek li pêş û yek jî li baş didin dûv Îskanê Gulîxan û derbasî aliyê malê dibin. Qor Silêman sûnd dixwe û dibêje; ewî çawa pismamê min di ber sênga xuşka min de kuştibe, ez ê jî wîna di xew de wilo bikujim. Bi dizî û bi qelavizî xwe digîhîne bin çîta Îskanê Gulîxanê û li pişt çîtê disekine. Piştî ku gavekî wext bihurî xir xir bi qirîka Iskanê Gulîxanê dikeve. Ertfiyeke Misrî di destê Qor Silêman de ye. Ertfiya wî tûj e wekî şûjin û derziyê, heta nêviyê etfiyê bi jehra Silêmanî kelandiyê. Qor Silêman xwe bi sivikayî dibêje çip û xwe davêje aliyê hindurê çîta wî. Dibîne ku Îskanê Gulîxanê di navbêna herdu pîrekên xwe de raketiye. Diçe hêdika li ber serê wî disekine, xwe bi ser de daqûl dike, bi temberîka wî digire û dibêje xirp, serê wî di xewê de jêdike. Qor Silêman radihêje serê wî û li ber qorziya çîtê disekine. Îskanê Gulîxanê wekî kewê ku mirov serê wî jêke, diperpîte. Li bin çîtê wî jî îca dibe he-

war û qêrîn... Qor Silêman ji bin çîtê derdikeve, 'bi kêf û eşq tê cem birayên xwe, serê Îskanê Gulxanê wekî kundirekî xerabe, li ber herdu birayan li erdê dixîne. Birayê mezin Qor Mistefa bangî eşîrê dike; Heyhat, em birayên Seyrê ne, em pisma-mên Eliyê Mamed in. Em ji welatê Hesenan û Heyderan hatin heyfa wî ye. Me serê Îskanê Gulxanê jêkir bi guharê Heyderiye. Binêrin dijmin hebûn li dora wî ye. Hey lawo bela kes neke zena tu kesî ye. Me îro bi tenê hatiye heyfa xwe hilaniye. Ewê ku dixwaze vê yekê bi xwe nexweş werîne, fermo meydana şûrqêlaşa aha va ye! Deng ji kesî dernakeve û dûra jî gelek dibêjin; heqê wî gawirî bû!

Hersê bira bi hev re tenê binê konê Hiseynê Dobelên, ew jî yek bi yek rûwê wana maçî dike, daweta esas a wî bixwe ye. Ji ber ku Hiseynê Dobelên ewê dîsa bibe mezinê hemû eşîrê. Hersê bira ji kirîvê xwe xatir dixwazin, hersê lawên Hiseynê Dobelên bi wan re siwar dibin û berê xwe didin biniya Geliyê Kersê, Geliyê Dudê û Geliyê Simoqê. Dibêjin; aha li vê derê me Seyrê danibû, hûn dikarin pirsra wê ji binê konê Snoqê Şemerî bikin. Herdu birayên mezin li pêş in û Qor Silêman jî li paşiyê dimeşin. Ji bona destavê Qor Silêman hinekî li paş maye. Ew hêdî hêdî nêzîka hersê geliyan dibin. Qor Silêman li Seyrê difikirê û diponije. Ji nişkekê ve dengê dibihîze, ew dora xwe saxtî dike, reşekî li ber deriyê şikeftê dibîne. Ber bi reş de diçe, reş ji diçe paşiya şikeftê. Qor Silêman û Reş li ber hevdu didin, heger mûm e heger fener e pêdixin, wextê ku ew hevdu dibînin qêrîna wana digihêje ezmanê hefta. Seyrê û Qor Silêman hevdu himbêz dikin... Seyrê dîsa dibêje û dibilîne; li min Seyrê li min nemayê...

Seyrê dibêje keko min nebe nava însana. Lê Qor Silêman hema Seyrê wê gavê li pişt xwe siwar dike û dimeşe. Nêzikayî li herdu birayên xwe dike. Ew dibînin ku qîzek li ser piştê hespa Qor Silêman e. Dîsa qerfê xwe pêdikin. Dibêjin me nizanî bû te wilo zû dil têkevî qîzikên Yezîdiyan! Lê wexta ku ew baş nêzikî hevdu dibin, dinêrin ku ew qîz xuha wan Seyrê ye! Qêrîn bi hemûyan dikeve... Hersê bira raya xwe dikin yek û qewlê xwe jî bi hev re dikin; ewê ku tiliya xwe bi neqencî bi Seyrê veke, ewê ji nav lepên me xelas nebe. Emê canê xwe fedayê canê Seyrê bikin. Seyrê jî ji biraye xwe yê biçûk re, ango ji Qor Silêman re, dibêje ku ez dixwazim hergav li cem te bimînim. Heta ku tu sê û çar jina jî bînî, ez dixwazim ku ez bindara biraye xwe bim. Qor Silêman jî li Seyrê vedigerine; heta ku tu jî zewaca mêra nexwazî, zewaca jinan li min jî haram be. Qor Silêman, Seyrê, Qor Mistefa û Qor Qasim didin dûv hevdu û berê xwe, giran giran didin nava welatê Hesenan û Heyderan." □

Dewama wê di hejmeta bê de

HERE DERA DILÊ TE TE DIBIYÊ

SUSANNA TAMARO

Opînîstîna, 16ê Çiriya Paşîn 1992



Susanna Tamaro bi romana xwe "Here dera dilê te te dibiye" bû nivîskareke cihani

Ev serê du mehan e ku tu te rê de gotibû ez hîn dijîm û pê ve min ji te tu xeber negirtîye. Vêse, li bexçe ez li ber dara te ya gulê demeke dût û dirêj rawestiyam. Li gel ku payiz gelekî derbas bûye jî, lê ew di nav nebatên din yê çilmisê de bi wî rengê xwe yê binefşî bi şiklekî qurre û tenê hîn li pê sekiniye. Ma tê bîra te me ew kînga çandibû? Tu deh salî bû û te *Prensê Biçûk* hîn nuh xwendibû.

Min ew kitêb ji te re wek diyariya sinifderbasbûnê kiribû. Kêfa te pîrr ji çîrokê re hatibû. Bêtir jî te ji gulê û ji rûvî hezkiribû. Te ji dara babab, ji mar, ji pîlot ya jî ji wan însanên basît û jixwerazî

ku di planetên xwe yê biçûk de tiral tiral rûniştibûn qet heznekiribû. Dawiyê sibakê gava me xurniya xwe dikir, te wiha got: Ez gulekê dixwazim. Gava min got ji xwe berê gulên me pîrr in, te gotibû: Ez gulekê dixwazim ku divê tenê ya min be.

Ez dixwazim li wê binêrim û wê mezin bikim. Helbet bêyî gulê te rûviyek jî dixwest. Bi konetiyeke mexsûsî zarokan te daxwaza xwe ya mumkûn, berî ya ku meriv qet nikanibe bi cî bîne anîbû zimên. Piştî ku min soza gulê dabû te, minê ê çawa bikanîbûya tu bê rûvî bihîştâ? Me gelek munaqêşe kir û dawiya dawî li ser kirîna kûçikekî me li hev kir. Şeva berî ku em herin wî bînin saniyakê jî xew neket çavê te. Ji serê nîv seetê carê te li deriyê min dixist û digot: Ez nikanim rakevim. Roja din seet di heftê sibê de tew te xurniya xwe kiribû, xwe şuştibû û kincên xwe jî li te xwe kiribû. Qapûtê te li navpiyê te, li ser palkursiyê tu li bende min bû. Seet di heşt û nîvan de em li ber deriyê çiffliga kûçikan bûn. Li wir li kûçikên berdayî û bêxwedî mêze dikirin. Lê hîn venebûbû. Te di nabêna caxan re nêrî û digot: Ezêê çawa bizanîbim kîjan yê min e? Di dengê te de bêsebrîyek muthîş hebû. Min tu saktî dikir, digot: Merirse, ma nayê bîra te Prensê Biçûk rûviyê xwe çawa kedî kiribû.

Em sê rojan li ser hev çûn çiffliga kûçikan. Di hundur de ji dused kûçikî zêdetir hebûn û te dixwest ku tu gişan jî bibînî. Tu li ber her qefesê bi hawakî bê libat di-sekinî û diket nav xem û xeyalan. Di vê nabênê de kûçikan xwe holî ser têlan dikirin, diewtiyan, didan çindikan û dixwestin bi pençên xwe têlan biqetînin. Xanima mesûla çiffligê jî li ba me bû. Qey ji wê wendê tu jî keçikeke wek her keçikê yî, lema jî ji bo ku kêfa te bîne kûçikên herî baş nîşanî te dida. Ji te re digot: Hela li vî cokerî binêre. Ya jî tu ji vî lassî re çî dibêjî? Wek bersîv te dengêkî wek uêrîna berêz derdixist û bêyî ku tu li wê guhdarî bikî tu dimeşiya.

Di roja sêyemîn ya van seferan de ku dişibiya meşa hecîyan ya ezîyetê em rastî Buck hatin. Ji qefesên dawî ew di nav yekê de bû, di wir de li kûçikên nexweş û birîndar mêze dikirin. Çaxa em çûn ber qefesê ew jî wek hemû kûçikên din ber bi me reviya û bêyî ku serê xwe jî rake ji cîyê xwe nelîviya. Tu qîriya û te got: A ev. Te bi tiliya xwe ew îşaret kir û te got: A ez vî kûçikî dixwazim. Ma ew mit û matmayîna jinikê tê bîra te? Wê fahm nedikir ku tu çawa dikanî bixwazî bibe xwediya vî kûçikê pîsik. Erê Buck kûçikekî biçûk bû, lê wî di wê biçûkayiya xwe de hema hema xusûsiyetên hemû cînsên dunyayê civandibû. Serê wî wek yê gur bû, guhên wî nermok û şelteyî wek yên kûçikên nêçîrê, çîpên wî ziravokî wek çîpên bonciyan, dêla wî wek ya collîn bi pirç û pûrta wî jî wek ya doberman reş û dûz bû. Di rê de, çaxa em diçûn buroyê ji bo ku kaxetan îmze bikin, xatûna mesûl ji me re çîroka Buck got. Di destpêka havînê de yekî ew ji erebeyêke bi suret diçû avêtibû. Ji ber ku bi hêl li erdê ketibû pirr giran birîndar bûbû, lema jî nîgekî wî yê dawî bi hawakî bê ruh li ba dibû.

Buck nuha li kêleka min ketiye. Çaxa ez dinivîsînim ew jî car carna keseran dik-
şîne û serê pozê xwe nêzî nigê min dike. Poz û guhên wî hema hema sipî bûne. Ji
demekê vir de ye perdeyek mexsûsî kûçikên mezin girtiye ser çavên wî. Gava ez li
wî dinêrim kovanek min digre. Bi min wiha tê fena ku perçeyek ji te li kêleka min
be, perçê ku ez herî bêtir jê hez dikim, ew perçê te yê ku berî nuha bi salan, di nav
dused ruhên bêxwedî de dizanîbû yê herî bêteşe û bextreş hîlbijêre.

Bi mehan, gava ku ez di nav tenêtiya malê de hema wer li dora xwe diçûm û di-
hatim, ew nelihevkirin û dilmanên ji wan salên ku me bi hev re buhurandibûn
mabûn wenda bûn. Tiştên di bîra min de mane bîranînên wan salên ku tu keçike-
ke biçûk ya tirsok û zûxeydok e. Ez van rêzan ji wê re dinivîsînim, ne ji qurre şerû-
da van demên dawî re. Ev pêşniyar gulê ji min re anî. Vêşê gava ez di ber wê re bi-
hurîm, ji min re wiha got: Here kaxet û qelemê bigre û jê re mektûbekê binivîsîne.
Ez dizanim, li gor peymanê me ya dema ku em ji hev qetyabûn divê me ji hev re
nenivîsanda. Ez vê yekê bi hawakî bêdilî qebûl dikim. Ev rêzên min ewê bi tu hawî
nefirin û neyên li Emerîka nekevin destê te. Di dema veqera te de ku ez ne li vir
bim, di dêlî min ve ewê van mektûbên min li bende te bin. Ma ji bo çi ez wiha di-
bêjim? Ji ber ku berî nuha kêma zêde bi mehekê, di jiyana xwe de cara pêşî ez wiha
pirr nexweş diketim. Ji ber vê yekê jî li gel gelek ihtîmalan, ihtîmalek jî ew e ku piş-
tî şeş ya jî heft mehan ez ê ne li vir bim ku derî li te vekim û te himêz bikim. Wex-
tekê hevaleka min ji min re gotibû, kesên ku berê qet nexweş neketibin tehamulî
nexweşiyêke ji nişka ve û bi şiddet nakin. Ya min jî tam wiha bû. Sibakê gava min
dara gulê av dida ji nişka ve te digot qey yekî ronahî vemirand. Heger jina birêz
Razman ji nabêna çîten ku bexçê me ji hev diqetîne ez nedîta ma, ez bawer dikim
ku nuha tu sêwî mabû. Sêwî? Ma gava dapîra meriv bimre meriv wiha dibêje? Ez
bawer nakim. Dibe ku kalik û pîrik wek hin tiştên aksesuar bin, lema jî ji bo ku
meriv wendabûna wan binav bike tu gotinek taybetî tune. Meriv bi mirina kalik
û pîrika xwe ne sêwî dimîne û ne jî bî. Meriv wan li dereke riya dirêj bi şikleki tabî
li pey xwe dihêle, wek ku meriv ji mujûlî şemsiya xwe ji bîr bike wan jî ji bîr dike.

Gava li nexweşxanê ez bi xwe hesiyam qet tiştek nedihat bîra min. Berî ku ez çav-
vên xwe vekim, min digot qey simêlekî dirêj û nerm bi min ve çêbûye eyn wek ya
pisikê. Lê min çer çavên xwe vckir, min fêm kir ku ew du xortimên plastîk in; di
pozê min re derketibûn û di ser lêva min re xwe berra jêr dabûn. Li der û dora min
gelek makînen ecêb hebûn. Piştî çend rojan ciyê min birin odeyêke normal, li vir
du kesên din jî hebûn. Rojekê piştî nîvro, çaxa hîn ez li wir bûm birêz Razman û
jina wî hatin ziyareta min. Razman ji min re got: Hûn vê jîna xwe deyndarî kûçikê

xwe ne, şikir bike ku ew wek dînekî di ewtiya.

Piştî demekê êdî ez dikanîbûm rabûma ser xwe, rojekê tuxtorekî xort hat odê, min ew di wîzîteyên berê de dîtibû. Kursiyak girt û li kêleka min rûnişt. Ji min re got: Piştî ku merivên we yê ku ewê kanibin li we mêzekin û li ser navê we biryarê bidin tunene, lema jî ez ê raste rast û bi samîmiyet bi we re bipeyivim. Ew dipeyivî, dema ew dipeyivî erê min lê mêze dikir, lê min lê guhdarî nedikir. Lêvên wî ziravokî bûn û tu dizanî ku min tu carî ji merivên lêvzirav heznekiriye. Li gor wî rewşa min hewqas xerab bû ku, ewê nikanîbûya îzin bida ku ez biçûyama malê. Wî navê du sê pansiyonên ku ez dikanîbûm li wan bimama ji min re got. Qey ewê ji murûzê min tiştek fêm kiribe ku, tavilê ev jî lê zêde kir: Vana ne wek xaniyên kalûpîran yê berê ne, nuha her tişt bi hawakî din e. Nuha odeyên wan ronî û modern in, ji bo ku meriv ji xwe re bigere bexçeyên wan hene. Min jê re got: Tixtor, ma tu eskimoyan nas dikî? Got: Helbet ez nas dikim û dûre jî rabû ser xwe. Min got: Baş e, a ez jî dixwazim wek wan bimrim. Gava min dît ku wî tiştek fêm nekir, min lê zêde kir: Di dêlî ku ez ê di odeyeke dîwarsipî de, di nav nivînan de saleke din jî bijîm, çêtir e ku ez di nav kundirên bexçê xwe de bi dev û ruyan bikevim û bimrim. Di wê nabênê de tixtor gihîştibû ber derî jî. Bi zindiqî dimizicî. Berî ku ji odê derkeve got: Gelek wiha dibêjin. Lê ji bo ku tedawî bibin di deqîqeya dawî de bazdidin vir, wek pela spîndarê dilerizin û ji me reca dikin ku em wan zû derman bikin.

Piştî sê rojan min wesîqeyê ku meriv pê bikene îmze kir, di wir de ez dibêjim heger ez bimrim ji mirina xwe ez mesûl im. Min ev wesîqe da hemşîreyêke ciwan a serbiçûk û cotek guharên zêr yê tu dibê ecêb di guhan de û dûre jî min hûrik mûrikên xwe yê biçûk xistin torbaki naylor û min berê xwe da pageha texsiyê.

Buck çer ez li ber deriyê bexçe dîtîm wek dîna li dora xwe da çirvîtan. Dûre ji bo ku kêfxweşiya xwe hîn baştir nişan bide, bi xeyretkêşî ewtiya û sê ya jî çar şitlên gulê pelixandin. Vê carê qet ji dilê min nehat ku ez pê de bixeyidim. Bi pozê xwe yê bi heriya sor hat ba min. Min jê re got: Hevalê kevn, te dît? Vaye em dîsa bi hev re ne. Min wiha got û belka guhê wî xurand.

Rojên din min hema hema qet tiştek nekir. Ji wê ketinê û virde aliyê min yê çepê wek berê gurra min nake. Bi taybetî jî destê min pirr giran bûye. Ji ber ku ez ji serkeftina wî pirr hêrs dibim, lema jî heta ku ji min tê ez wî ji destê xwe yê rastê bêtir dixebitînim. Min şarîkek sor li qirpika destê xwe gerandiye, ji bo ku çî cara ez bixwazim tiştekî rakim, bê bîra min ku divê ji dêlî destê xwe yê rastê ez destê xwe yê çepê bi kar bînim. Heta ku laşê meriv li gor lazimiyê fonksiyona xwe bi cî tîne meriv nizane ku ew dikane bibe dijminekî çawa; lê heger meriv yek saniyê jî dev ji

mucadelê berde, meriv wenda kiriyê.

Axir, ji ber dijiwariyên min yê fizîkî min nifteyek jî da jina Walter. Ew her sibe riya xwe bi min dixê û hemû hewcedariyên min temîn dike.

Çaxa ez ji xwe re di nava malê û bejçe de hema wer diherim û tîm, fikara li te qet ji min naqete û şiklekî sabit girtiye. Gelek caran ez çûm ser telefonê û min rahîşt ahîzê ku ji te re têlgrafekê bişinîm. Lê her carê jî berî ku santral dengê min bibihîze min biryara xwe duguherand. Varan gava ez li ser palkursiya xwe rûdiniştîm, -li hember min valayî û li dor min jî bêdengî- min ji xwe re digot gelo ewê kîjan hîn baştir bûya. Bêguman ne ji bo min, ji bo te ewê çî baştir bûya... Ji bo min helbet ewê gelekî xweş bûya ku dema ez mirim tu li kêlek min bûya. Ez bawer dikim, heger min ji nexweşiya xwe tu agahdar bikira, te yê di cî de dev ji seyhara xwe ya Emerîka berda û tu ê bi lez vejeriya vir. Ya dû re? Dû re dibe ku ez sê çar salên din jî bijiyama, belkî jî li kursiya bi teker bihesiliya ma, dibe ku jî bixirifiya ma û te ê jî mêzekerina li min li ser xwe wek wezîfeyekê bidîta. Teêyê ev bi dil û can bikira, lê bi demê re wê hêrs û kîndariyê dewsa vê dildariyê bigirta. Tu ê kîndar bibûya, ji ber ku ewê sal biboriyana û te ê xortaniya xwe belasebeb heder bikira. Hezkerina te ewê jiyana te mecbûrî kuçeyêke bêveger bikira. A dengê hundurê min yê ku nedixwest telefonêke bide te ji min re wiha digot. Gava min biryara xwe dida ku ew rast dibêje, di şîûrê min de dengêkî din xwe nîşan dida. Min ji xwe ev tişt dipirsî: Ya gava ku te derî vekira û di dêlî min û Buckê ku ji kêfa dida lotikan, xaniyekî ku ji demekê virde vik û vala û bêxwedî bidîta, te ê çî bikira? Ma çî dikane ji vegereke ku negîhîje armanca xwe hîn xerabtir be? Ya jî dema te bi têlgrafekê xebere mirina bigirta, ma te ê viya wek îxanetekê qebûl nekira? Ya jî wek cezakê? Fena ku ez heyfa xwe ji te bigrim, bibêjim, ji ber ku di van mehên dawî de te li hember min bê hurmetî dikir, lema jî ez wiha diçim û xeberê nadim te. Evê bihata wê maneyê min bi yek derbê tu di zêrzemiyekê werdikir û ez bawer dikim piştî ketinêke wiha jî berde wamiya jiyane hema hema ne mumkûn e. Her tiştê ku te dixwest bi dapîra xwe ya xoşewîst re bipeyivya ewê heta û heta di dilê te de bimana. Ewê di bin axê de ye û tu, tu carî nikanî li nav çavên wê binêrî, wê himêz bikî ya jî hemû tiştên ku te jê re negotibûn jê re bibêjî.

Roj derbas dibûn û min jî nikanîbû tu biryar bigirta. Lê piştî, vêsê gulê ev pêşniyar anî. Gor: Jê re mekrûbekê binivîsîne, rojaneyêke biçûk ku kanibe jê re bibe heval. Û nuha vaye ez li mitpaxê rûniştîme, defterêke te ya kevn li ber min e û wek zarokeke ku di çêkirina dersên xwe de dijiwariyê bikîsîne ez serê qelema xwe dikurîsînîm. Ma ev wesiyetnameyêke? Na, ne bi temamî, ji wê wêdetir tiştêkî ku ewê ka-

nibe bi salan bide pê te û dema ku tu bixwazî min li nêzî xwe hîs bikî tu ê bikanîbî derxî û bixînî. Metirse. Ez ne dixwazim wazê bidim te û ne jî te xemgîn bikim, tenê dixwazim bi wê samîmîyeta ku demekê em herdu rapêçabûn, lê di van salên dawî de wenda bû bi te re hinekî têkevîm şêwr û mişêwrî. Ji ber ku min pirr emir kiriye û gelek kesên nêzî xwe wenda kirine, lema jî nuha ez dizanim ku ji mirina wan bêtir, ew gotinên ku me tu carî nikanîbû jî hev re bigora kederê dide meriv.

Tu dizanî, ez di salên xwe yên wiha de ji te re bûm dê, ku di wan salan de meriv tenê dikanîbû bibûya pîrik. Gelek feydeyên wê çêbûn. Feyda wê gihîşt te, çimkî pîrikek hertim ji diyekê nermtir û bi dîqettir e. Feyda wê gihîşt min, çimkî min jî wek kesên di salên xwe de wexta xwe ya piştî nivro li qulûbê bi lîstika destek kanasta, bi tembelî neborand. Di dêlî wê ve min ji nuh ve xwe fêrî anafora jiyane kir. Lê belê di nuxtakê de ji nişkave hin tişt qetiyar. Çewtî ne ji min û ne jî ji te bû, tenê qanûnên xwezayê wiha bûn.

Zarokî û kal û pîrî dişibin hev. Di her du rewşan de jî, ji ber sebebên cihê, meriv bê parastin e. Meriv hîn ya jî êdî ne perçeyek jiyana aktîv e; ev jî rê dide ku meriv dikane bê pêşîn hukimî û ji hemû qaîdeyên ku ji berê de hatine tespîtkirin azad bijî. Di wexta jiyana meriv ya balixiyê de zirxêke nayê xuyakirin bi rengê hêdî, lê saxdem li dora bedena meriv tê meydanê. Ev zirx di vê demê de çê dibe û dûre jî di seranserê jiyana me ya mayî de her ku diçe qalindtir dibe. Prosesa mezinbûna wê dişibe ya mirariyê. Birîna wê çuqasî mezin û kûr be, zirxa li dor wê jî hewqasî saxlemtir dibe. Lê li gel vê jî zirx bi wextê re kevn dibe. Ew jî wek qatek kinc, gava demeke dirêj tê lixwekirin ji dera xwe ya herî bêtir tê bikaranîn kevn dibe, dibîşkive û carekê çaxa zor têyê diqete. Wek prensîp tu qet tiştêkî ferq nakî. Tu wiha bawer dikî ku zirx hîn baş te diparêze, lê rojek tê ji ber tiştêkî pirr bêmane, ji nişkave tu jî wek zarokêkî dest bi girî dikî. Çaxa ez dibêjim di navbêna min û te de ferqeke xwezayî çê bûye, qesta min ev yek e. Çaxa zirxa te dest bi çêbûnê kir, ya min ji zûde zîvêl zîvêlî bûbû jî. Te tehamulî hêsirên çavên min û min jî tehamulî dilhişkiya te nedikir. Her çuqas min xwe amade kiribû ku ewê di salên te yên balixiyê de cira te biguhre jî, lê gava ev guherandin hat meydanê bi min gelek zahmet hat ku ez wê qebûl bikim. Ji nişkave meriveka nuh li hember min bû û min nizanîbû ku ez ê li hember vê merivê çawa herket bikim. Varan, çaxa ez di nav nivînan de li ser fikarên xwe hûr dibûm, guherînên li ba te dilşadî dida min. Min ji xwe re digot, ew kesê ku di salên xortaniya xwe de zirarê nebîne tu carî nabe însanekî mezin yê temam. Lê gava bû sibe û te cara pêşî wê rojê derî li ruyê min xist, bira te bizanîbûya ku ez çuqasî pê êşiyabûm! Min tenê dixwest ez bigrîm. Ew hêza ku ez ê kanibim bi

wê li hember te serî hildim min li ba xwe nedî. Çaxa tu bû heystê salî, tu ê jî bibînî ku meriv di vî temenî de xwe di meha Îlonê de wek pelekê de his dike. Ronahiya rojê kintir dajo û dar hêdî hêdî maddeyên ku hewcedariya wê pê heye berbî xwe dikşîne. Kok ji nuh ve azotê, klorofîlê û proteînê dimije û bi vî hawî ne hişinayî dimîne û ne jî zindîtî. Meriv bi guliyekê ve li ba dibe, lê meriv dizane ku meriv li ber ketinê ye. Pelên li der û dorê yek bi yek diweşin. Meriv li weşana wan temaşe dike û tim di nav wê tirsê de ye ku ba ewê nuha dest pê bike. Ji bo min ba tu bû, tu û çustiya xortaniya te bû. Ma vê yekê qet bala te kişand delala min? Jiyana me herduyan jî li ser darekê derbas bû, lê di demsalên wiha cihê de ku!

Roja tu çû tê bîra min. Em herdu jî çuqas bi heyecan bûn ne wiha! Te qebûl nekir ku ez bi te re werim balafirgehê û her cara ku min tişteki ku divê te bi xwe re bibira bi bîra te dixist, te digot: Ez diçim Emerîka, naçim çolê. Gava ez li ber derî sekinîm û bi wî dengê xwe yê tîz û ne delal li pê te qîriyam û min got: Baş li xwe miqate be!, bêyî ku tu berê xwe bi min de kê te got: Li Buck û gulê baş binêre.

Ev rengê xatirxwestina te wê çaxê ez hinekî mit û mat hiştibûm. Wek pîreke diltenik min tişteki hîn cihê, maçek ya jî gotinek dilovan ji te dîpa. Lê gava bi şev xew neket çavê min û ez bi ber tena kerasê raketinê ve di hundur xaniyê vala de wer diçûm û dihatim, min fêm kir ku ha min li Buck û li gulê mêzekiriye û ha jî li wî perçê te yê dilgeş yê li ba min dijî baş mêzekiriye, di nabêna wan de qet ferqek tune. Û ez tê gihîştim ku sebebê wê xatirxaziya te ya sar ne ji ber bêhisîyê bû, xwe-ragirtina keseka li ber girî bû. Yanî ew zirxa ku min ji te re berê qal kiribû. Ya te nuha hewqasî tengê ku hema hema tu nikanî bîna xwe bigrî. Ma tê bîra te min di van demên dawî de ji te re çi digot? Hêsirên neherikin di dil de kom dibin, bi derbasbûna wextê re qalik girê didin, çawa ku kils makîna kinca dixetimîne, nahêle bixebite, ew jî dil dixetimînin û felc dikin.

Ez dizanim, numûneyên min yên ji cîhana mitpaxê ji ken bêtir ewê te biqherînin. Lê divê tu qebûl bikî ku her kes îlhama xwe ji cîhana ku baş nas dike digre.

Nuha ez mecbûr im ku terka te bikim. Buck keseran dikşîne û bi çavên bergerê li min dinêre. Ew jî dûzana xwezayê qebûl dike. Ew di her demsalê de bi deqîqîya seereke Siwîsrî dizane ku wexta xwarina wî kînga ye. □

Wergera ji swêdî: **ZINARÉ XAMO**

Romana *Here dera dilê te te dibiyê* wê mîna pirtûk di nava weşanên Nûdemê de derkeve

WEKHEVIYA JIN Û MÊRAN DI CIVATÊ DE



ŞAHÎNE BEKIRÊ SOREKLÎ

Ji salan û vir de ye ku di rojname û kovarên kurdî de salê carekê behsa jinan û mafên wan tête kirin. Sal bi sal di heyva adarê de Roja Navneteweyî ya Jî-nên Cîhanê ji aliyê rêxistin û dezgehine welatên Roj-helata Navîn de tête "pîrozkirin." Wekî diyar e, ra-mana "mafên jinan" ji welatên rojavayî hatiye der û biryara Koma Neteweyên Yekgirtî ku salê rojê wek Roja Navneteweyî ya Jinan bi nav bike, bi bûyereke li Dewletên Yekgirtî yê Emerîka hatibû meydanê pey-wendiya wê heye. Wek tête dîtîn, di rojên îroyîn de di nav civatên van welatan bi xwe de hemahema çî şopên bîrhanîna vê rojê nemane. Roja Jinan bêtir li welatên ku wek welatên cîhana sêyem têyên binavkirin maye, ew jî zêde di nav rêxistinên xwe çep dizanin de û bi şêweyêke rotînî.

Dema behsa "mafên jinan" tête kirin, gelo mebest çî ye? Di nav civateke paş mayî de, yan di nav civatên ku tê de ol, erf û tore rolên mezin dilîzin, bersîva pîrsa: "mafên jinan çî xwebêjê dide?" gellekî dirêj û kûr dibe. Lê eger mirov li gor mentiq bîponije bersîva vê pîrsê dikare bi kurtî wisa bête dayîn: Hemû mirov layiqî eynî mafa ne. Ji ber ku jin û peya herdu jî mirov in, ew layiqê eynî mafa ne. Lê dayîna bersîveke wisa bi gotinê hêsa ye û bi kirinê dijwar e. Çima dijwar e? Dijwar e ji ber ku rola jinê di civatekê de ne wek rola wê ya di civateke din de ye. Dijwar e ji ber ku baweriyên olî û erf û toreyên civakî ji bo bersîvdana vê pîrsê roleke mezin dile-

yizin. Li milê din, mafên jin û peyan di nav civatekê de bi proseseke dîrokî ve girêdayî ye ku ev jî bi sedan, dibe ku bi hezaran sal paş dihere.

Di rastiye de civatek wek mirovekî bi du destan e: destek jin e, ye din peya ye. Divêt her du dest ji bo berjewendiyên hevbeş, ji bo amadekirina nîfşê nû û ji bo pêşeroja endamên civatê bi ittîfaq li gel hev kar bikin. Lê li vir divêt mirov pirseke girîng bi bîr bîne: her civat bi eynî çavî li wekheviya jin û mêran nanihêre. Di nav hindêk civatan de karê jinê li mal e: Lênerîn û xwedîkirina zarokan e, amadekirina xwarinê ye, şuştina kinc û cilan e û hwd. Bê guman yek ji sedemên vê dîtîne ew e ku di demên raberdû de yên pere û xwarin peyda dikirin her peya bûn. Lê di nav civatine îroj de, bi taybetî li bajarên mezin, dema ku jin jî dest bi kar dike, dîtina ku şûna jinê li mal e nema dikare cîhê xwe bigire. Li vir rolên jin û peyan li nav hev dikevin û kirîzên malbatî dikarin dest pê bikin, heger mêr dest ji dîtînen adetî bernede (wek mînak, heger mêr hîn ji jina xwe bipê ku ji wî û ji zarokan re xwarinê amade bike, kincên wan bişo û otî bike, hundir malê paqîş bike...bêyî ku biçê alîkariya wê; û bixwaze ku jina wî tevdiira xerckirina peran bi tevahî bi dest wî ve berde, li gel ku jin jî wek wî diçe kar û wek wî peran bi dest dixê). Bivêt nevêt, bi derbasbûna demê re erf û tore jî dest bi guhertîne dikin. Tecrûbeyaya civatên rojavayî di vî warî de vê yekê piştrast dikin (hindêk kes wisa bawer in ku erf û toreya civatên rojavayî her wek xwe bûne. Di rastiye de ne wisa ye. Gelek ji erf û toreya civatên rojavayî de jî hebûne).

Di nav civatên pêşketî de heye ku nema hewcedarî ji bo rêxistinên jinan hebe, ji ber ku di nav van civatan de bizav tête kirin ku jin û mêr li gel hev beşdarên birêvebirina civatê û welêt bibin. Bi gotineke din, hebûna rêxistinên cuda ji bo jinan û mêran dikare bi serê xwe wek îspateke newekhevbûna wan bête hesabandin. Li welatên ku di navbera jin û peyê de bi rastî wekhevî heye, qanûn mafên herduyan jî diparêze, herdu li pêş qanûnê yek in. Di rêxistinên siyasî û civakî de jî ew xwediyên eynî mafan û eynî pêwîstiyên in.

Li welatên Rojhelata Navîn rewşa jinan nayê guhertin heger jin bi xwe wekheviye nexwaze. Lê li milê din, ji bo bidestxistina mafê wekheviya tevahî û daxwaza wî mafî rewşeke alîkar divêt. Di nav civateke gundî de ku fersendên di dest jinan de bi sînor in, ku jin nikare wek mêr biçê xwendegêhê, wek wî karekî bi dest xe, wek wî serbest be, guman nîne ku hevgirtin û têkoşîna jinan ji bo wekheviyê dê dijwar be. Ev rewş tarîtir û diwartir dibe dema rêxistinên olî bi navê xwedê bawerî û dîtînen xwe li ser jinê feriz dikin. Wek nimûne, li Cezayir û li hin bajarên mistê keç û jin

tên kuştin ji ber ku wan serên xwe li gor daxwaza rêxistinên olî girê nedane.

Li ser kaxezê, yan di munaqeseyên devkî de, dibe ku pirsra wekhevîya jin û mêr wek tiştêkî hêsan bête ber çav, lê di rastiyê de ev pirs yek ji diwartirîn pirsan e.

Baş e, li welatekî wek Kurdistanê ku bi kêmasî ji % 80 jinan nexwende ne, ola îslamê, eşîrtî û erf û toreyên kevnar hîn roleke mezin dileyizin û kar ji bo jinan hemahema tenya li mal heye, yanî di civateke wisa de jin ewê çawa bikaribe wekhevîyê bixwaze, yan jî heta haydara mafê wekhevîyê be?! Gelo li welatên wek Kurdsitanê rêxistinên jinan ku endamên wan ji çend jinên bajarî pêk tên, ku ya di bin bandora siyaseta dewletê, ya jî di bin ya partiyekê de ne, heta çi radeyê dikarin bi ser kevin? Û ji bo jinên civateke wisa, gelo ewê mafê me hebe ku em behsa mafên wan bikin? Gelo di nav rewş û mercên îroyîn de daxwaza wan bi xwe çî ye? Gelo ew mafên ku ji bo jinên australî, swêdî û emirikî hene, me maf heye ku em eynî mafan ji bo jina kurd ya li Kurdistanê jî bixwazin?! Jê bêtir, gelo her mêrê ku ji bo mêr jinê daxwaza wekhevîya tevahî dike, amade ye ku wê wekhevîyê ji bo xûşka xwe, yan jî ji bo jina xwe jî bix-



Wêne: Serhad Bapir

waze ?! Gelo sînorê wê wekhevîyê ji ku dest pê dîke û li ku kuta dibe ? Ya jî, ew wekhevîya em dixwazin gelo bêyî sînor e ?!

Hêjayî gotinê ye ku di rewşa îroyîn de di nav gelek civatên Rojhelara Navîn de mafên peyan jî bi sînor in. Cendirmeyek dikare bêyî sedem li mirovekî heqaretê bike û heta lêxe; leşgerêk dikare mirovekî bide ber gulleyên reşşa xwe; milîsên hukûmat û partiyan dikarin mirovan bi tawanên wek xiyaretê û casûstiyê bikujin. Belengazî, bêparmayîna ji xwendin û zanyariyê, erf û adetên curbicur, nakokî, pirsana namûsê û gelek tiştên din rola xwe dilîzin. Mirov dikare vê pirsê jî ji xwe bike: Peyayê ku bi xwe ne azad be, peyeyê ku bi xwe wekhevîyê hest neke, peyayê ku hevîrê wî di nav wehzên olî, erf û toreyên êlî û civateke ku tê de çê her têtê bikarhînin, ku tê de "zor zane, devê tîfinga mor zane" gotineke gelêrî ye..., gelo ev peya ewê bikaribe bawerîya xwe bi wekhevîya jinan û mêran bîne?!

Tew li welatêkî wek Kurdistanê ku ji hev beşbeş e, ku tê de hemahema her tişt bi siyaseta dewletan û ya partiyan ve girêdayî dimîne; ku tê de nexweşiyên civakî, gelşên hawîrdorî, bêkarî, nebûna xizmetên tenduristî, kêmkêde niximî mane, ku tê de her dewlet û partî û mezheba olî bizava mêtîşustîna xelkê dîke: Di civateke wisa de gelo ji bo wekhevîya jinê û mêr çî hevî hebe, dema ku mafên mirov: jin dibe, peya dibe, zaro dibe, li gor mercên di nav civateke bi şaristanî de hemahema ji holê wenda ne?! Gelo ewê çî mafê me hebe ku em hevîyên mezin ji cotkarekî nexwendê bikin ku li dereke wek Kurdistanê dimîne, dema li welatêkî wek Swêdê, yan Almaniyayê, yan Australiyayê yekî rojhelatnavînî bi salan li wir mabe, lê dîsa jî bikaribe xûşka xwe, jina xwe, yan jî dotmama xwe bikuje, ji ber ku ew li gor erf û adetên welatê eslî ranebûye û rûnenîştîye ?!

Di nav civateke wek ya kurdan de, berî ku behsa mafên jinê bête kirin, pêwîst e bête aşkerekirin ka mebest ji van mafan çî ye. Hindek kes mafên jinê bi rola wê ya di nav "siyasetê" ve girê didin lê beşdarbûna di karê siyasî de xwebêja wekhevîyê nade. Wek nimûne, li welatêkî wek Îrana îroj, heger jinek bibe seroka welêt jî mirov ê nikaribe bibêje ku li vî welatî wekhevîya jinan û peyan heye, çimkî ev jina serok, heger bixwaze jî, dê nikaribe li gor daxwaza dilê xwe kincan li xwe ke, dê nikaribe zewaca mêrekî bi du jinan re qedexe bike. Bi gorineke din, heger li welatêkî wisa jinek tew bibe serok jî, pîvanên olî û civakî dê rê nedin wekhevîya tevahî ya jin û mêr. Guhertina ji derve de jî xwebêja wekhevîyê nade. Jina ku kiras û xeftan û bervaneka xwe bi pantilonekî "jeans" dabe guhertin, yan tew di meşeke xwenêşandanê de jî cîh girtibe, gelo ewê gihîştibe mafên xwe? Jina ku ji derve de dibiriqe, dibe ku fermandarê li ser mêrê xwe be, gelo gihîştîye mafên xwe? Jina ku di

nav hefteyekê de ji gundekî çiyayî digihê Parisê û piştî sê salan li gel mêrê xwe û wênêkêşa vîdyo li gund vedigere, gelo gihîştîye wekhevîyê? Bêguman mirov nikare sedî sed bibêje erê. Ji aliyekî din ve, gotina ku di nav civatên rojavayî de wekhevîyê sedî sed heye jî ne rast e. Hinek tenya ji derve de wek "xwedan maf" tên dîtin. Di rastiye de ew mafên xwe bi kar naynin û hê jî xwe ji mêran biçûktir û nizimtir dibînin, yan tew wekhevîyê meraq nakin. Li milê din, di nav civata kurdî de hejmareke ji jinan heye ku xwe ji mêran kêmtir nabînin lê ji bo xatirê erf û adetên ji "usûlê" der naçin. Bêyî dirêjkirina gotarê, mebest li vir ev e: Ji bo ku jin bigihêje wekhevîya li gel mêr divê ew bi xwe vê yekê bixwaze, divê guhertineke berdewamî di nav tevahiya civatê de çê bigire. Di nav salên dema vê guhertinê de pêwîst e hemî tiştên xwe bi wekhevîya jinê û mêr ve peywendîgir dikin vekirî û bi şeweyên rêk û pêk tekevin munaqeseyê, ji mafê mulkiyetê bigir ta têkiliyên cinsî û pîrsa namûsê. Yan na, bi razekîkirina (teqlîdkirina) civatên rojavayî û bikarhanîna killîşeyên siyasî wekhevîya jin û mêran nikare çê bigire. Li milê din, divê jin bi bawerî daxwaza mafên xwe bikin, ne ku razeke jinên civatên din bike. Guhertinên civakî di warê wekhevîya jin û mêr de pêwîst e xuristî bin, çimkî bivê nevê rewşa civatê ya gelemper e rola xwe bilîze. Heger guhertin xuristî û bi demê re be gelsên bi encama guhertinê çê digirin jî dê kêmtir bin.

Xwendin, mebest xwendina pirtûkan û rojname û kovarên baş e, ji bo perwerdekirin û pêşvebirina endamên civatekê pir grîng e. Ji ber ku piraniya civata kurdî nexwende ye, naxwînin, yan bi zimanê wan pirtûkên şewecuda û kalîtebaş bi sînor in, him wekhevîya jinê û mêr û him jî hejmareke din ji pîrsên civakî dê demeke dûr û dirêj bêbersiv bimînin. Mebest li vir helbet piraniya gelê kurd e, ne kom û komikên li vir û wir in.

Roja Navneteweyî ya Jinan nikare tişteki ji bo jinên tevahiya cîhanê bike heger di nav civatên cawaz bi xwe de guhertinên mezin dest pê nekin. Ji bo wekhevîya jin û mêr di nav civatekê de, ne tenya guhertina raman û dîtinên mêran, ne tenya guhertina raman û dîtinên jinan, lê herweha guhertina şert û mercên jîyanê û berî her tiştî jî ittifaqeke di navbera endamên wê civatê de, bi jin û mêrên xwe ve, divê.

□

EŞ

berî sedşala 21ê
bi du salan
min jiyân
vajî li xwe kiriye li qiraxa wextan

difetisim
bêhna beratên havînê oksîjena min
cemidî ye laşê min
hew tê bêhna xwêdanê ji min
belqitî ye emirê min
mirin
li ser lengergehên bahrên min
rûniştî
û lingên xwe pê de berdayî

awirên te
hêrsên min tund dikin
dadidin
tenûrên çavên min
gûr dikin
xwekuştinên min
kirasê mirinê ji min re difesilînin

piştî zayîna Îsa sal 1998
afrodîta ku ji kefên zerya spî afirî bû
beratek e
li peravên yewnanîstanê
peykerên giacomettî yên jîndar
livbaziyan xwe wenda kirine
bûne kevir
wêneyên van gogh
bi zerikê ketine
kulîlk kulîmekî bûne

hecaman diavêjim piştî baranên xwe
şana li kêleka devê mihîna min
reng guhertiye
biharan bi qasî
bi zimanê zivistanan biaxifin
ji eslên xwe dûr ketin

her ku min cixarên xwe vemitand
çavên xezala min ji xwe re kir xwêlî-
dank
roja min dest bi
serjêkirina berbangên zer kir
û vir de
sor in berbang
nizanim bê çima
hela xwîna qirika min
wiha zû li gîyotînê keliya

ha yadê!
lawê te
hew ji êvaran hez dike ha!...
hew ji pirtûkan jî yadê
ji tembûran jî
ji helbestan jî...

bi keviran rojê parsûyekî xwe
û diranekî xwe dişkine
yadê, lawê te
hew ditanê xwe jî firçe dike ha!
rêviyên xwe li dû xwe dişkîne
yadê, lawê te
hew xwarinê jî dixwe ha!
dimire yadê!...
dimirim yadê!...

RÊNAS JIYAN

Çik wilo

çîkek heye di rûyê te de bêbavê
min ji kar û barê gel dide alî
bêhneke ku ya toraqê bi min dide jibîrkin
çîkek heye di bûbikên te de hey bêbavê

çîkek heye di destê te de birayo
min wek meyrtekî bêxwedî davêje axê
tirseke ku sibehêkê bi min dide ramandin
çîkek heye di kefa destê te de hey birayo

çîkek heye di dilê te de dayê
min wek zara virnî xwedî dike
çîkîniyeke ku bi pêşîrên neviyên te ve dizeliqe
çîkek heye di payîna te de hey dayê

çik wilo tiştine ewkane hene
di vê civata bêserî de her çik wilo
lê min jî çîkek heye
him jî wilo wilo ye
ku dikare biqevize
di ser bûka baranê re

KAWA NEMIR

REHÎMO: "ZIMANÊ RENGAN JÎ HEYE"

RINDÊ ÇAÇAN

Rehîmo di sala 1962an de li Amûdê hatiye dinyayê. Wî di sala 1991ê de li Şamê akademiya hinerên spehî xilas kiriye. Niho ew li Belçikayê dijî û wî hemî dem, fikr û ruhê xwe daye resimkirinê.

Piştî ko ew ji Amûdê mişextî bû wî li ser riya xwe li Şamê, Moskovayê û Belçikayê gelek ekspozîsyon çêkirine û niho li nav hinerhezên kurd û belçîkî de cihê xwe girtiye.



Rehîmo Hisên

Rehîmo xwen- û xeyalperest e. Ew di ramanên xwe de kûr û dûr diçe û tabloyên xwe bi xewnên xwe rengîn dike. Temayên tabloyên wî bêsînor in, rengên wan germ in û ew gelek teknîkên guhertî bi kar tîne. Rengên pehîzî di hinerê Rehîmoyî de raser in: qehweyî û zerê tarî bi hev re dikevin cengê li hemberî hestên temaşevanan, dirûv û serûberê mirovan di temenê pehîzê de ne.



Lê belê pehîz dikare gelek tişt be: 1) pehîz dikare sembola destpêka sermayê, tenêbûnê û tirsê be, 2) pehîz dikare şiklek ji wan şiklan be ko di tazîtiya xwezayê de rastiye diyar dike û 3) pehîz dikare encama pijana hemî serboriyên mirovî be.

Herçend rengên hinerê Rehîmoyî pehîzî jî bin Rehîmo bi xwe ruhek yê biharî ye û ta dereceyekê mirov dikare bibêje dijminê rengên xwe ye û hertim bi wan re di

cegeke bêeman de ye.

Mirov dikare bipirse ka Rehîmo di nav van reng û teknîkên guhertî û germ de li rişteki windabûyî digere yan jî li xwe bi xwe digere.

Temaya jinê di tabloyên wî de rengê e ji rengên trajediyê. Rehîmo bi xwe dibêje:

– Li gor bîranînên min yê zarokîtiyê jin, bêhna nanê germ, dengê giriyê zarokan û sînemaya Amûdê ko şewitî sûretek yê bihevvegirêdayî ye.

Lê belê hinek caran di tabloyên wî de jin bi rengên xwe ve rapêrînekê li hemberê trajediyê dikin û ew jî wekî rengên Rehîmoyî gur û germ dibin û qitîskên agirî berdidin jiyana xewnan.

– Aragon Parîsê di çavên jinê re dibîne û Salvador Dalî gava ko Gala dimire tirba xwe dikole û dibêje ew jî piştî Galayê nikare bijî.

Di civatê de deng û gotin hêmanên sereke yê ragihandinê ne û gelek caran mirov li hêza zimanê rengan û birha wan nafikire. Rehîmo holê dibêje:

– Zimanê rengan jî heye: ew di axivin bêyî ko deng ji wan derbikeve. Gotin dikare serast xwe bigihîne hestên mirovan û wan rake ser piyan, dilşa an xem-

gîn bike. Lê belê zimanê rengan di demên dirêj de birha xwe diyar dike û bêyî ko hayê temaşevanan jê hebe tesîrê li ruh û hestên wan dike. □



OLOF PALME

"Hûn dikarin me qir bikin. Lê zarokên stêrkan tu car nabin kûçik."

Somabulano, Rhodesia 1896



MIHEMED DEHSIHAR

Wê rojê piştî kar westiyayî û birçî xwe avêt malê. Jina wî li benda wî bû û xwarinê li ser maseyê rêz kiribû. Her sê zarok êdî zilam bûn û her yekê li deverekê kar dikir an jî dixwand. Mala mezin û fereh bi herduyan mabû. Palmeyê ku ji zarokan pirtir hez dikir û bi wan şa dibû, li dora xwe ya vala mêze dikir û ji mecbûrî rewş qebûl dikir. Çaxê kete navmalê, jina wî bixêrhatin dayê û ew maçî kir. Bi çavên kentijî çakêrê mêrê xwe jê wergirt, bi destî wî girt û ew bir ser xwarinê. Çavên kentijî û rûyê geş westandina wî pê dabû jibîrkin û ew ji ramanên kûr rizgar kiribûn.

Wê şevê biryar dabûn ku herin sinemayê û li filîmekî temaşe bikin. Berî ku telefonî kurê xwe Mårten bike, destûr dabû herdu parêzkerên xwe ku herin malên xwe û wan bi tenê bihêlin.

Saet ji nehûnîvê şevê derbas bûbû ku jin û mêr ji deriyê Västerlånggatan 31ê derdiketin. Şeveke sar bû û bayekî kur ew bi xwe re kaş dikirin. Bêyî kontrolê, bêyî polîs û parêzkeran, bêyî çavên xerîb bi trêrê, bi tena serên xwe, xwe avêtibûn ber sinemayê; kurê wan Mårten û keçika hevala xwe, li devê derî li benda wan bûn.

Palme du bilêt kirîn û tev bi hev re ketin hundir ku filîmê "Bröderna Mozart" te-
maşe bikin.

Keçika ciwan piştî tewabûna filîm di salona sînemayê de li benda hevala xwe bû. Hevala wê ketibû tûwaletê û ew jî li ser sendeliyekî rûniştibû û li derva mêze dikir. Li derva, di pişt caman de zilamekî bejindirêj û ecêb bala wê kişand ser xwe.

Zilam tevî kumê xwe yê ta ber guhan kişandî, destek di berîka qapût a xwarê de, yek jî di ya jor de carina li hundir û carina jî li dora xwe dinihêrt. Ji sermayê di ber şibaka sînemayê de diçû dihat û car caran jî li hundir mêze dikir. Çaxê fêm kir ke-
çika hundir lê dinihêre, awirên xwe tûj kir û berê xwe de keçikê. Keçik ji awirên mêrik behitî û berê xwe da alî.

Çaxê hevala wê ji tûwaletê derket, jê re jî rewşa mêrik ya ecêb diyar kir. Keçika hevala wê jî li mêrik şaş ma lê zêde guh nedayê. Gava herdu heval derketibûn, wî mirovî xwe dabû alî. Lê çend meter wêde çav bi yekî din ku dixwiya ew jî li benda tiştêkî yan jî yekî bû, ketin. Ev zilam ji yê din quttir bû û hinekî jî dagirtî bû. Lê keçikan rûyê herduyan jî baş nedîtibûn. Yekî şewqa xwe heta ber guhên xwe kişandibû û rûyê yê din jî di tarîtiyê de nexuya bû. Tenê awirên zilamê pêşî di bîra wan de mabû. Ew awirên tûj û xirab ticar ji bîra keçikê nedîçûn.

Di hundir de serokekî sendîqayeke karmendan û jina wî jî çav bi Palme ketibûn û bi hev re hinekî axaftibûn. Piştî filîm çaxê serokê sendîqayê li dora serokwezîrê Swêdê tu polîs nedîtibû, ji jina xwe re pêşneyar kiribû daku wan bi otomobîla xwe bibin mala wan. Lê jina wî ji ber sedemê belkî wan dixwast bitenê bimînin, nexwestibû wan aciz bikin.

Piştî ji hundir derketin, ji dostên xwe û ji Mârten û keçika hevala wî xatir xwestin û ji hev qetiyar. Mêr û jin di milên hev de, ji xeter û xayîntiyên felekê bêxeber, di Sveavägen de ber bi îstasyona trêne ya Hötorgetê ve meşiyar. Ji hêla rastê ve berê xwe di zaboqa sar û vala de dan hêla din daku herin aliyê din î rê. Çawa ji Dekorîma derbas bûn, zilamê bejindirêj û şoqe di serî de ji paş ve nêzikayî li wan kir.

Lîsbet bi dengê fişekan ve ji xeyalên xwe şiyar bû. Olofê wê, dilê wê li ber çavên wê, di nav xwînê de dirêj bûbû. Xwe avêt ser dilê mêrê xwe û destê xwe di serê wî yê bi xwîn de gerand. Bêyî ku bi birîna xwe jî bihise li dora xwe nihêrt û hewar û gazî kir. Zilamê hinekî qut û qalind ku li ber derencoka trêne disekinî, bi awirên sar berê xwe ji Lîsbetê da alî û di nav tarîtiyê de wenda bû. Ne gazî û ne jî hewar bi ser ve hat. Delalîkê dilê wê, bavên sê zarokên wê, kevokê aştiyê di nav xwînê de mabû. Mirdarên destbixwîn ji bo armanceke bi qirêj, dilên bi milyonan mirov şî-

kandibûn û di nav rarîtiyê de wenda bûbûn.

Lîsbet demek berê çend kesên balkêş li dora mala xwe dîtibû û li wan ketibû şikan. Lê piştî ku demekê ji wan his nehatibû, wê jî ew jibîrkiribûn. Çi dizanibû ku dê ev sosret bi serê wê ve were.

Kurtejiyana sosyaldemokratên Swêdê

Dîroka sosyalîstên Swêdê jî mîna yên welatên Ewropayê, ji kevn ve dest pê dîke. August Palm (1849-1922) berî ku partî resmî bibe, hê di sala 1881an de di civîna yekem a sosyaldemokraran de ajîstasyonê û ji bo damezrandina partiyê xebateke bê-hempa dikir. Palm mirovekî zana bû û ji teref gel ve dihat hezkirin. Wî di sala 1885an de hîmê rojnameya Sosyaldemokratan avêt û bi xwe belav dikir. Piştî ku Partiya Sosyaldemokratên Swêdê di sala 1889an de hat damezrandin, serokatîyê ji



Hjalmar Branting re berda.

Hjalmar Branting (1860-1925) ji malbateke dewlemend dihat û ji destpêka damezrandina partiyê ve serokatiya wê kir. Ew di hilbijartinên 1896an de ji listeya liberalan kete meclîsê û di sala 1903an de ji partiyê 4 nûneran xwe xistin meclîsê. Piştî hilbijartinên 1917an lîberal û sosyaldemokratên bi hev re hukûmeta koalîsyonê ava kirin û Branting jî bû wezîrê aborî.

Branting di sala 1920an de, bi piştgiriya liberalan hukûmet bi serê xwe ava kir lê wê tenê 7 mehan dom kir. Wî di sala 1921an de ji bo xebata xwe ya Yekîtiya Nete-weyan xelata Nobelê wergirt. Branting salek şûnde hukûmeta xwe ya nisbî ava kir û vê ta 1923an dom kir. Di vê demê de bala xwe bi taybetî da ser bûyerên navneteweyî û pirsgrîkên wê. Her wiha di Yekîtiya Nete-weyan de bûbû nûnerê Swêdê.

Hjalmar Branting di sala 1925an de mir, lê ew di meydana siyaseta navneteweyî de mirovekî aşîxwaz dihat naskirin û li welêt jî rêçeke nû pêşkêşî hemwelatîyên xwe kiribû. Wî dabû diyarkirin ku meriv dikare bi riya aşîyê û bêyî şoreşeke bixwîn ji bin nîrên kapîtalîstan û karbidestên derkeve û bi reforman di vî awayî de pêşkeftîneke sosyalîst û înternasyonalîst pêk bîne.

Per Albin Hansson (1885-1946) piştî Branting bû serokê Partiyê. Hansson ji malbateke kedkar dihat û wî bi xwe jî hê di zarokîya xwe de li curbicur dikanan kar kir. Di xwendegêhê de pirr jîr bû û li gora heval û mamosteyên xwe, ji bo dersan pêwîstî bi xwandîneke zêde nedikir.

Hansson 16 salî bûbû endamê kluba sosyalîstên ciwan û salek pişt re bû berpirsiyarê wê. 19 salî zewicî û pişt re jî di Arbetet de -ku rojnameyeke sosyalîst bû û li Malmöyê derdiket- dest bi kar kir. Pişt re hat Stockholmê û li wir bû redaktorê Sosyaldemokratên. Di sala 1918an de kete meclîsê û 1920an de jî di hukûmeta Branting de bû wezîrê ewlekariyê.

Çaxê Hansson bûbû wezîr, merivekî gazin kiribû û "bêyî xwandîneke bilind mirov nabe tiştêk!" gotibû. Hansson lê vegeyabû û "wisa nebêje, li min mêzeke!" bersîv dabû. Hansson ji sala 1932an ta mirina xwe serokwezîrtiya Swêdê kir.

Per Albin Mala Gel ava kiribû û rewşa gel ji gelek awayan ve bilind kiribû. Lewra jî jê re Bavê Welêt dihat gotin. Ew mirovekî "ji nav gel" bû; jiyana wî pirr mutewazî bû û di maleke pirr hêsan de dijîya. Hertim bi wasîteyên gelêrî diçû û dihat û di nav gel de xwe rehet hîs dikir. Sîstema rehet û hêsan, modeleke sosyal û wekhev, xebata bi qanûn û nîzam bi saya serê wî di Swêdê de bicî bû. Ji ber vê yekê jî serokên piştî wî, li ser vê rê domandin. Ew ji wan re bû sazûmandar û bingehê civaka rehet û serkeftî.

Tage Erlander (1901-1985) di sala 1944an de bûbû wezîrê dewletê û salek şûnde jî yê perwerdekirinê. Piştî ku Per Albin Hansson çû ser heqîya xwe, Erlander di sala 1946an de kete dewsa wî.

Erlander ji sala 1946 ta ya 1969an serokwezîrê Swêdê bû. Kesî hê ta niha jî hewqas dirêj ev wezîfey nedomandiye. Yek ji wan qanûnên herî girîng ku di jiyana ci-vakî ya Swêdê de gaveke herî baş tê hesibandin, ATP çêkir û herkes kir xwediyê sî-gorteya jiyane.

Erlander di vê dema dirêj a serokwezîrtiya xwe de, gelek qanûnên din jî di meclî-sê de da qebûl kirin. Di dema wî de aboriya Swêdê pirr bi pêş ket û rewşa gel jî baş-tir bû. Wî Palme keşîf kir û rê dayê ku xwe bi pêş ve bibe. Ew û Palme bûn heva-lên hev ên pirr nêz û bi her awayî bi hev bawer bûn. Wî jî destpêkê ve bawer dikir ku dê Palme têkeve dewsa wî.

Olof Palme

Dema Serokwezîrê Swêdê, lehengê aştî û azadiyê yê bi nav û deng Olof Palme hat kuştin, wî nêzî 33 salan di navenda siyaseta Swêdê de rola herî girîng leyîstibû û di ya navneteweyî de jî di roleke sereke de cîh girtibû. Mirov dikare jiyana wî tenê bi çend gotinan bibêje yan jî binivîse û derbas bibe. Lê ev ne dîtî û ramanên wî û ne jî jiyana wî ya dewlemend û balkêş tînin ber çavan. Tevî vê jî ez dê çend tiştên kro-nolojîk birêz bikim û hê li ser jiyana wî û ramanên wî dûvedirêj bisekinim.

Olof Palme di payiza 1953 an de 26 salî jî teref serokwezîrê wê demê Tage Erlan-der ve, mîna sekreterê wî yê taybetî jî nav gelek ciwanên wê demê hat neqandin. Dê Erlander di vê biryara xwe de poşman nebûya û jê gelek alîkariyên girîng wer-girta. Bi Palme re Erlander jî xwe re hevalem nêz ku dikaribû pê re stratejiya siyase-tê û dîtînen siyasî nîqaş bike, dîtibû. Herdu di nav 12 salan de pirr nêzî hev bûn û bi hev re kar û xebata siyasî kirin.

Di sala 1955an de bi hîlbijartinê kete komîsyona birêvebir a SSU yê (Yekîtiya Ci-wanên Sosyaldemokrat) û bû serokê perwerdekirinê. Ta sala 1961an jî wî ew kar domand. Ew di demeke kin de, di nav ciwanan de binavûdeng bû û bi taybetî jî di warê siyaseta dîrokî û îdeolojiya wê de gelek semîner pêşkêşî wan kir. Her wiha ew di pirsên xwandin û perwerdekirinê de bû pispor û pêşevanê ciwanan.

Di sala 1963an de bû wezîrê dewletê û du sal pişt re jî bû wezîrê komunîkasyonê. Di sala 1967an de wezareta wî hat guhartin û ew bû wezîrê perwerdekirinê ku tê de pispor bû. Wî her wiha di gelek komîsyon û komîteyên girîng û têkel de serokatî jî dikir. Palme di sala 1969an de bû serokê Partiya Sosyaldemokratên Swêdê û hima

piştî wê bû serokwezîrê Swêdê. Wî li Swêdê nêzî 16 salan serokatiya partiya herî mezin kir û nêzî deh salan jî serokwezîrtiya Swêdê kir.

Palme di van salan de, di pêşdebirin û nûjeniya Swêdê û avakirina civaka modern û dewleta sosyal de rolê herî girîng bicî anî û Swêd di warê navneteweyî de kir xwedî roleke taybetî.

Di dema Palme de, nakokiyên civakî yên di navbera xebatkar û karbidestan de kêmtir bûn; karker di pêşdebirina civakê de bûn beşek ji deshilatdaran û xwedî însiyatîf. Rewşa xebatkar, jin, zarok û teqawîdan hem di warê aborî û hem jî di warê civakî de pîrr baştir bû.

Reformên Palme û sosyaldemokratan, Swêd kir dewleteke di dinyayê de ji yên herî dewlemend û di warê sosyalî de jî civakeke ji yên herî pêşdeçûyî. Xwandin û xwandegeh bi reformên nû rewşa şagirtan û xwandevanîyê bi her awayî pozîtîf guhart û Swêd di vî warî de jî bû yek ji wan dewletên herî pêşkerî.

Olof Palme ji destpêka salên 1950an bi dîtî û kiryarên xwe ve di nav vê xebatê de bû û bi formulasyonên xwe, rê da vê çerxa nû ya Swêdê. Wî rewş û awayên siyasî di nav gelê xwe de guhart û ew bi gel da hezkirin. Ew yek ji wan siyasîvanên dema xwe yî herî girîng bû û bi dîtî û kiryarên xwe yên nûjen di nav sefa pêşîn de cî digirt.

Zarokî û ciwaniya Palme

Palme di 30ê çileyê 1927an de, di wê sala ku sosyaldemokrat ji ser hukum ketibûn û li maleke dewlemend û xwedî dîtînen lîberal de hat dinyayê. Ev zarokê sêyem bû ku ji wan re çêdibû; navê wî li yê bapîrê wî Sven danîn: Sven Olof Joackim. Birayê wî Claes, jê bi deh salan û xwişka wî Catharina jî bi heft salan mezintir bûn. Bavê wî Gunnar çaxê li Uppsalayê dixwand bi keçeke din re dima û ji wan re kurek çêbûbû. Lê ta salên dawî jî ev eşkere nebû. Gunnar ji wan re nefeqe dişand lê ji bo ku rewşa xwe eşkere neke, bi ser wan ve nedîçû.

Gunnar zilamekî nerm û di heddê xwe de bû. Weke ewûqat ketibû dewsa bavê xwe û di şirketeke sîgortayê de (Thules Försäkringsbolag -îro Skandia) kar dikir. Bapîrê wî Sven Palme, çaxê ew hat dinyayê 75 salî bû. Ew bi xwe mirovekî lîberal bû û demekê jî ketibû meclîsê. Lê ji ber serokê lîberalan Karl Staaf ew ne kiribû wezîrê aboriyê, dev ji siyasîyê berdabû û di sîgortayê de dest bi kar kiribû.

Dapîra wî Hanna von Bron di malê de bi wan re bi elmanî diaxift û carina jî dersên rûsî dida wan. Ew bi xwe jî malbateke fînî û aristokrat dihat. Ew jineke zana

bû û ji edebiyatê gelek hez dikir. Gelek caran bi nivîskarê bi nav û deng August Strindberg re digeriya û herduyan li ser tiştên têkel nîqaşê dikirin. Olof hê di zarokîya xwe de çend şîrên Pûşkîn jiber zanibû. Ji dayîna xwe jî hêdî hêdî fêrî fransîzî dibû.

Diya wî Elisabeth ji malbateke esîlzade dihat. Malbata Knierimê bi eslê xwe lettî û elmanî bû. Bavê wê li Rîgayê rektorê xwendegeha bilind a teknîkê bû. Wê bi xwe jî li Moskovayê doktorî xwendibû û di şerê cîhanê yê yekem de li nexweşxaneyêke Moskovayê kar kiribû. Piştî demekê xwe ji wir dabû alî û bi alîkariya sefirê swêdî, di berîkê de navnîşana Palme, di sala 1915an de hatibû Stockholmê. Ew li Swêdê bûbû mamosteyê elmanî ya xwişka Gunnar û piştî salekê bi Gunnar re zewicî bû.

Dema bapîrê wî di sala 1934an de û bavê wî jî mehek piştî wî çûn ser heqîya xwe, birayê mezin Claes ji mecbûrî dibe mezinê malê. Lê vê jî zêde dom nekir; Claes li Sîgtunayê dest bi xwendegehê kir û ji malê çû. Niha wek zilam tenê Olof di malê de mabû. Dê piştî demekê wî jî dev ji malê berda û li xwandegeha Beskovskayê de, ku tenê ya lawikan bû dest bi dibistanê bikira. Ew di nav şagirtên hevalê xwe de yê herî hûr û temenbiçûk bû.

Olof ji her awayî ve jîr bû lê her wiha şerûd jî bû. Hê di destpêkê de bi hevalemî xwe re çûbû kluba boksê û dest bi boksê kiribû. Lê çaxê diya wî pê hisiyabû, nehiştibû careke din bi wir ve here. Pîrraniya caran bi şagirtan re şer dikir lê çaxê zora wî dibirin, pîrr aciz dibû û bi ber xwe diket. Xusûsiyeteke wî hebû ku gelek ji nava xwe razî bû. Tevî ku ne zêde delal bû jî, gelek keçik di bin tesîra wî û çavên wî yên kentijî de diman.

Ew hê ji zarokîya xwe ve kurekî bi nexweşîn bû. Ta dest bi xwendegehê kir jî di rûyê wî de bîrov hebû û di laşê wî de pizirk derdiketin. Ji ber wan pîrr diêşîya û gelek caran jî diket nav livînan.

Palme xwandinê berî ku dest bi xwandegehê bike ji diya xwe fêr bûbû. Pirê caran xwe di xwandina pirtûkan de wenda dikir û ji bîr dikir ku here xwarinê bixwe.

Dapîra wî jîneke mêrane û xwedî biryar bû. Her wiha di malê de pîrr bi otorîte bû. Carbicar kurê xe rexne dikir ku bi zewacê re li malê rûniştibû û xwe nedida kar. Her wiha bûka xwe jî ji ber ku baş bi swêdî nizanibû û ji zarokan re pîrr helîm û nerm bû, rexne dikir. Palme van gotinên wê pişt re carbicar bibîr dianî û diyar dikir ku biyanîtî û xerîbî çiqas zor bû û çîna serdest çiqas zordar û bêtolerans bû.

Xwendegeha "Sigtuna Humanistiska Läroverk" textîdek ji xwendegehên Londone bû. Şertên wê gelek giran û jiyana tê de pîrr zor bû. Palme hê ji destpêkê ve ji sîstema wê hez nekiribû û li dersên xwe nedîşuxulî. Tevî vê jî ji gelek hevalên xwe

pêşdetir bû. Dersên herî xweş cîmnastîk û mûzîk bûn li gora wî. Louis Armstrong û Benny Goodman du hunermendên mûzîka cazê bûn ku Palme ji wan pîrr hez dikir.

Bi sala 1940an re reformên nû rewşa xwandegehan ji guhart. Êdî keçikan jî dikaribû li xwandegeha wan bixwandina û vê jî pîrr kêfa Palme dianî. Xwandegeheke bêqîz, mîna dareke bêpel û bêfêkî bû li gorî wî. Çar sal pişt re, di sala 1944an de wî ev xwandegeh qedand.

Di saxiya xwe de bavê wî dixwest herdu kurên wî hiqûqê bixwînin û xwe weke zabitan perwerde bikin. Claes bi ya bavê xwe kir lê Olof dixwest beşa siyasetê, ya dîplomasi û îdareya dewletê bixwîne. Di salên dawî yên li Sigtunayê de timî dengûbasên şer, ên rojhilat û rojava guhdarî dikir. Di dawiya xwandina xwe de ji bo amadekirina kompozîsyona xwe beşa dîrokê neqandibû û bi vê nivîsara xwe ya bi navê di dîroka Înglîstanê de rewşên krîtîk, dereceya herî bilind wergirtibû.

Lê dawî jî bi ya bavê xwe kir; pêşî bû zabitê cîgir û pişt re jî ewûqatî xwand. Ji bilî van gelek tiştên din jî kir; di dema eskeriya xwe de di rojnameya Svenska Dagbladetê de dest bi nivîskariyê kir.

Di mala Palme de kêrî caran tiştên siyasî dihatin axaftin. Ew bi xwe jî ne difikirî ku bi siyasetê ve mijûl bibe. Lê di sala 1947an de, piştî dawiya şerê cîhanê rewş guhîribû û fikrên wî jî pê re guhurîn. Bi taybetî jî gotinên wezîrê aborî yê sosyaldemokrat Ernst Wigfors li ser wî tesîreke mezin kiribûn. Wigfors li ser rewşa aborî û ya zikatê rawestiyabû û siyaset bi Palmeyê ciwan şêrîn kiribû. Li gorî Palme ew di fikrên xwe de zelal û rehet bû; pîrr zana bû û mirov zû dixist bin tesîra xwe. Piştî ku beşdarî wê nîqaşa wî ya bi siyasetvanên burjuva re bûbû, Palme êdî bûbû alîgirê dîtînên Wingfors.

Di dawiya 1947an de çû Amerîkayê daku li Ohioyê Kolleja Kenyonê bixwîne. Dibistan bi giranî li ser pîrsên civakî radiwestiya û şagirt hem di vî awayî û hem jî di awayê siyasetê de mecbûrî nîqaşan û xebateke zêde dikirin. Dîtînên Palme jî bi vî awayî li Amerîkayê bêtir radîkal û çarçoveya wan bêtir fereh bûbûn.

Gava Palme xwandegeha Kanyonê di salekê de tewa kir û şahadetnameya xwe wergirt, dest bi gera xwe ya "perwerdekirina rastî" kir. Ew di sala 1948an de 21 salî, di berîkê de 300 dolar li Amerîkayê geriya. Di nava sê mehan de li 35 bajaran geriya, li otêlên erzan raza, xwarinên erzan xwar. Wî li wir ferqa di navbera çîn û rengan, a feqîr û dewlemendan de bi çavên xwe hê bêtir dît û jiya. Ev cara yekemîn bû ku Palme derketibû dervayî derdora çîna xwe ya dewlemend. Li gorî wî "feqîriya biçûkxistî" sedemeke din bû ku ew kiribû sosyalîst. Gera Amerîkayê û pişt re jî ya

Asyayê li ser Palme tesîreke pirt mezin kiribû. Digel vê, di warê teknîkî û civakî de pêşketineke mezin jî rastiyeke din bû. Bi vî awayî tevî ku gelek kêmasiyên girîng ên civakî mîna rastiyeke qebûl dikir jî, dîsa bûbû heyranê Amerîkayê.

Paul Newman, şanogerê amerîkî yê bi nav û deng, li xwendegeha Kanyonê bi Palme re dixwand. Tevî ku herdu di malekê de diman, di tîpa futbolê de dileyîstin û serşoka malê parve dikirin, bi tenê silav didan hevdû û zêde hev ne dinasîn. "Me di dema xwandinê de hev zêde nas nedikir, lê bêşik mirov kariyereke mîna ya Palme ji nêz ve taqîb dike." digot Newman piştî ku Palme dibê serokwezîrê Swêdê.

Wî dixwast li wir zêde bimîne û li Ûnîversîteya Harwardê, beşa ekonomiyê xwandina xwe bidomîne. Lê diya wî û birayê wî yê mezin dixwastin ew vegere welêt. Li gorî wan ew hê biçûk bû û biryar dabûn berî ku li deverên xerîb riya xwe şaş bike û têkeve riyên xerab, vegere mala xwe.

Piştî vegehiya welêt, di payiza 1948an de li Ûnîversîteya Stockholmê dest bi xwandina hiqûqê kir. Yek ji wan pirtûkên ku di kursê de ji destên wî nediket, Manifestoya Komunîst bû. Palme di rojnameya sosyaldemokratî Aftontidning de li ser vê nivîsekê jî nivîsand. Li gorî wî Marks û Engels du mirovên reformîst ango ne komunîstên doktrîner bûn. Ev her wiha dîtînen sosyaldemokratî jî bûn, difikirî Palme.

Palme di sibata 1949an de di rojnameya Svenska Dagbladetê de li ser pirtûka Norman Mailer a bi navê Yên tazî û yên mirî lêkolînek nivîsand. Di vê nivîsara xwe de Palme dîtînen xwe yê di derheqê Amerîkayê de, îdealîzma xwe û hezkirina xwe ya ji Amerîkayê diyar dike.

Nivîsa wî bala endamên îdareya Yekîtiya Xwandevanên Swêdê (SFS-Sveriges Förenade Studentkårer) kişand. Berpirsiyarên rêxistinê pê re ketin pêwendiyê û xwastin ku ew beşdarî nav xebata wan bibe. Palme bû endamê vê rêxistinê û li ser navê wê dest bi gera xwe ya Ewropayê ku hê nû ji şer filitî bû û xerabe û wêran mabû, kir.

Di nîsana 1949an de mîna turîstekî çû Pragê, serekbajarê Çekoslovakayê. Li wir rewşa gelê wir dît û di warê nakokiyên civakî de agahdarî wergirt. Palme li wir bi keçîka çekî Jelena Rennovera re "zewicî" daku wê bîne li Swêdê bicîbibe û ji şerpezetî û binçavîyê rizgar bike.

Piştî nêzî salekê vê carê Palme weke delegeyê SFSê çû Pragê û beşdarî kongreya IUSê (Rêxistina Xwandevanên Sosyalîst a Navneteweyî) bibe. Li wir ji mecbûrî di bin fotografê Stalîn de, deh rojan derbas kir û beşdarî civîn û meşên wan bû. Dê Palme pişt re bi raporekê ev kongre û kiryarên wê rexne bikira û her wiha di radyo-

ya swêdî de jî li ser wê dîtînên xwe eşkere bigota.

Bersîva vê kongreyê li Stockholmê ji teref ISC (International Student Councel) ve ku ji IUSê veqetiyabû, bi konferansê hat dayin. Palme bi xwe jî sekreterê giştî yê vê konferansê bû. Di vê konferansê de biryar hat dayin ku sekreteryaya konferansê COSECê damezrîne. Biryareke din jî ew bû ku alîkariya xwandevanên feqîr bikin.

Îro tê zanîn ku COSEC ji teref fondên Amerîkayê ku piştgirî ji CIAYê werdigirt, dihat finanse kirin. Armanca vê rêxistina xwandevanan a navneteweyî ew bû ku li hember dewletên sosyalîst xebateke çaralî bike û kontrola xwe di nav ciwanan de zêdetir bike. Dema eşkere bû ku di damezrandina vê rêxistinê de tiliyên dewlemendên amerîkî û CIAYê heye, Palme pêşî qebûl nekir ku COSEC di nav şer de alî giriye û gelek jî aciz bû. Lê dawî derket ku Palme û hevalên xwe hay ji vê yekê tunebûn û hatibûn xapandin. Ew şexsiyetên ku alîkariya vê rêxistinê dikirin ji teref wîsan kesan ve dihatin îdarekirin ku mirov texmîn nedikir pêwendiyên wan bi rêxistinên parastinê re hebin.

Tevî ku ev rêxistin bi armancên din jî hatibûn avakirin, feydeyên wê jî çêbûbûn. Eşkere bûbû ku xwandevanên amerîkî li gora yên ewrûpî bêtir li dijî kolonyalîzmê û bindestiyê bûn. Her wiha alîkariya abortî ya Amerîkayê ku ji hinek welatên feqîr û belengaz re diçû -wê hingê kesî bi dek û dolabên vê dewletê ku li başûrê Amerîkayê dikir nizanîbû- ji welatên ewrûpî re jî bûbû numûneyên qenc. Palme ji van pêwendî û alîkariyan gelek feyde dît û gelek tiştên nû -piştgirî û xwedîlêderketinê fêr bû.

Palme di sala 1950an de yekem car raya xwe dide sosyaldemokratan û salek pişt re jî dibe endamê wan. Di destpêkê de ji ber xebatên xwe yên navneteweyî zêde nikaribû beşdarî civînên partiyê bibe. Di adara 1952an de dibe serokê SKSê û berpirsiyarê buroya gerê ya rêxistinê. Çend hefte pişt re di gera kayakê de rastî Lisbet Beck-Friis -ku keçeke bi çar salan jê biçûktir bû û pirr şêrîn bû- dibe. Herdu ciwan hevdu nas dikin û di nav wan de nêzîkahiyeke dest pê dike.

Eynî salê çaxê diçe Frensaya daku frensiya xwe bi pêş ve bibe, Sten Andersson nas dike û herdu bi hev re dibin heval. Sten jê re qala rewşa karkeriyê û belediyeya karkeran dike.

Palme dibe sekreterê Erlander

Serokwezîrê Swêdê Tage Erlander di sala 1953 an de ji xwe re li sekreterekî digere û

vî derdê xwe ji endamekî SSUyê Assar Lindbeck re vedike. Gelo wî dikaribû vê wezîfeyê bigirta ser xwe, jê dipirse. Lindbeck dê biçûya eskeriyê û nikaribû ev kar bikira. Lê "Palme bigire" dibêje, "ew xortekî gelekî jîr e". Gelo ew sosyaldemokrat e, meraq dike Erlander. "Belê" bersîv dide yê din.

Erlander çend rojan pişt re bi telefonê li Palme digere lê tu bersivê nagire. Lewra jî li ser gotina wezîrê xwe Ragnar Edenman serokê SSUyê ya Göteborgê weke sekreter digre cem xwe.

Di 20ê tebaxa 1953an de Erlander û Palme li Harpsundê hev dibînin û bi hev re dikevin xeberdanê. Palme jê re qala gera xwe ya Asyayê dike û rewşa gelên belengaz tîne ziman. Erlander jê gelek hez dike û dixwaze ku ew bibe sekreterê wî.

Palme bêyî ku dev ji karê xwe yê sekreteriya li cem wezaretê ewlekariyê ku hê nû dest pê kiribû berde, bi nîv danî -bi şevan û dawiyên heftiyên weke sekreterê Erlander dest bi kar dike.

Palme ji gera xwe ya Asyayê pîrr zane û gihîştû vegeyriyabû û gelek di bin tesîra wir de mabû. Sê mehên ku Palme li Hindistanê, Ceylonê, Burmayê, Taylandê û Îndonezyayê derbas kiribû, dê di jiyana wî û dîtînen wî de guhertînen mezin çêke û wî di tevahiya jiyana xwe de di bin tesîra xwe de bihêle. Feqîrî û belengaziya wan, xweşiya jiyana xistibû dilê wî. Di vê gera xwe de Palme li Hindistanê bi nexweşiya malaryayê jî ketibû û çend rojan di nav ciyan de mabû.

Palme ji du sedeman karê sekreteriya Erlander qebûl kiribû. Ya yekê berpisiyariya vî karê zêdetir bû û xebat li vir bêtir digihîşt armanca xwe. Ya din, tevî ku di navbera wan de 26 sal ferq hebûn jî, di hevdiîtina pêşî de ketibû bin tesîra wî. Şexsiyet û karakterê Erlander bûbû sebebê pêwendiyêke baş.

Herdu jî ji dervayî çîna karkeran ketibûn nav wan û ji malbat û derdorên burjuva-lîberal hatibûn. Her wiha herduyan jî di demên cuda de, di nav xwandevanan de kar kiribûn û bi pirsên xwandevaniyê ve mijûl bûbûn. Xwandin beşeke din bû ku herdu bêtir nêzî hev dikir.

Palme ne tenê herdu kar bi hev re dimeşandin; lê wî her wiha bingeha nivîs û axaftînen Erlander amade dikir, di gerên wî yê dervayî welêt de tercumaniya wî dikir û bi dîtînen û pêşneyarên xwe yê zelal ew hişyar dikir. Palme di derheqa pirsgerêka Vîetnamê de ku dê wî di pêş de li çar aliyê dinyayê bide nasîn, zêde serê xwe êşandibû û agahdariyên heja civandibû; wî ev zanebûn û agahdariyên xwe di her fersendê de pêşkêşî serokwezîrê xwe dikir.

Pêwendî û rêgihîştina wan dualî bû. Herduyan baş ji hev fêhm dikirin; çaxê Palme bi du gotinan pîrsek vedikir, Erlander armanca wî fêhm dikir. Ev rewş ji Palme

re jî her wisa bû. Wî li cem Erlander xwe pirr rehet hîs dikir; serokwezîrê wî rê di da sekreterê xwe ku ew tiştên tabû û qedexe bibêje û rewşenbîriya xwe bide nîşandan. Di nav sohbetên wan de tu tiştên qedexe û tabû tunebûn û naveroka dîtî û gotinên wan bêsnor bû.

Tevî ewqas nêzikayî û dîtînen hevbeş jî dîsa di nav wan de cudatîyek hebû; Erlander pesîmîst û Palme jî optîmîst bû. Erlander hesabê ku herî tiştê xerab biqewîme dikir û li gora wê jî tedbîrên xwe distand. Lê Palme nediket nav hesabên hûr, wî ji tiştên herî xirab jî fikrên qenc derdixist. Di demên herî xerab de gava Erlander pirr nerihet bû jî, Palme bi fikrên nû û nûjen nîqaşê germ dikir û rewş bi gotinan pozîtîf dikir. Dê ev rewşa wî, di jiyana wî ya pêşerojê de bibûya beşa wî ya herî girîng.

Palme di sala 1955an de -teví ku ne beşdar bû jî, di kongreya SSUyê de weke berpirsiyarê perwerdekirinê hat hilbijartin. Wî di axaftinên xwe de dabû qebûlkirin ku ew pedagogekî hêja bû û hunera axaftinê xweş bikar dianî. Ne ku bi serê xwe dîtînen nû pêşkêş dikir, lê dikaribû di sîstema heyî de bi rihetî bide fêmkirin ka çi dibe û çi pêwîstî hene. Lewra jî Erlander sekreterê xwe, "berpirsiyarê pêşkeftina dîtînen Partiyê yê salên 1950an" pêşkêşî dora xwe dikir.

Palme mirovekî xwedîhêz û berhemdar bû; wî xwe bi derdorê û bi taybetî jî bi Erlander dabû qebûlkirin û bawerkirin. Erlander jê hez dikir û pê bi her awayî bawer bû. Dema ku di sala 1956an de delegasyona Swêdê ji bo hevdiîtinên resmî çûbû Moskovayê, Erlander nexweş ketibû. Piştî roja yekem Palme ketibû dewsa wî û sekreterê 29-salî, li ser navê dewletê bi Krûşçev û Malenkov re civîn berdewam kiribû.

Palmeyê ku bavê xwe di zarokîya xwe de wenda kiribû, di şexsê Erlander de ji xwe re bavêkî nû dîtibû. Erlander bi dilsozî û camêriya xwe, ew ciyê vala dagirtibû.

Dom dike

SALÊN ŞERÎF PAŞA YÊN DAWÎN

ROHAT ALAKOM



Ji aliyê çepê ber bi rastê: Bavê zavayê Şerif Paşa, Şerif Paşa, keça Şerif Paşa (Melek Xanim), mêrê Melekê û sefirê Misrê, li Romayê.

Di hejmareke kovara Çirayê de me dabû kîvşê ku Şerîf Paşa wek di çend çavkaniyan de cîh girtiye, di sala 1944an de nemiriye. Me di eynî hejmara Çirayê de nûçeke ku di sala 1950'yî de di *New York Times* de hatibû weşandin jî, bi nivîsê ve kiribû. Me dabû kîvşê ku Şerîf Paşa bi kêmanî heta salên 1948an jiyaye.⁽¹⁾ Dokumentên ku paşê gihîştin destê me nîşan dan ku Şerîf Paşa di tarîxa 22.12.1951an de miriye. Di hejmara 162 ya kovara *Dîrok û Cîvat* (Tarih ve Toplum) de bi sernivîsa *Tarîxa Mirina Şerîf Paşayê Kurd* nivîseke min berî salekê hatibû weşandin. Me di vê nivîsê de dabû kîvşê ku Şerîf Paşa çawa di çend çavkaniyan de cîh girtiye ne di sala 1944an de, ew di sala 1951'an de miriye.⁽²⁾ Di hejmareke mayîn ya eynî kovarê de nivîseke Hasan Basri Danişman û yeke Sinan Kunalalp di derbarê vê nivîsa min

de di rûpelê "Ji xwendevanan name" hatine weşandin. Di van naman de ji bo min çend agahdariyên nû û kêrhatî çih girtine, wek mîsal



Şerif Paşa û keça wî Melek Xanim.

Hasan Basri Danişman dide kivişê, ku du neviyên Şerif Paşa li Tirkîyê demekê perwerdegariya ziraaetê kirine û paşê vegeriyane Misirê⁽³⁾ û Sinan Kuncrap ji dide kivişê ku jina Şerif Paşa ya pêşîn Emîne Xanim di sala 1926'an de miriye û nevikî Şerif Paşa niha li Enqerê dimîne, lê belê nav nade.⁽⁴⁾ Di demeke waha de wexta bi saya kovara Dîrok û Civat Şerif Paşa ji xwendevanan re dihate nasîn, nevike Şerif Paşa ya ku li Monacoyê dimîne, ji me re di derbarê salên dawîn yê Şerif Paşa de çend sûret, dokument û hin zaniyariyên biyografîk bi riya postê ve şandin. Ev agahdarî û zaniyariyên ku ji kesêke nêzikî Şerif Paşa ji nişan didin, ku Şerif Paşa di 22.12.1951an de li Îtalyê miriye. Li kîderê miriye û li kîderê hatiye veşartin, ev yeka ji hatiye ronî kirin. Bi vî tehrî ew nezelaliyên derbarê sal û çihê mirina Şerif Paşa ji ortê rabûn û em dikarin bêjin ku êdî dawîya wan raberzînan hat. Ji aliyê

din babeta Şerif Paşa salên xwe yê dawîn gelo li kîjan welatê Ewrûpê derbas kirine? bersîva vê pirsê ji ronî bû.⁽⁵⁾

Di nav wan belgeyên ku Antonietta Kerimeeyê ji me re şandine nameke dûr û dirêj, 15 sûretên Şerîf Paşa, se-cera ku ji bo kok û endamên malbata Şerîf Paşa hatiye tanzîm kirin û çend dokumentên ku ji kartvizit û nas-nameyan pêkhatî, hene. Ev sûretan di navbera salên 1939-1951an da hatine kişandin. Di piraniya van sûretan de Şerîf Paşayê kalbûyî bi keça xwe Melek Xanimê ve tevatî tê xuyan. Di sûreteke mayîn de Şerîf Paşa bi Salih Begê ve tê xuyan. Ev Salih Bega bi ihtîmaleke mezin, mêrê keça wî ya pêşîn, Şerîfe Xanimê ye. Ji ber ku navê wî jî Salih Beg hû. Di sûreteke mayîn de Şerîf Paşa hi Antonietta Kerimeeyê ve tê xuyan, ew kesa ku ev sûret ji me re şandine. Ew, di wê demê de zarokeke piçûk bûye. Ji van sûretan çend heb ev cara pêşîn e ku di kovara *Nûdemê* de tîn weşandin.



Şerîf Paşa û neviya wî Antonietta Kermée

Angorî agahdariyên neviya Şerîf Paşa, Antonietta Kerimée ya ku li Monacoyê dimîne (sala bûyîne 1949), Şerîf Paşa di sala 1921'an de cara duwemîn zewiciye. Heta niha derbarê vê zewaca duwemîn de tu tişt nedihatî zanîn. Şerîf Paşa bi keseke Fransîzî ya bi navê Melle Edwige Pairani nas dike û bi wê re dizewice. Ji vê zewacê tenê keçeke wan hi navê Melek Argia (1922-1972) tê dinê. Dema Melek mezin dibe, bi kesekî Îtalî Comte Carlo Pecorini Manzoni re mêr dike. Paşê sê zarokên Melekê çê dihin, du keçik û kurek: Antonietta Kerimée, Patrizia Saïda ve Umberto. Ew kesa ku derbarê Şerîf Paşa de ev dokument ji me re şandi-

ne, Antonietta Kerimee ye. Ew û birayê xwe Umberto niha li Monacoyê, keça din Patrizia Saida jî niha li Îtalyê li bajarê Catanzaro dimîne. Çawa tê zanîn Şerîf Paşa salên xwe yê dawîn li vî bajarî derbas kiriye û di sala 1951an de jî li vir miriye. Kesa ku cara pêşîn derbarê sala mirina Şerîf Paşa de em agahdar kiribûn bi rastî xûşka piçûk Patrizia Saida bû, di hejmara 162an ya kovara *Dîrok û Cîvat* de ev yeka me dabû kivşê. Wusan tê xuyan ku wê ev karê înfomasyonê paşê spartîye xûşka xwe ya mezin, Antonietta Kerimeeyê.

Angorî agahdariyên ku Antonietta Kerimeeyê ji me re şandine, piştî Parîsê Şerîf Paşa li Îtalyê li bajarê Romayê cîwar dibe. Paşê diçe li bajarê Catanzaro dimîne û hersê salên xwe yê dawîn (1949-1951) bi keça xwe Melek ve tevayî li vî bajarî derbas dike. Şerîf Paşa di roja 22.12.1951an de vefat dike û cenazê wî dişînin Misirê. Angorî wesiyeta wî, cenazê wî dibine Rodayê li kêle jina wî ya pêşîn Emîne Xanimê gor dikin.⁽⁶⁾ Bi vî tehrî wek sala mirina Şerîf Paşa, cihê ku lê hatiye veşarin jî derkete ronahiyê. Angorî nama ku Antonietta Kerimeeyê ji me re şandiye, ihtîmaleke gelek mezin e ku keçên wî yê ji zewaca pêşîn Şerîfe û Cesa jî li vî heremê hatine veşartin. Ji zewaca yekemîn du keç û ji zewaca duwemîn keçek ango Melek hatiye dinê. Ji herdu zewacan serhev sê keçên wî çêbûne. Angorî texmînên Antonietta Kerimeeyê, Şerîfe Xanim keça pêşîn di sala 1969'an de, Cesa jî dûra miriye. Cesa du caran zewiciye, mêrê wê yê dawîn yekî Polonî bûye. Keça Şerîf Paşa ya ji zewaca duwemîn hatiye dinê, ango Melek Xanim di sala 1972an de miriye. Bi gotineke din hemû zarokên Şerîf Paşa îro mirine, ne li dinê ne. Tenê neviyên wî dijîn.

Ez bawer dikim ku bi saya van sûret û dokûmentan, em îro vî şexsiyetê kurd, Şerîf Paşa baştir dinasin. Di lêkolînên kesane de tarîx û cihê mirinê çiqasî girîng e, em berê jî li ser vî baberê sekinîbûn. Eger ev kes berî çil-pêncî salî miribe, wê çaxê tarîxî û nezelaliya zaniyariyên biyografîk divê sedî sed bînan ronahî kirin. Ji ber ku dem, ne demeke ewqas dûr û dirêj e, îmkana lêkolînan gelek zêde ye. □

JËRENOT:

- 1) Rohat Alakom, *Babeta Sala Mirina Şerîf Paşa* (Lêkolîneke biyografîk) Çira: 5/1996.
- 2) Rohat Alakom, *Kürt Şerîf Paşa'nın Ölüm Tarihi*, Tarih ve Toplum, hejmar :162, 1997.
- 3) Hasan Bastri Danışman, *Kürt Şerîf Paşa ve Ailesi*, Tarih ve Toplum, sayı:164, 1997.
- 4) Sinan Kunalalp, *Kürt Şerîf Paşa'nın Ölümü*, Tarih ve Toplum, sayı:164, 1997.
- 5) Heta niha çend çavkaniyan dida kivşê ku Şerîf Paşa salên xwe yê dawîn li Misirê derbas kiriye û li vir jî miriye. Derbarê vî yekê de binêre: *Şerîf Paşa - Bir Muhalifin Hatıraları*, İstanbul, 1990. A.Özalp, ew kesê ku ji van bîranînên Şerîf Paşa re pêşgorînek nivîsiye cîhekî de wuha dibêje ku nerast e: "*Şerîf Paşayê ku salên jiyana xwe yê herê bi herêket li Partîsê derbas kir, paşê hate Kahîreyê ji sala 1923 heta roja mirina xwe jiyana xwe li wir derbas kir*".
- 6) Rohat Alakom, *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti*, Tarih ve Toplum, No:171, 1998.

HAWAR hat hawara me!

Hawar dengê zanîne ye. Zanin xwe nasin e.
Xwe nasin ji me re rêya felat û xweşiyê vedike.
Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin.
Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin.
Lewma ko ziman şerta heyîne a pêşin e.

(Celadet Alî Bedir-Xan, Hawar hej. 1, 1932)

FIRAT CEWERÎ

Kovara HAWARê gelekî bi derengî kete destê min. Ez bawer dikim min ew di sala 1982an de bi dest xistibû. Niha nayê bîra min bê min ew çawan û bi kîjan riyê bi dest xistibû, lê baş tê bîra min gava ew ketibû destê min, fena ku malê dinyayê bûbû yê min. Ez ji xwendina wê têr nebûbûm. Mîna ku min tişteki xwe yê bi qîmet wînda kiribû û dîsan ew dîtibû. Hawarê ez hê bêtir bi nivîsandina kurdî ve girêdabûm. Şêrîniya zimanê kurdî bi min şêrîntir kiribû; fikra dostanî, xweşbînî û bêhnfirehiyê li ba min bi qîmet kiribû. Ez ber bi cîhana kurdîtiyê, ber bi kûrîtiya dîroka kurdan ve ajotibûm. Xwendina çîrok, stîtan, şîret û gotarên di Hawarê de rameke bi lezet dabû min. Bîrbîrî û sergiraniya Celadet Bedir-Xan, hêviya peyda-bûna entelektueliyê kurdî li ba min xurt kiribû. Hêviya entelektueliyê kurdî ya xurt, hêviya biserketîne dabû min. Ew Hawara bi çapeke piçûk û bi aleke kurdî pêçayî, ji bo min, bersiveke herî di cih de ya li dijî politîkayên asîmîlasyon û înkariyê bû. Niha, gava ez rûpelên Hawarê di ser hev re diqulîpînim, ez têdigihîjim ku Mîrza Hemreş Reşo bi jinûveçapkirina Hawarê zehmetiyê çawan kişandiye, karekî çiqasî baş û pîroz kiriye. Ez bawer dikim, ger ne ji vê fikir û xebata Hemreş Reşo bûya, wê Hawar bi tenê di arşîv û pirtûkxaneyên hin entelektuelên kurdan de bima û wê nivşek ji xwendina Hawarê bêpar bima. Bêparmayîna vî nivşî, wê di warê zimên de gelek serêşî bi xwe re bianiya. Hemreş Reşo bi jinûveçapkirina Hawarê, hem Hawar ji mirin û jibîrkirinê parastiye, hem ew gîhandiyê nîşkekî, hem jî rê li ber berberî û nelihêvîkirinê zimanê kurdî girtiye.

Niha, gava mirov li dîroka Hawarê û li rola wê ya îroyînî dinihêre, di salên heftêyan de çapnebûna Hawarê, hem di warê zimên û rola zimên de, hem jî di warê hî-


sên milî û xwenaskirinê de, kêmasiyêke mezin e. Di salên heftêyan de, bi taybetî ji 75an heta 80yî, li bakurê welêt tevegriya xortan ya xurt hebû. Dînamîka salên heftêyî mîna bombeyêkê ji teqandinê re amade bû. Lê ev dînamîka ha bêtir angajeyî siyasî bû. Ger bi qasî karên siyasî, karên edebî û çandî jî hatibûya kirin û di wan salan de kovara Hawarê li bakurê Kurdistanê an jî li Tirkîyeyê hatibûya çapkirin, wê li hemberî pêla asîmilasyonê bibûya bendek. Lê mixabin, ew nivîş li welêt, ji peydakirin û xwendina kovara Hawarê bêpar ma; yê ku derketin derveyî welêt, ev kovara ku di dîroka edebiyata me de rola wê ne kêmtî rola pirtûkeke pîroz e, li biyanîstanê bi dest xistin. Dîsan li vê biyanîstanê, dostê hêja, rehmetiyê Mihemed Bekir, bi zewq û besteke mezin li derxistina Hawarê mijûl bûbû. Wî bi çapeke bedew, ji hejmara 1ê heta hejmara 9an, mîna cildekê derxist. Lê nexweşiya kambax pêxîla vî dilşewatê kurd berneda û hê berî ku ew bigihîje armanca xwe bi cih bîne, wî ji nav me koç kir. Mirov dikare bibêje, ku di pêla dudan ya danasîna kovara Hawarê de, rola rehmetiyê Mihemed Bekir gelekî mezin e. Xwedê wî bi rehma xwe şa bike.

Mîna jinûveçapkirinên Hawarê, destpêka weşana wê jî her li derveyî welêt bûye. Piştî şikestina serfîhildanên Dêrsim û Agiriyê, piştî xebatên dûr û dirêj, Celadet Bedir-Xan, bingehê kovara xwe li Şamê datîne. Ew hejmara pêştî di 12ê îlona 1932an de derdixe. Celadet Bedir-Xan dixwaze bi derxistina kovara Hawarê di dîroka kurdan ya nûjen de rûpelekî nû veke û kurdiya ku bi salan di bin nîrê zordestiyê de maye, rizgar bike. Wekî din, ew bi kovara Hawarê kevneşopiyekê jî dişikîne; dev ji nêvî bi tirkî û nêvî bi kurdiyê berdide, an jî bi temamî dev ji zimanê tirkî berdide û di şûna wê de kovara xwe, çend rûpelên frensizî ne tê de, xwerû bi kurdî derdixe. Celadet beg dixwest bi riya Hawarê kurdan bi zimanê wan, bi girîngiya zimanê wan; bi gotineke din, bi hebûna wan bihesîne. Gava mirov çavekî li her 57 hejmarên Hawarê digerin, mirov dibîne ku Celadet Bedir-Xan vekirî tu îdeoloji nepeşandîne, kurd nekirine sinif û tebeqe, sinif û tebeqeyek negirtiye û li dijî sinif û tebeqeyêke din şer nekiriye. Di ferhenga wî de gotina "kurd" tê maneya biratî, hevaltî û dostaniyê.

Di welatekî bê dibistan de, bê perwerdeya bi zimanê mader de, wî dixwest bi Hawara xwe dibistaneke milî ava bike; tê de fikir û ramanên milî, tê de dostanî û biratîyê belav bike.

Lê dema wî demeke bêdengiyê bû; demeke şikestina kurdan, demeke tirs û surgunan bû. Kurdên xwende kêmtî bûn, yê hebûn jî ne ewçend nêzikî zimanê kurdî bûn. Celadet dixwest bi riya Hawarê hem nivîskaran çêbike, hem jî xwendevanan

bigihîne. Wî destê alîkariyê dirêjî Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Nûredîn Zaza û hinên din kir, ew ber bi cîhana nivîskariyê ve kişandin û bi xêra wê dibistanê ye ku îro navê van kesayetiyan kurdan nemir bûne. Hem ew kesayetiyan kurdan nemir bûne, hem jî bi xêra Hawarê zimanê kurdî yê edebî zindî maye. Ji xwe gava Celadet Bedir-Xan destê xwe ji siyaseta di-kişîne û xwe bi hemû hêza xwe davêje qada ziman û edebiyatê, ew ê li van rojan fikirîbe. Li gorî delîlên ku li dû wî mane û li gorî gotinên kevaniya wî Rewşen Bedir-Xan ku ez di sala 1987an de li Baniasê lê bûbûm mêvan, Celadet Bedir-Xan derwêşekî karê xwe bûye. Wî hemû xebata



xwe li ser siberojê ava kiribû. Ji bo me bû, ji bo nivîskî berî me bû. Lê nivîşê berî me pê nehisiya û tê re buhurî, lê ev nivîşê me pê hesiyaye û mîna ku li xezîneyekê rast hatibe, bi herdu destan lê xwedî derdikeve. Hebûn û maneya Hawarê îro ne bi tenê ji bo kurdiya nivîskî, lê ew li ba kurdên îro mîna otorîte jî hatiye qebûlîkirin. Ez bawer dikim ger îro kovara Hawarê tunebûya, me ê di warê zimanê nivîskî de gelek serêşî ji hev re derxista. Îro, piraniya partî û rêkxistinên kurdan, piraniya çapemeniya kurdî li ser riya Hawarê diçin. Ev jî, ji bo rojên pêş kêfxweşiyekê dide mirov.

Mîna ku min di destpêkê de jî got ku kovara Hawarê cara pêşî di sala 1982an de kete destên min, lê hinek hejmarên wê yên eslî, di sala 1987an de gava ez li Baniasê li Rewşen Xanimê bûbûm mêvan, wê dabû min. Wê ji min daxwaza çapkirina hemû hejmarên Hawarê kiribû. Ji bilî Hawarê jî wê hinek pirtûkên weşanên Hawarê û xebata Celadet ya li ser zimên "Bingehên Gramera Kurdmancî" dabûn min. Me "Bingehên Gramera Kurdmancî" mîna pirtûk di sala 1993an de weşand. Lê herçî

jinûveçapkirina Hawarê bû, hem hemû hejmar li ba me peyda nedibûn, hem jî ji bo karekî weha cesareteke mezin, cidiyet û berpirsiyariyeke taybetî diviya. Gava di destpêka salên 90î de me di bin bandora Hawarê de dest bi weşandina kovara NÛ-DEMÊ kir, em hê bêtir li ser derxistina Hawarê fikirîn. Hejmarên ku li ba me kêmbûn, me ji ba Mehmed Uzun û Mahmûd Lewendî peyda kirin. Herdu hevalan jî bê ku tu keleman ji me re derxin, arşîvên xwe ji me re vekirin; ez li vir spasên xwe yê ji dil ji herdu hevalan re pêşkêş dikim. Herweha, dostê hêja Emîn Narozî bi xebata şev û rojan tîpguhêziya her 23 hejmarên pêşî kir; ne ji vê xebata wî bûya em ê ji xwendina wan ya latîni bêpar bimana. Ez li vir gelekî spasî wî jî dikim.

Mîna tê zanîn, her 23 hejmarên pêşî bi herdu alfabeyan; ango bi alfabe ya erebî û latîni dihate weşandin. Ji hejmara 24an heta ya 57an tenê bi alfabe ya latîni hate weşandin. Hem di destpêka kovarê de hem jî di berdewamiya weşana kovarê de ji bilî zaravayên kurmançî, mirov pêrgî zaravayên soranî û zazakî jî tê. Ji ber ku zaravayê soranî îro jî bi alfabe ya erebî tê nivîsandin, me hemû nivîsên soranî neguhestin alfabe ya latîni, lêbelê me bi tenê ew nivîsên soranî ku pevgerîdaneke wan an bi kovarê re an jî bi nivîsên kurmançî re hebûn, guhastine. Herçî nivîsên zazakî ne, ji ber ku îro ev zarava bi alfabe ya latîni tê nivîsandin, me tîpguhêziya wê kiriye. Lê me di tîpguhêziya hersê zaravayan de jî, tîpa "q" û "k" rast, yanî mîna îro bi kar anîne. Di 23 hejmarên pêşî de tîpa "q" di şûna "k" de û tîpa "k" jî di şûna "q" de dihate bi kar anîn. Di guherandinên hejmara 24an de, em dibînin ku hem alfabe ya erebî ji kovarê radibe, hem jî herdu tîp mîna ku em îro bi kar tînin, têne guhertin.

Herçiqas em di destpêkê de fikirîbûn ku Hawarê weke cildekê derxin jî, lê paşê me maqûltir dît ku em bikin du cild. Cilda yekê ji 23 hejmarên pêşî û beşa tîpguhêziyê pêk tê û cilda duyan jî ji hejmara 24an heta ya 57an e. Me ji bo her cildekê naverokên cihê çêkirine, lê me hejmarên rûpelan ji hev veneqetandine. Dibe ku hin hejmarên bi zehmetî werin xwendin hebin, lê me ev yeka han da xatîrê orjînalê û me nexwest em hemû hejmaran ji nû ve binivîsînin û orjînalê kovarê xerab bikin.

Me bi vê xebatê xwest ku em di sedsaliya rojnamegeriya kurdî de careke din balê bikişînin ser xwendin û nivîsandina zarê kurdî û careke din Hawarê û xwedî û berpirsiyarê wê Mîr Celadet Alî Bedir-Xan bi bîr binin.

Stockholm, 1998

Ev nivîs wek kurtepêşgotina çapa Hawarê ya nû hatiye pêşkêşkirin.

ELYÊZERÊ KURD

MUSTAFA AYDOGAN

Sirgûn ewrekî reş î tarî... Sirgûn reşbîniya ku bûye kurkê qetiyayî... Sirgûn êrîşên bêhêvitiyê yên ku berê wan li bihara dilê me... Sirgûn reşqedera ziman û edebiyata kurmançî. Hem ziman û hem jî edebiyata me di gelek demên dîrokê de bi êrîşên pîrhêl rû be rû bûne. Nuha jî bi îmkanên teknîka nuh ve hawirdora wan hatiye girtin. Dinya hem li ser serê kurdan û hem jî li ser serê ziman û edebiyata wan bûye tara bêjingê.

Sirgûn bitenêbûn, sirgûn êş û elem, sirgûn hesret û kesereke bêdawî. Sirgûn li devereke bakurê dinyayê ya xalî sermayeke dijwar î nedîtî. Sirgûn labîrentên wendabûn û bêhêvitiyê... Malmîratê bireke weha kûr î bêbinî ye ku mirov di wê de hertim bi hesreta bi rûkala dinyayê ketinê ve dişewite. Sirgûn zîndana hêviyê ye; serî li kevirê gorê ketin e.

Di sedsala bîstî de kurd her ji demekê carekê mecbûrî sirgûnê bûne û ji ber xezeba ku bi awayekî nedîtî bi ser wan de hatiye, xwe li geliyên kûr î bêbinî yên ku ji bo dabelihandinê amade bûn girtiye. Kurdan ji sirgûna bêbext bext xwestiye. Sirgûn jî bi nan û perçakî li ber digere ku hinek xwe lê bigire û ew jî bikaribe fonksiyona xwe bi cîh bîne.

Lê kurdan di dîroka xwe de nîşan daye ku sirgûn di eynî wextê de, di nav toz û dûmana ku ezmanê şîn, bi tebeqeyeke reş nixumandiye de, çirûsk bi çirûsk hêvî ye jî. Ji ber ku ji bo ev qedera xerab bête guhertin hewildanên herî berbiçav dîsa her li sirgûnê, li vê devera bêçare peyda bûne. Kurdan bi vî awayî ji bêçaretiyê çare afirandine.

Ev li gel xebarên din di warê weşan, ziman û edebiyatê de jî her weha ye. Rojnameya "Kurdistan"ê ya ku em îsal sedsaliya wê pîroz dikin û me roja weşandina wê (22 Nîsanê) wek roja rojnamegeriya kurdî qebûl kiriye -wek piraniya rojname û kovarên piştî xwe- jî li sirgûnê derketiye. Îro jî gelek kovar û rojname li sirgûnê

derdikevin. Îro jî ziman û edebiyat li sirgûnê bêtir di ber xwe de didin û îmkanên pêşveçûnê bêtir peyda dikin.

Hawarê jî wek gelek kovar û rojnameyên din ji ber xezeba tarîtiyê, ji ber agirê ku li kurdan bariyabû, 66 sal berê li sirgûnê dest bi jiyana xwe ya weşanî kir. Ew gava piştî serhildanên kurdan ên ji bo bidestxistina maf û azadiyên neteweyî têk çûn û co û cobarên welêt sor herikîn, gava kurd bûbûn noka li kevir, wek bendeke kurdan a ji bo xwe li hember êrişên tunekirinê bikaribin bigirin derket ortê. Di pêvajoya ku pêlên bêhêvitiyê bi xurtbûn û heybeta xwe ya herfî mezin herkes dabû ber xwe de, ew li sirgûnê, li vê devera kana bêçaretîyê, wek kaneke hêvî û çareyê derdikeve ortê. Banga Hawarê di şertên ku êdî ço di şikeftê de hilnedihat de, halana ji bo desthilanîna kurdan e. Parêzgeha me ya weha xurt e ku li hember êrişên asîmîlasyonê em dikarin bi ewleyî tê de bisitirin.

Hawar di jiyana kurdan de qonaxeke pir girîng e. Ev girîngiya wê, ne bi tenê ji ber bi kurmançbûna wê an wan xusûsiyeten wê yên ku min li jorê behsa wan kir, rê. Beriya hertiştî, fikira ku di 1919an de bi tesîra Mécêr Nowelê îngilîz bi Celadet Bedir-Xan re peyda bûbû, bi saya wê têkilî bi jiyana re danî. Bi vî awayî C. bedir-Xan bi perspektîva xwe ya ku yekîtiya zimên bi yekîtiya herfan pêk tê, bingehê alfabe ya me ya latînî danî û di rûpelên Hawarê de pêşkêşî gelê me kir. Wî bi cidiyeta alimekî her herf bi hûrbijartî hilbijart û sedemên vê hilbijartinê ji bo her herfê bi detay şirove kir. Bi wê re bingehên gramer û rastnivîsandina kurmançî hat amadekirin. Û piştî van gavên Hawar û xwediyê Hawarê, êdî tu kesî nema dikaribû bigota zimanê me bi tenê zimanê axavtinê ye. Ji ber ku bi van gavan re hîmê zimanekî nivîsandî hatibû danîn. Gelo beriya Hawarê bi vî zimanî nehatibû nivîsandin? Celadet Bedir-Xan di hejmara bîstî de di vî warî de weha dibêje: " Herê, hatibû nivîsandin û di zemanên gelek kevn de. Berî çend babelîskan hin camêran bi zimanê me kitêbînen mezin jî çêkirine. Lê wan nivîsaran ji me re zimanek ne dianîn pê." Lê Celadet Bedir-Xan xebatên wan camêran înkâr nake; wek hinekan dîrokê ji xwe nade destpêkirin û dibêje " Heke Hawarê hîmê zimanê me daniye Xanî giyanê wî afirandibû. Ji xwe kurdaniya bîrewer bi Xanî re dest pê dike."

Xusûsiyeteke din a Hawarê ev e; wê tesbît kiriye ku di navbera edebiyata devkî û nivîskî de ferqeke mezin heye. Di vê niqreyê de tişteki nuh tune ye, ji ber ku ev beriya wê jî têtê zanîn. Lê tiştê ku xusûsiyeteke taybetî dike para wê ev e ku wê bi vê tesbîta xwe bi tenê qîma xwe neaniye û rewşa edebiyata nivîskî ya ku hema hema bi helbestan ve sînorkirî mabû qebûl nekiriye û ji bo zimanê me di her qada jiyana de bête bikaranîn, bi perspektîveke zelal û çalakiyên berbiçav hewil daye. Ji aliyekî

din ve, rûpelên Hawarê belgeyên dewlemendiya folklorê me ye. Wê ji bo berhevkirin û ya herî girîng jî bi awayekî bi nivîskî pêşkêşkirina hêjayiyên di vî warî de xebateke weha mezin kiriye ku mirov li hember şiyana dûrbîniya xwedî û xebatkarên wê ecêbmayî dimîne.

Hawarê di xebata xwe ya ji bo pêşdebirina zimên de, girîngiyeke mezin daye wergeran jî. Wê di pêşdebirina zimên de rola wergeran baş dizanîbû û ji ber vê yekê rûpelên xwe bi wergerên cur be cur jî xemilandine.

Mirov ji kîjan aliyê li Hawarê binihêre, mirovê şoreşeke xurt tê de bibîne. Ew li gel hin xusûsiyetên xwe yê ku li jor behsa wan hat kirin, hem mamoste bû, hem dibistan û hem jî propagandîsta çand û zimanê kurdî bû. Ew di vê niqteyê de sitûna me ya herî xurt e ku divê îro jî em xwe bispêrinê. Vê rola wê ya dîrokî nebûye qismetê tu kovarên din. Divê em li ser îmkanên ku bi saya wê hatin afirandin û fikir û kirinên xwediyê wê yê ku ji bo bingehekirin û pêşdebirina çand û zimanê me ku di pêvajoya jiyana wê ya weşanî de derketin ortê, bi awayekî pîrêl bifikirin, mînaqêşe bikin û di vî warî de baweriya li ser esasê zanebûnê hatiye avakirin xurttir bikin. Bi şertê ku em di çarçoveya lêbixwedîderketina hêjayiyên xwe de bimînin, em dikarin di hin waran de bi awayekî cuda bifikirin û bi misteweya xwe ya nuha reforman mînaqêşe bikin. Ev tiştêkî xwezayî ye û divê tu kes li hember bikaranîna vî mafê xwezayî raneweste. Celadet û Hawar bê şik bingehek in. Perspektîvên Hawarê çarçoveya me ye. Lê divê em hişkiya olperestî ji derveyî vê çarçoveyê bihêlin. Bi awayekî zanistî û bi perspektîva ku hertiştê kêr divê bête temamkirin û hertiştê şaş divê bête rastkirin, mînaqêşeyên xwe yê ji bo zelalkirin, pêşdebirîn û lêbixwedîderketinê bidomînin.

Fonksiyoneke derengmayî

Xusûsiyetên Hawarê û mîrasa ku wê ji me re hişt, wê ji hemû kovar û rojnameyên din vediqetîne. Ev taybetmendiya wê, îmkanên bitesîrbûna wê jî zêdetir dike. Lê mixabin wê gavê tesîra wê ji bo hemû beşên welêt bi eynî dereceyê xuya nebû. Ev tesîr bi taybetî li Bakurê welêt, ji ber şertên wê demê bi sînor ma. Ancax gava sirgûna bi 12ê Îlonê re dest pê kir, îmkanên ku Hawar bikaribe fonksiyona xwe ya derengmayî ji bo vî perçeyê welêt jî bileyize bêtir bûn. Bi binxetbûna xortên ku xwe ji ber xezeba tarîtiyê didan alî, şertên bicîhanîna fonksiyona derengmayî jî hêdî hêdî dihatin amadekirin. Di vê mahneyê de mirov dikare bibêje, Hawar "diyarîyeke" ji wan diyariyan e ku di pêvajoya xezeba 12ê Îlonê de hatiye bidestxistin.

Ger Hawar di salên 70yî de li Bakurê welêt hatiba weşandin, ger perspektîvên wê

û xwediyê wê ji aliyê girseyan ve hatiba zanîn û fahmkirin, bê şik rengê minaqeşeyên me yên wê demê û helwesta me ya di warê lêbixwedderketin û pêşdebirina hêjayiyên neteweyî de, dê bi awayekî din ba. Lê mixabin ew pêvajoyê ji mîras û tesîra Hawarê bê par hat jiyîn. Ger Hawarê bikarîba tîna xwe bida tevgerên wê demê, di warê bi kurdî jiyîn û lixwevegerînê de, gavên pir mezin dikarîbûn bihatana avêtin. Lê mixabin nîşên heftêyî ji vê dewlemendiyê bê par, hilma xwe ancax li binya xetê vekir.

Min bi xwe Hawar cara yekem di havîna 1981ê de li bajarê evînê, li Qamişloka rengîn dît. Hevdunaskirina min û wê berê li taxa Qudûrbegê dest pê kir, lê gava me ji wira bar kir û em çûn xaniyê rehmetiyê Xelîlê Bêzo -ku gelek mexdûrên 12ê Îlonê wî baş nas dikin- êdî di orta min û wê de -wek ku di orta wê û gelek kesan de hebû- dostaniyeke ku gotin têrê nakin hatibû peydakirin. Ew bi temamî bû heval û hogîra min a sirgûnê, dibistana min a xwe baştir nasîn û bi xurtî lixwevegerînê. Min her wê salê, ew çend caran xwend, bi gotineke din, min ew berê xitim kir û dû re jî carî kir.

Her ku min rûpelên wê di ser hevdu re qulapandin, deriyê dinyayeke rengîn û dewlemend li ber min vebû. Her rûpelek mîna kulîlkeke nuhbişkivî... Ez ji bêhna ku ji wan difûriya sermest bûm û min bi vê sermestbûnê xwe li baxê îrem girt. Min xwe di pêlikên ber derî re bera xwarê da, ez daketim dinyaya wê. Ez li mala Mîr bûm mêvan. Ez li mêvanperwerî û comerdiya kurdan bûm şahid. Gava min li "Xwe binas" a wî guhdarî kir, ne tu rêyên çiyayên asê û ne jî tu ba û bahozan dikarîbû ez rawestandama. Min şîretên wî yên di warê xwenaskirin û lixwevegerînê xistin serê xwe û min soz dayê ku ez ê eynî şîretan li piçûkên xwe jî bikim. Min li Ehemedê Fermanê Kîkî guhdarî kir. Min di "Ez û Dîlberê" de rewşa Cegerxwîn î li hember "yar"ê dît. Ez li N. Zazayê ku evîn û hesreta welatê wî di dilê wî de hilnedihatî û zor dida qafesa sîngê rast hatim. Ez û ew em di "Derketî" de bi gotina wî ya ku derketî li her derê bi tenê ye, bi hevdu re kelogîrî bûn. Ez çûm şevbihêrka Dêrikiyan. Min ji Êlas Efendî tecrubeya 1925an wergirt, diwariya şertên sirgûnê bi çavên serê xwe dît. Ez dû re bi xemgînî ketim bin darbesta wî û ew tevî hesreta wî min ew li Ebû Ceradê veşart. Min ji devê Qedrîcan li "Dêrik"ê guhdarî kir. Bi wê re, di wê kelkela germa havînê de bayekî hênîk ji Tûrcelê hat û xwe li min girt. Ez bi Osman Sebrî re bi minasebeta "Tevdîra mişkan" li ser bêtevdîriya kurdan fikirîm. "Dil ji min bir" a Melayê Cizîrî dil ji min jî bir. Min di bin tesîra Çarînen Xeyam ên bi kurdiya K. A. Bedir-Xan hatibûn wergerandin de piyaleyê şeraba sor ji destê meygerekî girt û bi ser xwe de dakir. Ez bi Mem re jî temaşeya xweşîkbûna

Zînê têr nebûm, lê dû re em bi hevdu re di nav dixana fesadiyê ya ku Beko bi erdê xistibû de wendabûn.

Ez li Elyêzerê cihû rast hatim. Min dît ku zilamek dibêje ziman bingeh e, bê ziman netewe nabe. Mirovek zimanekî vedijîne û pêşkêşî neteweyekî dike. Min di vî warî de li Celadet Bedir-Xan guhdarî kir û ji serpêhatiya vî zilamî îbret girt. Min şertên Elyêzer û yên Celadet Bedir-Xan dan ber hevdu. Min dît ku herdu jî li welatên xwe mezin nebûbûn. Lê herduyan jî bi fikirên mezin û ji bo welatên xwe hereket kiribû. Di vê rêyê de fedekariyên pir mezin nîşan dabûn. Herduyan jî ji bo yekîtiya neteweyî û yekîtiya zimên pêşevanî kiribû û dîsa herduyan ev pêşevanî di bin ronahiya perspektîvên xwe yên mezin î neteweyî de bi bawerî û bi israr meşandibû. Herduyan jî bawer dikir ku ger ziman tune be, netewe jî tune. Dîsa herduyan ji bo yekîtiya neteweyî jî ziman wek bingeh dizanîbû.

Min serê xwe ji Hawarê rakir û ez li rewşa nîfşê xwe, ya rastî bêtir li rewşa xwe fikirîm. Salên heftêyî wek xewnekê hatibû jiyîn. Di nav hêjayiyan de wan hêjayiyên neteweyî yên ku ji ber paraztina wan min xwe bi derbekê re di Kolana Evînê de dîtibû, ancax piştî hevdûditina min û Hawarê rohnîtir û zelaltir bûbûn. Nîfşê me he ta wê gavê ji bo bîdestxistina wan hêjayiyan fedekariyên pir mezin kiribûn, lê piraniya wan bi wan hêjayiyan nejiyabûn, zimanê wan î esasî yê mînaqêşe û nivîsandîne ne zimanê kurdî bû, çand û folklorê ku ew li ser konsantre bûbûn di giraniyê de ne ya kurdî bû. Lê ji ber ku ew kurd bûn û wan maf û azadiyên kurdan paraztibûn felek li serê wan geriyabû û wan jî xwe li hêlîna sirgûnan girtibû. Di vê hêlînê de Hawar hat gaziya vî nîfşî û ew hêdî hêdî bi hêjayiyên eslî ve techîz kirin. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku di warê lixwevegerîna vî nîfşî de Hawarê bi derengî be jî roleke esasî leyiztiye. Ji xwe, yê ku di navbera bakurê welêt û Hawarê de dû re rola pîreyekê leyiztî û hîn jî dileyize jî her ev nîfş e ku têkiliyên wan bi Hawarê re çêbûne.

Kurd di Hawarê de bilind in

Di her rêzeke Hawarê de, di her rûpelekî wê de û di her hejmareke wê de hewildanên ji bo kurdan hîn bilindtir bikin xuya dibin. Gava ew ji bo ku kurd bi xwe bi hisin hewil dide, ji bo paraztin û pêşdebirina maf û azadiyên wan dixebite, wek hînekî din ku di dema me de dikin, kurdan qet piçûk nabîne. Nefretê ji kurdan nake. Ji bo xebata xwe mineta xwe li wan nake. Êrîşî sitûnên ku kurd xwe dispêrinê nake. Tam tersê wê, ew ji kurdan pir hez dike û ji bo vê hezkirinê tiştê ku nikaribe feda bike tune ye. Ew ne ji xwe, ne ji dîroka xwe û ne jî hêjayiyên xwe fedî dike.

Ew bi awayekî serbilind pesnê dewlemendî û hêjayiyên kurdan dide. Mirov dikare pir bi hêsanî bibêje ku bi Hawarê re rijikên kurdan jîr bûn. Ji bo ku kurd bikaribin bi xwe bihisin û xwe nas bikin, da ku bikaribin bi awayekî hîn xurtir û zanetir li van dewlemendî û hêjayiyan bi xwedî derkevin, Hawar û Celadet Bedir-Xan xebatên xwe yên di warê şiyarkirin û fêrkirinê de bi hemû awayên fedekariyê û bê rawestan domandine.

Çeka me ya bitenê: ziman

Celadet Bedir-Xan di hejmara bîstê de, li ser çeka ku em ê bikaribin xwe pê biparêzin radiweste: *"Ji ber ku milletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzînin: Ol yek, Zman dudo. Lê heke ola milletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek yek bitenê ye, û bend tenê zman e."*

Gotinên xwediyê Hawarê pir eşeker ne; di vî warî de xeteke esasî pêşkêş dikin; bingeh û rêya biserketinê nîşan dikin. Piştî van gotinan, piştî xeta ku Elyêzerê kurd daniye, êdî hun lîberal bin, sosyalîst bin, mihafezekar bin bibin; çî dinivîstin, çî minaqeşe dikin bikin. Lê ger we di van nivîsandin û minaqeşeyên xwe de miameleya sinifa duyem bi zimanê kurdî re kir, ew tê mahneyê ku we ji destpêkê de wenda kiriye. Di vê qonaxa îro de hebûna çand û zimanê kurdî bi qasî ku bi dema Hawarê re nikare bête miqayesekirin tê tehdîdkirin. Îro mala ku lê bi kurdî neyê peyivîn, komeleya ku zimanê wê yê resmî ne kurdî be, partiya ku ji bo ji zimanê kurdî bireve li mazeretan bigere, nikare doza kurdan jî pêş de bibe. Ev herweha ji bo kovar û rojnameyên ji aliyê kurdan ve derdikevin û ne bi kurdî, lê bi zimanekî din xîtabî kurdan dikin jî derbas dibe. Ji ber ku ger kurdî bê jibîrkirin û di giraniyê de zimanekî din bibe zimanê me, wê gavê tu mahneya hewildanên me yên ji bo paraztin û pêşdebirina hêjayiyên neteweyî dê tune be. Ger em girîngiya bikaranîna zimanê fahm nekin, em ê hertim ji xelkê re herin eş.

Yên li xerîbiyê dijîn jî divê guhên xwe baş bidin Elyêzerê kurd. Ew di hejmara 40î de berê xwe dide kurdên li xerîbiyê dijîn û weha dibêje: "Belê ji wan kurdan re divê, gava ji derve tene mal, herwekî cilên xwe ji xwe dikin û wan bi cilên malê diguhêrin, zimanê xwe jî welê biguhêrin û bi zimanê kuçê di nav malê de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tişteki miqedes hilînin."

Çi li welêt û çî jî li xerîbiyê, di gelek civînên kurdan de dengê yên ku dibêjin ziman ne girîng e, tiştê girîng ew e ku em bikaribin mesaja xwe bigihînin gel, pir tê bihîstin. Û gelek hene ku hîn jî bi vê perspektivê hereket dikin û bi çavekî piçûk li wan kesên ji bo jiyandina kurdî hewil didin dinihêrin û wan wek mirovên ku xu-

NAR

NAR

HAWAR

2

Hajrat 24/7
(1933-1943)

1

2

sûsiyeta vê pêvajoyê fahm nekiriye dibînin. Ger em girîngiyê nedin vê minaqeşeyê û di xebata paraztin û bikaranîna zimanê xwe de, sist bin, xwediyê perspektîvên ku li jor hatin zimên, dê me bikin dizê sola me. Ji bo vê yekê di vî warî de hewildanên xurt û pîrhêl pêwîst in.

Divê herkes û di serî de xwediyên perspektîvên weha, xwe vir de û wê de nebin û di vê pêvajoyê de baş tê bigihêjin ku yên bi kurdî nepeyivin û nenivîsînin, dara bin xwe dibirin. Di warê çand, ziman û edebiyatê de û ya girîng di warê hebûna xwe de, şertên ku kund li dewsa warên wan bixwînin bi destê xwe amade dikin. Yên ku ji bo kurdî wek zimanê xwe yê esasî bi kar neînin li mazeretên bêbingeh bigerin û ji bo paraztina rewşa xwe, her ku mirov singekî bikute û ew jî tûrekî pê dakin, dê di warê midaxeleya vê pêvajoyê û lêbixwedîderketina hêjayiyên xwe yên neteweyî de, hertim wek agirê li heriyê diçe, bê tesîr bin. Dewla wan dê tu carî bi avê nekeve.

Xelateke sedsaliya rojnamegeriya kurdî

Hawar çî ye ne çî ye, tevî fonksiyonên xwe herî baş di hejmara yekê de bi gotinên xwediyê xwe hatiye zimên: ” *Hawar dengê zanîne ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike, dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyîne a pêşîn e.*”

Hawar di nav toz û dûmana reşbîniyêke dijwar î xerab de xweşbîniyêke kurdan e. Her rûpeleke wê kulîlkek û her hejmareke wê demsalek e...

Hawara ku li sirgûnê di 15ê Gulana 1932an de dest bi weşanê kir, berê di 1975an de û dû re di 1987an de dîsa li sirgûnê li welatên Ewrûpayê yên cuda wek rojeke kurd ji nû ve hilat û berê tîrêjên xwe beş bi beş ber bi welêt ve vekir. Lê îsal li Swêdê, yanî vê carê jî li sirgûnê ev tîrêj hemû li hevdu civiyan û di roja rojnamegeriya kurdî de, bi şewqeke mîna ku li ser serê çiyayê Nemrûd ji nişka ve xuya bibe û hemû şopên çand û dîroka me de ronahiya xwe de bihêle, berê xwe da gelê kurd. Di bin vê şewqê de mezopotamya rengîntir, Firat û Dicle bi heybettir herikîn.

Nûdemê bi weşangeriya xwe ya birêk û pêk, bi estetîka xwe ya taybetî û bi xebata xwe ya hûrbijar em bi xelateke sedsaliya rojnamegeriya kurdî; bi hemû hejmarên Hawara me şad kirin. Divê êdî kurd tevî hêz û îlhama ku ji Hawarê tê wergirtin, di hawara xwe de, di hawara çand û zimanê xwe de, di hawara hebûna xwe de werin û ”rêya felat û xweşiyê” vekin. □

NÊRÎNÊN ÇEND REWŞENBÎRÊN KURDAN DI DERHEQA HAWARÊ Û ROLA WÊ DE

DERWÊŞ M. FERHO

Gava mirov pelên HAWARa pîroz vedike û nivîsarên wê dixwîne rehên ruhê milî di laşê mirov de qewîntir dibin. Ev jî dide xuyakirin ku li ba berpirsiyarên Hawarê di salên sihî de ruhê kurdî çiqas xurt bû. Û tiştê herî girîng, di bin çî zehmetî, çetînî, zor û tunebûnê de ev ruhê kurdî ku di kovarê de jî xweş xuya ye, berthema xwe bi 57 hejmaran domandiye. Di bin her awayê zehmetiyan de şoreşa alfabe û zimanê kurdî bi serfirazî pêk anîne. Pîrozî û giraniya Hawarê jî di vir de ye.

Tiştê ku bala min di rojên îro de dikişîne ev e: em kurd he-ta îro, -ev 66 sal in- di warê gramer, alfabe û standardekirina zimên de ji dereca Hawarê nebuhurtine. Hawarê berî 66 salan çî da me ew jî heye. Ango, Mîr Celadet Bedir-Xan di salên sihî de di warê zimanzaniyê û (û ez karim bi rehetî jî îddîa bikim di warê siyasî, civakî û kulturî de jî) ji çapa întellektueliya îroyîn ya kurdan pêşdetir bû. Gava mirov li nivîsarên wî, xebata wî, xebata standartkirina zimanê kurdî ku ji hemî hêlên Kurdistanê bi hev re muqayese dikir, bîr û baweriyên wî di warê siyasî de, jiyana wî ya civakî û cîhana ku ew di çarçewa kulturî de dijî, dinêre, her tişt zelal dibe.

Gelek caran tê gotin ku Hawar rola xwe ji her demê zêdetir niha dilîze. Ez ne di wê baweriyê de me. Hawarê di salên weşana xwe de jî, di salên paş xwe de jî û di dema îro de jî rola xwe ya mezin û piralî bi awayekî serketî listiye. Herçend Hawar bi jimareke pir kêr dihate weşandin. Pir kêr kesan dikarîbûn wê bi dest bixin. Lê her jimara hejmareke wê mîna 'Ema Quranê li nav rewşenbîrên kurd digeriya. Lê dihate pirsîn. Her helbesteke kurdî, bi taybetî yên Cegerxwîn mîna ayetên Quranê dihatin jiberkirin. Mîna stranên dihatin gotin. Tiştê herî balkêş jî mele, şêx, mirîd û sofîyên dîndar ev helbest gund bi gund digerandin, ji xelkê re bi serbilindî dix-

wendin. Heta elîta bilînd ya kurdan jî ev helbest ji ber dikirin û dixwendin. Heta niha jî ev adeta xwendina helbestên Cegerxwîn, di nav kurdan de heye. Ev hemû bi saya Hawarê bû. Gelek kesên ku ew helbest jiber dikirin û di nava civatan de dixwendin hê jî dijîn.


Nivîsarên li ser mijarên cihê ku di nava pelên Hawarê de dihatin nivîsîn jî roleke pir mezin dilîstin. Ji çîrokên geleverî heta bi tefsîra Quranê, ji mijarên siyasî heta mesele û metelokên pêkenîne tesîra xwe li çarçewa ruhê kurdî re bi awayekî xurt dikirin. Ji ber vê yekê ye ku Hawar mîna pirtûkeke muqeddes e. Ji bo kurdan ew Quran e, Încil e, Tewrat e, Mishefa Reş e. Û bi çapa xwe ya nuh û bi temamî ji aliyê Firat Cewerî –NÛDEM– ev pirtûka muqeddes careke din fersenda xwendina wê mimkin bû. Bê guman, dîsa bi gelek zehmetî û çetînî ev çap amade bûye. Firat Cewerî ew wezîfa xwe ya pîroz kir. Dor dora bîrewerên kurd e ku wê di nava civaka kurd de bi awayekî fereh belav bikin! □

SEBRÎ BOTANÎ

HAWAR niha jî fêrgeheke giring û binyatiye. HAWAR berî 66 salan li hawara me hat. Ne wek kovarêke normal hat. Wê bi hatina xwe re ABCyeke delal û amadekirî jî bo me anî û bingehên rêziman û nivîsandina kurdiyê, pê belav kir. Ev ji aliyê HAWARNASAN ve bi lêkolîn û şirovekirinê bi dirêjî li ser hatiye sekinandin û ta niha jî di rojname, kovar û berhemên kurdan de, li piraniya deverên Kurdistana parçekirî û li Ewropa û Stenbol, bi lêkolîn û gengeşê li ser dixebitin. Mala wan ava be.

Bêguman ko Hawarê ciyekî bilînd û pîroz di ser û dilê van Hawarnasan de heye. Min got Hawarnas, min negot zimanzan, nivîskar an jî ronakbîr. Çunkî pir mixabin, ne hemî zimanzan, nivîskar û ronakbîrên me, Hawarnas in. Belkî hindêk ji wan Hawarhez bin, lê qet ne Hawarnas in. Ji xwe ne spas ji bo Xwedê û partiyên Kurdistanê, em bê xwendegehî jî... Madem rewş ev rewş e, çare çi ye?

Çare û derman bo vî derdê me, fêrgeha Hawarê ye. He-



HAWAR mina du cildan di nava weşanên NÜDEMÊ de derketiye

ke na ew nivîskarê HAWAR nenasî be, an ne Hawarnas be, dê çawan bişê dev ji devoka devera xwe berde?

Di warê edebiyat û kulturî de jî rola Hawarê mezin e û kartêkirin û bandora wê jî li ber çav e... Hawar li hawara me hat... Gereke em jî li hawara Hawarê herin. Em zimanê wê spehîtir û tekûztir werar bikin û bixwînin û bidin xwendin.

Hawar ji ciwanan dixwaze ko kevl û kavlên wê vekewêşin û tiştine nû jê derbînin zimanê xwe pê serrast bikin. Hawarê riya zimanekî tekûztir ji zimanê xwe ji me re vekiriye. Ew dibêje, ez hew têra we dikim, gereke hûn ji her alî ve bi dilsojî bixebitin û zimanekî bilindtir û hevgirtîr bînin meydanê ji bo nivîsandina kurdiyê.

Êdî firazî bo kur û keçên Hawarê û rûreşî bo neyarên zimanê Hawarê. □

PERVÎN CEMİL

Ez bawer dikim ku em hemî dipejirînin ku HAWAR bin-geha zimanê kurdî yê nivîskî, zaravê kurmancî, daniye.

Eger rojnameya kurdî ya pêşîn KURDISTAN be jî, ez bawer dikim ku ji aliyê nivîsîna kurdî ya paqij, HAWAR ciyê pêşîn digire. Bi saya Hawarê, îro bi dehan nivîskarên kurd, nemaze li Ewropayê, bi kurdiyeke hema hema standard -ez dikarim bêjim %90 standard- dinivîsin. Eger ji salên 1978 heta salên 1998, ango di nav 20 salan de, ewqas nêzîkbûn di awayê nivîsîna kurdmançî de bûbe, ev bi saya Hawarê ye. 20 sal ji bo ku zimanê wî li welêt qedexe ye û ku ne akademiya wî û ne jî sazandeyên wî yê din hene ne gelek e. Heta em dikarin bêjin ku ev mûcîzeyek e. □

HESENÊ METÊ

Bêguman Hawar jî weke gelek kovarên dunyayê kovareke dema xwe bû, lê bi cudayiyekê. Bi cudayiyêke muqedes. Rewşa siyasî, civakî, kulturî û nemaze tradisyona xwendin û nivîsandina bi kurmançî tuneye û di demeke weha de Hawareke pîrozwer dest bi weşanê dike. Ew kesên ku dest davêjin Hawarê û bi karê wê radibin, (mîna karê wan hemû kitêb û nivîsên muqedes) bi hejmareke kêm in. Û Xwedê dizane di destpêkê de bi qasî hejmara hawariyên cenabê Mesîh jî hawariyên Hawarê tunene. Li ber destê min îstatîstîkek tuneye ku ez bêyî piştakultî bibêjim, tîraja Hawarê çî bû û heta dawiya jiyana xwe bû xwediyê çend hawariyan. Lê tiştêkî berbiçav heye, meriv têderdixin ku di wan deman de ji ber gelek sedeman Hawar bi fonksiyona kovarekê ranebûye û hawariyên wê jî nikanî bûne rola xwe bilîzin. Bêguman xwediyê Hawarê jî di wan deman de hay ji vê yekê hebûye. Hay jê hebûye ku heta demekê hejmara hawariyan ê zêde nebe, hay jê hebûye ku zimanekî hawarî û lîteratureke bi vî zimanî ê dîrûdirêj bikêşe, hay jê hebûye ku jiyana wî ê jî têr neke. Diyar e ku rêzên bi navê *Zilamek û Zimanek* jî ji bo sebat û mebesteke weha ye.

Hawarê xwe ne gihand hejmareke şêstî û bêdeng ma, li gor agahdariyên ku têne gotinê tîraja her hejmareke Hawarê di binê şêstî re bûye, xwediyê Hawarê xwe ne gihand temenekî şêstî û eniya xwe siparte axa sar, hejmara hawariyên Hawarê ne gêhîşt şêstî û yek bi yek serê xwe danîn û çûn.

Û Hawara ku li Binxetê derdiket û belav dibû, piştî şêst salên di ser navê xwe î pîrozwer re dîsa olan dide. Ji Binxetê heta Ewrûpayê û nemaze li bakurê dunyayê hawariyên nû peyda dibin. Ez naxwazim têkevim heftûheya kalîta hunera nivîsandina îro, lê îro êdî bi kurdiyêke hawarî rojname û kovar belav dibin, roman û novel derdikevin, bi gotinên bilind û şekirîn helbest têne nivîsandinê, klasîkên mezinan û gotinên Xwedê têne wergerandinê.

Ev hêz, ev daxwaz û ev wêrekiya ha bêguman ji gelek ciyan tê, lê ciyê herî mezin jî Hawar e. Latîniya Hawarê, elfaba wê, gramera wê û mijarên ku têde hatine raxistin... ev hemû fenomenên ha dihêlin ku ji ciyê mayî hawariyên nû derkevin û derketine jî. Bi gotineke din em hemû ji nava rûpelên Hawarê derketin û îro heryekî ji me hawariyekî Hawarê ye.

Ku ez gotinên xwe biguvêşim û bibêjim: Dema ku meriv lê hûr dibe, meriv baş têdigêhîje ku Hawar weke kovar di dema xwe de ne xwediyê rolekê ye. Herçiqas rengdêra wê kovar be jî, tîraja çapê û tunebûna abonemanên wê jî bi me dide zanîn ku Hawar ne weke kovar lê wek tiştekî muqedes derketiye û hew. Ez di wê baweriyê de me ku Hawar îro nû bi rola xwe radibe û di siberrojê de jî ew ê her xwediyê vê rol û rûmeta xwe be.

Cenabê mîr Celadet Alî Bedirxan û hawariyên xwe di dema xwe de Hawara zimanê kurdî kirin gopalekî zêrîn û em jî îro didin ber xwe, em didin ber xwe û pê radibin, em pê radibin û... û êdî meş jî li me û Xwedê.

Îro weşanên Nûdemê ev gopalê zêrîn niqirandiye û bi qasî du hezar liban daye ber me. Gotinên zêde haram in, lê bihêlin ez bibêjim bi qasî hejmara van liban mala weşanên Nûdemê ava û bi ewqas salan jî bijî. □

ROJEN BARNAS HAWAR Rêber û Hawar e

Di dîroka rojnamegeriya kurdî de Hawar kovara kurmançî ya pêşî ye ku bi alfabe ya kurdî-latînî derdikeve û bingehê gramêr û rastnivîsîna kurmançiyê radigihîne gel û gelî hîn dike.

Kurmacî bi HAWARê dest pê nekiriye, lêbelê bi qedirdayî-

neke mezin rêdayina bikaranîna her devokên kurmanciyê bi HAWARê derbasî meydana nivîsarê biye. Ji devoka kurmanciya Qeyserê ta ya Şikakan, ji ya peravên Çemê Qersê ta ya dolikên Çiyayê Kurmênc nimune tê de hene ku ev ji bona kesê mîna min yê dixwazin kurmanciya xwe binasin û pêşve bibin, kaneke bêbiha ye.

HAWAR herçî berhemên edebiyata nivîskî yê ku hingê bi dest ketine, cardin weşandîye da bigihên me xwendevanan ku em jî jê kelk bigirin. Her wisa folklorê kurmancî jî... Di vê maneyê de HAWAR antolojiya edebiyata kurmancî ya klasîk, anonîm (folklorîk) û modern (ya hingê) e.

Di warê bêjezanî û termînolojiyê de çavkaniya herî bi ewle ye. Ez wisa bi Mîr Celadet Bedir-Xan bawer im ku heta ji sedîsed pê ewle nebiye, hema wisa yaxurî ranekiriyê bêjekê û wê bi kar neaniye.

HAWAR ji bona min hawar e: Gava di warê gramêr, rastnivîsîn, termînolojî, berhemek edebî de dikevim tengasiyê li HAWARê hawara xwe dadixînim û ew jî li hawara min tê. □

MEHMED UZUN

Navê HAWARê û navê xwedî û gerîndeyê wê Celadet Alî Bedir-Xan, du navên esasî yê tevgera ronakbîriya kurdî ne. Tevgera ronakbîriya kurdî ku gelekî qels e, bi van navan geş dibe.

Çîroka Celadet Alî Bedir-Xan û kovara wî HAWARê gelekî dirêj e. Min bi firehî, bi hemû kitekitan, di romana xwe Bîra Qederê de çêla vê çîroka gelekî balkêş kiriyê. Eger ez, li vir, bi gotinekê bibêjim; di tarîxa însaniyetê de kêma kes bi şuxulekî weha rabûye û karîbûye şixulê xwe bibe serî... Em gelekî deyndarên C. A. Bedir-Xan û HAWARê ne. □

AGAHDARIYEK JI BO ABONEYÊN NÛDEMÊ

Em pir kêfxweş dibin gava aboneyên me hersal abonetiya xwe ji me re dişînin. Ji ber ku carinan aboneyên me yên Swêdê ji bir dikin ku navê xwe li malika **Avsândare** binivîsînin, em nizanin gelo kê şandiye. Gava em bi riya postê li dûv bigerin em ê dixin, lê ger aboneyên me bi xwe ji kerema xwe re haya me bigihîninê wê baş bibe. Ger **kvitto** li ba aboneyên me yên ku navên xwe di malika **Avsândare** de nenivîsandine hebe û bikaribin kopyayeke wê li ser adresa Nûdemê bişînin em ê spasdarê wan bin. Bi vê yekê wê hem karê me hêsan bibe hem jî em ê hîn bibin bê kê abonetiya xwe şandiye.

Herçî aboneyên ku abonetiya xwe neşandine bila ji kerema xwe re bişînin. Ger heqê abonetiye negihîje me em ê mecbûr bimînin ku abonetiye ji ser wan bibirin. Ev yeka ha jî me xemgîn dike. Ji kerema xwe re heqê abonetiya xwe razînin û bikin ku kovara NÛDEMÊ ji we re bi rêk û pêk were şandin. Nûdem bi tenê bi we dikare li ser lingan bimîne û Nûdem ji bo we ye.

Herçî aboneyên derveyî Swêdê ne, em dizanin ji bo wan zehmet e ku ew abonetiya xwe ji me re bişînin. Lê em ji bo wan aboneyên xwe jî lédikolin ku ji wan re riya abonetiya Nûdemê hêsantir bikin. Loma jî em hewl didin ku li Almanyayê kontoyeke bankê an jî postê vekin da aboneyên me yên Almanyayê bikaribin bi hêsanî abonetiya xwe razînin û kovara Nûdemê mîna hertim bi balafirê ji wan re were şandin.

Ji bir mekin, NÛDEM ya we ye jî!

ROMANA TARÎTÎ Û RONAHIYÊ

LOKMAN POLAT

Ev roman di nav hemû romanên Mehmed Uzun de, ji aliyê zimanê edebî ve, di radeya herî bilind de ye. Roman ji aliyê heyecan û macerayê de ji, ji hemû romanên wî yê çûyî pêştetir e. Di vê romanê de gel, bûyerên civakî, qewimandinên dîrokî hene. Qetlîam û koçberiya neteweyê kurd heye. Dagirkeriya biyaniyan, talan û wehşeta wan heye. Zilm û zordariya dema nû heye. Roman ji aliyekî ve ji, romana îroyîn e, romana qewimandinên bûyerên dema nêzik in. Roman, romana ev dema ku em tê de dijîn e. Ev roman, romana serpêhatiya du kesên kokkurd e. Baz û Kevok, herdu jî Kurd in. Lê di jiyane de gelek tişt tên serê wan. Serpêhatiyên herduyan, wan li cihêkî digihîjin hevûdu û qedera wan dike yek. Mirov dikare bibêje ku ev roman, romana kontrgerîlayekî ku bi koka xwe Kurd e, mîna ku romana yek jî şefên



JÎTEM'ê Yuzbaşî (Serbaz, paşê dibe serheng) Cem Ersever û keça kokkurd Muhsîne ye. Muhsîne pêşî dibe gerîla û paşê êsîr-dîl- dikeve û dibe peyayê kontrayan, dibe dostika Cem Ersever, li dijî gerîlan dikeve nav çalakiyan. Herdu ji perçeyek ji wan kesan in ku li dij gelê Kurd şerê qirêj didominin. Cem Ersever li Kurdistanê gelek xirabîyan dike, qetlîamên mezin organîze

dike. Ew û hêza wî ya ku xîsusî ji bo şerê qirêj hatiye damezrandin -JÎTEM- bi taybetî şerê qirêj didomîne û bi metodên "qesasê nediyar" gelek mirovên welatparêz dikujin. Cem Ersever mêrkuj e, xwînwxar e, qatîl e. Muhsîne jî xain e, îtirafkar e. Ji xwe zirara herî mezin van îtirafkaran dane gelê Kurd. Hêza gerîlan jî herî pir ji destê van îtirafkaran zirar ditiye. Li Kurdistanê, di jiyana rojane de, welatparêzî û xaintî, mêrxasi û tirsonekî, qehremani û îtirafkarî, berx-

wedan û teslîmbûn her tim li hemberê hev meşîyan e. Ev herdu cure helwest di qada jiyânê de bi zelalî derketine holê. Hinek bi aliyê tarîtiyê ve û gelek jî berbi aliyê ronahiyê ve çûne. Tarîtiyê ew ber bi mirinê ve biriyê, ronahiyê ew biriyê ber bi qada payebilind ya evînê ve. Loma jî mirov dikare ji bo vê romanê bi kurtahî bibêje; ev roman, romana tarîti û ronahiyê ye.

Nivîskarê romanê Mehmed Uzun di xesîyeta şefekî kontr-gerîla de şerên qirêj yên dewleta dagirker tîne ber çavan. Zîlm û zordariya dewletê ya li ser gundiyan Kurd radixe holê. Nivîskarê romanê zehmetiya jiyânê li çîyan, azm û fedakariya serhildêran, şer û têkoşîna wan, bîr û baweriyên wan û pîrozîya doza wan tîne zimên.

Nivîskarê romanê bi vê romanê xwe jî qalibekî derdixê û dikeve qalibekî nû. Wî di romanên xwe yên berê de xwe bi standartên dirokî ve dabû girêdan. Lê ew bi vê romanê xwe jî standartên sînorkirî derdixê û di jiyana xwe ya nivîskariyê de pêngavên nû davêje. Ev roman li gor pîvanên herikandinên edebî yên navnetewî hem romaneke realist e û hem jî romaneke alegorîk e. Ew hem bi rastiyê ve girêdayîye û hem jî bi zanebûn xwe jî rastiyê dîr xistiye û metoda fîksiyonê -kurgû'yê- bi kar anîye. Wî fîksiyona romanê bi hostatî pêk haniye û bi zimanek edebî yê herîkbar bûyeran li hev hunandiye. Di vê romanê de dewlemendiyeke herî mezin xwe di hêla ziman de dide xuyakirin. Di vê berhema edebî de peyv pir in û peyv dipeyivin. Roman beş bi beş e. Her beşek bi serê xwe dewlemendiyeke e. Hemû beş bi hevûdu re girêdayî ne. Her beşek wê têr û tîjî bi heyecan e. Niha em bi kurtahî li naveroka beşan binêrin:

Romana "Ronî mîna evînê, Tarî mîna

mirinê" jî şanzdeh beşan pêk tê. Di her beşeke romanê de derd, kul, êş, kelem, keder û huzn heye.

Beşa yek'ê; navê wê "Mirin" e. Di beşa yekem de; Baz û Kevok girtîne. Baz; zarokê mirinê, Kevok; zaroka sirgûnê ye. Baz di qetlîameke mezin de xilas bûye. Kevok jî di encama sirgûnê de hatiye dinê. Di beşa yekem de girtîna Baz û Kevokê û kuştîna Kevokê têt qalkirin. Hevalên Baz, kontrayên dewletê Baz û Kevok girtîne û wan ber bi riya mirinê ve dibin. Di vê beşê de Kevokê dikujin, lê Baz nakujin. Piştî vê beşa yekem serpêhatiya jiyana Baz û Kevokê dest pê dike.

Beşa du'yê; navê wê "Koç" e. Di vê beşê de koçkirina gundiyan, qetlîam û xilasbûna Baz têt qalkirin.

Beşa sisê; "Zayîn" e. Di sirgûnê de ji dayikbûna Kevokê di vê beşê de têt qalkirin. Di dema sirgûnê de diya Kevokê hemilê ye û ew di sirgûnê de diwelide. Kevok tê dinê. Nivîskarê romanê wek herdu beşên pêşîn vê beşê bi zimanek edebî li hevûdu dihone. Sirgûnkirina gelê Kurd, gundi û rewşenbîrên Kurd bi teferuat qal dike. Xurtiya vê romanê yek jê jî ev e; ku bûyerên civakî bi teferuat hatine qalkirin. Di vê romanê de, koçberî û sirgûniya gel mukemel hatiye taswîrkirin.

Beşa çar'ê; "Xwîn" e. Di vê beşê de têkiliyên serbazê ordiya mezin, Baz, bi jinan re û paşê zewaca wî têt qalkirin.

Beşa pênc'ê; "Veqetîn" e. Veqetîna du evîndaran, veqetîna Kevokê û Jîr e. Kevok û Jîr, herdu jî di Unîversîteyê de dixwînin. Herdu jî ji hevûdu hez dikin, herdu jî, ji welatê çîyan in.

Beşa şeş'ê; "Şev" e. Baz li welatê çîyan e. Li wir li pey nêçîrê ye. Nêçîrvaniyê dike.

Nêçîra wî nêçîra heywan û lawiran nîn e, nêçîra insanan e, insanên Kurd. Baz bi şerwan derdikeve nêçîrê. Gundiyên Kurd, gerilayên Kurd dikuje. Bi hîlan, bi dehfîkan, bi fen û futan û bi alikariya gundiyên ceşş, welatparêzan, şerker û şerwanên canfidayên welêt digire û bi xwînxwarî, bi weşşetî wan dikuje.

Beşa heft'ê navê wê "Biyani" ye. Di vê beşê de nivîskarê romanê derdikeve holê û qala xwe dike. Behsa gera xwe ya ku bi hinek nivîskaran re çûbûn Tirkîyê dike. Behsa beşdariya mehkemeyek nivîskarekî dike. Ew diçin mehkemê wek guhdaran di mehkemê de amade dibin. Di mehkemê de sê sal ceza didin nivîskar.

Nivîskarê romanê hetanî beşa şeş'an behsa serborî û serpêhatiya Baz û Kevokê dikir. Di beşa heft'an de gelo çima xwe jî xist nav romanê? Gelo çima nivîskar bi xwe bu figûrekî romanê? Di vê beşê de nivîskarê romanê û Kevok hevûdu dinasin. Nivîskar wexta ku di paytextê Tirkîyê de ye diçe konsera dengbêjek. Li konserê dengbêj anons dike û dibêje hinek nivîskar jî di nav me de ne û navê nivîskaran anons dike. Piştî demekê kurt, Kevok tê cem nivîskar û dibêje; "ez we dinasim, min romana we xwend." Kevok li ser romanê dîtînen xwe pêşkêşê nivîskar dike. Gotînen gelek balkêş dibêje. Li ser evîne û li ser edebiyatê nîrxandinên muhîm dike. Nîrxandinên wê di esase xwe de ji bo hemû nivîskarên Kurd bangê e. Ew bi van nîrxandinên xwe bala nivîskaran dikşîne ser pîrs û pîrsgirêkên girîng. Kevok li ser evîne û li ser edebiyatê weha dibêje:

".. evîn îro, li vir, li vî welatî, bi hemû xurûya xwe, bi hemû celebên xwe, tê jiyîn. Ne hewce ye ku meriv xwe bispêre tarîxê, vegere nav rûpelên zerbûyî yê tarîxê..."

"Evîn li wir, li aliyê herî dûr ê vî welatî, li pey van çiyayên serî li esmanan tê jiyîn..... li wir ne bi tenê evîn tê jiyîn, tarîx jî, ew tarîxa ku hûn ewçend jê hez dikin, ewçend behs dikin jî, li wir tê jiyîn. Li wir....."

"Ez ji wir im.... ji welatê jibîrbûyî..... Hûn hatine vê derê, niha li derewên vî bajarî guhdarî dikin, sibê, du sibê hûn ê vegerin û herin û hûn ê dîsan bikevin nav rûpelên tozgirî yê tarîxê û çiroka evîn û tarîxê bibêjin... bêyî ku hûn wî welatê jibîrbûyî bi bîr binin, bêyî ku hûn bala xwe bidin ser evîn û tarîxa ku îro, bi xwîn, bi hemû celebên şidetê tê jiyîn.... evîn jî, tarîx jî li wir e, di nav xwîne de ne, bi xwîne tînan avdan.... Min dil kir, hûn bi vê yekê jî bizanibin...."

"Belê, hûnê vegerin... Heye ku hûn li welatên xwe çêla gera xwe, behsa dijwarî û zehmetîyan jî bikin, lê piştî demekê hûn ê her tişt jî bîr bikin û vegerin odeyên xwe yê teng û tarî yê nivîsinê. Hûn ê vegerin nav çirokên xwe yê tarî yê dûrî me, dûrî mirovan, dûrî mirovahiyê. Lê xwîn, wê mîna berê, li vir, li wî aliyê din ê welêt, biherike, şidet, qîrîn, girîn, gazîn, hawar, kîn û nefret ê dewam bike."

"Ez we sûcdar nakim, bi tenê tişteki ku hûn nabînin, ji bîr dikin, bi bîra we ûnim. Ez ne bawer im ku di gotînen min de dijberî hene. Edebiyat, roman divê ronî be, ronahî bireşîne. Ji ber ku jîyan tarî ye. Ronahî û tarî... aha ev tişt in ku di hemû tarîxa edebiyatê de bûne meseleyên sereke, esasî... ronahî û tarî... Helbet hûn bi destana Gilgamîş dizanin? Vegotina herî kevn a însanîyê Gilgamîş e.... Di destana Gilgamîş de, gelo şerê Gilgamîş bi kê re ye, li hember kê ye? Hûn ê bersiv nedin, ez bibêjim, li hember tarîyê.... ...edebiyat, kani-

ya edebiyatê ev e; şerê ronahî û tarîtiyê. Ronahî û Tarîti.....pirsa bingehîn a berhemke bedew a edebî ronahî û tarîti ye.Gilgamiş li wir, li wî welatê ku di nexşeyan de navê wî nîn e, hê, diji. Ronahî û tarîti, şerê wan li wî welatî diji, welatê ku îro di nav xwîné de ye..... welatê ku tarîxa wî ji miriyan, şehîdan, qehremanên ku di newalan de, bênav, bêgor, ketine, hatiye pê. Lê hûn ê ji ku, bi çi quwetê bala xwe bidin wan deran!..."

Kevok van gotinan û gelek gotinên din dibêje. Ew bi van gotinên xwe rastiya welêt, rastiya Kurd û Kurdistanê dide nîşandan. Bala nivîskarên edebiyatvan dikşîne ser vê rastiye.

Romana Mehmed Uzun "Ronî mîna evî-nê, Tarî mîna mirinê" hem bi tevahî û hem jî bi taybetî ev beşa şeş'an dide xuyakirin ku, ev roman romanek realist e. Ev roman li ser hîmên herikandina realîzmê hatiye afirandin, bûyerên wê li gor waqîyayên rasteqîn, bi metodek realist li hevûdu hatiye honandin. Û li gel vê realîzmê jî honandinên alegorîk hene. Ev herdu metodên cihê ji hev re dibin alîkar û hevûdu temam dikin. Kurguya ku bi metodên alegorîk hatine pêkanîn roman bedew kiriye.

Beşa heşt'ê "Sûzenî" ye. Di vê beşê de Baz diçe kerxanê. Li cem dostika xwe ku navê wê "Mader" e dimîne. Ew ji Maderê re behsa malbata xwe dike.

Beşa neh'ê "Xew" e. Di vê beşê de beşdarbûna Kevokê ya nav serihildaran û jiyana wê ya gerilatiyê di çîyan de, rêveçûna gerîlan û zehmetiyên ku dibînin têt qalkirin. Kevok di çiyê de di nav komek gerîla de ye. Kevok Kevoka berê nîn e. Kevok Kevoka beşên romanê yên çûyî nîn e. Kevok qulipiye ser însaneke din, însaneke nû. Kevok di

nav cil û bergên gerilayên Kurd de ye. Porên wê wek berê dirêj nîn e, kurt e, lêvên wê boyaxkirî nîn e, ew sade û zelal e. Di destê wê de keleşkofeke "Kûbî" heye. Li ser singa wê rext dibiriqe, narîncokên -bombe-yên destan- wê bi kemera wê ve eliqandîne.

Kevok hêj nûh beşdarê nav hêza gerîlan bûye. Komek gerîla ku Kevok jî di nav de ye divê riya sê rojan bi rê biçin. Yê ku ji bajaran diçin û beşdarê nav hêza gerîlan dibin, di rêveçûnê de sist in. Bi qasê gerilayên ku ji gundan in nikarin rê biçin. Kevok di rêveçûnê de zehmetiyê dikşîne, lê hevalên wê pê re alîkariyê dikin. Piştî demekê ew jî fêrî rêveçûnê û fêrê şert û şûtên zor a jiyana çîyan dibe. Nivîskarê romanê zehmetiyên tebtîetê, tirs û sawa şiyayan û şevên tarî, di nav berf, bahoz û bagerê de rêveçûn û dijminê gerîlan yê herî mezin ku wan ber bi mirinê ve dikşîne "xew"ê gelek baş taswîr kiriye.

Mehmed Uzun li ser gerîlan jî taswîr û nirxandinek gelekî hêja dike. Bi zîmanê edebî nîrx û qîmetdayîna gerîlan wan bi rûmetir dike. Niha binêrin ji bo çiyayên Kurdistanê û gerilayên qehreman, ji bo lehen-gên dema me nivîskar Mehmed Uzun çi dibêje:

"Çiya, çiyayên welatê wê; pira navbera erd û esmanan, pira hezkirin, xewn û xeyalên evîne. Çiyayên wê, dermanê dilên birîndar, ava gewriyên zuwa û tî, nanê birçî û neçaran, kaniya her tûştî, avzêya zelalî, paqîjî, aramî û rastiye. Belê, çiyayên wê; kaniya co û çemên bêserî, bereketa ax û dinyayê, bereketa av û behran, strana teyr û tûr, şalûr û bilbilan, stariya şêr û piling, hirç û guran, hêlîna teyrê elo û baz, başoke û semîran. Çiyayên welatê çîyan; (Nivîskarê romanê Mehmed Uzun di romana xwe de bi

metodek alegorik Kurdistanê wek welatê çiyani bi nav dike. Nota min. L. Polat) ji sedan, hezaran salan û vir ve kal, bi heyecana raperîna do û îro xort, nemir, li ser tixûban serbilind, serhildêr, warê serhildêran, gotina li ser zimanê degbêjan, peyva nivîskî ya şairan... ev çiya, ev çiyayên asê, spehî... ev çiyayên ku niha qulipîne ser warê hêviyê, bûne hêvi...”

“Şervan..... şervanên xort, xurt. Di şerê man û nemanê de bêtirs û dawiyê pirî caran şehîd. Şehîdên bênav, bêgor û goristan. Fedakar. Dilên ku bi tenê ji bo welat, ji bo gel, ji bo vê axa pîroz hildavên. Dilên ku bi vê axê ve hatine girêdan, bûne yek. Evîndarên vê axê, van çiyani. Serhildêr; hêviya sibê, qehremanên tarîxa sibê, maxrûrî û pesnên rojên bê. Ronahiya tûrêjen tava vî welatê girtî, belengaz û bêpişt, çirîskên şeva tarî ya van çiyayên asê yên bê rê û bê rêwî. Navê wan; şervan, serhildêr, bi tenê hewqas. Bênavên ku jiyaneke nû ji bégavî û mirinê ava dikin. Law û keçên miriyên ku di nav van gelî û newalan de serî danînc, li ser van zozan û çiyani xwîna xwe rijandine. Law û keçên ku li ser şopa bav û kalên xwe ne.”

Gotinên jor ku ji alî nivîskar ve ji bo çiyayên Kurdistanê û ji bo gerilayên Kurd hatîye gotin di romanê de wek nexşên zêrîn cihê xwe girtiye.

Beşa deh'ê navê wê “Xwîn”e. Di vê beşê de Baz û Kevok û qedera wan heye. Baz û Kevok wek çemên Dijle û Firat pêrgî hevdu tî. Yek ji mîlekî, yê din ji mîlekî, rûberê hev dibin.

Kevok hindî tam bûye gerila. Ecemîtiya wê xilas bûye, ew bûye gerilayeka profesyonel. Di nav pêvajoyê de ew fêrê jiyana gerilayîyê bûye. Ew û gerilayên hevalên wê di çiyani de bi azadî dimeşin. Kevok dimeşe,

şervan dimeşin. Kevok keça malbata dewlemend, xwendevana Unîversîteyê, telebeyaya beşa edebiyata Fransî, di çiyani de, di nav hawirdora hov û sawjî de bi hêsanî dere, dimeşe. Ew dest û tiliyên nermik, berê radihiştin defter, pirtûk û pênûsan. Ew dest û tiliyên nerm niha bi hişkayî, xwe spartine çek û silahan. Jiyana gerilan, gerilayî hêsan nîn e. Jiyana wan jiyana şer û têkoşinê ye, jiyana xweparastin û êrişê ye.

Kevok û hevalên xwe di çiyani de digerin. Ew biroj radizin û bişev rê diçin. Ew di serê riyên xwe de gundên xirab e, gundên kavlîkirî, gundên ku hatine şewitandin dibînin. Dehl, daristan hatine şewitandin. Dijmin gundan xirab dike, daristanan dişewitîne. Kurdistan dişewite. Dagirker bi kîn, bi xof, bi hovîti û barbarî welatê Kurdi, Kurdistanê xirab dikin, dişewitînin. Gundiyên Kurd, mirovên reben dikujin, gerilayan qetîl dikin. Kevok û hevalên xwe li dij vê barbarîyê serihildane, têdikoşin, şer dikin. Şer, şerê man û nemanê dimeşin.

Mifrezeya gerilan ya ku Kevok jî di nav de ye, di ber gundekî xirabe de derbas dibin. Gund hatiye xirabkirin û valakirin. Di gund de tiştekî zîndî nema. Hinekî diçin, rastî jineke navsal tî. Jinik, jina Kurd, gundiye feqîr û belengaz, diqîre, dizare, dinale. Ji gerilan re dibêje:

“... bi tenê gundê me mabû. Lê ew jî şewitî. Wan ew şewitandin.....ard, zad, zexirê me jî şewitandin..... ew çend xirbe xaniyên gund jî şewitîn... gund nema, gundê bav û kalan çû, mala min nema..... ez li lawê xwe digirim... lawê min, kurê min, mala min.... kurê min li kû ye? We kurê min ditiye?... sê kurê min hebûn.... sê şêr, sê mîrxas, sê çiya... Yek mir, wan yekî, mezinê hemûyan, li meydana gund kuştin. Yek bi xwe re bi-

rin. Biçûkê hemûyan ji reviya, ber bi van devera, ji bo ku tevî we bibe. Kuro, kurê min li kû ye? Ew hê zarok e, umrê wî hê çardeh e. Mala min, mala min.....”

Beşa yanzehe’ê “Tirs” e. Kevok di destê askeran de dîl e, hêsir e. Kevok li garnîzonê girtî ye. Di odeyek piçûk û tarî de hepis e. Ew di vê odeya genî û xwînê de di bin îşkenceyê de ye. Ew li wir du mehan îşkenceyê bi Kevokê dîkin, lê Kevok napeyive. Cih û wargehên serhildêran ji wan re nabêje. Kevok di zindanê de ye, birîndar e, dinale, axîne dikşîne, dibêje “xwezî ez bimirama û neketama destên wan.” Birîna Kevokê kûr û xedar e. Kevokê her celeb, her texlît îşkence dîtiye û niha ji mirina xwe razî ye. Kevok ji wan re dibêje; min bikujin. Tîştê ku ez ji we re bibêjim nîn e. Ji Kevokê re gotine an tu ê bibî hevala leşkeran an jî tu ê bimirî. Yanê du rê dane ber Kevokê; an mirin, an jî îxanet.

Kevok dipeyive. Di karageha Baz de Kevok çî dizane dibêje. Îfadeyên wê pê didin nivîsîn. Bi qasî sî rûpelî ew dinivîse. Di rûpela jiyana Kevokê de rûpelek nû vedibe. Ev rûpel rûpela xaîntiya wê ye. Rûpela nû, mukir, îtîraf, peyivîn, cîh û warê gerîlan nîşandan e.

Beşa donzdeh’ê “Jan” e. Kevok îtîrafker e. Baz ji Kevokê re dibêje: “Tu divê cîh û warên keleşan (ji gerîlayan re keleş dibêje. NM.) nîşanî me bidî. Gund û zome, gundî û xelkê ku alîkariya we dikirin... Tu divê van tiştan hemûyan bikî, îmtîhaneke baş bidî ku bawerîya me, bi temamî, bi te were û tu ji mirinê xelas bibî...”

Kevok êdî bi dagirkeran re li çiyayên Kurdistanê li pey serhildêran digere ku wan bide girtin, bikuje. Kevok û Baz bi hev re ne. Kevok, Baz, sê zapit, bîst leşker û heft

cehş bi hev re diçin. Hemûyan ji cilûlibasên gerîlan li xwe kirine. Kevok yeko yek cîh û stargehên gerîlan bi wan nîşan dide.

Beşa sêzdeh’ê navê wê “Awir” e. Di vê beşê de hîs û psikolojiya Kevokê tê diyarkirin. Kevok li paytextê welatê mezin e. Ew di malên lojmanên leşkerî de dimîne. Kevok û Baz bi hev re li wê malê dimînin. Kevok dilêş e, bi derd, kul û keder e. Malbata wê, dayika wê dikeve bîra wê. Ew stranek ku dayika wê di piçûkahiya wê de jê re digot, bi bîr tîne û vê stranê dilorîne. Baz ji derve tê malê û dinêre ku wa ye Kevok disitirê, bi dengêkî xweş strana dibêje. Baz ji gotinên stranê fêhm nake, lê maqamê lorîna stranê pê gelek xweş tê, hîs û ruhê wî mest dike.

Baz ji Kevokê re dibêje:

“Serek û amirên min dixwazin ez te teslîmê wan bikim... Mîna te bi sedan kes hene. Yanê kesên ku dev ji sewda serhildanê berdane û niha bi me re ne, bi dewletê re ne, ji bo dewletê dixebitîn û alîkariya me dîkin. Piraniya wan di hepisxanan de ne. Çaxa hewce be, em wan ji hepisxanan derdixin û bi xwe re dibin êrişan. Hinên wan ên bijarte jî bi me re ne, lê ew, şev û ro, li rê, di nav şer de ne. Her roj ew dimirin û dikujin.... Rewşa kesekî ne mîna a te ye. Bi zanîn min te anî vê derê da ku ez bikaribim te biparêzim... Te ji mirinê xilas bikim..... ...niha amirên min te dixwazin.... Bi ihtîmalekî mezin ji bo kuştinê... Tu hew bi kêrî wan, bi kêrî tiştêkî têyi...”

Ev gotinên Baz yên li jor baş xuya dike ku dagirker, kesên îtîrafkar demekê bi kar tînin û paşê wan dikujin. Kevok li ser rewşa xwe difikire. Ew kî ye, çima weha bûye? Çima ketiye vî halî? Êdî ew hevala hevalan nîn e, Kevoka wan nîn e, ew hendî jê nefret dîkin. Lewra ew êdî xaîn e. Xayîna welat û

tevgera serihildanê ye. Ew êdî mîna xainekê diji. Kevok li rewşa xwe û li xaintiya xwe difikire û digiri. Hêstirên çavan li ser rûyê wê belav dibin. Kevok digiri. Jiyana wê herimiye.

Baz araqê vedixwe û dikeve xew. Kevok di metbexê de wexta bi tenê dimîne gelek difikire. Ew dixwaze pêşî Baz bikuje û dûre jî xwe bikuje. Heger Kevok xîret bike dikare Baz di xew de bikuje. Lê Kevok xîret nake, ew ditirse...

Beşa çardeh'ê navê wê "Hafîza" ye. Baz dîsa li cem Maderê ye. Madera ku dostika wî ya kerxaneyê bû. Mader jê re dibêje tu çima naçî ber jina xwe û zarokên xwe. Baz dibêje ez naçim, min avûkat girtiye ez dê wê berdim. Baz jî Maderê re dilê xwe, hundirê xwe vedike. Jê re behsa gelek tiştan dike û paşî dibêje: "... min dest bi xwendina şîran kiriye. Şîrên li ser aşq û sewdayê, şîrên ku qala evîne dikin... Min dest bi guhdarîkirina musikê kiriye. ... Min dest bi nivîsînê kiriye." Mader jî dibêje: "welê dixwîye ku tu ji rê derdikevî.Ev tiştên ku tu dibêji, elametê dilhebinê û merhametê ne. Gidî tu bi xewna evîne neketibî?" Mader jî jê re behsa hîsa dilê xwe û behsa ku çawan û çima, ji bo çi ketiye kerxaneyê dike.

Beşa panzdeh'ê "Rêwing" e. Baz û Kevok bi hev re di trêneke şevê de ne. Di kompartîmana trênê de ew herdu bi tenê ne. Herdu jî rêwing in. Baz Kevok teslîm nekariye û ew jî bi Kevokê re direve. Ew li ser riya reveke bêveger in. Ew di rêwîtiyeke dirêj de ne. Rûpeleke nû, jiyaneke nû, heyameke nû li pêşiya wan e. Ew niha li ser vê rê ne. Di vê beşê de jî gelek sahnayên alegorîk hene.

Beşa şanzdeh'ê "Ronahî" ye. Di vê beşê de cihê ku Baz û Kevok bi dîzi lê dimînin

têt qalkirin. Nivîskar di vê beşê de disan dikeve dewrê û agahdariyek kurt dide xwendevanan. Kevokê jî nivîskar re nameyek şiyandiyê, lê di nameyê de adresa wê tune, loma jî nivîskar nikaribûye bi wê re têkiliyan dayne.

Baz û Kevok li milê deryayê, li herêma behra reş, di havîngehekê de xwe veşartine. Ew li benda pasaportên sexte ne. Dê jî wan re pasaportên sexte bêne çêkirin û ew herdu dê birevin derveyê welêt. Baz û Kevok li wir bi hev re çend rojan dimînin, bi hev re gelekî diaxifin...

Baz wexta ku diçe ku pîrsa pasaportan bike û hinek xwarin û vexwarinê bikire, li gund hinek wî dibînin, taqîba wî dikin û tîna wî û Kevokê di xaniyê havîngehê de digrin.

Beşa hivdeh'ê "Mirin" e. Beşa yek'ê jî navê wê "Mirin" bû û di wê beşê de kuştina Kevokê hatibû qalkirin. Di vê beşa hivdehê de jî kuştina Baz tê qalkirin û romanê dilas dibe. Nivîskar di vê beşê de jî derdikeve holê agahdarî dide û sedemên nivîsîna vê romanê diyar dike. Nivîskar di kutupxaneyê de bi tesadufî di rojnameyê rojane de nûçeya kuştina Kevok û Baz dixwîne. Çirîska nivîsîna vê romanê li wir dikeve dilê nivîskar û nivîskar paşê romana Baz û Kevokê dinivîse.

Niha ez dixwazim li ser ziman, teknik, psikolojiya qehremanên romanê û taswîran çend gûnan bibêjim û nivîsê bi maneya alegorîyê ve bidim girêdan. Wek ku min di destpêka vê nivîsê de jî got; roman, bi giranî romanek alegorîk e. Ji bo wê jî divê mirov baş têbigihîje ku alegorî çi ye? Maneya bi vê şeweyê nivîsîn, anku bi şeweya alegorîk roman nivîsîn fêr bibe, bizanibe.

Zimanê romanê gelek dewlemend e. He-

tanî niha di tu romanek Kurdî de bi vê hayî, bi vê dewlemendiyê ziman nehatiye bi kar anîn. Ev roman dewlemendiya zimanê Kurdî dide nîşandan. Zelaliya zimên radixe ber çavan. Di hêla teknîka romanê de teknîkek baş hatiye pêk anîn. Teknîka hûnandina romanê gelekî xurt e. Teknîkeke modern e. Karekter û psikolojiya lehengên romanê û guherîna wan baş hatiye qalkirin. Nivîskarê romanê di ruhîyeta Baz û Kevokê de; şidet, zor, germahî û dilhebînî daye nîşandan. Taswîrên çiya, welat, çem, gêlî, newal, insan û tevgerên wan pir baş hatiye taswîrkirin. Nivîskar her awayî bi serketiye.

Protîpên di romanê de bi metodên alegorîk, bi hostaû li hevûdu hatiye nexşandin. Di romanê de General Serdar heye. Ew protîpekî diktatoriyê ye. General Serdar, anku ev protîpê diktator dikare Mustafa Kemal Atatürk be, dikare Kenan Evren be, Hafîz Esad be, Xumeynî be, yan jî Saddam Huseyn be. Baz jî protîpek e. Yê wek Baz pir in. “Yeşil” jî Bazekî din e. Yê ku qod navê wî “Yeşil” e (Mahmûd Yildirim ji Solaxan e) û hêj jî çalakîyên xwe yê qirêj didomîne. Mirov dikare bibêje ku; Baz’ê herî se-reke Mehmed Agar bi xwe ye. Kevok jî pir in. Gelek keçên ku di serî de ketin nav refên serihildêran û paşê bûne îtrafker hene. Wan keçan zirarên mezin dan hêza serihildêran.

Nivîskar di taswîra welat de, “welatê mezin” û “welatê çîyan” bi nav kiriye. Ev welatê mezin dikare Tîrkiye, Îran, Irak yan jî Suriye be. Welatê çîyan jî Kurdistan e. Ji xwe di alegoriyê de metoda bingehîn tiştan bi şeweyekî din qalkirin e, bi şeweyek cuda taswîrkirin e. Di alegoriyê de fêrkirîni heye, tê de tiştê tradisyonê heye. Didaktis e.

Wek minak: Dost; du maneya dost heye;

yek dostê heqîqî, yek dostê sexte. Dost, lê di binê dostaniyê de ne dostanî heye. Baş, lê di binê başiyê de xirabî heye. Xirab xuya ye, lê di binê xirabiyê de başî heye, yan jî berevajê wê baş xuya ye, lê di binê başiyê de xirabî heye. Di alegoriyê de du mane hene. Dixwaze tiştêkî bide ber çavan ku di bin siya berçav de ye. Bi awakî din, bi zimanê hal dipeyive. Yanî tewsîr dike, şerh dike. Alegorî maneyeke fêrkirîni û fêrkirina maneya veşartî ye.

Min li gori zanabûn û têgihîstandina xwe danasîn û analîza vê romanê kir. Dibe ku ez gelek aliyên romanê nebînim. Dibe ku ez li ser girîngiya hinek aliyên romanê baş nese kinim, ji min ewqas hat. Ez hêvî dikim ku edebiyatzanên Kurd li ser vê romanê analîz bikin, nivîsan binivîsin. Kêmaniyên di vê nivîsê de jî ew dikarin temam bikin. Mirovên edebiyatzan bila li hember vê romanê û hemû berhemên edebî ku bi kedeke pîroz û bi gelek zehmetiyan têne afirandin, bêdeng nemînin. Edebîyat bi analîzên edebî pêş ve diçe, xurt dibe.

Şeweyên nivîsîna bi metodên “romanîkî, simbolîstî û alegoriyê” hêj nû di nav edebiyata Kurdî de tê pêkanîn. Divê Kurdên edebiyatzan li ser van şeweyên edebî dîtûn û ramanên xwe pêşkêşî xwendevanan bikin.

□

Ronî mina evîne
Tarî mina mirîne
 Mehmed Uzun
 Weşanên Avesta


ÇEND GOTIN LI SER "KULTUR Û RAMAN"Ê

N. ZAXURANÎ

Beriya niha bi çendekî pirtuka Şerexan Cizîrî ya bi navê "Kultur û Raman" ket destê min. Nivîskar, bi alîkariya vê berhema xwe hewl daye ku bi zimanekî peqî li ser pisrgirêkên bingehîn yê dîroka ramanê di serpêhatina dem û dewranan de analîzên bi rêk û pêk li dar bixîne. Herweha, weke ku ji naveroka berhemê bi hêsanî tê têgihîştin, hevalê nivîskar li ser mijara întelektuelîz-

mê bi awayekî bi gelek alî rawestiyaye. Bi qasî ku ji kar û xebata wî ya di vî warî de tê xuyakirin, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku nivîskar di vê kar û xebata xwe de bi serkerî ye.

Lê bela ku, berhem li ser gelek mijarên ji hev cuda yê ku di demên ji hev cuda de hatine weşandin, diraweste, parîkî sext e ku mirov bikaribe bi carekê re nerîn û ramanên xwe pêşkêşî xwendevanên hêja û delal bike. Lewra, her mijar bi serê xwer analîzên hûr û kûr dixwaze. Ji ber vê yekê jî, ez dixwazim ku di vê nivîsa xwe de li ser sernivîsa



bi navê "Metodeke zanyarî ya edebiyatê" bi awayekî bi rêk û pêk rawestim.

Cizîrî di vê sernivîsa xwe de li ser rewşa edebiyata kurdî ya ku ji metodên zanyariya edebî yê nûjen bêpar e, diraweste û bi mafdarî gili û gazinên xwe ji tiriletîya întelektuelên kurdan dîke. Ji ber ku sifreke bi her awayê xwe tekûz ya zanyariya edebiyata bedew ji aliyê ro-

nakbîrên neteweyên din yê cihanê ve hatîye raxistin, lê mixabin ronakbîrên me kurdan ji ber nekêrkiriya xwe nikarin tu kelkê (fêdê) jê bigrin, da ku edebiyata me ji di vî warî de mîna edebiyatên din yê gelên serfiraz di warê hemû jîyanê de bi gelek alî bi-pîşkive.

Herweha nivîskar bi alîkariya vê sernivîsa xwe hewl dide ku dest bavêje metodên zanyariya edebî yê ku di serpêhatina dem û dewranên ji hev cuda ji aliyê tevgerên edebî yê ji hev cuda hatine afirandin, birame û bi taybet hevalê nivîskar serê xwe li ser tev-

gera edebî ya strukturalîzmê têşîne. Di serpêhatina hûnandina semivîsa xwe de nivîskar ji bo ku bikariba pirsgirêkê bi rêk û pêk çareser bike, serî li çend otorîteyên zana yê ku di derbarê strukturalîzmê de xwedî kar û xebatên heja û berferêh in, dide.

Bêguman cihê strukturalîstan di dîroka kar û xebata edebî de berbiçav û diyar e. Lewra, mirovê ku haya wî ji vê tevgera edebî hebe, herçiqas rind dizane ku serkêşên vê tevgera edebî hewl dane ku di kar û xebata xwe yî edebî de rexnê li tevgera edebî ya formalîst digirtin jî, ew bi xwe ketine nav çawtiyên serkêşên tevgera formalîst. Ji xwe, naveroka semivîsa bi rêz Şerefexan Cizîrî vê yekê ji me re dest nişan dike. Lewra, kesên mîna Roman Jakobsson - ku di vî warî de kar û xebatên balkêş li dar xistine - hewl dane ku tevgera edebî ya formalîst û ya strukturalîst nêzikî hevdu bike. Lê, divê ku baş bê zanîn, bi vê metoda rîqakirinê mirov nikare weha bi hêsanî xwe ji çawtiyên tevgera edebî ya formalîst rizgar bike û bi vî awayî jî, metodeke edebî yeke bi rêk û pêk biafirîne. Herçiqas birêz Şerefexan Cizîrî dibêje ku amanca Mîkæl Bachtîn ew e ku: "Beriya hemû tiştan rexne li formalîzmê girt û got ku avaniya hunerî nikare ji derdora xwe were îzolekirin" jî, mirov bi hêsanî nikare dibêje ku wî xwe ji çawtiyên tevgera edebî ya formalîst rizgar kiriye. Kare bê pirskirin : Ma gelo çima?

Ji bo ku pirsgirêk di vî warî de baş bê ronî kirin, divê ku mirov di destê pêşî de serê xwe rind li ser peywendiyên di navbera zanistîya edebî û medodolojiya edebî bi rêk û pêk biêşîne. Weke ku tê zanîn, karmendiya (wezîfa) herî sereki ya zanistîya edebî ew e ku peywendiyên di navbera jiyana gelan ya bi reng civakî û edebiyata bedew de bi awa-

yekî hûr û kûr raxîne ber çavan di serpêhatina geşbûna dîrokê de. Geşbûna bi reng dîrokî ya edebiyatê ligel taybetmendiyên wê yê sereke bi gelek alî şirove bike. Ji ber ku her disiplineke zanistîyê beriya her tiştî hewl dide ku li ser objeya (kirde) xwe bi qasî ku jê tê xwestin, lekolînên cur bi cur li dar bixe û bi alîkariya vê yekê jî, qada jiyane ya ku objeya wê di xwe de bi cih û war dike, bi gelek alî binirxîne. Heger ku disiplineke zanistîyê yekê ji xwe re bike kar û barekî sereki tê wê wateyê (maneyê) ku ew di kar û barê xwe de him serketî ye û him jî geş û balbûna wê li dare. Ji vê yekê wîrdetir, ev yeka tê wê wateyê ku ew ji bo şirovekirina jiyana civakî ya ku ji objeya wê re dibe mijar, çalak û bikêr hatiye. Ji ber ku, her disiplineke zanistîyê gava ku objeya xwe ligel qanûnên wê yê bi reng civakî bi qasî ku jê tê xwestin binase, dê hingî bi hêsanî bikaribe karmendiya xwe ya bi reng civakî bi cih bîne.

Heger ku mirov bixwaze fenomenên bi reng hunerî an jî civakî bi gelek alî binirxîne, di vê ku mirov sedemên ji wan re dibin bingeh, rind bizane. Bê ka ev fenomen serçaviyên xwe ji kuderê digrin, tên wateya çî û giringiya wan ya civakî ji kuderê tê an jî bikêrî çî tê, bizane. Mîna ku baş tê zanîn, civat jî weke xwezayê xwediyê qanûnên xwe yê taybetî ye. Geşbûn an jî guhertina wê li gor qanûnên wê tê pêk anîn.

Fenomenên bi reng civakî jî di xemlandina jiyana civakî ya rengîn de peyde dibin. Ev yeka ha, ji bo hemû fenomenên bi reng civakî rastîyeke ku mirov nikare li ser gotûbêjan bike. Helbet ev yeka ha, ji bo fenomenên hunerî yê cur bi cur jî xwediyê girîngîyeke bi reng jiyana ye.

Ji ber vê yekê, heger ku zanistîya edebî

bixwaze li ser lingên xwe raweste, divê ku van herdû pirsên jêrin bibersivine: Yek, ji ber çi hema bibêje di jiyana hemû gelan de ligel zanistiyên din edebiyata bedew jî hebûna xwe her domandiye, di jiyana gelan de edebiyata bedew xwediyê çi rolê ye? Dido, ji ber çi edebiyata bedew ya gelan di serpêhatina dem û dewranan de tê guhertin, li ser dinamikên civakî bi serpêhatina dîrokê re geş û bal dibe?

Bersiva van pirsgrêkên ku di xetên jorîn de hatin kirin, ji aliyê tevgerên edebî yên ji hev cuda bi bersivên ji hev cuda hatin bersivandin. Heçî aligirên tevgera edebî ya formalist in, bi carekê re peywendiyên hunera edebî û rêkiliyên jiyana civakî yên bi gelek alî û rengin ligel serpêhatina wan ya dîrokî qut dikin. Ji ber vê yekê jî, aligirên tevgera edebî ya formalist naveroka berhemên edebî bi carekê re di kar û xebata xwe yê hunerî de rakirin. Aligirên vê tevgera edebî di vê bîr û baweriyê de bûn: Li gora wan berhemên edebî bi tenê ji forma (şiklê) xwe tîr pêk anîn. Ji ber vê yekê jî, divê ku mirov di kar û barê xweyî hunerî de serê xwe bi tenê li ser forma wan bişîne. Li gore wan, jiyana civakî ya ku di hûnanadina berhemên edebî de tê xwiya kirin, ji aliyê nivîskarê berhemê ve mîna materyal tê bi kar anîn. Li gorî ramana wan, berhemên hunerî ji hinek “şeweyên nivîsandinê” tîr meydanê. Ev yeka ha jî, bi tenê xwediyê fonksiyoneke bi reng estetîkî ye.

Bi vî awayî jî, aligirên tevgera formalist edebiyata netewî dixistin mistewa sistemeke ku ji “şewa an jî uslubên nivîsandinê” tê afirandin, di kar û barê xwe de nêzikayî lê dikirin. Aligirin tevgera formalist ji vê nerîna xwe ev encam derdixistin: Her “şewa an jî uslubê nivîsandinê” di destpêkê de xwende-

van bi awayekî ji awayan jê hez dikin, lê piştî kêfa wan jê re nayê û bi vî awayî jî, sistemeke din ya nivîsandinê cihê wê digire.

Bêguman, struktuelist li pêşberî vê helwesta formalîstan ya ku fonksiyona edebiyatê ya estetîkî jê re dixistin amanc derdixistin û êdî wan li berhemên hunerî mîna ku ji “uslub an jî awayên nivîsandinê” bi xwîn û can dibin, nedinerin. Lê, wan berhemên edebî mîna Struktoreke (avahiyêke) ku him naverok û him jî forma wê dixwe de cih û war dikir, dinirxandin. Bi vî awayî jî wan dixwest ku bi alikariya metodên matematîkî berhemên edebî şîrove bikin. Lê, divê ku baş bê zanîn, mirov weha bi hêsanî nikare bi saya metodên matematîkî berhemên edebî mîna ku ji mirovî tê xwestin, binirxîne. Ji ber ku, mirov bi tenê dikare forma berhemên edebî mîna avahiyekê (struktorekê) destnîşan bike. Ma gelo çima? Ji ber gava ku mirov behsa avahiyekê dike, ya balansa unsurên madî yên ku bi awayekî organîkî li ser hevûdu bandorê dikin, tê bîra mirovî, an jî di navbera fenomenan (diyardeyan) ku koordinatên wê hatine tasawwur kirin, dan û standina wan ya bi reng diyalektîkî, tê bîra mirovî.

Ji ber vê yekê jî, tiştên ku bi reng avahî ne, mekîne ne, organîzmên bi reng mirovî ne, bi taybet jî mêjîyê mirovî ye. Lê, li pêşberî vê yekê, bîrewerî û nerînên mirovan-tiyê ligel kar û xebata wê ya zîhnî ku bi alikariya bandora jiyane bi awayekî bêrawestan tîr guhertin an jî geş dibin, ne fenomen an jî tiştên bi reng avahî ne. Bela ku xwediyê peywendiyên bi taybet û xwediyê qanûnên bi taybetî ne, mirov dikare wan mîna sisteman destnîşan bike. Herweha çalakîyên mirovan yên ku bi awayekî bîrewerî tîr kirin, sistemî ne. Mirov dikare vê yekê

ji bo naveroka berhemên hunerî ku ji ramanan pêk tên, bi hêsanî bibêje. Ji ber vê yekê jî, mirov nikare naveroka berhemên hunerî ku bi ramanên nivîskarê berhema edebî ve tên rapêçan, bi nerîna strukturalîstan ya ku li ser bingehê avahiyê tê ava kirin, analiz bike. Ji ber vê yekê jî, gelek kesên strukturalîst hevî dikirin ku bi alîkariya metodên matematîkî an jî sembola berhemên hunerî bi awayekî hêsanî şirove bikin, lê mixabin, mîna wan derneket. Ev metodên weha yên bi vî rengî mirov dikare bi tenê ji bo analizkirina forma berhemên hunerî bi kar bîne. Heta bi hêsanî mirov dikare bibêje ku ev metod ne ji bo forma berhemên edebî bi tevahî, ancax ji bo bîrr an jî beşekî ji forma wan bi kar bîne. Weke ku tê zanîn, forma berhemên hunerî ji îmajan pêk tê. Heçî îmajên hunerî ne, yekîtiya fenomenên hunerî yên bi giştî û ji yekîtiya tiştên ferdî pêk tên. Ji ber vê yekê jî, heta ku mirov di derbarê yekê ji wan de nexwediyê agahdariyên bi rêk û pêk be, mirov nikare weha bi hêsanî yên din jî binase. Lê, weke ku tê zanîn, taybetmendiyên fenomenên hunerî yên ferdî mirov dikare bi tenê bi alîkariya nerîneke estetîkî analiz bike û bi vî awayî jî gava ku mirov xwe li ser nerînên giştî hûr û kûr bike, dê mirov bikaribe bi saya vê yekê wan rindtir ji nêzik ve nas bike. Naxwe, mirov nikare bi alîkariya nerînên abstrak, mînak, bi alîkariya nerîneke matematîkî ya ku ji îşaret û hijmaran pêk tê, nikare wan nas bike.

Vêca, mîna ku bi hêsanî tê xwiya kirin, mirov nikare bi alîkariya analizên matematîkî naveroka berhemên hunerî ligel fonksiyona wan ya bi gelek alî binirxîne û wan baş fehm bike. Biqasî ku ji kar û xebata formalîst û ya strukturalîstan tê xwiya kirin, di

lêkolînên xwe yên edebî de serçaviyên xwe ji qanûnên dîroka geşbûna netewî nedigirtin. Ji berevajî, wan qanûnên geşbûna dîroka netewî ligel serpêhatiyên jiyana civakî bi carekê re û bi yek alî red dikirin. Ji bona vê yekê jî, wan guhertin û geşbûna zanistîya edebî bi hinek faktorên ku bi awayekî ji awayan “di nava geşbûna edebî bi xwe de” veşartîne, girêdidan. Heger mirov vê yekê ha bi termên felsefî destnîşan bike: Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku ev nerîna ha serçaviya xwe ji îdealîzma Kant digre.

Ligel vê yekê jî, divê ku mirov bi tu awayî kar û xebata edebî ya formalîst an jî strukturalîstan mîna kar û xebateke biçûk an jî bêkêr nebîne. Heger ku mirov dev ji kêmaniyên wan yên ku di rêzên jorîn de bi awayekî kurt behsa wan hate kirin, berde, wan kar û xebatên gelekî balkêş di derbarê zanistîya edebî de pêk anîne. Bi rastî jî, gava ku haya mirovî ji geşbûn û guhertina edebiyata gelan di serpêhatina dem û dewranan de hebe, mirov dibîne ku gelek “motîfên” hevpîşk di edebiyata gelên cihanê de hene. Li çî heye ku ev “motîfên” hevpîşk mîna ku formalîst an jî strukturalîstan mîna “faktorên mistîkî yên di edebiyatê de” didîtin, nebûn. Mirov dikare serçaviyên van faktorên yên ku dibine bingeh ji geşbûna dîroka edebiyatê re ji qonaxên dîrokî yên jiyana gelan bi xwe derxîne.

Ji aliyê din ve jî, berhemên hunerî ji aliyê form û naveroka xwe ve carcaran gelek aloz û tevlihev in. Ev alozî û tevliheviya wan divê ku ji aliyê edebiyatzanan ve bi nerîneke estetîkî bê şirovekirin. Di vî warî de herçiqas alîgirên tevgêra edebî ya formalîst an jî strukturalîst mîna ku ji wan dihat xwestin, rola xwe bi cih neanîbin jî, bi giştî gava ku mirov ji kar û xebata wan hayadar be, hingî

mirov dibîne bê çî xwediyê kar û xebateke çê ne di vî babetî de. Vêca, ji bo ku mirov bikaribe geşbûna dîroka edebiyata gelê Kurdistanê ligel qanûnên wê yê ku rayê xwe berdidin nav kurahiya dîroka kevnar û herweha edebiyata netewên din yê gelên cihanê bi awayekî bi rêk û pêk ji nêzikahî ve binase, divê mirov di derbarê metodên zanyariya edebî de xwediyê agahdariyên tekûz be, da ku mirov bi alikariya vê yekê bi hêsaniyê bikaribe pirsgirêkên edebî yê cûr bi cûr analîz bike. Bêguman, gava mirov di vî warî de li rewşa edebiyata kurdî dinêre, mirov bi çavên xwe dibîne ku edebiyata me di vê hêlê de gelekî lewaz e. Lewra, gava mirov edebiyata gelê Kurdistanê û ya gelên din yê serfiraz bi hevdu re muqayese dike, bi hêsaniyê tê xwiya kirin ku edebiyata gelên serfiraz di gelek qonaxên dîrokî yê ji hev cuda de

derbas bûye. Bêguman, edebiyata wan jî li gore van qonaxan hatiye guhertin û metodên zanyariya edebî yê ji hev cuda ku bi termên mîna klasîzîm, naturalîzîm, romanîzîm û yê din tî bi nav kirin, rengîn bûye. Lê, ji ber sedemên ku baş tîne zanîn, edebiyata me tu fersend nedîtîye ku mîna edebiyatên din yê gelên serfiraz li ser dînamîkên xwe yê netewî û civakî bipîşkive. Ji ber vê yekê jî, edebiyata kurdî ji destpêkê ta îro bûye edebiyata xweparastin û ya berxwedanê. Heger ku ronakbîrên me dixwazin edebiyata me jî vê tengasiyê rizgar bibe, divê ronakbîrên me di warê hamû jîyanê de hewl bidin ku rola xwe ya dîrokî li ser dîka edebiyatê bileyizin. □

Kultur û Raman
Şeref xan Cizîrî
Weşanên NÛDEME



Kemal Burkay bi qasî siyasetsvanîyê ewqasî jî di nava aktîvîteya nivîsandinê de ye. Wî di warên cihê de berhemên cihê nivîsandine. Lê belê nivîsandina wî ya sereke şîr in. Wî heta niha bi kurdî û tirkî bi çendan pirtûkên şîran weşandine. Ev pirtûka wî "Can Taşır Dicle" bi tirkî ye, lê şîrên tê de berê bi kurdî hatibûn nivîsandin û jî aliyê şîr bi xwe ve hatine wergerandin.

Şîrên Burkay bi tama xwezayê, hêza berxwedanê û hêviya azadiyê hatine hûnandin. □

Can Taşır Dicle
Kemal Burkay
Weşanên Deng

LI SER ŞEREFNAMÊ Û ÇAPA WÊ YA NÛ

ZIYA AVCI

Her wekî tê zanîn, îsal çarşedsaliya temambûna nivîsandina cilda yekê ya Şerefnameyê ye. Şeref Xan, çarşed sal berî niha, yanî dawiya meha zulhîc-ceya sala 1005ê koçî (13yê tebaxa sala 1597ê zayîni) dawî bi nivîsandina cilda yekê ya Şerefnameyê aniyê. Ev nusxeya han a bi qîmet ku destxetê Şeref Xan bi xwe ye, 246 rûpel e û niha di Kitêbxaneyê Bodleian a Unîversîteya Oxfor-

dê de ye û di bin reqema 312an de qeyîtkirî ye. Bi bîst tabloyên bi nirx hatiye xemilandin û her yek ji wan tabloyan bûyerek dîrokî îzah dikin. Şeref Xan, nivîsandina cilda diduyan jî di meha gulana sala 1599ê zayîni de tamam kiriye. Ev cilda han jî li ser dîroka Osmanî û Îranê ye.

Îsal, hêvî ew bû ku di vî warî de gelek aktivîte bînin kirin, semîner û xebatên cûr bi cûr bînin meşandin. Lê mixabin qasî ku tê ditin, li gor qîmet û giringiya Şerefnameyê tiştêkî zêde di orteyê de tune. Wisan dixuyê dê ev sala han a jî kurdan re gelek bi me'ne



û bi qîmet jî wekî gelek salên din di sersarî û bê xemwariyê de biçê. Çima sersarî û bê xemwariyê? Çunkî Şeref Xan yekem kes e ku xwestiye hisa ruhê kurdîtiyê vejîne. Bi vê jî mirov dikare wî pîrê damezrênerê ruhiyeta kurdîtiyê, bi gotineke din babê giyanê nasyonalîzma kurdî bihesibîne. Vê ruhiyetê di mejiyê wî de tam sed sal berî Ehmedê Xanî xwe nîşan daye. Lê sed mixabin heta niha jî

ji aliyê me kurdan ve, ku em jî hemû netewe û gelên cîhanê zêdedir muhtacî bûyerek wiha ne, ne qedir û qîmeta Şerefnameyê û ne jî ya nivîskarê wê Mîr Şeref Xan hatiye zanîn.

Mebest jî vê kurtepêşgotina han ne ew e, ku ez li vir li ser qîmet û giranbîhatiya Şerefnameyê û nivîskarê wê Mîr Şeref Xanê Bedlîsî bisekinim û hêjatiya ew karê çarşed sal berî niha û ew perspektîva ku ew karê hatiye kirin, bidim xuyakirin. Ev xebat jî aliyê dîroknas û lêkolînerên ku pisporê vê mijarê ne hatiye kirin. Bi vê xebata xwe Şe-

refnameyê bi alim û zanayên rojavayê dane nasandin û bûye sebeb ku wergera wê ya bi ser çend zimanên rojavayê bê kirin.

Ez dixwazim zêdetir behsa ew wergerên Şerefnameyê ku heta niha hatine kirin û ew nusxeyên ku ew werger li ber hatine çêkirin, bikim û çend rêz ji li ser vê wergera kurmançî ya Şerefnameyê binivîsim.

Yekem car wergera Şerefnameyê bi zimanê tirkî hatiye kirin. Ev kar di sala 1078ê koçî (1667/1668ê z) de ji aliyê mîrekî Bedlîsê ye navê wî Mihemmed Begê kurê Ehmed Begê Mîrza ve hatiye kirin û nusxeyek ji vê wergerê di Kitêbxaneyê Beledîya Stenbolê di nav nivîsên M. Cevdet û di bin reqema 0/29an de ye. Li gor Y. Vasiliva, ku ji aliyê Dr. K. Mezher Ehmed ve hatiye neqilkirin, ev ne tamamê Şerefnameyê ye, kurtiya wê ye.

Wergera duyem a bi zimanê tirkî, di sala 1681ê zayînî de ji aliyê nivîskarekî naznavê wî "Şem'î", ji bo mîrekî kurd ê navê wî Mistefa Beg re hatiye wergerandin. Ev naznavê han li hinek ciyan jî "Samî" derbas dibe. Ev herdu nusxeyên han jî di Museum Britîsh a li Londrayê de hene. Heta niha du destnivîsên nusxeya yekê û yek jî ya diduyan hatine dîtîn, lê yek ji wan jî nehatine weşandin.

Wergera Şerefnameyê ya cara sîsyan bi zimanê tirkî, di salên 1930î de ji aliyê mamostekî diyarbekrî ye navê wî Suleyman Savcî bi elfabeya latînî hatiye kirin û ew nusxeya han di Kitêbxaneyê Giştî ya Diyarbêkrê û di bin reqema 2065an de qeyîtkirî ye.

Wergera Şerefnameyê ya cara çaran bi zimanê tirkî, di sala 1971an de ji aliyê M. Emîn Bozarşan ve bi elfabeya latînî hatiye kirin.

Di navbera salên 1853-1859an de, wergera Şerefnameyê ya almanî li paytextê Avustur-

ya (Nemse) Viyanayê ji aliyê G. A. Barbe ve hatiye kirin. Ev werger di navbera van salan de beş beş hatiye weşandin. Di sala 1858-1859an de, cara yekê wergera wê ya kurdî bi handana kurdnasê bi nav û deng Aleksander Jaba, ji aliyê Mele Mehmedê Bayezîdî ve hatiye kirin. Ev wergera destnivîs ne tamamê Şerefnameyê ye û di Kitêbxaneyê Giştî Ya St: Petersburgê de hatiye parastin.

Wergera Şerefnameyê ya zimanê fransîzî, di navbera salên 1868-1875an de ji aliyê farişizane mezîna F. B. Charmoy ve li St: Petersburgê hatiye kirin. Ev çapa fransîzî ya Şerefnameyê çar cild e. Beşa yekê ya cilda yekê di sala 1868an de, beşa diduyan a cilda yekê di sala 1870an de, beşa yekê ya cilda diduyan di sala 1873an de û beşa diduyan a cilda diduyan jî di sala 1875an de hatiye çapkirin. Heta niha wergera erebî ya cilda Şerefnameyê ya yekê du caran û cilda diduyan jî carekê hatiye kirin. Cara yekê ji aliyê Cemil Rojbeyanî ve, wekî ku bi xwe dibêje; di roja 11yê meha gulana sala 1943an de, dema ku di Bendixaneyê 'Emmareyê de girtî bûye, dest bi wergera Şerefnameyê ji orijînalê wê farisî bi ser zimanê erebî kiriye. Korî Zanyarî Iraq jî di sala 1953an de ev berhema han a bi qîmet weşandîye. Ev wergera erebî 480ê rûpel e.

Wergera cara diduyan a cilda yekê ya Şerefnameyê bi ser zimanê erebî, di sala 1948an de ji aliyê M. 'Elî 'Ewnî Beg ve hatiye kirin. Çapa wê piştî wefata wî, di sala 1958an de ji aliyê mamoste Omer Wecdî û li ser erkê Wezaretê Perwerdeyî ya Misrê û bi pêşgoteneke fireh a Yehya Xeşşab hatiye kirin. Ev werger 540 rûpel e. Wergera yekê ya cilda diduyan a bi ser zimanê erebî jî cardin M. 'Elî 'Ewnî Beg kiriye. Ev cild jî di sala 1962an de cardin li Qahîreyê hatiye çapkirin. Lê mixabîna M. 'Elî 'Ewnî Beg bi

çapên van berheman şad nebûye.

Di dawîya salên 1950an de rojhilatnasên Sovyetê qîmeteke gelek zêde dane Şerefnameyê. Vê navê re wergera Şerefnameyê ya bi zimanê rûsî Yefgîna Vasîlîva girtiye ser milê xwe. Di sala 1967an de cilda yekê û di sala 1976an de jî cilda diduyan ji çapê re amade kiriye. Cilda yekê 619 rûpel e, 412 rûpelên wê Şerefname bi xwe ye û qismê mayî jî ji pêşgotîneke 55 rûpel, paşgotin û kurtebehsêke di derheqê kitêbê de ye. Ev pêşgotîna Vasîlîva ya ji 55 rûpelan pêk hatî, wekî ku Dr. K. Mezher Ehmed neqildike, gelek bi nîrx û hêja ye û tê de hatiye gotin, ku Şerefname di sedsala 17an de bi riya nivîsên gerokêkî tirk ê navê wî Katîb Çelebî gihîştîye çîhana zanyariya rojavayê.

Ji bilî van, xebateke gelek hêja ji aliyê Memed (Mîhemmed) Şemsî yê azêrî ve hatiye kirin. Vê xebata xwe ya li ser Şerefnameyê wekê têza doktorayê û bi zimanê azêrî amade kiriye û li Bakûyê weşandiye.

Piştî vê zanyariya kurt ya di derheqê wergerên Şerefnameyê yên bi ser zimanên cihê cihê de, ez dixwazim bi kurtî jî bibe behsa nusxeyên ku ew wergerên behsa wan hatin kirin li ber hatine çêkirin û awayê xebata ew kesên ku ev kar kirine bikim.

Yekem kesê ku dest bi karê berhevkirina destnivîsan kiriye V. Zîrnov e. Wî çar destnivîsên Şerefname yê bi dest xistiye û ev çar destnivîs gihandîye hev û ji wan yek nusxe pêk aniye. Piştî re jî di sala 1860 an de bi farîsî li St. Petersburgê çap kiriye. Ew di vî warî de wiha dibêje: "Ev rêk û pêkiya ku îro di Şerefnameyê de tê dîtin, bi saya ew fihrista ku min bi xwe jê re çêkiriye de ne."

Piştî re vê xebata xwe bi vî awayî îzah dike: "Çi kil û kêmasiyên ku di nusxeyên kitêbxaneyê de (mebest Kitêbxaneya St. Petersburgê ye- Z. A.) hebûn, min ew bi yên Xanîkov re dan ber hevûdu û çap kir. Ji wir

şûn de êdî tu şik ji min re nema ku kitêba min gelek ji destnivîsên di Muzexaneyê Asyayê de baştir derketiye. Ji bilî vê, bi taybetî careke din min ew di bin çav re derbas kir û piştî re min ji çapê re şand. Min tu destkariyek ji ber xwe ve tê de nekiriye. Eger car û caran, ew jî gelek kêr, min valatîyek tîjî kiribe, min ew ji afirandinên wan kesên ku Şeref Xan ji wan wergirtine îstifade kiriye. Yanî yên wekî Ibn Xelekan, "Ebdurrezzaq û yên din. Ji ber ku wekî min got, ez rastkirina şaşîyan û belgeyan dikim dawîya kitêbê û ez li wir dîr û dirêj li ser disekinim."

Ew nusxeyên destnivîsên Şerefnameyê ku V. Zîrnov li ser xebitiye û gihandîye hev û ji wan yek nusxe pêk aniye ev in: Nusxeya yekê: ew nusxeya destnivîs a sala 1007ê koçî (1599yê z) ya li ber nusxeya yekê ya bi destxetê Şeref Xan bi xwe hatiye nivîsand, ew e. Ev destnivîs, piştî temambûna wê, ji aliyê Şeref Xan bi xwe ve hatiye redaktekirin. Ew ji aliyê birêz Frach ve hatiye dîtin û navê wê kiriye nav fihrista destnivîsan, lê V. Zîrnov dibêje, gelek kêmasiyên wê hene. Ew ji behsa Eşîreta Mehmûdî dest pê dike û bi behsa Eşîreta Siyamenso-rî dawî lê tê.

Destnivîsa diduyan a ku V. Zîrnov jê îstifade kiriye, yên birêz Xanîkov in. Dema ku ew di sala 1854an de li Pîranê konsolosê Rûsya yê bûye, li Dîlemanî li ba Salmasê ew sitandîye. Destnivîsên din jî ji Kitêbxaneyê Yehya Xanê Xanî yê Fermanrewayê Azerbaycanê wergirtiye.

Destnivîsa yekê ya Xanîkov, di 19yê meha şebana sala 1252yê koçî (1837ê z) de mirovekî navê wî Mehmûd Rizayê kurê Sabîr 'Eliyê Kerbelayî, li ser fermana Rewşen Efendî yê ji gundê Dîlmekan û li ber destnivîsa Şerefnameyê ya tarîxa nivîsandîna wê 1007ê koçî (1599yê z) hatiye kirin. Di dawîya vê nusxeya destnivîs de Şeref Xan wiha

gotiye: "Nivîskarê wê kitêba han ê muhtacê rehma Xwedê, Şerefê kurê Şemseddîne Kesrâyî di dawîya meha muherrema sala 1007an a koça pêxember de -silavên Xwedê li ser bin- li bajarê Bedlîs ê -Xwedê ji qeza û bela biparêze- ji rastkirin û bijartina şaşîyan xelas bû".

Xwediyê wê destnivîsê ji di dawîya kitêbê de wiha nivîsandîye: "Bi alîkarî û himmeta Xwedayê beşînder, jartirîn koleyê ber destê te Mehmûd Rizayê kurê Sabir 'Eliyê Kerbelayî yê ji gundê Dilmekan roja şêşembê nêzîkî taştê, 19yê meha şebanê destnivîsa wê kitêbê xelas kir." Ev destnivîsa Xanikov 250 rûpel e. Nuxxeya sisiyan a bi destnivîs ku V. Zimov li ser xebitiye, ew destnivîsa li Muzexaneyaya Asyayê ya Unîversîteya Qeyser ya li St: Petersburgê ye. Reqema qeyda wê destnivîsê ya di muzexaneyê de 756 e û 605 rûpel e. Ev ji Rosso re bi diyarî hatiye. Ew kesê xwediyê wê ku diyarî aniye, li ser rûpela yekê wiha nivîsandîye: "Ji Bada Xanê Hakimê Sawuchulax." Lê ne tarîxa nivîsandina wê û ne jî navê nivîskarê wê li sere. Ev nuxxeya han a Rosso ji birêz M. Wolkow re hatiye dayîn û wî ji maqaleyek li ser nivîsandîye û di rojnameya Asya de daye weşandin.

Nuxxeya bi destnivîs a çaran ku V. Zimov jê îstîfade kiriye, ew nuxxeya di Muzexaneyaya Asyayê ya di bin reqema 576an de qeytkiriye. Ev nuxxeya han ji aliyê Baron Bondve ji Îranê hatiye anîn û 100 rûpel e.

Wek me li jorê jî got, V. Zimov ev her çar nuxxe gihandine hev û ji wan yek nuxxe pêk aniye. Yanî ew nuxxeya ku di sala 1860an de li St: Petersburgê bi farişî, yanî zimanê kitêbê yê orijînal hatiye çapkirin. Bi gotîneke din ew nuxxeya ku "çapa Rûsyayê" jî jê re tê gotin.

Çapa farişî ya Misrê jî li ber van hersê nuxxeyên han hatiye amadekirin: Nuxxeya

yekê, ew nuxxeya V. Zimov a li jorê me behsa wê kir, yanî nuxxeya "çapa Rûsyayê" ye. Ya diduyan, nuxxeyek destnivîs a di Kitêbxaneyaya Mekteba Osmanî ya Helebê de ye, ku ji aliyê M. 'Elî 'Ewnî Beg ve hatiye dîtîn. Nuxxeya sisiyan jî, wekî ku M. 'Elî 'Ewnî Beg di pêşgotîna çapa Misrê de dibêje, ji aliyê Sureyya Bedirxan Beg ve jê re hatiye dayîn.

Cardin li gor gotîna M. 'Elî 'Ewnî Beg, Sureyya Bedirxan listeya 170 kitêbên li ser kurd û Kurdistanê û cî û salên çapkirina wan jî pê re, bi du fihristan ve daye wî, lê dibêje ku, gelek mixabin me nekarî ew bi çapa farişî re biweşanda.

Ev çapa Şerefnameyê ya Misrê, cardin wekî ku M. 'Elî 'Ewnî Beg dibêje, ne tenê ji aliyê wî ve hatiye kirin. Wî, Şêx Ferecûllah Zekî Kurdî û Şêx Muhyeddîn Sebrî Kurdî di navbera xwe de ew xebat par ve kirine û piştî xebata salekê ya bê rawestan ew jî çapê re amade kirine.

Li gor Dr. Kemal Mezher Ehmed, hejmarê destnivîsên Şerefnameyê yên di kitêbxaneyên naskirî yên cihê cihê de ku hatine parastin, digihîjin 22 liban. Lê kesên ku lêkolîn li ser Şerefnameyê kirine, di wê baweriyê de ne ku eger lê bê gerîn di Kurdistanê de gelek nuxxayên din ên bi destnivîs dikanrin bi dest bikevin.

Niha ez dixwazim çend gotinan jî li ser wê wergera kurdî ya bi zaravayê kurmançî bêjim. Teqriben pênc sal berî niha, ji bo çarsedsaliya temambûna nivîsandina Şerefnameyê fikra wergera wê ya bi ser kurdî ya bi zaravayê kurmançî ket serê min. Wê çaxê wergera Mam Hejar a bi zaravayê soranî nû ketibû destê min. Ji bo ku wergera tirkî ji erebiya wê hatibû kirin, zimanek ketibû navberê û di wergerê de jî ev xalekî girîng e, ev wergera kurdî ya zaravayê soranî ez teşwîqê wî karî kirim.

Wergera Şerefnameyê ya bi zaravayê soranî, ji aliyê Mam Hejar ve raste rast ji çapa farisî ya Mistrê hatiye kirin. Dema ku mirov li vê prosa wergerê binêre û nêzikahiya di navbera zaravayê kurmançî û soranî jî bigre ber çav, mirov dikare wergerek wiha ya kurmançiya Şerefnameyê, weke ya ji ber orjînalê wê bi xwe hatî çêkirin bihesibîne. Lê, dema min dest bi vî karî kir û ez pê de çûm, neqla bûyerên wekî yê Buxduz (Baxduz), ew teswîr û sifetên ji bo pesin û serkevîna kurdan hatine bikaranîn, ji min re dudilî çêbû û ez ketim şikê. Ji ber vê, ji bo ku ez bikarim vê xebata han bi awakî rêk û pêkî bimeşînim, ez mecbûr mam min serî li wergera tirkî da.

Min wergera tirkî û wergera kurdî ya zaravayê soranî, ez dikarim bêjim ku ji serî heta binî dan ber hev. Ew ciyên ku li hev nedikirin û ferqiyetên mezin di navbera wan de hebûn, min ew îşaret kirin û bi alîkariya hevalên farisîzan, ew bi orjînalên wan yê farisî ya ji aliyê Mihemmed 'Ebbasî ve hatî amadekirin, muqayese kirin. Bi vî awayî ew şaşiyên ku di herdu wergeran de jî hebûn, min ew di jênotan de dan xuyakirin.

Mam Hejar, ku me li çend ciyan di jênotan de îşaret kiriye, li gelek ciyan rîayetê bikaranîna termînolojîya îdarî û siyasî ya wê çaxê nekiriye. Li gelek ciyan jî ew teswîr û pesnên ku ji bo kurd û Kurdistanê hatine kirin, gelek dirêj kiriye. Ji ber vê, daneberheviya herdu wergeran di ciyên wiha de zehmet bû. Ji bilî vê, di wergera şî'iran a bi ser zaravayê soranî de gelek têkelhevî hene. Hinek ciyan Mam Hejar di ciyê wergera şî'iran de, şî'irên xwe bi xwe nivîsandine. Lê ji derveyî şî'iran, bi gelemperî ew ciyên ku di herdu wergeran de li hev nedikirin û me bi saya orjînalê wê ya farisî rast kirin, hat dîtîn ku di wergerê de Mam Hejar zêdetir

nêzikî me'neyê bûye. Me tev ev xalên han di jênotan de dane xuyakirin. Problemek din ku derket pêşiya me, mesela salên koçî û wergera wan bi ser salên zayînî bûn. Ji bo listeyek ku mirov bikare pê bawer be bi dest neket, me salên wan ên zayînî wekî yê wergera tirkî qebûl kirin. Ev salên zayînî yê wergera tirkî, gelek jê ji aliyê M. 'Elî 'Ewnî Beg ve hatine kirin û yê din jî Seydayê M. Emîn Bozarşan wergerandine. Me ew pêşgotinên ku ji aliyê kesên cihê cihê ve hatine nivîsandin, kirin pêşiya kitêbê, hakeza ew belgeyên bi destê me ketin û qaxaxên wergerên bi zimanê din jî me avêtin dawiya kitêbê.

Ez dixwazim ev werger ji aliyê xwendevanên hêja ve ji bo çarsedsaliya temambûna nivîsandina berhemeke weke Şerefnameyê re diyariyek biçûk, berê ked û zehmetekî hindik bê qebûlkirin. Qet nebe, dengekî jar jî be hewarek jî vê bédengiyê re ye. Ez hêvîdar im ku rojekê muesseseyên kurdan jî çêbin û kesên zimanzan û diroknas peyda bibin û bîr ba hev, ew destnivîs û xebatên li jorê behsa wan hatin kirin, bi taybetî nusxeya yekê ku bi destxetê Şeref Xan bi xwe ye û ew pêşgotinên ji hemû wergerên cihê cihê re hatine nivîsandin bigrin ber çavan û careke din ji nû de wergera Şerefnameyê têkin ber destê xwendevanan û Şerefnameya Mîr Şeref Xanê Bedlîsî nedin ji bîr kirin.


Ez di dawiyê de sipasî hemû wan kesan dikim ku alîkariya vê xebata han kirin. Ez gelek şad û dilxweş im ku erkê wergera afirandîneke evqas hêja, bi kil û kêmasiyên xwe ve jî be ket ser milê min. Bi hêviya ku bi dilê xwendevanên hêja be û bi kêrî wan were. □

Şerefname
Şeref xanê Bedlîsî
 Werger: Ziya Avci
 Weşanên APEC

Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi

Bi hinceta sedsaliya rojnamegeriya kurdî isal kurdan li seranserî dinyayê bi aktîvîteyên cihê sedsaliya rojnamgeriya kurdî pîroz kirin. Yek ji van aktîvîteyan jî jinûveçapkirin û derxistina pirtûkên li ser rojnamegeriya kurdî bû. Ev pirtûka ku ji aliyê Malmisanij ve hatiye amadekirin yek ji van aktîvîteyan e. Malmisanij di vê pirtûkê de li ser rêkxistin an jî komeleya "Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti" radiweste û dîroka wê, şaxên wê û girîngiya wê bi me dide zanîn. Mîna tê zanîn Cemiyeta Teavun û Terakki, yek ji wan cemiyetên pêşî ye ku xwestiye pirsgerîka kurdî bi rê û metodên legal were çareserkerin û komele bi xwe jî legal xebitiye. Herweha ji aliyê vê komeleyê rojnameyek jî bi navê "Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi" derketiye. Li gorî agahdariyên ku Malmisanij di pêşgotina vê berheme de dide, wê neh hejmarên rojnamê derketibin, lê wî bi tenê karîbûye çar hejmaran bi dest bixe. Endamên komeleyê, an jî welathezên kurd nêrînen xwe bi rîya vê rojnameyê belav kirine û kurd di derheqa dîrok, kultur û edebiyata wan de haydar kirine.

Beşekî girîng yê vê pirtûkê jî li ser şairê kurd Pîremêrd (Süleymaniyeli M. Tefîk) e. Malmisanij li ser jiyana û berhemen Pîremêrd radiweste û ji xebatên wî mînakên pêşkêş dike. Wekî din jî em di vê pirtûkê



de pêrgî gelek navan tên ku ji aliyê nivşê niha ve an nayên naskirin an jî pir kêmtên naskirin.

Ev berhem bi analizeke dirêj ya di derheqê vê rêkxistinê û vê rojnameyê de hatiye amadekirin, herweka ji rojnameyê jî gelek nivîsên bi kurdî û tirkî hatine pêşkêşkirin. Ev nimûneyên ku ji rojnameyê hatine pêşkêşkirin, hemû ji aliyê Malmisanij ve ji alfabe ya erîbî hatine transkrîbekirin.


Ev pirtûka ku jiyana kurdan ya siyasî, aborî û entelektuelî ya destpêka sedsala 19an rohnî dike, hêjayî pesnê ye. □

Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi
Malmisanij
Weşanên APEC

Dîroka Edebiyata Fransî

Fransa hertim mîna welatekî medenî, Paris mîna paytextê huner û edebiyatê hatîye naskirin. Helbet ev ne besebeb e. Ji ber ku hê di dawîya sedsala şanzdehan û di destpêka sedsala huvdehan de kultur, huner û edebiyatê li Fransayê dest bi geşbûnê kirîye. Dema Henriyê IVan, Louisê Sêzdeh û Çardehan destpêka gulvedana huner û edebiyata frensî ye. Dr. Fawaz Husên, ku bi xwe li Sorbonnê doktoraya edebiyatê kirîye, bi hûrbîni dadikeve kûrahiya edebiyata frensî ya sedsala huvdeh û hîjdehan û navên girîng yê wê demê, bi xebat û minakên xebatên wan, pêşkêşî xwendevanên kurd dîke. Di vê berhema ku berê beşekî wê yê mezin di kovara Nûdemê de hatibû weşandin, mirov prosesa edebiyata Fransayê, bi kirîz û serketinên wê ve dibîne. Ji ber ku Fawaz Husên ev berhem mîna dersên xwe yê ûnîversîteyê amade kiribû, ew mîna dersên ûnîversîteyê jî hatine pêşkêşkirin. Loma, F. Husên li ser nivîskaran û li ser berhemên wan yê girîng ku hem tesîrek taybetî li edebiyat û pêşketina edebiyata frensî kirine, hem jî tesîreke bêpîvan li edebiyata cîhanê kirine, radiweste.

Ji bilî serdema Henriyê IVan, Louisê Sêzdeh û Çardehan, Fawaz Husên li ser şeweyên hunerî û edebî û beşên tiyatroyê jî radiweste. Di beşên şeweyên hunerî û edebî de nivîskar li ser şeweya barok, şeweya xweşikperestiyê û şeweya klasik radiweste û van şeweyan bi şiroveyên edebî radixe. Herweha ew di vê beşê de li ser şeweyên tiyatroyê; yê mîna tiyatroya pastoral, tiyatroya trajî-




komedî û komedî radiweste û ji pêşevanên van tevger û şeweyan; Corneille (1606-1684), Racine (1639-1699) û Moliér (1622-1673) bi jîyan û berhemên wan dide naskirin.

Di sedsala huvdehan de tevgerên curbecur yê nivîsandinê jî hebûn. Mirovên sereke yê wê demê jî ev bûn Pascal (1623-1662), Descartes (1596-1650), La Fontaine (1621-1695), Charles Perrault (1613-1680), La Bruyère (1645-1696), Montesquieu (1689-1755), Voltaire (1694-1778), Diderot (1713-1784) û Rousseau (1712-1778). Fawaz Husên jîyana van nivîskar û filozofan, berhemên wan yê girîng û naveroka hin berhemên wan bi minakan dide.

Ev pirtûka ku bi riya danasîna edebiyata frensî û dîroka edebiyata Fransayê deriyekî cîhanî li ber edebiyata kurdî vedîke, hêjayî pesin û şabaşê ye. □

Dîroka Edebiyata Fransî


Fawaz Husên
Weşanên APEC



Yasaklı Topraklar pirtûka Nejdet Buldan ya duwemin e. Berî niha bi demekê ji bi hinceta biranîna birayê xwe Savaş Buldan, ku li Tirkîyeyê ji aliyê

hêzên reş ve hatibû kuştin, pirtûkek bi navê "Savaş'a Mektup" nivîsandibû. Buldan di vê pirtûka xwe ya biraninan an jî "gernameyê" de ji bilî danasîna xweşî û spehîtiya xwezaya Kurdistanê, behsa hevdiîtinên xwe yê bi gerilayan re jî dike. Pirtûk bi tirkî ye û ji aliyê Weşanên Mezopotamya ve li Almanya ye hatiye weşandin. □

Yasaklı Topraklar
Nejdet Buldan
Weşanên Mezopotamya




Bedirxan Epözdemir ji mêj ve ye di nava çalakîyên nivîskarî û rojnamegeriya kurdî de ye. Wî heta niha di gelek kovar û rojnameyên bi kurdî û tirkî de

nivîsandîye û herweha xwendevanên Nûdemê wî ji nivîsên wî yê di Nûdemê de jî nas dikin. Epözdemir jî mîna gelek siyasetvan û rewşenbîrên kurdan piştî 12ê îlonê xwe ji ber cûntayê da alî û niha li Hollandayê dijî.

Ev berhevoka Bedirxan Epözdemir ku ji 18 şîran pêk hatiye, hemû jî li ser berxwedan û hêviya berxwedanê, xeribiyê, bêrikirinê û azadiyê ne. □


Awazên xeribiyê
Bedirxan Epözdemir
Weşanên Aso, Stenbol



Ali Biçer yek ji şairên me yê zîrek e ku bi zîmanê tirkî dinivîsîne. Ew ji ber fikrên xwe yê siyasî zêdeyî deh salan di girtûgehên Tirkîyeyê de razaye. Biçer niha li der-

veyî welêt, li Swisreyê dimîne. Lê ji şîrên Ali Biçer dixuye ku wî salên xwe yê girtûgehê vala nebuhurandine û girtûgeh jî xwe re mîna dibistanê bi kar anîye. Şîrên Ali Biçer mîna senfoniyeke ku bi evîne hatiye hûnandin e. □


Aşkın Kısa Tarihi
Ali Biçer
Weşanên Pêri, Stenbol



Ev berhevoka Şîran ku bi tabloyeke hunermendê kurd Riza Topal hatiye xemilandin, bi naveroke xwe jî pirtûk xemilandiye. Ji dîroka şîran jî xuya dibe ku M.

Rojasor ji mêj ve ye dinivîsîne. Dîroka li binê şîra pêşî ya vê berhevokê 1972 ye. Şîrên Rojasor ku bi têkoşin û berxwedanê dest pê dikin, li xeribiyê bi bêrikirin û dîsan geşkirina hêviya berxwedan û azadiyê dewam dikin. □

Gula derengi an jî rengên kurdî
M. Roja Sor
Weşanên Navenda çanda Kurdi



Wê rojê ji me re ji Tirkîyeyê pakêtek hat. Gava me pakêtek vekir, me dît ku Încîl e. Încîla bi kurdî ye, bi kurmançiya latînî ye. Herçiqas ev ne cara pêşî be

ku Încîl bi kurdî derdikeve jî, lê ev cara pêşî ye ku Încîl bi kurdiya latînî û bi bedewiya zimanê kurdî derdikeve. Bêguman armanca vê xebata ha herçiqas belavkirina Încîlê û belavkirina fikrên xirîstîyanîyê be jî, lê gava mirov rewşa zimanê kurdî li ber çavan digire, mirov dibîne ku bê jî bo geşkirina zimanê kurdî xebateke çiqasî hejî ye. Xwezî di civata kurdan de xwediyê her fikrê, her baweriyê weşanên nêzîkî raman û bawerîya xwe wergerandina zimanê kurdî. Musulmanan berhemên îslamî, marksîstan berhemên marksîzmê, liberalan yê fikrên liberalîzmê û fikir û baweriyên din jî herweha yê nêzîkî fikir û baweriyên xwe wergerandina... Lê em dibînin ku însiyatîfa wergerandina Încîlê jî ne ya kurdan lê ya şîrketeke bi navê "Şîrketa Kitêba Pîroz" e. Bi riya vê şîrketê Încîl wergeriyaye gelek zimanên dinyayê. Mîna tê zanîn cara pêşî Încîl di sala 1872an de bi kurmançiya alfabeya ermenî derketîbû. Paşê jî bi alfabeya erebî derket. Ger îro jî wan Încîlan mabe jî, bi tenê di arşîv û pirtûkxaneyan de maye. Lê ev Încîla (Mizgîn) bi kurmançiya latînî ku niha li Tirkîyeyê hatiye weşandin di warê xwe de valahiyeke mezin dadigire. Yek; ji ber ku li Kurdistanê nemusulmanên mîna ermenî, asûrî-suryanî, kildanî û hwd. hene. Dudu; ji bo fêhmkirina vê pirtûka pîroz. Sisê; ji bo geşkirina zimanê kurdî û teşwîqkirina bawermendên din û îdeolojîyên cihê ku ew jî kitêbên xwe bi zimanê kurdî biweşînin.

Ev kitêba pîroz ji aliyê komisyoneke jîr û bi kurmançiyê hêsan û xweş hatiye wergerandin. Kitêb 357 rûpel e û bi ebateke biçûk e. □

Încîl (Mizgîn)
Kitabi Muqedes




Di warê pêş-dexistina zanyarî û zimanê kurdî de rola Dr. Kamiran Ali Bedir-Xan ne kêmiya Celadet Bedir-Xan e. Kamiran Bedir-Xan di şaxên cihê cihê de

berhem pêşkêşî pirtûkxaneyê kurdî kirine. Ji çarînen Xeyam, tefsîra Quranê, nivîsandina şîran bigire heta amadekirina alfabe û ferhengên xebatên Kamiran Bedir-Xan hene. Ev pirtûka bi navê "Xwendina Kurdî", cara pêşî di sala 1938an de li Şamê hatibû weşandin. Pirtûk jî şûr û çîrokên kurt pêk hatiye ku armanca Kamiran beg bi vê pirtûkê ew bûye ku ev pirtûk di dibistanan de were xwendin. Mixabin ku piştî çapkirina pirtûkê bi şêst salî hê jî dibistanên kurmançî nînin û ev pirtûka Kamiran Bedir-Xan jî hê jî neketiye destên şagirtên dibistanên zimanê kurdî. Lê, Weşanxaneya Jîna Nû bi jinûveçapkirina vê berhemê karekî hejî kiriyê û nivîş nû bi xebata alim û zanayê kurd hesandiye. □

Xwendina Kurdî
Dr. Kamiran Ali Bedir-Xan
Weşanên Jîna Nû

Bi taybetî piştî salên heşytêyî û bi derketina kurdan ya derveyî welêt re kurd bi xebatên Celadet Ali Bedir-Xan hesiyan. Îro, her kurdekî serwest kême zêde navê kovara Celadet Bedir-Xan HAWAR bihîstine û




hindik be jî ji xebatên Mîr haydar in.

Celadet Bedir-Xan ji malbateke welê tê ku mohra xwe li dîroka Kurdistanê xistine. Konê Reş, bi berfirehî vê mal-

batê dide naskirin, rola bav û bapîrên Celadet tîne zimên, behsa jiyana wan dike, behsa surgunên wan dike û behsa mêrxasî û şerpezetiya wan dike. Ev berhema ku bi giranî li ser jiyana û ramanên Celadet Bedir-Xan radiweste, bêguman di kurmancî de berhemeke sereke ye. Di dawiya pirtûkê de albumeke resiman hatiye amadekirin ku ew jî rengê dirokê didin pirtûkê. Konê Reş, ku nivîskarekî ji binya xetê ye, bi vê xebata xwe rûpelekî jibîrbûyî ya dîroka entelektueliya kurdî derdixe rûkala dinyayê. Spas jê re...□

Celadet Bedir-Xan
(Jiyan û ramanên wî)
Konê Reş
Weşanên Jina Nû



Ev zêdeyî bîst salî ye ku Ferhad Shakely di nav aktivîteyên nivîskarî û rewşenbîriyê de ye. Wî bi temenê biçûk dest bi şairîyê kiriye û bi çend hevalên xwe


re di destpêka salên heftêyî de destreke baş li nivîşê li dû xwe kiriye. Lê mîna gelek şair û nivîskarên herçar perçeyên welêt, niha Ferhad Shakely jî li Swêdê dimîne. Wî li Swêdê jî xebatên xwe yên di warê rewşenbîriyê

de domandiye û bi navê "Mamostayê Kurd" deh salan kovareke edebî derxistiye. Ji bilî wê jî bi navê "Svensk Kurdisk Journal" çend salan kovareke bi zimanê swêdî derxistiye. Lê di ber van xebatên xwe re jî Shakely dev ji nivîsandina şîran bernedaye. Ev berhevoka şîran ku di demên cihê cihê de nivîsandine û ji aliyê Lars Bäckström, Ingvar Rydberg û Christian Råbergh ve hatine wergerandin, bi evîn, hezkirin, bêrikirin, têkoşin û berxwedanê ve mişt in. Şiîrên di pirtûkê de pirtûk bi wêne û sembolan xemilandiye. Di vê şewenivîsandina Ferhad Shakely de tesîra tevgera surealîzma frensî baş xuya dibe, lê digel vê jî Shakely îlhama xwe ji kehnîya çanda kurdî girtiye. Ev şiîrên ku bi wergereke baş hatine kirin, rengêkî nû didin şîra swêdî jî. □

En pârîla i drömmens grumliga damm
Ferhad Shakely
Weşanên APEC

Piştî têkçûna serihildana Dêrsimê, bêdengiyek li welêt hakim bûbû. Tevgerêk çûbû, xebat rawestiyabû û kurd bi lez asîmîle dibûn; jî xwe, jî nasnava xwe, jî kurdîtiyê bi dûr diketin. Lê, di dawiya salên 1950î de, tevgera xwendevanên kurd hêdî hêdî ew bêdengî diçirand û diisan dengê kurdan bilind dikirin. Ev tevgera xortan ku paşê dewlet bi dû nêçîra wan ket û di dîrokê de jî bi navê bûyera 49an hate navandin, wek bombeyekê kete rojeva Tirkîyeyê. Di

17ê meha donzdehan 1959an de 49 rewşenbîrên kurdan ji aliyê dewletê ve hate girtin. Dewletê dixwest bi girtin û temirandina dengê 49 rewşenbîrên kurdan,



tevgera kurdî bi giştî vemirîne. Nivîskarê vê pirtûkê Yaşar Kaya ku bi xwe yek ji van 49an bû, bi temenê xwe jî yê herî ciwan bû.

Lê piştî bûyera 49an, di destpêka salên 1960î de bûyereke din çêbû ku ew jî girtina 23 rewşenbîrên kurdan bû. Gelek ji van 23 kesan bi xwe di nava bûyera 49an jî de bûn. Di destpêka salên 1960î de êdî destpêka geşbûna rojnamegeriya kurdî bû jî. Di wan salan de *Roja Nêwe*, *Dicle-Firat* û *Deng* dest bi weşana xwe kirin. Kurd hêdî hêdî bi xwe dihesyan, hejmara nivîskar û xwendevanên


kurdan zêdetir dibûn. Lê dewletê vê carê jî çû ser wan û di sala 1963an de 23 rewşenbîrên kurdan yê bi jarte girtin. Ev pirtûka ha li ser bûyera van 23 rewşenbîran e. Yaşar Kaya bi zimanekî edebî biyografiya hin rewşenbîran digel biryarên mehkemê û bûyera dîrokî digihîne nivîşê îro. □

23 Kûrt Aydnî

Yaşar Kaya

Weşanên Mezopotamya

JI WEŞANÊN NÛDEMÊ ÇAR PIRTÛKÊN NÛ



Epilog pirtûkeke çirokan e ku ji çiro-keke dirêj û heyst çirokên kurt pêk hatiye. Hinek ji van çirokan berê jî di kovara Nûdemê de hatibûn weşandin û xwendevanên Nûdemê hezkirina xwe ya çirokan bi me dabûn zanîn. Ev çirokên Hesenê Metê jî mîna çirokên wî yê berê bi hûnandineke bêhnfireh bêhtengiyê tînin zimên. Hesenê Metê ku berê jî navê xwe bi çend pirtûk û çend wergeran dabû bihistin, bi zimanekî taybetî, bi stîleke klasîk î taybetî rewşa kurdan a civakî, siyasî û psikolojîkî tîne zimên, dadîkeve kûraniya ruhiyeta gernasên xwe û bi wan re dibe yek. Ew gelek caran jî bûyêrên trajîk bi rengê komedî û îronî dihûne. □

Epilog

Hesenê Metê

Weşanên NÛDEM





Dara Hinare, serpêhatiya çend çiyayîyan e ku li Çûkûrovayê li kar digerin. Di pêvajoya gera wan ya kar de, xwendevan dikişê çihana Çûkû-

rova ya hundurîn û dibe şahidê guhertinên wê. Li Çûkûrovayê êdî sistema feodalîzmê dimire û di şûna wê de kapitalîzm bi pêş dikeve. Di pêşketina vê sistemê de rewşaarker û paleyan, bêkarî û belengaziya wan mîna filmekî li ber çavan tê raxistin. □

Dara Hinarê
Yaşar Kemal
Werger: Firat Cewerî
Weşanên NÛDEMÊ

ku bi forma kesê yekemîn hatiye nivîsandin, di derheqê çend girtiyan de ye ku li bendî gulebarandina xwe ne. □

Dîwar
J.P. Sartre
Werger: Firat Cewerî
Weşanên NÛDEMÊ



Ci bigire Çher kurdêkî xwendevanê Yaşar Kemal dîzane. Yaşar Kemal bi xwe kurd e, lê bi zimanê tirkî dinivîsîne. Ew îro yek ji nivîskarên dinyayê ye

bijarte ye û ji salên heştêyî û bi vir de navê wî di akademiya Nobelê de aktuel e.

Piraniya temayên Yaşar Kemal an li ser kurdan in, an jî ji kehnîya kultura kurdî dîzên.

Siltanê Filan jî yek ji van e. Di *Siltanê Filan* de şerê fil û gêrikan heye, serhildana gêrikan ya li dijî filan heye. Ji ber ku fil tîn welatê gêrikan û dixwazin welatê wan dagir bikin, zimanê wan bi wan bidin jibîrkirin, wan ji gêrikiyê bi dûr bixin û wan bikin fil. *Siltanê Filan* ku bi motîvên neteweyî ve mişt e, bi kurdiya Mustafa Aydoğan vê biharê di nava Weşanên NÛDEMÊ derket. □

Siltanê Filan
Yaşar Kemal
Werger: Mustafa Aydoğan
Weşanên NÛDEMÊ



Xelatgirê Nobelê yê edebiyatê Sarte, filîzofekî navdar e û avakare felsefeya existentîyalîzmê ye. Lê wî di ber karê xwe yê filozofiyê de gelek berhemên edebî jî nivî-

sandine. Di berhemên Sartre yê edebî de şopa felsefeya wî baş dixuye. Di vî warî de çîroka wî *Dîwar* minakeke baş e. Ev çîroka

ŞEŞ PIRTÛKÊN NÛ JI ENSTITUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ

Enstituya Kurdî ya Brukselê di sala bihurî de ji bilî weşanên xwe yên kovar û broşûrên cihê, bi zimanên holandî û frensizî, şeş pirtûkên nû, yek bi zimanê kurdî û pênc bi zimanê holandî, weşandin û xebata xwe ya di çarçewa weşanan de bi serfirazî domand. Pirtûkxaneyê kurdan, yan pirtûkxaneyê li ser kurdan bi şeş berhemên nû zengintir bû.

Pirtûkên ku Enstituya Kurdî ya Brukselê weşandine ev in:

Binêr... Ez mezin dibim, (ji roja pêşin ta sê saliyê awayek baş ji bo dîtina mezinbûna zaroka we) **Christiane CLOET-MULLIE û Hedwig STELLEMANS-WELLENS, 100 rûpel, (werger: Derwêş M. FERHO),** pirtûka li ser babeta mezinbûna zarokan.

Di mezinbûn û perwerdekirina zarokan de roleke mezin li ser milên dê û bavên heye. Ji vê sedemê, divê meriv ne bes li saxlemiya laşê zarokê binêre, lê herweha li rewşa zarokê ya rûhî gelekî agahdar be.

Tê gotin ku xwendegêha dê û bav nîne. Di nava civakê de rastiyekê vê gotinê heye. Dayikêk û bavêkî baş pirseke şexsiyetê ye. *Encex*, xurtbûna gotinê heye. *Encex* xurtbûna tebîî bi alîkariya perwerdekirinê hê zêdetir meywe dide. Awayên cihê, rêyên mezinbûnê û perwerdekirina zarokê yên zanyarî (ilmî) rastiyekê jiyane ne.

Ev pirtûk bi armanca ku dê û bav, zarokên xwe ji roja bûnê ta sêsalîya wan bikaribin baştir nas bikin hatiye amadekirin. Dayik û bavên ku dixwazin zarokên xwe baş

perwerde bikin û mezinbûna wan bibînin pêwîst e vê pirtûkê bixwînin.

Ev pirtûk cara pêşin ji aliyê Zarokxana girêdayê Zanîngeha Katolik ya Leuvan (K.U.L.), bi alîkariya Rêxistina Civakî û saxiyê (V.M.S.I.) bi zimanê holandî hatiye amadekirin û weşandin. Bi hevkarîya nivîskarên wê Christiane Cloet-Mullie, Hedwig Stellemans-Wellens û Hunermend Francine Rondou ji aliyê Derwêş M. Ferho hatiye wergerandin. Hin tiştên nû hatine zêdekirin û bi awayekî nû ji çapê re hate amade kirin. Hêvî ew e ku ev berhem di pêşerojê de li welêt ji were weşandin.

Gevangenis Nr. 5, 11 Jaar in de Turkse Gevangenis, Mehdi Zana, 132 rûpel, bi zimanê Holandî, (Girtigeha Nr. 5, 11 sal di girtigehê de li Tirkîyê). Werger: Chris Den Hond).

Di têkoşîna azadiya gelê kurd de Mehdi Zana yek ji kesên xwedî cihêkî girîng e. Di

navbera 1980 û 1991 de ew 11 salan di girtîgeha Diyarbekrê de girtî bû.

Di vê pirtûkê de ew li ser êşkenceyên rojane, zilma dewletê, sadîzma îdareya girtîgehê, serhildan, serbilindî û hevkarîya girtîyan di navbera hev de dinivîse.

Pirsa kurdan ji destpêka rejîma kemalist heta niha bi zimanekî zelal dinivîse.

Mehdî Zana, xwediyê têkoşîneke serbilind e. Di salên 70 de wî di nava T Î Pê de kar dike. Di 1977 de weke serokê şahredariya Diyarbekrê tê bijartin. Dema ku leşkeran li Tirkîyê heşkere hikim xistin destê xwe ew hate girtin û mahkûmê 36 sal girtîgehê bû. Di 1991 de azad dibe, lê di 1994 de dîsa bi 18 meha tê cezakirin. Ev bû çend sal e ku Mehdî Zana li dervayê welêt e û xebata xwe ya ji bo azadiya gelê xwe didomîne.

Pirtûkeke hêja ye ku hem ji aliyê kurdan û hem ji aliyê kesên din bê xwendin.

Dr. A. KASIMLO, Merivê aşti û diyalogê, 72 rûpel. Bi zimanê Holandî, Biyografiya rehmetiyê Dr. Kasimlo ji aliyê PDK-Î û kesên cihê.

Yek ji merivê herî mezin ku di sedsala 20 de jiyane. Yek ji serokên kurdan ku di siyaseta de cihê xwe bi ûpên zêrîn di nava têkoşîna netewî ya kurdan de ji bo azadiyê û jiyaneke mirovane daye nivîsan.

Dr. A. KASIMLO, Merivê aşti û diyalogê, 72 rûpel. Bi zimanê holandî, Biyografiya rehmetiyê Dr. Kasimlo ji aliyê PDK-Î û kesên cihê.

Yek ji merivê herî mezin ku di sedsala 20 de jiyane. Yek ji serokên kurdan ku di siyaseta de cihê xwe bi ûpên zêrîn di nava têkoşîna netewî ya kurdan de ji bo azadiyê û jiyaneke mirovane daye nivîsan.

Dr. Kasimlo di sala 1930 de li bajarê Urmiya hate dinê. Paş xwendina xwe ya bingehî wî li Paris û Pragê xwendina xwe ya bilind berdewam kir. Li van her du cîyan jî mîna dersdar kar dikir.

Di sala 1973 de Dr. Kasimlo dibe sekretêrê giştî yê Partî Demokratî Kurdîstana Îranê. Ji wê demê û paş de wî weha xebat kir ku parti di pîrr alîyan de pêşketîneke darî çav qeyd bike. Di rojên herî zehmet de wî parti idare kir. Bi serbilindî ji bin her barê giran derket. Rejîma Îranê jî xiste bin pîrr astengîyan. Bi xebata xwe ya diplomatîk rejîma Îranê ya kevneperst şermezar kir. Ji ber vê sedemê jî kevneperestên Îranê, bi destên diplomatên xwe li ser maseya diyalogê di sala 1989 de Dr. Kasimlo tev du hevalên wî dane kuştin.

Di vê pirtûkê de jîyan û xebata wî ya politîk ji aliyê PDK-Î û kesên din bi ferehî tê axaftin.

De Koerden, in de (voor-malige) Sovjetunie 1921-1994, Herman TAELS, 114 rûpel, bi zimanê holandî.

Gelek kesan pîrra neteweyî ya Kurdan li Tirkîyê, Îran, Irak û Suriyê bihîstîye. Lê li ser kurdên li Sovyetê yan qet nehatiye bihîstin yan jî pîrr kêman kesan. Eger hatibe bihîstin jî agahdariyeke kêman e.

"Dem a ku min xwest li ser wan kurdan agahdariyan bistînim baş xuya bû ku çîqa kêman agahdarî peyda dibe. Di nava pirtûkeke mîna 'Les Kurdes', ya Basil Nikitîne jî ji xeynî yek rûpelî li ser wan nanivîse. Agahdariyên kurdologên li Sovyetê jî ji tesîr û serdestiya hikmê komunîzmê azad nebûne û her agahdariyên ku ew belav dikin bê pîrs tene wergirtin. Xuyaye ku ew agahdarî di

nav gelek şaşiyân de fetisîne. Rastî ne xuyaye.

Ez gîham wê baweriyê ku li ser wan pîr kêm tê zanîn û xebateke bîngêhî pêwîst e. Bi gelek çetîniyan min dest bi xebata berhevkirina agahdariyan kir. Ez bawer nakim ku min weke dil dixwest kar kiribe. Lê hevî dikim ev berhem ji lêkolînên din re bibîne bîngêh, yan qet nebe bibîne sedem ji bo xebatên pêşerojê.” Herman TAELS.

Di vê pirtûkê de li ser gelek aspektên kurdên Sovyetê li komarên cihê agahdariyên balkêş hene.

Kurd, Mafê Destxistina Azadiyê di Çarçeweya Neteweyî û Navbermeteweyî de, Katy VERZELEN, bi zî-manê Holandî, 172 rûpel.

Di Adara 1991 de li pîrrianiya televîzyonê cihanê li ser kurdan û koça wan dihate axaftin. Mîna pîr kesan nivîskara vê pirtûkê ji bi wê rewşê gelekî êşa. Ev ji bû sedema ku wê ev berhem paş lêkolîneke du salan pêşkêşî xwendevanan kir.

Nivîskar di vê berhema xwe de li ser siyaseta li welatên ku Kurdistan di navbera xwe de par kirine, li ser siyaseta Rojhilata Navîn, li ser siyaseta Ewropa, Sovyeta kevî û Dewletên Emerîka Yekbûyî (U.S.A.) û îstîs-marîkirîna pîrsa kurdî ji bo menfaetên xwe yê dewletê bi awayekî fereh dinivîse.

Nivîskar di vê pirtûkê de baş dide xuya kirin ku kurd bi tekarar tene xapandin û dewletên din vê pîrsê çawa ji bo menfaetên xwe qurban dikin. Yek ji van dewletan jî Beljîka ye ku ji bo menfaetên xwe yê dewletê (li gora yê dewletên din herçend e pîr jî kêm in) pîrsa kurdî li gora daxwaza dewleta Tirkîye dimeşîne.

Ev pirtûk, mîna berhemeke nû ji bo kurdan û kesên ku li ser pîrsa kurdan radiwestin valahiyeke giring tijî deke.

Hêlin Rook Naar Boomhars, Suzan SAMANCI, (werger ji Elmanî û Tirkî: Koen van Bael û Isabelle De Keyser) bi zmanê Holandî, 110 rûpel.

Ev berhema ji 15 çîrokên xweş amade bûye ji di nava weşanên Enstituya kurdî ya Brukselê de hate weşandin.

Her çîroka di vê berheme de li ser jiyana rojane ya kurdan li Diyarbekrê, li derdorê Diyarbekrê û li navçeyên din yê Kurdistanê nivîskara vê pirtûkê bi xwe li Diyarbekrê dimîne û ew vê rewşa rojane li wira diji. Ev yek ji hêzbûna van çîrokan dide xuya kirin.

Hêvî ew e ku nivîskara van çîrokan bi zîmanê xwe yê bedew, kurdî, hunerê xwe pêşkêşî gelê xwe bike û berhemên wê ji zîmanê kurdî bo zîmanên din werine wergerandin.

Kurdish Instituut of Brussels
Rue Bonneels, 16-1210 Brussels
Tel. (0032) 2. 230 89 30, Fax 2. 231 00 97

TITANIC

SÜLEYMAN DEMİR

Titanic, Titanic. Di Caprio, Di Caprio. Li her deran Titanic û Di Caprio. Di rojnaman de Titanic û Di Caprio, di kovaran û televîzyonan de Titanic û Di Caprio. Titanic bû suksêya herî mezin a Hollywood a dema compiuteran. Titanic solta dinyê tevî rakir. Di Caprio kir "mezinê dinyê". Di hemû kovar û rojnameyan de heye. Di radio û televîzyonan de heye. Bi her awan bahsa wî tê kirin. Her demê tê kirin. Rojname û kovarên dinyê ên mezin hemû ji bo raportajan bi dû de ne. Jibirakirina wî kêmasiyek e. Li ser tişortan jî heye.

Titanic çi ye? Çawa ye?

Titanic û xuşka xwe Olympic, di wextê xwe de keştiyên dinyê ên herî mezin bûn. Bi dûkelê dixebitûn. Titanic wek keştiyeke ku wê qet tu caran xewr nebûya hatibû eşkerekirin. 1909-an dest bi çêkirina wê hat kirin. Şirketa Britanî, White Star Line, 10 nîsana 1912-an Titanic derxist rêwitiya herî pêşî. Wê ji Britanya, ji Southampton biçûya New Yorkê. Lê mixabin 14 nîsanê, gava hina 600 km dûrî Newfoundland bû, li çiyayekî qeşayê ket, qulên mezin di pêşiya wê de vebûn û xewr bû. 2206 rêwî tê de hebûn. 705 (li gor hin agahdariyan 704) rêwî tenê hatin xelaskirin.

Ji hemû milletên ewrûpî tê de hebûn. Dost û nas û merevên gellekan tê de hebûn.

Ên ku tê de tunebûn, bi hêvî û baweriya xwe tê de bûn. Keştiyeke wilo mezin û saxlem rêwîti hêsan dikir. Ji ber wilo jî gava xewr bû, bû sedema êş û şîneke mezin.

Berê jî filmê Titanic hatibû çêkirin. Min ew jî ditibû. Balkêş bû. Mirov dibû hevparê wê êşê û wê şînê. Lê Titanic dîsa bû film û rekorda temaşevanan girt. Ez jî yek ji wan temaşevanan bûm.

Li gor film, şirketek, lêkolînan di derheqa Titanic de dike. Û bi dû elmasekî bi navê "Dilê deryayê" de ne. Robot dadikevin binê deryayê, hundurê Titanic. Li devera ku bawer dikin ku Dilê Deryayê lê ye, wî nabînin. Lê sûretekî dibînin. Keçeke tazî ye û ew dil di stûyê wê de ye. Ew yek ji wan re dibe sergêjekek.

Karê wan ê di wê derheqê de, di televîzyonan de direkt xuya dike. Pireke gellekî mezin wan dibîne, telefonê dide wan û dixwaze alikariyê bi wan bike. Navê wê Rose e. Tê wê dibin wir, cihê Titanicê û lê guhdarî dikin. Gava ew dibêje, çîrok ji serî ve dest pê dike.

Rose (Kate Winslet), gava Titanic ji Britania derdikeve rê, keçeke ciwan e, spehî ye û destgirtiya yekî gellekî dewlemend e. Lê Rose ne ji dewlemendan e. Rose ji wî û jîna ku di nav de ye hez nake. Êvarekê gava pê de dixeyide, Rose derdikeve jora Titanicê pişt caxê, dike xwe biavêje û xwe bikuje.



Didemek ji film; Leonardo Di Caprio û Kate Winslet.

Jack (Leonardo Di Caprio) ku rêwiyekî Îtaliyê ye, wênevaneke nûhatî, feqîr û hîna ne navdar e, bilêta xwe di listika pokêr de derxistiye, wê dibîne. Ew ber esir ji li ber caxa

jor dîtibû û dil ketibûyê. Jack diçe û dike ku wê xelas bike, wê ji wê kirina xeter vegerrîne. Bi gounên ku hêviyê didin dilan dixwaze wê qane bike. Lê Rose pêşî jê bawer

nake û dev ji min berde, ez ê xwe biavêjim dibêje. Jack, heger tu xwe biavêjt, ez ê ji bi te re bêrn dibêje û kincên xwe ji xwe dike û xwe ji avêtinê re kar dike. Rose xwe hêdt hêdt ji bira dike û li kirina wî ecêbmayî dimîne. Kuro tu dîn î, çima tu dê xwe biavêjt, tu dê bimirî, dibêje. Jack, ê baş e, ji bo ku tu min xelas bikî, divê tu ji wir û ji a xwe vegeri, dibêje.

Rose bi a wî dike. Gava dike ku vegere, nigê wê dişemite û dike ku bikeve. Lê Jack xwe digihîne wê. Jack wê bi xeter û sextî, ji aliyê caxê ê derve xelas dike. Gava wê ji ser caxê dadixe bi ser hevdu de dikevin. Bekçî wan di wî halî de dibînin û gumana ku yekî keleş bi zorê êrîşî yeke dewlemend dike, dikin. Wî digirin û bi Rose re dibin ba destgirtiyê wê. Lê Rose, bûyer ne wilo bû dibêje û wî xelas dike.

Îcar carê havdu dibînin. Jack hin dixwaze wê bibîne û hin jî dixwaze wê bi temamî ji wê fikra xwekuştinê vegerine. Bi hev re dilêş in. Carekê derdikevin ser caxa pêşiya keştiyê, destên xwe daftin ser destên hev, tiliyan di nav ên hev re derbas dikin û baskan vedikin, xwe didin ber bê û li asoya êvara sor dinerin. Jack wî çaxî ji ber dilgeşiya dilê xwe "ez mezinê dinyê me" dibêje.

Jê û pê ve îcar agirê evîne dikeve nava Jack. Dilê wî bi ser Rose ve ye, her demê di tîrsa ku dê bikaribe xwe biavêje de ye. Xwe di cihê xwe de nagire. Lê ên wek wî feqîr nikarin biçin cihên dewlemendan. Jack diçe û wê dibîne. Civanan didin hev. Destgirtiyê wê bi wan dihise. Lê gava ku Rose dev ji wî berdide û bi Jack re diçe, Titanic li çiyayê qeşayê rast tê. Eşkere dibe ku wê xewr bibe. Destgirtiyê Rose wê peyde dike û Jack bi awayekî ku nikaribe xwe xelas bike, hepis dike.

Kaos li dar e. Gava pêşî pîrek û zarokan (ên dewlemend) li keştiyên biçûk dikin û dikin wan xelas bikin, Rose xwe ji keştiyeke wilo biçûk dîsa diavêje Titanic nîvbinavbûyî û diçe ku Jack xelas bike. Di koridorên tije av de li Jack digere û a soxî wî peyde dike û xelas dike. Keft û lefra xelaskirina jîna ciwan a bi evîneke dilkamax, alikariya ku bi hevdu dikin, di koridorên teng de rewa ji ber avê, wêneyên balkêş in. Di wî halî de, destgirtiyê Rose jî tê û bi demançê dikeve dû wan.

Jack jir û şareze ye. Heta gava ku Titanic xewr dibe ji xwe û Rose xelas dike. Textekî peyde dikin. Rose derdixe ser û ew jî xwe bi text digire û li bendî ku hin bêrn wan xelas bikin dimînin. Lê av sar e. Jack li pêş çavên Rose hêdt hêdt dimire. Ên ku wek wan in hemû di çend deqîqan de dimirin. Şeş kes tenê tîrn xelaskirin. Rose yek ji wan e. Rose ew pîra mezin e.

Titanic berhemeke mezin e. Xweş hatiye çêkirin. Sê saetan dirêj e, lê bi min deqîqeyeke tenê ya zêde tê de tune ye. Bûyer gellekî bi can û balkêşî dibin. Mirov zû dibin ba xwe. Mirov dibe yekî di Titanicê de. Mirov dikeve tîrs û xiroşa mirinê. Filmekî dijwar e. Niv saeta dawî hemû bi giriyê temaşevanan derbas bû. Ên li herdu teniştên me, her digiriyan. Li pêş û paş me her digiriyan. Bi zêdebûn ciwan digiriyan. Qiz digiriyan. Bêguman nasên hinan di nav ên ku mirin de hebûn. Ya ji li ser wê mirina ku bi zalimî dibû, digiriyan. Gellek ji li ser Di Caprio û evîna ku nedîçû serî digiriyan. Ew yek jî, yek ji nişanên film ên bi serketibûnê ne. Titanic û James Cameron hêjayî pîrozbahiyê ne.

J. Kameron, di Titanic de, ferqa dewlemendan û xelkê xweş daniye. Qet ne tesa-

duf e. Quretî û cahiltiya dewlemendan bi awayekî pirr eşkere derdixê ber çavan. Heta gava nivê Titanicê binav dibe jî, balo li dar e û ên herî qure di dansê de ne. Carnan henekê xwe bi wan dike. Gava li ser masa xwarina mêrê Rose (dor deh kesekî ne) bahsa Freud dibe, jî hev re "ma Freud jî rêwiyek e" dibêjin. Lê di sahna bi dû wê de, îcar germiya jînê û hisên mirovan li ba xelkê û feqîran dide xuyakirin. Xweşiya şahiya wan dide xuyakirin. Bi xuyakirina dilovanîya jîna wan, rûmetê dide wan, wan bilind dike.

Ji sisê paran, pareke rêwiyên Titanicê dewlemend bûn. Gava eşkere dibê ku wê Titanic xewr bibe, bi xelaskirina wan dest bi karê xelaskirinê dikin. Ji bo ku heta bikaribin pêşî jin û zarokên wan û bi dû re jî mêrên wan xelas bikin û tu kaos çênebe, deriyên qatên xelkê û feqîran dikirin. Lê xelk xwe didin wan deriyan û pîrek û zarokên xwe jî dibin ber keştiyên ku rêwiyên jî Titanicê dadixin. Jack pêşengiya wî karî dike.

Titanic afirandineke mezin e. Afirandineke bi hêza teknîkê ye. Afirandineke guhertî ye. Berê gava film dihatin çêkirin, bûyer û kirin bi piranî bi awayekî dihatin kirin. Mirov beşdarî bûyeran dibûn. Sahne bi berfîrehî dihatin çêkirin û raxistin. Ên ku rol digirtin, bûyer û kirin, dikirin û "sûretên" wan dihatin girtin. Heger hin tiştên ku nikaribûna bi xwe bikirana hebûna, ên profesyonel ew kar jî bedêla wan ve dikirin. Lê di Titanic de bi piranî ne wilo ye. Ên ku rola sereke dilîzin tenê mirovên rast in. Wekî din, derya, ezman, Titanic bi xwe û dor çend hezarek mirov, bi computeran hatine çêkirin. Sûretên xeyalî ne. Bi computeran wenê jî hev tên vejînanandin û li hev tên su-

warkirin. Wilo, gellek taxe sûret li hev tên suwarkirin û tiştê ku dixwazin, bi wî awayî a soxî derdixin. Mesele, gava Di Caprio û Kate Winslet li pêşiya keştiyê ne û baskan vedikin, di eslê xwe de di qutiyeke kesk de li ber perwanê ne. Niha, hîna divê zemîn ya kesk be, ya jî şîn be. Teknîka îro hîna wilo dixwaze. Wan bi computeran dikin sûret û dibin li ser sûretê Titanicê suwar dikin. Bi teknîka îro, bêyî ku nigên aktorên şil bibin, karin filmên bin avê çêbikin.

Rojnamevanan di vê derheqê de jî zanayên sinemavanîyê û J. Kameron pirsîn bê ma wê êdî film wilo bi mirovên "sexe" bên çêkirin. Erê, lê em nikarin tiştinan têxin bedêla rolgirên sereke, ên stêrik. Ew ê her hebin, gotin.

Lê gava ku wilo hatibe çêkirin, ne ku karêkî hindik e. 285 milyon dollar li karê çêkirina Titanicê çûne. Titanic filmê Hollywoodê herî buha ye. Perên herî mezin çûne jî computeran, avakirina îstasyonên computeran û karmendên computeran re. Cumpu-teran mejiyekî gellekî mezin, programên ku hîna jî bo wî karî nehatibûn çêkirin û sistemen xurt dixwestin û ên wilo mezin, xurt û pêşketî tunebûn. 200 îstasyonên xebatê hebûn. Gava bawer dikirin ku her tiştê tamam in û 2000 mirovan du mehan bi şev û rojan dest bi karê xwe kirin, hat dîtin ku 30 computerên din lazim in. Hêdî hêdî binê peran derdiket û hêvî dişkêst. Hemû tiştê diketin xeterê. Lê a soxî Titanic xelas bû û xelata xwe stend. Titanic, giha biserketinê ku tu filman jî salên pêncî heta roja îro bi dest nexistibûn. Pere û xelat û navdarî hamû girtin. 11 xelatên Oscar stendin. Gava J. Cameron xelat girt, bi heq bû ku Oscara xwe bi herdu destên xwe bilind bike û wek lehengê Titanicê bibêje "ez mezinê dinyê

me". J. Cameron her tiştên baş hîlbijartîbûn û her tişt baş kirîbûn. Hemû leheng rast hîlbijartîbûn. Herdu lehengên wî yê sereke xelat negirtin, lê ne ji ber ku ne bî-serketî bûn. Ji ber ku ên wek Jack Nicholson û Helen Hunt li hemberî wan hebûn.

Muzîka Titanic jî, My heart will go on, xelata Oscar girt û li çar aliyên dinyê guhdar peyde kirin. Klama evîneke bêhedan e, a hezkirineke xurt e. Bi lerza dengên muzîka navneteweyî ye. Celine Diona Kanadayî vê klama wilo ji hêla hisan ve dewlemend, hêdî hêdî dibêje. Di lîsta ewrûpa de, bi Titanic re peralel bilind bû, navdar û stêrikên ciwanan hemû derbas kirin û giha çihê yekemîn. Lê li hemberî wê jî Madonna bi Frozen hebû û nikarîbû çihê yekem ji ber wê bigire. Geh ew û geh ew yekem e.

Gellek di derheqa Di Caprio de bi şîk bûn û hîna jî bi şîk in. Lê J. Cameron ew bi zanebûn hîlbijartîbû û şaş derneket. Lêkolînêrên sinemê xweş dizanin ku qîzên dinyê dikarin berê çûna rewşa filman biguherin. Heger xortê filmê stêrikê spehî be, qîz zû dibin temaşevanê filmê. Heger ew bûn temaşevan, ên ku bikaribin bibin temaşevan, hemû didin dî wan. Ji ber wilo jî J. Cameron bi Di Caprio bawer bû û derket ku cawê Hindê ye. Îro qîzên dinya rojava hemû dildarên wî ne. Bêhna wî li ku bê, sed sed êrîşî wir dikin. Bibihîzin li kîjan otelê ye, ji bo ku bikaribin wî bibinin û îmzeyekê jê bistînin, ji ber deriyê wê naçin.

Bê guman ne spehîbûna Di Caprio tenê ew wilo navdar kiriye. Titanic e, mezinbûna filmê e, hêza listikvaniya wî bi xwe ye û mezinbûna bûyera Titanic û gellek tiştên din in. Lê baş e, Di Caprio kî ye?

Navê wî, Leonardo Di Caprio ye. Niha 23 salî ye. Li Los Angeles çêbûye û mezin

bûye. Bi esil Îtalî ye. Navê wî jî bi Îtalî ye. Hîna di 14 saliya xwe de dest bi çêkirina filmên reklaman kiriye. Bi dî re di hin seriên televîzyonê jî de listiye. Bi filmê Gilbert Grape", di 19 saliya xwe de navdar bûye. Di Caprio hîna azîb e û êvaran bi hevalên xwe re li Manhattan xuya dibe. Niha filmekî wî yê din li sinemên dinyê dilîze. "Zilamê bi maskeya hesinî". Du rolan dilîze. Him qralê Fransa ê ciwan Ludvigê XIV e, him jî yekî xerab e. Tê gotin ku wê gellek ji bo dîtinê wî bi xwe herin wî filmî jî.

Rexnegir bawer dikin ku wê Di Caprio, wek ku zû navdar bû, zû bikeve jî. Gava rojnamevanên swêdî ev yek anîn bîra wî, "na, ez ê nekevim. Ez ê bi hemû hêza xwe bixebitim" got. "Tu nema azad î", hat gotin, "ez azadiya xwe didim bi navdariyê" got.

Lê heçê Kate Winslet e, ew di nav toz û siya Di Caprio û Titanicê de hat jibîrakirin. Di çapemeniya dinyê de, balisa wê nayê kirin. Wek ku wê rola xwe kir, perên xwe stendin û ji sahê daket. Lê bi baweriya min Kate Winslet pirr bi rola xwe diket û xweş dikir. □



HAWAR

dengê zanîne ye!

NÛDE: Box: 177
177 23 Järfälla-Sweden
Tel û faks: 8-580 13162

HAWAR hat hawara me

Hemû hejmarên HAWARê, ango ji hejmara 1ê heta ya 57an mîna du cildan di nava weşanên me de derket. Mîna tê zanîn kovara HAWARê yeke-mîn kovara edebî û çandî ya zaravayê kurmancî ye ku di navbera salên 1932-1943an de li Şamê bi alfabeya latînî derdiket. Lê belê 23 hejmarên pêşî hem bi lafabeya latînî û hem jî bi ya erebî bûn. Di vê çapa nû ya HAWARê de me her 23 hejmarên pêşî jî transikrîbeyî alfabeya latînî kirine da xwendevanên îro bikaribin bixwînin. Herdu cildên HAWARê bi cildên çerm mîna pirtûkên pîroz hatine çapkirin. Herdu cild li ser hev 1146 rûpel in. Buhayê herdu cildan li ser hev 100 Markên almanî ne. Yên ku çar taximan bixwazin em heqê postê jî digirin ser xwe. Ji bo Swêdê jî her taximek (Cild 1 û 2) bi 400 Kronên swêdî ye.

♥ HAWARêkê têxe mala xwe, bila mala te bê HAWAR nemîne. HAWAR bingehê ziman û edebiyata me ya nûjen e. Bila zarokên we bi nûjentiya HAWARê perwerde bibin.

♥ Qîmetê bidin ziman û edebiyata xwe, qîmetê bidin hêjayiyên xwe da xelk jî qîmetê bidin we!

♥ Xwe bi HAWARê serbilind bikin, mala xwe pê şên bikin, giyanê xwe pê şa bikin!

♥ HAWAR dengê zanîne ye!

BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

Ger hewesa te li ser şîir, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sinema û hwd. hebe, pêşniyazêke me heye; bibe aboneyê NÛDEMÊ!

Ger tu bixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya herçar perçeyên wê lêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwinî, dîsan bibe aboneyê NÛDEMÊ!

NÛDEM dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike; bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê / aboneya NÛDEMÊ.

Ji bo Swêdê salek 240 Sek., Ewropaya 80 DM.

Nav û paşnav

Adres

Vê kartê dagirtin û fotokopiyê wê li ser adresa NÛDEMÊ bişînin. Çer ku ew bihîje me, em ê NÛDEMÊ di gel karta aboneyê jî te we bişînin.

